



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBÎYATA KURDÎ

CIH DI ROMANÊN KURDÎ DE

Mehmet EKEN

TEZA LÎSANS A BILIND

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Dr. Öğr. Üyesi Hêmin Omar AHMAD

ÇEWLÎG- 2021

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KÜRT ROMANLARINDA MEKAN

Mehmet EKEN

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ DANIŞMANI

Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

BİNGÖL- 2021

NAVEROK

PÊŞGOTIN	VI
ÖZET	VIII
ABSTRACT	IX
KURTE	X
KURTEBÊJE	XI
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

PÊNASEYA CÎH

1. CÎH DI BAWERİYAN DE	5
2. CÎH DI BERHEMÊN WÊJEYÎ DE	7
2.1. Cih di Helbestan de	8
2.2. Cih di Destanan de	12
2.3. Cih di Çîrokan de	17
2.4. Cih di Romanan de	19
2.4.1. Bikaranîna Cihî di Romanê de	20
2.4.2. Teswîra Cihî di Romanê de	24
2.4.3. Erka Cihî di Romanê de	26
2.4.4. Têkiliya Cihî, bi Dem, Bûyer û Lehengî ve	28
3. TESWÎRA CÎHÎ DI BERHEMÊN WÊJEYÊ DE	29
4. TÊKÎLIYA CÎH Î EŞYAYAN DI BERHEMÊN WÊJEYÎ DE	31
5. CÎH DI RÊBAZÊN HUNERÎ DE:	32
6. CÎH DI BERHEMÊN HUNERÎ DE	33
7. SENIFANDINA CÎHÎ DI BERHEMÊN HUNERÎ DE	34
7.1. Cihên Derdorî	35
7.2. Cihên Têgihî	35
7.2.1. Cihana Ku Tê Labirentkirin	36
7.2.2. Cihên Ku Sinorê Wan Bêdawî Ne	37
7.3. Cihên Şênber	37
7.3.1. Cihên Vekirî û Fireh	37

7.3.2.	Cihên Girtî û Teng	38
7.3.3.	Cihên Çandî.....	38
7.3.4.	Cihên Olî	39
7.3.5.	Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	39
7.4.	Cihên Razber	39
7.4.1.	Cihên Ûtopîk	40
7.4.2.	Cihên Fantastîk	40
7.4.3.	Cihên Derî Sirûştî.....	40
7.4.4.	Cihên Sehekî	40

BEŞA DUYEM

ROMANA KURDÎ Û BIKARANÎNA CIH DI ROMANA KURDÎ DE

1. PÊŞVEÇÛNA ROMANA KURDÎ	42
2. CIH Û ROMANA KURDÎ	45
3. CIH DI ROMANÊN QAFQASYAYÊ DE	49
3.1. Şivanê Kurmanca	49
3.1.1. Cih di Romana Şivanê Kurmanca de.....	50
3.1.2. Encama Tehlîla Romanê	57
3.2. Gundê Mêrxasan	58
3.2.1. Cih di Romana Gundê Mêrxasan de	59
3.2.2. Encama Tehlîla Romanê	71
4. CIH DI ROMANÊN BAKUR DE.....	72
4.1. Bîra Qederê	72
4.1.1. Cih di Romana Bîra Qederê de	73
4.1.2. Encama Tehlîla Romanê	99
4.2. Rojnivîska Spînoza.....	100
4.2.1. Cih di Romana Rojnivîska Spînoza de	101
4.2.2. Encama Tehlila Romanê	109
5. CIH DI ROMANÊN ROJHILATÊ DE	110
5.1. Pêşmerge	110
5.1.1. Cih di Romana Peşmerge de.....	111
5.1.2. Encama Tehlîla Romanê	119
5.2. Balindeyên Li Ber Bê	120

5.2.1.	Cih di Romana Balindeyên Li Ber Bê de	121
5.2.2.	Encama Tehlîla Romanê	137
6.	CIH DI ROMANÊN BAŞÛR DE	138
6.1.	Apê min Cemşîd xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir	138
6.1.1.	Cih di Romana Apê min Cemşîd xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir de	139
6.1.2.	Encama Tehlîla Romanê	155
6.2.	Hotel Europe	156
6.2.1.	Cih di Hotel Europa de	157
6.2.2.	Encama Tehlîla Romanê	177
7.	CIH DI ROMANÊN ROJAVA DE.....	179
7.1.	Mijabad	179
7.1.1.	Cih di Romana Mijabad de	180
7.1.2.	Encama Tehlîla Romanê	203
7.2.	Heftiyeke dirêj li Amedê de	204
7.2.1.	Cih di Romana Heftiyeke dirêj li Amedê de	205
7.2.2.	Encama Tehlîla Romanê	214
ENCAM.....		216
ÇAVKANÎ.....		220

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım ‘‘**Cih di Romanên Kurdî de**’’ de adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

11/02/ 2021

Mehmet EKEN

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mehmet EKEN tarafından hazırlanan *Cih di Romanên Kurdî de* başlıklı bu çalışma, 19.03.2021 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan: Dr. Öğr. Üyesi Osman ASLANOĞLU

İmza:

Danışman: Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD

İmza

Üye: Dr. Öğr. Üyesi İlyas SUVAĞCI

İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/.../

2021 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

PÊŞGOTIN

Ev xebat ji bo nişandana bikaranîna cihê di romanên Kurdî de hat amade kirin. Mijara vê xebatê, ku ji bo teza lisansa bilind hatiye amade kirin, teoriyên cihê û bikaranîna wan ku di romanên de pêk tê.

Di hilbijartina romanên de me xwest ku babetên wan ji hevdu cuda be. Di xebatê de ji her 5 perçeyên ku Kurd li dijîn, ji her yekê 2 roman hatin hilbijartin û babetên wan jî hat xwestin ku ne wekî hev bên. Di nav romanên ku hatin hilbijartin de cureyên romanên derûnnasî, dîrokî, biyografîk, otobiyografîk û hwd. cih digirin. Bi cudabûna cureyan me xwest ku li ser romanên ji hevdu cuda xebat were kirin jî ber ku cih li gorî cureyên pirtûkan diguherin. Mînak di romanên derûnnasîyê de cih zêdetir bandor li ser lehengan çêdike lê di romanên bûyerî de ew bandor ewqas ne berbiçav e.

Di vê xebatê de gelek zehmetî hat kişandin lewra di Kurdiya Kurmancî de xebatên bi vî şiklî zêde nehatibû kirin. Li zanîngeha Muş Alparslan di sala 2020 an de ji aliyê Cihan Kaynar ve bi navê ‘*Hêmana Mekanê Di Edebiyata Modern a Kurdî de*’ tezek hat nivîsandin. Di gihîştina çavkanîyan de gelek zehmetî hat kişandin. Kêmbûna xebatên bi vî şiklî di Kurdiya Kurmancî de û nezanîna Soranî û ji bilî Tirkî nezanîna zimanên din berê me da xebatên Tirkî û pirtûkên ku bi Tirkî hatine wergerandin. Di rênîşandina xebatê de me ji wan sûd wergirtin lê em bi girêdayî wan neman gelek pirtûkên teorîk me xwendin û gelek çavkanîyên cuda hatin bikaranîn.

Di vê xebatê de armanc ew bû ku, ji bo xebatên bi vî şiklî rêyek were vekirin û di pêşerojê de xebatên bi vî awayî zêdetir were kirin. Tê zanin ku ji bo pêşketina wêjeyê xebatên cuda divê werin kirin.

Di vê xebatê de li ser 10 pirtûkan hat sekinandin. Helbet tê zanin 10 pirtûk li beramberî romana Kurdî nagire lê ji bo tezê, divê sinorek bihatana çêkirin, ji ber vê jî çarçoveya xebatê bi vî şiklî hat saz kirin. Tunebûna xebatên wiha barê me girantir kir. Û ji ber ne dubarekirina hin tiştan me xwest ku bila ji her perçeyê 2 pirtûk be. Lê em bawer in ku ew ê mijar were fehm kirin û di pêşerojê de ev xebat ji aliyê gelek kesan ve were xurt kirin.

Xebat ji 2 beşan pêk tê. Di beşa yekem de teoriyên cihê û bikaranîna wan ya di hin cureyên wêjeyî de hat nişandan. Di beşa duyem de jî bikaranîna wan ya di romanên Kurdî de bi awayekî fireh û bi şirove hat nivîsandin.

Di vê xebatê da keda gelek kesan hene. Lê bi taybetî dixwazim ji mamoste Doç. Dr. Hemîn Omer AHMAD spas bikim ku bi temamî bi min re ji bo pêkanîna xebatê şuxulî û bi zanebûn û agahiyên xwe rê nîşanê min da, pê mijûl bû û ji min re şêwirmendî kir. Paşê Doç.Dr. Zahîr ERTEKÎN ku ji min xwest ku xebateke wiha bikim û di vê xebatê de bi agahî û tecrûbeyên xwe alikariya min kir û Dû re ji hevalên min ên hêja Mem Artemêt û Serhat KAYA re spas dikim ku di gihîştina pirtûkan û rastkirina rêzimanê de gelek alikariya wan gihîştin min.

Mehmet EKEN

Reşemî 2021, Amed

ÖZET

Mekan roman da en önemli unsurlar arasında yer almaktadır. Mekansız bir roman yaratmak kolay değildir hatta denilebilir ki böyle bir roman yaratmak mümkün bile değildir. "Kürt Romanında Mekan" adlı bu çalışmada önce bazı soruların cevabı verildi. Örnek; mekan nedir ve nasıl kullanılır? Sonra bölüm bölüm mekan farklı kategorilerde gösterildi. Sonrasında edebî eserler ile mekan arasındaki ilişki gösterildi. Edebî eserlerden sonra, mekanın sınıflandırılması ve yorumlanması yapıldı.

İkinci bölüm de ilk önce kürt romanı hakkında bilgi verildi. Bu çalışma da 10 roman üzerinde duruldu. Her parçadan 2 roman seçildi. Romanlar teker teker okundu ve cümle cümle sınıflandırıldı. Romanda kullanılan mekanlar gösterildi ve ait oldukları bölümlerin altına yazıldı. Sınıflandırmadan sonra da sonuçlar yazıldı.

Anahtar Sözcükler: Mekan, Roman, Kürt Edebiyatı, Edebi Eleştiri

ABSTRACT

Space is among the most important elements in the novel. It is not easy to create a novel without a place, and it can be said that it is not even possible to create such a novel. In this study called "Space in Kurdish Novel", some questions were answered first. sample; What is the venue and how is it used? Then, part by section, the venue was shown in different categories. Afterwards, the relationship between literary works and space was shown. After the literary works, the space was classified and interpreted.

In the second part, information about the kurdish novel was given first. This study focused on 10 novels. 2 novels were chosen from each piece. Novels were read one by one and classified sentence by sentence. The spaces used in the novel are shown and written under the chapters they belong to. After the classification, the results were written.

Keywords: Place, Novel, Kurdish Literature, Literary Criticism

KURTE

Cih di roman de di nav hêmanên sereke de cih digire. Bê cih afirandina roman ne hêsan e, heta ku dikarin bêjin ku tiştekî wiha ne pêkan e. Di vê xebatê ku bi navê ‘‘Cih di Romanê Kurdî de ‘‘hat nivîsandin de pêşî bersîvên hin pirsan hat dayin. Wek cih çî ye û çawa tê bikaranîn? Paşê beş bi beş cih di hin cureyên cuda de hat nişandan. Paşê têkiliya cih û berhemên wêjeyî hat nişandan û ji wan hin minakan hat dayîn. Piştê berhemên wêjeyî, senifandina cihê hat nivîsandin û şîrove kirin.

Di beşa duyem de jî pêşî di derheqê romana kurdî de agahî hat dayîn. Di ve xebatê de li ser 10 romanên kurdî xebat hat kirin. Ji her perçeyan du roman hatin hilbijartin. Roman hatin xwendin û hevok hevok hatin senifandin. Di romanên de cihên ku hatine bikaranîn hatin nişandan û di bin beşên xwe de hatin nivîsandin. Piştê senifandinê encamên biçûk hatin nivîsandin.

Bêjeyên Sereke: Cih, Roman, Kurdî, Wêjeya Kurdî, Rexneyên Wêjeyî

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

doç. :Doçent

dr. :Doktor

hj. :Hejmar

hwd : Her weke din

r. : Rûpel

weş. :Weşanxane

yrd. :Yardımcı

DESTPÊK

Di Kurdiya Kurmancî de li Tirkîyeyê li ser ‘‘Cih’’ xebat zêde nayê dîtin. Ji bilî teza ‘‘*Hêmana Mekanê Di Romana Kurdî (Kurmancî) De: Mînakên Mijabad, Labîrenta Cînan Û Gerîneka Guernîcayê*’’ ya Cihan KAYNAR û ‘‘*Dosyeya Mekanê*’’ ya Wêje û Rexneyê li ser vê mijarê rastûrast zêde ne hatiye sekinandin. Di hin xebetan de cih tên nişandan lê ji ber ku bi awayekî zanîstî û bi zanebûneke têr û tije ne hatine vegotin, xebat qels dimînin.

Romannivîsên Kurd ku dema ku romanên xwe dinivîsinin divê hêmanên romanê baş bizanibin û wan baş bi kar bînin. Yek ji wan hêmanan jî cih e. Mehmet TEKIN dibêje ku: Cih di nav hêmanên sereke yê romanê de cih digire. Yekkirina hêmanên romanê pêvist e û cih jî hêmaneke sereke ye ku pêvistiya bûyerê pê heye ku di cihekî rastî an çêkirî de pêk were. (Tekin, 2018, s. 44) Wek li wir jî tê dîtin cih bi bûyerê re girêdayê tê qebûl kirin lê di vê di gotinê de taybetmendiyên cihê zêde nayê gotin. Ev gotin ji dewsa giringî û taybetmendiyên cihê zêdetir têkiliya wî ya bi bûyerê re tê vegotin. Cih divê tenê ji bo tevgerên lehengan û sehnebûna bûyerê neyê dîtin. Lewra cih tenê erka sehnebûnê nagire li ser xwe cih di sazkirina bûyer û lehengan de roleke mezin dilîze. Di derheqê dem, derdor, çand hişmendî û hwd. de agahiyan dide.

Stendhal di romana xwe ya bi navê Sor û Reş da romanê bi vî şiklî pênasê dike; Roman, eynika ku di rêyeke dirêj da tê gerandin e. Ev eynik car geh şînbûna asîmanan geh herîyên ku di xendeqên rê da kom bûne nişan dide. Û hûn ew mêrîkê ku eynikê di tûrikê xwe da digerîne bi bêexlaqiyê sûcdar dikan. Eynikê wî ji ber ku herîyên rê nişan dide, hûn qebehetê di eynîkê de dibînin. Lê hûn rêya bi herî an mufettişa rê sûcdar bikin ew ê baştir bibe. (Binboğa, 2019) Bikêrhatina vê eynîkê girêdayî serkeftina berhemê ye. Heke berhem serkeftî be ew ê eynik jî kare xwe bi şiklekî baş çêbike. Berhem jî ji ber ku ji destê nivîskarekê derdikeve serkeftina wê jî girêdayê nivîskarê xwe ye. Nivîskar heke bixwaze romaneke serkeftî binivîse divê hin qaîdeyên romanê bizanibe û berhemên xwe li gorî wan binivîsinê. Yek ji wan qaîdeyan jî cih e.

Pewistiya çêbûna bûyerê bi kadroyên lehengan, cih û demê re heye. Loma jî divê girîngiya wan were zanîn û bi awayekî zanebûn werin bikaranîn. Giringiya cihê Bünyamin ÇERÎ, bi vî şiklî pênase dike: Cih, tiştên Pîroz ji tiştên ne pîroz, tiştên mêran ji tiştên jinan, malbatê ji xerîban û ji hemû talûkeyên derva vediqetîne. (Çerî, 2014, s. 30) Ferda Zambak jî di vê mijarê de dibêje ku: Di ravekirina cihê de kesên ku rave dikin tenê hin taybetmendiyan cih derdixin pêş. Lê di berhemeke wêjeyî de ji bo ji warekî re cih were gotin, çî şert û mercên wan divê hebin, nayê vegotin. Ev tişt jî tê wateya ne diyarkirina cihê ku bibe cure an nav. Ji ber vê jî ev mijar dibe sedema gengeşeyê û di xebatan de gelemperî taybetmendiyeke cihê tenê derdikeve pêş. Ev jî dibe sedema tehlîlên qels û ji ber vê jî tehlîlên xurt zêde dernakevin holê. (Zambak, 2007, s. 4) Cih divê pêşî bi awayekî zanistî û bi hemû taybetmendiyan xwe were rave kirin. Bi ravekirineke baş ew ê were dîtin ku cih ji bo berhemê pir girîng e û girîngiya cih bi vê ravekirinê ve di berheman de xwe bi awayekî zanistî nîşan bide û ji aliyên romannivîsan ve bi serkeftî were bikaranîn.

Cihê em dikarin wek bingeha berhemê bihesîbin. Ji ber ku bê cih berhemek nayê dayîn. Em ê di vê xebatê da bibînin ku cih di romanê da tê çî wateyê û bi çî şiklê tê bikaranîn. Em ê pêşî di derheqê mekanê da agahî bidin paşê em ê qala dîroka romanê bikin. Paşê em ê li ser romanên kurdî hin agahîyan bidin. Em ê romanên kurdî veqetînin 5 perçeyan û em ê ji her perçeyek 2 roman hilbijirin. Em ê li ser romanên ku hatine hilbijartin hin agahîyan bidin û cih çawa hatiye bikaranîn kêmasî û serkeftinên wan bi mînakên re nîşan bidin. Em dê li ser romanên bi navê *Şivanê Kurmanca*, *Gundê Mêrxasan*, *Bîra Qederê*, *Rojnivîska Spînoza*, *Pêşmerge*, *Balindeyên Li Ber Bê De*, *Apê min Cemşîd Xan Ku Hertim Bê Ew Li Ber Xer Dibir*, *Hotel Ewrûpa*, *Mijabad*, *Hefteyeke Dirêj Li Amedê*, li ser têgeha cihê bisekinin.

1. Mijara Tezê

Mijara tezê cih e. Cih çî ye û cih çawa tê bikaranîn û bi çî şiklê di berhemên wêjeyî de xwe nîşan dide. Tê zanîn ku bê cih fikirandina jiyanê ne pêkan e, ji ber vê jî mirov dema ku berhemekê dinivîse bûyerê li ser sehneyeke saz dike. Ew sehne jî cih e. Loma cih bo berheman girîng e. Mijara tezê jî wek hat gotin cih e û binbeşên wî û bikaranîna wî ya di romanên Kurdî de ye.

2. Armanca Tezê

Gelek armancên tezê hene. Yek ji wan nivîsandina teoriye ye. Ji ber ku di xebatên Kurdî de li ser vê mijarê ti teori heta niha nehatiye nivîsandin. Bi vê xebatê teoriyên ku heta niha hatine nivîsandin li ser vê mijarê hat kom kirin û bi Kurdî hat nivîsandin. Armaneke din ya tezê ji aliyê teoriye ve nixandina romanên Kurdî ye. Romannên Kurdî ku heta niha hatine nivîsandin elbet ne qels in. Lê bi nixandina bi teoriyan ew ê xurttir bibe. Armaneke din jî ew e ku nişandana cihê ye di romanên Kurdî de. Cih hêmaneke sereke ye di romanên de. Loma divê di romanên de cih baş were saz kirin. Kalîteya romanê bi saz kirina hêmanan tê diyarbûn. Armanca tezê ya sereke ew e ku romanên Kurdî bi nişandana bikaranîna cihê ve were nişandan û ji bo pêşerojê xebatên bi vî şiklê were kirin û saz kirina rê û rêbazekê ye.

3. Giringiya Tezê

Ji ber gelek sedeman gelê Kurd bi derengî dest bi xebatên zanistî kirin. Ji ber vê derengmayîne gelek mijar di refan de mane, nehatine vekolandin û nixandin. Yek ji wan mijaran ku ji ber van sedeman nehatiye vekolandin mijara cih e. Heta niha li Tirkiyeyê bi Kurmancî li ser vê mijarê ji bilî çend xebatan zêde nehatiye rawestandin. Ji ber vê jî ji bo kêmbûna xebatên li ser vê mijarê, xebateke giring e. Bi saya wê tezê di pêşerojê de li ser wê mijarê tezên cuda dibê ku werin nivîsandin, ev jî bibe çavkaniyek ji bo wan.

4. Çarçove û Rêbaz

Zanista wêjeya modern ji bo metnên edebî, hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê şiklê ve bê fehm kirin xwedî hin rê û rêbazan e. Ji bo di vî warî de xebatên akademîk bînin kirin, divê ev rê û rêbaz bînin şopandin û xebatên ku tên kirin li gorî van qaîdeyan bînin amadekirin. Di xebatê de pêşî sinorek hat saz kirin. Bi saz kirina çarçoveyê ve xebat destpê kir. Çarçoveya teoriya cih û bikaranîna wî ya di berhemên wêjeyî û hunerî de ye û di nav berhemên wêjeyî de jî zêdetir li ser romanê tê sekinandin. Romanên Kurdî jî di tezê de mijara bingehîn e.

Di tezê de 2 beş tê dîtin beşa yekem li ser teoriye û nişandana berhemên wêjeyî ye. Piştê teori û nişandana di berhemên wêjeyî de, binbeşên cihê hat nişandan. Paşê di derheqê romana kurdî de agahî hat dayîn û teoriyên ku hatibûn nivîsandin li ser

romanên Kurdî de hatin bikaranîn. Di dawiyê de li ser vê lêkolînê encam hat nivîsandin.

Rêbaza tezê bi vî şiklî ye. Peşî li ser teoriya xebatê gelek pirtûk û tez hatin komkirin. Paşê teoriyên ku hatin kom kirin bi hûrgilî hatin xwendin. Piştê xwendina teoriye, ji 30î zêdetir romanên Kurdî hatin xwendin û ji nav wan 10 roman hatin hilbijartin. Di hilbijartina romanên rêbazeke bi vî şiklî hat bikaranîn. Pêşî armanca me ji perçeyê hilbijartina 2 romanên bû. Paşê romanên ku me xwend li gorî babetê wan me senifand û li gorî xurtbûna bikaranîna hêmana cihê ve ji nav wan me 10 romanên hilbijartin. Pişt re di romanên ku hatin hilbijartin de cihên ku hatine bikaranîn hebo hebo hat nivîsandin û bi teoriyên ku hatin xwendin û nivîsandin cihên ku hatine bikaranîn hemû hatin senifandin.

5. Jêderên Sereke yê Tezê

Di vê xebatê de ji gelek pirtûkan hat îstîfadekirin. Gelek pirtûkên teorik û gelek tezên li ser vê mijarê hatin xwendin. Ji nav wan herî zêde ‘‘Roman Sanatî ve Înceleme’’ya Şerif AKTAŞ, ‘‘Romanda Mekan Unsuru’’ ya Mehmet BİNBOĞA, ‘‘Roman Çözümleme Yöntemi’’ ya Nurullah ÇETİN, ‘‘Romanda Mekanın Poetiği’’ ya Ramazan KORKMAZ, ‘‘Roman Sanatı’’ ya Mehmet TEKİN, ‘‘ Türk Romanında Mekan’’ ya Ferda ZAMBAK û ‘‘Kürt Romanı’’ ya Abidin PARILTI û Özlem GALİP, di vê xebatê de hatin jê îstîfade kirin.

6. Astengî û Zehmetiyên Tezê

Ji ber ku heta niha di Kurdiya Kurmancî ya Bakurê de li ser wê mijarê zêde xebat nehatibû kirin gelek zehmetî hat kişandan. Di kurdî de li ser vê mijarê teori zêde nehatibû nivîsandin loma xebat li ser zimanên din meşîya û teoriyên ku hatin destxistin hemû hatin wergerandin û li ser vê mijarê di zimanên din de xebatên ku hatibûn kirin ji hevuda cuda bûn. Ev mijar li ser pêrgaleke nehatibû rûniştandin. Loma jî gelek kes ji aliyê teoriyan ve tiştên gelek cuda digotin. Di senifandina cihê de jî ji hevuda cuda rê û rêbaz hilbijartibûn. Ji ber vê hemû hatin xwendin û di nav wan de li gorî mentiqê herî serkeftî kujan bin hatin hilbijartin û xebat gelemperî bi vî şiklî hat meşandin. Cihên ku hatine bikaranîn hemû hebo hebo hatin nivîsandin. Ji ber ku di hin romanên de cih gelek dihat bi kar anîn, nivîsandina wan rojan digirt.

BEŞA YEKEM

PÊNASEYA CÎH

Mekan: bi xwedîbûna gelek wateyên xwe em bi kurtasî dikarin bêjin ku ew cihê ku mirovan ji derdorê bi hin aliyan dûr dixê û bi hin aliyan jî mirovan bi cihê re girêdide. Cihê ku tê da tê jiyandin û tê da tê bi cih girtin. (Şengûl, 2010, s. 528) Mekan jî peyva kevn ya Erebî hatiye çêkirin. Tê wateyên wek cih, mal, cihên rûniştinê. Ji bilî wan jî bo cihan, derdor gerdûn û hwd. jî tê bikaranîn. Di inglîzî de bo mekan peyva "space" tê bikaranîn. Bacheland gotiye "Mala me koşeya dinyaya me ye. Gerdûna me ya yekem e." Her kes di hundirê mekanekê de jiyana xwe didomîne. Karên xwe pêwîstiyên xwe û hwd. di mêkanekê de dibîne. (Şengûl, 2010, s. 528) Di zimanê kurdî de jî ji dewsa mekanê peyvên wek cih, şûn, mekan, war, cihwar, feza (Farqînî, 2013, s. 1209) jî tên bikaranîn.¹

Frederick Jameson dibêje ku "jiyana me ya rojane, tevgerên me yê giyanî û zimanên me yê çandî ne bi saya demê re, hemû bi saya cihê tê bi diyar kirin (Binboğa, 2019) .Ji destpêkê heta niha cih bo mirovan xwedî cihê taybet bûye. Mirov gelek bi cihê re eleqedar bûne û wî girtine navenda cihana xwe. Ji bo mekanekê şer kirine û gelek caran hevdu kuştine. Di hemû çandan de cih xwedî cihê pîroz bûye. Bawerî, hînbûnî, erdnigarî û hwd. her çiqas di dizayna cihê guhertibe jî, hebûna cih, giringîya xwe ti carî winda nekiriye.

1. CÎH DI BAWERİYAN DE

Pîrozkirina dem û cih bi hin tecrûbeyên mirovan û watedayîna wan derdikeve meydanê. Mirov bi vî şiklî mildanîna xwe nîşan dide. Dem û cihên hatine pîrozkirin bi du şiklê wate digirin. Di ya yekem de piştî êş, tengasî û dijwarî çêdibin. Mînak piştî zelzele, şer û xela di hişê dîrokî de cih digirin. Ya duyem jî ji aliyê Xwedê ve dem û cihê diyar derdikevin holê. Di Cihûyan de perestgeha Suleyman, Çiyayê Tûrê, Cejna Fisihê, Rojên çardaxê, Di Xiristiyanan de Kudûs, Dêr, Dema lêketina zengilên ku dema îbadetê û duayê nîşan didin û zingilên ku rojê 7 caran lêdikevin. Di

¹ Ji ber ku di Kurmancî û Soranî de ji bo peyva "Mekanê" zêdetir peyva "Cih" tê bikaranîn, em ê jî di teze de peyva "Cih" bikaribînin.

Misilmanan de Mescîdê Aksa, Kebe, Çiyayê Arafatê, Roja Îne, Meha Remezanê, Şeva Qadirê, Roja Arefeyê bi nişandana Xwedê an bi sunnetên Pêxemberan tên diyar kirin. Di olan de ji bilî Xwedê cihên ku Xwedê şênber dibe jî pîroz tên hesibandin. Perestgeh, Sînagog, Dêr û Mizgeft. Di van cihan de erd û asîman digihijin hev. Li gorî perestgeh û cihên ku mîna wan in navenda pîrozî ne.(Kaynak, 2016, s. 466) Di hemû olan de ev tişt wek minakên jor tên dîtin.

Mirov dema ku Xwedê jî difikire nikare Wî bêcih bisêwîne. Mînak; Li gorî mitolojiya Yewnanana Antîk mirov bawer dikirin ku 12 Xwedayên mezin wek Zeus, Poseîdon, Athena û hwd. li ser çiyayê Olîmpus dijîn(Leeming, 2017, s. 103) û ji wir mirovan temaşe dikin. Di bawerîya putperestan de ji ber ku nikaribûne Xwedê bêcih bifikirin, şikl dane hin keviran û bawer kirine ku Xwedê wan ew in an rihê Xwedê dikeve hundirê wan keviran (Leeming, 2017, s. 47) û Xwedê bi vê şiklî xwe nîşanê mirovan dide. Li gorî Cihûyan Xweda di 6 rojan de her tişt afirandiye. Afirandina gerdûnê jî di Tewratê de jî bi vê şiklî derbas dibe.

Di destpêkê de Xweda asîman û erde afirand.

Erd vala bû, şiklên Rûyê erdê tunebûn, her der bêserûbin tarî bû. Rihê Xwedê li ser avê pêl dida.

Xweda got bila ronahî çêbe û ronahî çêbû.

Xweda dît ku ronahî baş e û wê ji tariyê veqetand.

Ji ronahî re roj, ji tarî re şev got. Şev û sibê bû û roja yekem çêbû.

Xweda, di navbera avan de bila qubeyek hebe û avan ji hevdû veqetine got.

Û wiha bû, Xweda qubeyê afirand. Avên bin qubeyê ji avên ser qubeyê veqetand.

Navê qubeyê ‘‘Esman’’ danî. Şev bû sibê bû û roja duyem çêbû.

Xweda got avên di bin asîmanê li cihekî kom bibin, axa ziwa bila xuya bibe. Û wiha bû.

Ji cihên ziwa re Erd, ji cihên av kom bûbûne re jî Behr got. Xweda dît ku ev tişteki baş e...(Tewrat, 1/1-10)

Di Tewratê de jî afirandina gerdûnê bi vê şiklî dest pê dike û didome ji vir jî tê dîtin ku ji bo jîyan were afirandin divê pêşî cih were ava kirin. Xweda jî lewra pêşî gerdûnê diafirîne û wê saz dike.

Îsa ji kevokfiroşan re got: Vanan ji wir rakin. Mala bavê min nekin cihê danûstendinê. (Încîl,179: 2/16) Ev ayeta jor di beşa ‘‘Îsa perestgehê paqij dike’’ de

derbas dibe. Îsa diçe perestgehê li dibîne ku hin kes pezên xwe xistine hundir hin kes kevokan difroşin. Îsa li hemberê vê tiştê dixeyide û wan ji perestgehê derdixe. Ji vê ayêtê jî diyar dibe ku udi Xaçperestan de cihên pîroz hene û divê cihên pîroz paqij bin.

Di nav bawerîya Îslamî da jî cihê “Arş” heye. “Bi rastî Xwedayê we erd û asîmanê di 6 rojan de afirand û istîvayê Arşê kir” (Araf: 7/54) û li gorî bawerîyên wan Xweda li wir ser kursiyê xwe ye. Ev der asîmana herî bilind e tebeqeya nehemîn e û ew der qata Xweda ye.

2. CIH DI BERHEMÊN WÊJYÎ DE

Cih ji bo jiyana rojane çiqas girîng be ji bo vebêjeyan jî ewqas girîngtir e. Jixwe çîrok, roman û hwd. jiyana mirovan nişanî me didin. Ji ber vê jî bikaranîna cihê ji bo hunerê jî hewce ye û girîng e. *Di berhemana de em dibînin ku li gorî cure û naverokê mekan erkên cuda digirin ser xwe. Li gorî niyeta nivîskar mekanên girtî û vekirî tên bikaranîn. Li gel romanê divê em berê xwe bidin cureyên din jî. Dema em li çîrok û destanan dinêrin em baştir vê zimanê mîmarîyê dibînin ku nivîskar ango vebêjer çawa roleke mîmarîyê digirin ser xwe.* (Kaynar, 2020, s. 27) Di berhemên sêwîrî de hêmanên sereke em dikarin bêjin ku kadroya kesan, bûyer û cih in. Di vebêjeyan de jî dixwazî bila destan be, dixwazî bila çîrok be an jî ji destpêka romanê bigire di hemû romanên de her tim girîngiya xwe parastîye û car caran jî ji aliyê girîngî ve ketîye pêşîya bûyerê jî.

Gelo çima cih ewqas girîng e? em nikarin bi çend bersîvanan vê pirse bibersînin. Ji ber ku her berhema xwedîyê çîrokekê cuda ye. Lê dîsa jî heke tiştek divê were gotin, ew jî herhal ew e ku; hebûna cih û mirovan ji destpêka dîrokê bigirin heta îro her tim girêdayî hevudu bûne û têkilîya wan jî ji têkilîyên tiştên din girîngtir bûye. *Têkilîyên navbera wan xwe di berhemana de jî nişan dane. Di cureyên vegotinê de mekan honakî ye û li gorî dîtin, fehmkirin û rewşa derûnî a kesên ku têde dijîn şikil digire; her tim ji nû ve tê afirandin, şêwe digire û wek hêmaneke sereke li wan kesên ku li ser dijîn bandor dihêle û wan ji bo rewşên psîkolojîk amade dike.* (Kaynar, 2020, s. 27) Wek li jor jî tê gotin cih li gorî rewşê şikil digire û şikil dide bûyerê jî li ser lehengan bandorê çêdike. Bi têkilîyên xwe, di berhemana de cih digire û berhemana xurttir dike. Loma jî ji bo berhemana gelek girîng e.

Cih statûya mîrovan nîşan dide. Di qewmên koçer de pêşneketina şarezatî bi xwedînebûna cihekî ve tê girêdan. Cih her çiqas medenîyetê bi xwe re bîne jî lê ewqas jî mirovan sînordar jî dike. Carinan cih ji bo kesên wek şah, mîr û began seray, qesr, koşk û erdên mezin û fireh îfade dike, lê carinan jî ji bo kesên feqîr, bêwar, şeyh û hwd. tenê perçeyek nan, xirqe an dil û laş îfade dike. Carinan di hin stranan de tê gotin ku “ hemû cihan ji we re be bes yarek têrê min dike, carinan jî ji hin sofîyan ve tê gotin ku “di cihanê de cih, di axretê da îman”(Binboğa, 2019) ew gotinên cuda jî peywendîya cih û çand û bawerî nîşanê me dide.

Di vebêjan de cih cara ewil di destan, efsane, çîrok, xebroşkan de derdikeve pêşîya me. Em dikarin bibêjin di destanan de a girîng tenê bûyer û qewimîna wê ye. *Di destanan de mekan tenê bi wateya sehneyê ye. Ligel vê mekan, tenê di formên derasayî yê bûyeran de derdikeve holê. Mekanên di destanan de yekawe ye û bêsînore. Di çîrokan de jî mekan tenê wek hêmaneke xeyalî dertê pêşîya me û wek destanan tenê di erka sehneyê de ye.*(Kaynar, 2020, s. 29) Ji bilî sehnebûna bûyerê cih di berhemên beriya romanê de zêde dernakeve pêş. Erka wî tenê ew e, ji ber vê jî girîngiya wî zêde nayê zanîn. *Cureyên pêşîya romanê ku zêdetir wek bûyernavendî ne û bêyî xema hunerî tenê bi armanca bandorkirinê dertên pêş, em di wan de têkiliya di navbera nesne û mirovan de nabînin. Ev têkilî û hûrgiliyên di navbera mekan, nesne û mirovan de wek cure di romanê de tîn bikaranîn.*(Kaynar, 2020, s. 29) Bi romanê re girîngiya cih tê fehm kirin û bi demê re jî ew girîngî xwe di berheman de zêdetir nîşan dide.

2.1. Cih di Helbestan de

Mirov ji roja aferîşîya xwe ve, pêwistiya cihê dikişîne. Ji xwesteka ewlebûn û xwe bi girêdana cihekî, cih saz kirine. Loma her mirov ji xwe re cihekî çêkiriye. Her wiha gel jî ji xwe re cih saz kirine û qerekerên xwe yên civakî di van cihan de nîşan dane. (Çoşkun, 2009, s. 237) Têgiha cihê bi gelemperî di roman, çîrok, şano û hwd. de tê bikaranîn. Bi rastî jî pêwistiya helbesteke ku ne girêdayê bûyerekê be, bi cihê re tune ye. Lê belê helbestvanek ji bo fikrek, hestek û feraseteke xwe bîne ziman ji cihê alikarî digire.

Di wêjeya klasik de dîsa bêmekan berhem nayê dayîn. Cih di helbestên Klasîk de jî bi awayekî eşkere derdikeve pêşîya me. Mînak Melayê Cizîrî di beyteke xwe de wiha dibêje:

“Gulê baxê îremê Botan im

Şebçiraxê şebê Kurdîstan im” (Cizîrî, 2004, s. 272)

Mela di beyta jorîn de xwe dişibîne gulê baxê îremê Botan. Îrem baxçeyek ji bihuştê ye. Mela welatê xwe dişibîne bihuştê û xwe wek gulê baxê bihuştê nişan dide. Di beyta duyem de jî xwe dişibîne şebçiraxê û dibêje ez ê şevên Kurdîstanê ronî dikim. Di her du beytan jî were meze kirin ew were dîtî ku Mela di her du beytan de jî pesna xwe dide û di navbera xwe û cihê de têkilî çêdike. Cihên wek: baxê îremê, Botan, Kurdîstan di helbesta xwe de bi kar tîne.

Çi zeman û çi mekan û çi cihat û çi hidûd?

Çi meqadir û tefasil û hesab in çi 'eded?

Çi munafat û lizûm in çi qiyas û çi misal?

Ev çi tewlid û çi terkîb e, çi rûh in çi cesed? (Cizîrî, 2004, s. 85)

Sofî dema li cîhanê dinêrin ti cudahî nabînin, li gorî Sofî her tîşt sîtava Xwedê ye. Sofî cawîdan dibe û êdî li her tîştê bi çavên Xwedê dibîne. Di dîwana Mela de ev jî bi vî şiklî xwe nîşanî me dide.

Sed Nil û Firat tîn û derin qelbê me

Pê nahisîhm, qulzem û derya yim ez

Tu j'nusxey tewhid mexûn ayetê nefye

Bê aletê isbatê, ku "Îlla" yim ez (Cizîrî, 2004, s. 97-98)

Mela dibêje sed Nîl û Firat diherikin dilê me lê nizanin ez derya me. Li vir Mela cihê fehmkirina îlmê wek dil nîşanê me dide û di dawî de jî dibêje hewcedariya min tune bi çespana delîlan ji ber ku Îlla ez im. Mela li vir navên çemên wek Nîl û Firat bi kar tîne lê armanca bikaranîna wan ji bo Mela fehm û feraset û îlma xwe bi alikiriya wan bîne ziman e. Di mînaka jêr de jî ji beşek daneberheva Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de em ê bikaranîna cihê bibînin.

Mela:

Kewkeb dibê m beşer e

Nûreke mûnezzeh tê

Çi husnek mûsewwer e

Resmek ji mîn-el'lah tê

Yeqîn bi xwe mezher e

Çerxek e sed xergeh tê

Feqî:

Xergeh bi min hîcab e

Sîtar dikit cemalê

Ewrê reş û nîqab e

Li ber wechê hîlalê

Perwane lew di' ezab e

Mehcûb e ji şemalê (Temo, 2013, s. 169)

Li jor Mela û Feqî daneberheva çêkirine û herdu jî bi helbestên xwe qala cihên wek stêrk, xergeh dikan. Feqî xergehê dişibîne perdeyê û dibije xweşîkbûnê ji min vedişêre. Ê ewrên reş û asîman li ser rûyê hîlalê ye. Ê perwane jî ezabê dikşîne û dibe ku ji finda xwe şerm bike. Ji helbestên jor jî tê ditîn helbestvan di helbestên xwe de cihê bi kar tînin û bi alikariya wan dixwazin fikr û ramanên xwe bînin ziman. Li helbesta jêr de jî Ziya Paşa ku di dawiya sedsala 19 'an de, di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Ez gava di ser xaka bêîmanan re derbas bûm

Min çend bajar û avahî ditin

Lê gava ku di nav memlekete Îslamê de derbas bûm

Ji kavilan bêtir, min tişteki din nedît. (Pîrpal, 2012, s. 35)

Helbestvanan bi şayesandina cihê ve li jor jiyana Misilman û xeyrîmuslim dixwaze berawird bike. Ê li gorî helbestvan cihên ku xeyrîmuslim dijîn bajar û avahî hene lê di cihên ku Misilman li dijîn ji bilî kavilan tişteke tune ye. Helbestvan bi

bikaranîna cihan ve hem fikra xwe tîne ziman hem jî dixwaze Misilmanan rexne bike.

Di helbestên modern de jî cih carinan ji aliyê hin helbestvanan ve tê bi kar anîn. Bo mînak em dikarin helbesta Îlhamî Özer ya “ Mirin Te Dît Ez Kî Me” de cih bi vî şiklî tê bi kar anîn.

Rojeke sar bû

Wext êvar bû

Tarî peya

Ba siwar bû

Amed devekî vekirî

Û bêziman û zar bû

Didan, kevirê bazalt

Dil tije ar bû

Vateya lemelema dijleyê

Hawar hawar bû

Min bi tebatî jimart

Çi neh, çi deh, sed hezar bû

Li hemberî derê Mêrdînê

Li qeraxa çemê dijleyê

Min gorek aşopî vedida

Xwêdanek xweş dida... (Özer, 2009, s. 38)

Di helbesta jor de ew ê bi awayekî baş were dîtîn ku helbestvan di helbestê xwe de bi temamî şayesandina cihê dike. Di helbestê de helbestvan pêşî qala dem û hewayê dike. Tê dîtîn ku dem êvar û hewa jî sar e, paşê ew ê were dîtîn ku helbestvan qala Amedê dike û dişibînê devê, û pişt re jî şayesandina cihê didomîne û şibandin û teşxîsan dike. Pişt re em dibînin ku li hemberê derê Mêrdînê û qeraxa dijleyê goreke xeyalî tê kolandin û tê xwedan dayîn û ew jî kêfxweşiyê dide. Baş tê dîtîn ku helbestvan di bin bandora cihê de helbesta xwe nivîsandiyê. Di mînaka jêr de

Brûsk Zozanî di pirtûka xwe ya ''Şêr û Xencer de helbesteke bi navê '' Dîyarbekir'' nivîsandiye û di helbestê de wiha dibêje.

Dîyarbekir çi wargehek dil fire ye
Mizgeft û hewr û dêr bi hev re ye
Keşe, Haham, Seyda werin bibîn,
Ma belengazî ne qedere li eniya me ye

Dîyarbekir çi xweş derge ye
Feqîr sefîh civak civak tê tije ye
Gelê guhdarê cîhan werin bibîn
Çi milletek bê zar û ziman gune ye (Zozanî, 2007, s. 23-24)

Helbestvan di helbesta xwe de qala bajarekî dide û şibandinan dike. Bi saya şayesandinên helbestvan em di derheqê bajêr de agahiyan dibînin. Qala Amedê tê kirin û li gorî helbestê di bajêr de mizgeft, hewr û dêr hene ew jî nîşanê me dide ku di bajêr de baweriyên cuda cuda hene û bi hevdû re dijîn. Paşê di helbestê de dîsa tê dîtîn ku di de feqîr û sefîh bi kom tên bajarê û tije ne. Ji helbesta jor de 2 tişt derdikevin pêşiya me yek helbestvan bi helbestê ve dixwaze qala fikr û ramanên xwe bike bi alikariya cihê ve ya duyem jî cih li ser helbestvan bandor çêkiriye ku helbestvan xwestiye li ser bajarê helbestê binivîse. Di herdu awayî jî em dibînin ku cih di helbestê de xwedî erk e û roleke mezin dilîze. Di helbestan de jî cih xwe bi vê şiklî nîşanê me dide.

2.2. Cih di Destanan de

Mirov li gorî derdora xwe şikl digire. Mînak dema ku mirovên erdnigariyên cuda werin berawird kirin, ew ê cudahiyan fîzyolojîk xwe nîşan bidin. Cudahiyên mirovên ku li ber behrê dijîn û mirovên di çiyayan de dijîn em dikarin wek mînak nîşan bidin. Loma bandora cihê li ser mirovan gelek derdikeve pêş. Li ser xwarin, cil û berg, qereker û hwd. bandora cihê xwe nîşan dide. Destan jî bûyerên girîng ku li ser gelan derbas dibin û li ser wan bandorê çêdikin wek mijar ji xwe re digire. Destan cureyeke wêjeya gelêrî ye ku bi şiklên nezm, pexşan bi bikaranîna lehengan ve di derheqê

jiyana demê de me agahdar dike. Di avakirina destanan de têkoşînên gel, bobelatên xwezayî, koç, nexweşî û tiştên wekî wan ku li ser gel bandorê çêdikin, cih digirin. Dirûvpêketinên ku destanan saz dikin di jiyana rojane de zêde nayên dîtin. Piştî bûyeran kesekî/ê ku xwediyê qabiliyeta vegotinê ye derdikeve û dastanan saz dike. (Yeşilyurt, 2018, s. 195) Di vê sazkirinê de dem cih û leheng roleke mezin dilizîn. Û her bûyer divê li ser cihekî were bicihkirin. Di destanên jêr de jî ew tişt derbikevin pêşiya me, ew ê bikaranîna cihê were nişandan. Mînak di destana Gilgamêş de, di destpêka lewheya yekem de şayesandina cih tê kirin.

Lewheyê Yekem²

Li çar aliyê Uruk'ê dîwar lê kir.

Li dîwara Enna û gencîneyên paqij binêre

Ev dîwar mîna kindira ji ji hiriyê hatiye çêkirin e.

Bircên wê ya koşeyên wê jî binêre

Ti kes nikare hevşiba wê lê bike

Ji wê derenceya kevir ku gelek dem li wir e bikeve rê

Nêzîkî perestgeha Enna bibe

Ti şah mîna wî tiştêk çênekir

Derbikeve li ser dîwarê Uruk'ê! Bimeşe!

Li ser asasê dîwarê lê hûr bibe

Gelo tuxleyên wê ne pêjyane?

Gelo asasê wê heft zana saz nekirine? (Ramazanoğlu, 1998, s. 20)

Li jor bi nişandana cihê ve ew kesê ku vedibêje dixwaze pesna wê derê bide. Li gorî wî, ew der ewqas xweş hatiye çêkirin ku ti kes nikare tiştêkî bi vê şiklî çêbike. Wek li jor jî tê dîtin cih di destanan de jî cihekî taybet digire. Di destpêka destanê de pêşî qala derdorê tê kirin û xweşikbûna cihê wek raserî tê dîtin. Di perçeya jêr jî dîsa ji destana Gilgamêş hatiye girtin û dîsa şayesandina cih tê dîtin.

Lewheyê Pîncem

² Beşên destanên ‘‘Gilgamêş, Odeyssea û Ösküs Uul’’ ji aliyê min ve ji Tirkî bo Kurdî hatin wergerandin.

Li daristanê bi çavên beloq mêze kirin
Şaş man ji bilindiya qetranan re
Şaş man ji rêya ku diçe daristanê re
Cihê ku Humbaba derbas bûbû şoperêç hebû
Rewşa rê baş xuya dikir
Rêya mezin xweş hatibû çêkirin.
Wan çiyayê dara qetranê didît
Cihê ku Xweda lê rûdiniştin
Perestgeha bilind ya Îrînayê
Li pêşiya wê çiyayê dareke qetranê hebû
Ew gelek kurs bû, siya wê pir xweş bû, bi çoş bû
Devî ketibûn nav hevdu
Darên daristana mezin tevî hev bûbûn. (Ramazanoğlu, 1998, s. 52)

Li beşa jor jî Gilgamêş û Enkîdu diçin ji bo Humbaba bikujin nav daristanê, li wir Gilgamêş cerdevanê derîyê dikuje. Paşê şoperêça Humbaba dibînin û li dema ku li derdora xwe dinêrin ji xweşikbûna derdorê şaş dimînin. Cih li ser wan bandoreke mezin çêdike û bi awayekî fireh ew tişt tê vegotin. Di perçeya jêr jî ji dastana Odysseia hat girtin

Girava Hengkujxwaran

Di pêlên behre de keştiyên wan rojan virvirî
Neh rojan li ber xwe dan di bahozê de
Di dawî de kişkişîn
Girava hengkujxwaran
Gelê hengkujxwaran hinek ecêb bûn
Fekiyên hengkujê ku dixwarin
Kesera welatê ji wan re dida jibîr kirin
Evînen wan berpirsariyên wan, her tiştî dida jibîr kirin

Kesên ku tehma wê fekiyê digirt

Nedixwest ji wir biçe (Adalı,2014, s. 23)

Li jor Odysseia piştê Şerê Truvayê bi keştiyên xwe dixwazin herin welatê xwe li ji ber xirabiya hewayê neçar dimînin ku li girava Hengkujxwaran bimînin. Ev girav ji wan re ecêb tê lewra fekiyên wê giravê bandoreke wisa li ser mirovan çêdike ku mirov naxwazin ji wir herin. Ji perçeyê jî tê dîtin ku carinan hin tiştan û hin deran li ser mirovan bandor çêdike û wan bi xwe re girê dide.

Cih ne tenê li ser qerekerên mirovan di eynî demê de li ser berhemên wan jî bandorê çêdike. Dema ku destanên Tirkên Altayî tê nêrîn, taybetiyên erdnigarî û demsalê rastûrast derdikevin pêşiya me. Ji ber ku herêma Altayiyan herêmekî çiyayî ye. Divê leheng pêşî çiya newal û hwd. derbas bike. Ev jî nîşaneyên qewet û hêzê ne. Di baweriyên Altayiyan de dinya ji sê qatan pêk tê. Rûesman, Rûyê erde, Binerd. Rûesman Cihê Xweda û Rihên baş, Rûyê erde, cihê tiştên candar, rihên av û erdê, Binerd jî cihê Erlîk û rihên ne baş in.(Türker, 2012, s. 81). Di mînakên jêr de di destana “ Ösküs Uul” de ew tişt were nîşandan.

Rûesman

Behra esman ku her diherike

Vexwarina gel bûye av

Heft bendeva bikirêc

Paldanka çiyayê pîroz e.

Rûyê Erdê

Robarê ku lixav diherike

Li ber berava kûr

Dema destpêka xumexumkirina robarê

Li pereva kut ê firikîn

Ösküs Uul dijiya

Binerd

Xwediyê robarê ez im

Navê min Talay Kaxan e.

Li heft tebeqaya bin erde.

Got: mala min heye (Yeşilyurt, 2018, s. 198)

Ev perçeyên ku ji destana Ösküs Uul hatine girtin, nişan dide ku bi destxistina hîn cihan qeweta wan kes û tiştan derdixe holê. Bi kurtasî cih bi nîşaneyê qewetê derdikeve pêşiya me.

Ji bo fehmkirina wêjeyê û têgihîştina bîr û baweriya wan divê qonaxên wan yên dîrokî û kevneşopiyên wan werin zanîn. Cihê dîrokê ku tê de geş dibe erdnîgarî ye. (Yeşilyurt, 2018, s. 196) Di destanên Kurdan de jî cih wek hêmaneke girîng e. Di destana Memê Alan de jî ji bo qeweta sê birayên mîr were nişandan di destpêka destanên de dîsa ji cih alîkarî tê girtin.

Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e.

Li ser heft çiyayê

Li ser sê sed û şeş û şeş qapiyan e

Her qapikê li ser sê sed û şeş û şeş walîlixan e

Her walîlikê li ser sê sed û şeş û şeş midirlixan e

Temam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye, sê biran e.

Xwediyê tewlê nijda, boşê dewa, xarê miyan e

Mifta devê sindoqên zêra barê çel û pênc bergîlan e

Xwediyê xezîne û define giran e

Xwediyê sûk û çarçiyayê (Lescot, 2013, s. 25)

Ji minaka jor jî tê dîtin ji bo destpêka bûyerê cih tê bikaranîn. Pêşî qala bajarê Mixribê tê kirin ku bajarekî giran e û li ser heft çiyayê ye. Bi sedan deriyên wî hene û li ser her deriyê jî sedan perezgeh û li ser her perezgeh jî sedan rêvebirîtî heye û hemû di destê sê birayan de ye. Vebêjer bi vê şayesandinê dixwaze ku bi xwedîbûna mal û milkê qeweta sê birayan nişan bide. Zêrên wan ewqas pir in ku miftayên

sindoqên zêrên wan barê çil û pênc bergilan e. Di dastana Memê Alan de jî mîna dastanên tê dîtîn ku cih ji bo bûyer û bicihkirina lehengan gelek girîng e. Cih li ser lehengan bandorê çêdike û bûyer bi şayesandina cihê ve destpêdike. Û bûyer bi cih re tê girêdan.

2.3. Cih di Çîrokan de

Di çîrokan de warê bûyerê cih in. Di hin rêbazên hunerî de: wek Romantîzm, Realîzm û Naturalîzm, li ser cih-bûyer, cih-rewş, cih-kes û cih-dem pir hatine sekinandin û girîngiya cihê hatiye dîtîn. Di tehlîla metîn de dîtîna cih bi tenê serê xwe kêrê tiştekî nayê, divê têkiliyên wî û erkên wî werin nişandan. Di çîrokan de cihanekî çêkirî tê ava kirin. Wek dem û leheng, cih jî perçeyek wî cihanê ye û li gorî nivîskar şikl digire. Di roman û çîrokên klasik de cih di berhemê de di nav hêmanên herî girîng de ye. Cih ji jiyana romanê re “ rih û kûrahî ” dide. Dibe ku cih daring û axa wêjeyî be. (Kanoğlu, 2017, s.1) Ji wan gotinên Kanoğlu jî tê dîtîn ku cih hem ji bo romanên hem jî ji bo çîrokan gelek girîng e.

Di çîrok û xebroşkan de jî cih bi heman girîngîya xwe derdikeve pêşîya me. Mîr û paşa di seray û qesr û koşkan de dijîn. Di gelemperî “yar” keçik di van koşkan de dijîn. An dêw hene ew jî di şikeftan de dijîn. An hin bûyer hene di hin welatan de derbas dibin. Ji bo bi karanîna cihê wek mînak em dikarin destpêka çîrokeke ji pirtûka Celîlê CELÎL ya bi navê “ *Çima Deve Xeyîdî?* ” nîşan bidin. Di çîroka “Çîroka Mirîşkên Misirî ” de cih bi vî şiklî tê bi kar anîn.

Hebû tune bû welatek hebû, navê wî welatî Misirî bû. Di dema berê da Misir bi mirîşkên xwe ve gelekî navdar bû. Mirîşkên Misirî ji hemû mirîşkên welatên dora xwe bi gewdeyê xwe cuda dibûn. Ew ewqas mezin bûn, ewqas gir bûn, ku mirîşkên Rojavayî û Rojhilatî gava li rex wana bisekinîna sîya Mirîşkên Misirî dikete ser wan û tirs û heybeteka giran dikete ser gişkan û qet nediwêrin li ber Misirîyan bilibitin. (Celîl, 2018, s.73)

Em dibînin ku di çîrokê de welatek tê bikaranîn ji bo pêvajoya bûyerê û taybetiyên wî dertê pêşî. Mirîşkên Misirî li gorî mirîşkên cihên din qelewtir û mezintir in. Di çîrokan de mînakên mîna vê gelek derdikevin pêşîya xwînerê. *Çîroka Mirîşkên Misirî* çîrokeke gelerî ye. Niha jî ji bo minak em ê di çîrokeke çêkirî de bikaranîna cihê nîşan bidin. Pirtûka Helîm YUSIV ku bi navê *Jinên Qatên Bilind* de

di çîroka Jinên Qatên Bilind de Helîm YUSIV çîrokê vedîqetîne sê perçeyan her sê beş jî bi cihê re girêdayîye. Navên beşên çîrokê bi vê şiklî ne:

a. *Jin di Berîka Mêr de*

b. *Gora Bêlaş*

c. *Mêr di Ezmana Jinê de* (Yusiv, 2013, s.57)

Wek li jor jî hat dîtin çîroknivîs çîroka xwe dike 3 beş û her beş bi navê xwe bi cih re têkildar e. Jixwe têkilya cih û çîrokê jî navê çîrok, berhem, diyar e. Ji bo mînakê em tenê qala beşa yekem bikin. Di beşa yekem de Helîm YUSIV şayesandina cihê bi vî şiklî dike:

Li dîwarên bilind dinêrî maran, bi zikê ban ve; xwe dikişikîşandin. Bi lingên bi demûş timsah xwe bi dîwaran ve digrin. Nalînên mêrên ku liba dawî ji ava canê wan dadiwerive. Teq req avahiyê dide ber xwe. Li ser erdeke tijî qelş, çirçirkên mîna beqan diqevaztin. Mişkên mîna neranan poç li hev dixistin. Kêzikek di wênayê jineke reş de ji wî ve nêzik dibe. Porê xwe yê gijikî û dirêj dadiweşand. Komên kêç û sipiyên ji ser rûyê wî difiriyên, pîrika wî hate bîra wî, dema çîroka wê pîrevoka ku her şev dihat... (Yusiv, 2013, s.59)

Di mînaka jor de çîroknivîs ciheke xeyalî diafirîne bi cihê re dixwaze derûnnasiya lehengê nişan bide. Paşê ev cihê xeyalî jî li ser leheng bandorê çêdike û diçe zarokatiya xwe û pîra xwe tîne bîra xwe û çîrokên ku pîra wî jê re digotin bibîr tîne. Jixwe ew cihê ku tê qal kirin dilê lehengê ye û çîroknivîs dixwaze dilê lehengê wek cihekî bide nişandan. Di mînaka jêr de jî çîroknivîs vê çare jî şayesandina ciheke rasteqîn dike:

Ji nişkê ve ew mêr ji dilê xwe derket û derî bi dû xwe girt. Piştî girtina derî avahî biçûk bû. Dîsa wekî berê bûbû dil. Ew danî kolanê û çû xaniyê xwe yê di binê erdê de. Di odeyêke piçûçik de bi cih bûbû û pencereyek biçûçik di jora dîwar re digiha kolanê. Rûniştavanê bin erdê, di rojê de, her kesê ku di ber pencereyê re derbas bûbûya ew didit lê tu kesî ew nedidit, ji ber ku di nav tariyê de bû. Bi şev kesê ku di ber pencerê re derbas dibû, di riya vê pencereya bi ronî re ya di binê dîwarê avahiyê de ew diditin... (Yusiv, 2013, s. 60)

Di perçeya jor de jî nivîskar şayesandina cihekî rasteqîn dike û em dîsa dibînin ku cih û leheng bi hevdu re têkildar in. Leheng di maleke biçûk de rûdinê û odeya wî

di bin erdê de ye. Têkiliya lehengê bi derve re bi saya pencereyeke biçûk çêdibe. Leheng bi alikariya wê pencereyê jiyana derveyê temaşe dike. Em bi saya şayesandina cihê di derheqê jiyana lehengê û aborî û derûnnasîyên wî de hin fikran dikarin di mêjiya xwe de saz bikin. Bi şiklê em dibînin ku cih di çîrokan de xwedî erk e û di afirandina bûyer û lehengê de roleke mezin dilîze.

2.4. Cih di Romanan de

Roman ji aliyê mahiyeta xwe ve honandinek e. “Cih” hêmayeke sereke ya vê honandinê ye. Di romanê de bûyer, çi bi leheng çi bê leheng, li cihekî diqewime. Lewra jî awayê vegotina cih ji bo yekgirtîbûn û rastiya romanê girîng e. Pêşkêşkirina cih, di romanê de yan ji devê lehengan tê kirin yan jî ji devê vegêr. Di romanên klasîk de wekî hêmayên di cih jî ji devê kesê sêyem dihat pêşkêşkirin. Di romanên modern ên serkeftî de ev şewaz guheriye. Êdî cih ji dewsa devê kesê sêyem, ji devê lehengan tê vegotin. Bi saya pêşkêşkirina cihê em dizanin bûyer li cihekî çawa diqewimin. Atmosfera derdorê aşkere dibe. Leheng baştir tê naskirin. Bal diçe ser civakê. Dibe ku carinan cih li gorî hizirîn û derûna leheng bê pêşkêşkirin. Ev yek piranî di romanên modern de tê bikaranîn. Bi vî awayî cihê ku di romanê de tê pêşkêşkirin rengê hizirîn û hestên lehengan dide. Yanê cih di kesayetîya lehengan de dibe xwedî nasname. Bi gotineke di dibe leheng bixwe. (Yılmaz, 2015, s. 82) Di romanê de jî gelek erkên cihê hene. Cih dekora bûyerê ye. Lê bi gelemperî cih, wek cihên bûyerê, cihên ku leheng tê da dijîn û cihên ku leheng hebûna xwe fêr dikin, tê qebûl kirin. Ji bilî wan di derheqê têgihîştina lehengan de agahîyan dide û rewşa wan yê derûnî û aborî nîşanî xwîneran dide.

Cih di nasandina lehengan de karekî girîng digire li ser xwe û bi vî şiklî di nav unsurên bingeh de, ji xwe re cihê xwe digire. Cih, li ser derdora lehengan û derûnnasîyên wan û heta li ser qerekerên wan jî bi bandor e, û divê bandora cih guhertinê, li ser bûyeran jî neyê jibîr kirin. Di danasîna lehengan de ji dewsa analîzkirina giyanî, cih dihat bikaranîn. Cihê ku leheng tê da dijî kesayetîya lehengê û statûya wî/wê ya civakê dida nîşandan. Di derûnnasîya geşedanê de John Watson wiha dibêje: ‘Hiş di dayîkbûnê de lewheyekî vala ye û hert tişt bi bandora derdorê şikl digire.’ (Narlı, 2002, s. 98-99) Hin bûyer li gorî hin bûyeran çêdibe. Mînak di romana kurdî de ew tişt gelek caran derdikeve pêşîya me. Lehengê me di destpêkê de

tadeyî dibînin an rastê hin bûyerên nexweş tên, ji ber vê jî dixwazin tola xwe hildin û di vê rêyê de heta dawî dimeşin.

Li gorî Aktaş, berhemeke îtîbarî de cih jî îtîbar e. esehiyiya xelqeyên bûyerê û şert û mercên lehengan di teşegirtina mekanê de rol dilîze. Cih, ji aliyê kê ve hatiye dîtîn, ji kê re hatiye qal kirin? pirsên wiha ji bo avakirina cihê ve girîng in. (Aktaş,1984, s. 125-126) Em ji vir fehm dikin ku avakirina cihan girêdayî bûyer û lehengan in. Lewra cih jî li gorî wan tê saz kirin.

Di romanê de bûyerên ku çêdibin di cihekî diyar de derbas dibin. Atmosfera romanê li gorî bûyer û cihê bûyerê ve tê guhertin. Emin ÖZDEMİR dibêje ku heke roman bi derdorê ve were analîz kirin û bi derdor û mirovan ve têkîlî were saz kirin ew ê rewşa berrahîya romanê xurttir bike. (Özdemir,1994, s. 263) Teswîrkirina romanê, ew ê tenê romanê xurttir neke, di heman demê de ji bo gihiştina taybetmendiyên lehengan jî alikariya xwîneran bike. Di romanê de cihê ku bûyer tê da derbas dibin ji bo fehmkirina civakê jî girîng e lewra jiyana civakê, atmosfera wan yanê her tişt bi saya romanê li ber çavan xuya dibe.

2.4.1. Bikaranîna Cihê di Romanê de

Cih bi gelek şiklên cuda di romanê de derdikevin pêşiya me ji ber vê jî divê senifandinek were çêkirin. Cih ji bo çî tê bikaranîn û bi çî şiklê derdikevin pêşiya me. Lewra ji bo sedema avakirina cihê Mehmet TEKIN senifandinek çêdike. Tekin sedema bikaranîna cihê bi 4 tiştan nîşan dide. Ew jî ew in:

1. Nasandina cihê bûyerê
2. Avakirina lehengan
3. Nişandana civakê
4. Avakirina atmosferê (Tekin, 2018, s. 129)

Birastî cih di romanê de yek ji wan pêwendiyên herî girîng e ku romanê nêzî jiyana rasteqîn dike. Ji ber ku xwîner dema ku romanê dixwîne li cihê mêze dike heke cih nêzîkî jiyana rasteqîn be, xwîner wê demê bawer dike ku bûyer jî rasteqîn e. Tekin ji bo cihê wiha dibêje: ji kijan demê û bi kijan meqset û pîvanê jê were îstîfadedgirtin jî cih sehneya bûyerê ye. Vebêje li ser sehneya bûyerê tê lê kirin. Beriya romanê di wêjeyê de cih bi tamamî muhayyel bû û wate û karê cihê tenê

sehnebûyîna bûyerê bû. Cihê ku hatibûn nivîsandin ne hewce bû li ser dinê hebe. Di pirtûkên Homeros, Boccaco û Dante de ew tişt derdikeve pêşîya me. Ev têgihîna cihê di sedsala 18an de bi nivîskarên romantik şiklekî nû digire. Romana modern, mirovan digire merkeza xwe. Bi taybetî cihê nesnel û bi alikariya têgihîştina zanîstî bi çavekî din li dinêre. Derdora fizîkî girîngtîr kiriye lewra bi nişanadana derdora fizîkî nivîskaran xwestine ku guhertinên qerekeran nişan bidin. Di romana Klasîk de nêrîna derdorê bi gelemperî ji çavên vebêjer dihat dîtin. Lê di romanên realist de bi çavên lehengê ve li derdorê tê nêrîn. Di romana klasik de cih biguhere jî nêrîna qereker nediguherî lê di realîstan de qerekerên ku xwedîyên xûyên cuda û çandên cuda, li derdora xwe bi çavên cuda mêze dikirin. Yanê dema ku qereker diguherî cih jî diguherî û roman xwe ji rewşa statîk rizgar dikir. Ew jî romanê nêzîktîrê jiyana rasteqîn dikir. Bi kurtasî cihê ku dihat dîtin li gorî nerîna qerekerê dihat guhertin. Tiştên ku derdorê tije dikirin statûyek dida qerekerê. Dewlemendbûna eşyayan û girêdayîtiya lehengên sereke yê Tolstoy, Flaubert û Stendhal bi eşyayên xwe re gelek balê dikişîne li ser xwe. (Tekin, 2018, s. 131-139) Di navbera leheng û eşyayên Tolstoy, Flaubert, Stendhal û hwd. bi awayekî eşkere tên dîtin. Ew jî romanê wan li gorî romanên kesên xurttir dike.

Di sedsala 20 an de guhertinek mezin çêdibe. Romannûs revendên cuda tînin romanê. Erka cihê tê guhertin. Cih êdî ji bo yan rastîyê rasterast nişan bide, yan jî ji bo rastîyê biguherîne tê bikaranîn. Cih ne ji bo berrahiya derve ji bo berrahiya hundir nişan bide tê bi kar anîn. Cih ji bo nişanadayîna cihana hişmendîya cihanani hatîye bikaranîn. Di romanên ‘‘Çîroka Du Bajaran’’ a C.Dickens, ‘‘Ulysses’’ a J.Joyce û ‘‘Pirtûka Reş’’ a Orhan Pamuk de cih hatîye lehengkirin. Cih li ber lehengbûna xwe jî bo nişandayîna civakî-çandî (sosyokûltûrel) jî hatîye bikaranîn. Cih her tim wek cihekî rasteqîn dernakeve pêşîya me. Carinan cihên wek xeyalî (ûtopîk) jî derdikeve pêşîya me. Cih ji hemû kêmasîyên cihana rasteqîn xwe dûrdixe. Cihekî nûwaze û îdeal dibe. Mînak; ‘‘ Welatê Tavê’’ ya Campanella, ‘‘Atlantîs’’ a F.Bacon û ‘‘Girav’’ a A.Huxley. Cih bûyerê şênbertir dike. Bi saya cihê fehmkirina bûyeran hêsantir dibe û bi ser de jî em dikarin bêjin ku nasandina lehengan jî bi alikariya cihê ve çêdibe. (Tekin, 2018, s. 141-150) ‘‘Welatê Tavê, Atlantîs, Girav’’ cihên ûtopîk in. Nivîskar li gorî hestên xwe welatekê ava dike. Giringiya cih di van berhemana de zêdetir tên dîtin.

Piştî romanên Klasîk vebejêrê lehengî, bo vegotina cihê û piştgirîtiya vegotina bûyerê hatiye bikaranîn. Cih li gorî derûnnasî û çanda kesên ku li dinêrîn hatiye guhertin û bê vebêjer hin agahîyan dane xwînerî (Tekin,2018, s. 151-154) Şayesandin(teswîr) rîtmê dide çîrokê. Ji nivîskar agahîyan digire û dide xwînerê. Yanê ji kesên agahdar agahîyan digire, dide kesên bê agahdar. Teswîr qerekerê derdixe sehneyê. Bi saya teswîrê leheng dikare xwe di hundirê rewşekê de bi cih bike. Û dîsa bi saya teswîrê dikare tevgerê bike. Teswîr wek unsûreke rêvebirina çîrokê, derdikeve pêşîya me û tamamîya çîrokê pêk tîne.

Lukacs dibêje ku; erka şayesandinê di nav metnê de, piştê epîkê derketiye. Şayesandina epîkê jixwe tahkîre ye. Di romanên sedsala 19an de li ser şiklê leheng û taybetmendiyên wan ên takekesî agahiyên servehî têr nedikir. Ji ber vê jî şayesandin ji pêş çavan ketibû û zêde girîng nedihat ditîn. Ji bo lehengên romanê, bi tamamî werin nasîn, divê derdora wan jî baş werin nasîn. Piştê vê hişyarbûnê şayesandin girîng hatiye dîtîn. Nivîskar/çavdêr- xwînerên pasîf guherîye. Ji dewsa wê nivîskar/beşdar- xwînerên çalak derketiye meydanê. Tahkiye wek rastîbînî(realizm), şayesandin jî wek siruşperestî (natûralîzm) derdikeve pêşîya me. Çavderî û şayesandina otonom di jiyanê de bi girtina cihê têgiha nîzamî, îdeolojiya nivîskarê, serpêhatiyên wî yê li ser senteza razberkirina bitunê û nakokiyên jiyanê, bi awayekî nîzamî û kêrhatî nişane me dide. (Başaraslan, 2010, s. 45) Cih bi şiklên cuda derdikeve holê û heta derketina sedema bûyerê wateyên nû digire.

Her çiqas hin roman ji aliyê cihê ve ne devlemend were xuyakirin jî cih guhertina di hundirê cihê de û bi tevlihebbûna cihên xeyalî ve xurt dibe. Heta ku romanên ku derûnnasîya lehengan vedibêjin, di derheqê boçûn û encama romanê de agahîyan didin. Di romana “Madam Bovary” de çûnehatina di navbera herdu bajarên Yonville û Rouen de simbolizekirin e. Çûnehatina Emma ku di navbera evîn û mirinê de dimîne dixwaze nişanê xwîneran bide. Di rewîtiya xwe ya bi fayatonê de Emma xeyal dixe ku di hin bajarên de digere. Lê ev ger wek me got xeyalî ne. Lewra ew, ew bajarên ku tê vegotin qet nedîye tenê navê bajarên bihistîye. Ev cihên ku di navbera xeyal û rastîyê de diçe û tê, di derheqê derûnnasîya lehengê de rê nişanê me dide. Dîsa ev cih guhertin di romanên monoton de bê hewce were xuya kirin jî ji bo pêvajoya romanê wek hêmaneke ritmik bi dest dixê. (Başaraslan, 2010, s. 46) Romannûs jî mîna wênekêş û wênesazan xwe di mesefayêke diyar de dide

sekînanandin û cihekî ku ew ji tê da ye ji xwe re hildibijêre. Cih li gorî xwe û li gorî çavdêr tê nivîsandin. Di nêrîna çavdêr de mîna bi nêrîna cihekî bilind dîmenek fireh tê dayîn. Di nêrîna kunc jî dîmen bi qasê pacêya xwe sinordar e. Lê nêrîna kesên ku di koşeya odeyê de mêze dike bi cih guhertinê dibe ku deşt û newalan beşçeyên fekîyan jî bibîne. Ev cih guhertinê cihê bi awayeke cuda li ber çavan dide xuya kirin. Di wêneyan de çavdêr rêyan bi xwe dibîne lê di şayesandinan de ev bar dikeve li ser mile nivîskaran û rêbertîya, rêyên ku xêz kiriye, bi xwe dike.

Di romanê de hin cureyên cihê hene, wek vekirî, girtî, fireh, teng, taybet û hwd. mekanên vekirî (welat, bajar, behr, çiya û hwd.) cihên din di hundirê xwe de dihewîne. Cihên ku leheng tê da dijîn û lehengên din nikarin bikevin jî cihên girtî ne (mal, ode, nexweşxane û hwd). Lê carinan li gorî rewşan guhertinê çêdibin. Mînak bajar li ber welatê biçûk dimîne yanê ji welatê biçûktir e ji ber vê jî wek cihên girtî jî dikare were qebûl kirin. Firehbûn û tengbûn jî bi hevudu re têkildar in. Welat û bajar bi hev re bin, welat fireh e bajar jî teng e, lê welat û cihan li ba hevudu re bin wê demê welat teng, cihan fireh tê qebûl kirin. Di cihê de sifaten wek demî, herdemî, biyanî û hwd. jî tên bikaranîn. Ji cihên ku tenê kesên diyar dikarin bikevin re cihên taybet, ji cihên ku her kes dikare bikeve jî wek cihên giştî tê bi nav kirin. Di rêwîti de erebeyên ku ji aliyê lehengê ve tê siwarbûn cihên demî ne û cihên ku leheng tim tê da dijî jî cihên herdemî ne (Narlı, 2002, s. 100). Mehmet NARLI cihên vekirî û girtî tenê ji aliyê fizikî ve li vir vedibêje lê vekirîbûn û girtîbûna cihekî pîranî li gorî erka xwe divê were nişandan. Lewra li gorî lehengek welatek ji ber ne azadbûna xwe dibe ku bibe cihekî girtî û teng, odeyek jî heke lehengek xwe li wir ewle hîs bike ji bo wî/ê dibe cihên vekirî û fireh.

Di romanê de cihek heye ku bûyer tê da derbas dibin û leheng tê da dijîn. Nivîskar dikare di romana xwe de navên rasteqîn jî bi kar bîne, dikare navên xeyalî jî bi kar bîne. Yanê nivîskar dikare cihên rasteqîn jî bikarbîne cihên xeyalî jî. Lê divê neyê jibîr kirin ku cih di rastî de hebe jî tunebe jî ferq nake, hemû xeyalî ne. Nivîskarek dikare bînav jî cihekî teswîr bike, ji bo xwendevan, wê cihê bi xwe derbixe. Teswîra nivîskar û cihên rast dikare sedî sed bi hevudu negire. Nivîskar dikare qala cihê dîtin jî neke. Sanki bûyer di cihekî de derbas nebûye, leheng di cihekî de ne jîyane. Pir tê rast hatin ku nivîskar ji bo berhemên wî gerdûnî be cihên vekirî û rast bi kar nayînîn. Ji dewsa wan cihên girtî û teng bi kar tînin. Nivîskarên ku

dixwazin berhemên wan realist werin xuya kirin, navê cih û taybetmendîyên wan jî dinivîsîn. Lê carinan nivîskar bi zanebûn nawan nabêjin. Dibêjî qey dixwazin navê mirovên ku li wir dijîn veşêrin. (Narli, 2002, s. 100-101) Ev cudahî jî li gorî romanên tîn guhertin. Di romaneke derûnnaşî de gelemperî cihên teng tîn bikaranîn lê di romanên bûyerî de cihên vekirî tîn dîtin.

Di bikaranîna cihê de bandorên bingeh, armanca nivîskar û uslûba wî/wê ne. Mînak 2 uslûbên bingehî di tanzîmata Tirkî de derketiye pêş. Yek ji wan ew e ku, ji bo gel, çîrokên Ewrûpî fehm bikin ji aliyê Ahmed Mithad ve hatiye bikaranîn. Armanca nêzîkkirina çîrokên Ewrûpî û Tirkî ye. Ev ûslub ji bo gihîştina her kesî hêna jî tê bikaranîn. Romanên Eliyê Evdirrehman, Erebe Şemo, Heciyê Cindê heta em dikarin bejin ku romanên Qafqasyayê bi gelemperî bi vî şiklî hatine nivîsandin. Uslûba din jî ji bo rewşên bîran e. Namik Kemal û hevalên wî bala xwe nedane çîrokên gelêrî. Bi tamamî bala xwe dane çîrokên Ewrûpî û xwestine teknîkên romanê bikarbînin. (Akyûz, 1990, s. 68) Li gorî yekemin di uslûba duyemîn de tehlîl û teswîr zêdetir in û armanca zêdetir estetîkbûn e. Di wêjeya Kurdî de ev mesela bi vî şiklî derdikeve pêşîya me. Roman û çîrokên pêşî piranî bi uslûba Ahmed Mithad hatine nivîsandin. Ji ber ku qeweta xwe ji çîrokên gelêrî girtine û xwestine xîtabê gel bikin. Di romanên dawî de jî uslûba Namik Kemal derdikeve pêşîya me. Lewra nivîskarên romanên Kurdî êdî dixwazin di asta berhemên Ewrûpî de romanên xwe binivîsin ji ber vê yekê jî di bandora romanên Ewrûpî de dimînin û berhemên xwe di bin bandora berhemên Ewrûpî de ava dikin. Çîrokên Helîm Yusiv û romanên Firat Cewerî û Şener Özmen ji bo vê uslûbê em dikarin mînak bidin.

2.4.2. Teswîra Cihî di Romanê de

Bingeha romanê ronahî ye. Ronahî yekbûnîyan perçe dîke an tevîhev dîke û reng û nêrînan diguherîne. Wek rengên sar û germ diyar û nûans, dij û tevîhev, vekirî û tarî û hwd... Di rewşên ku ne diyarbûna rengan de jî bi hatina ronahî, çêbûna rengên pêldar jî hêmanên romanê ne. Hêmana deng jî di romanê de bi bandor e. Bêdengbûn û xirecir jî bi alikariya bandora deng û ve tê çêkirin. Carinan di romanê de sehneyekê bihistîn cih negirtibe jî hevok di navberên xwe de rîtmek digire û lezbûn û hêdîbûna wan xirecir û bêdengbûnê derdixe meydanê. Balkişandin, hevokên kurt û dirêj û lêzbûn hêdîbûna peyv û hevokan ve zindîbûnê dide teswîrê. Ritîmbûna

teswîrê di eynî demê de tê wateya rîtmîbûna çîrokê û serkeftîbûna şayesandinê, giranî û cidibûnê dide çîrokê.

Cih ji bo sazkirina çîrokê û cihdayîna lehengan, pêwîst e. Lê têgihên cih û teswîr bi demê re hatine guhertin. Li gorî cihên derveyî ravekirina kesayetiya lehengan di gelek romanên sedsala 19an de tê dîtin. Di romanên naturalîst de teswîra cihê di plana yekem de lehengan ji ortê radike yan jî teswîra wan bi li gorî cihê ve tê kirin. Di romanên nûjen de bi çavê vebêjer an bi çavê lehengekî/ê teswîra cihê tê kirin. Hin nivîskar jî bêhiş tişt şayesandine. Li gorî nivîskarên ku bireserên xwe bêhiş diafirînin, nesne sinordar e û tenê bi hebûna xwe dikare di cihê de bi cih bibe. Yanê bi gelemperî em dikarin bibêjin ku nêrîna nivîskaran jî ji hevudu cuda ye û li gorî dem û fikran ve nerîn guherîne.

Teswîr çima tê kirin? Sedema teswîrê ritimdayîna çîrokê ye. Bi vegerandina nêrîna xwe ya cihê derve ve. Teswîr, piştî aksiyonê, sistbûn û di demeke krîtîk de birîna çîrokê ve di xwîneran de nêsemaxî çêdike. Perspektîfa vegotinê fireh dike, bi atmosfera fizîkî rewşa ku nirxa sembolî dest xistiye bi hevkarîya ritma wê atmosfera mirovahî tespît dike. Yanê bi lezbûn û hêdîbûndayîna, hereketê dide romanê. Teswîrkirin tê wateya nîşandinê. Lê di teswîrên dirêj de berevajiyê wê derdikeve meydanê. Teswîr çiqas dirêj be xwîner ewqas hindik dibînin. (Başaraslan, 2010, s.47) Teswîr ji aliyê nivîskar ve bo dîtîna xwîneran tê kirin. Teswîr nêrîna lehengekî/ê ye. Hebûna lehengê û sedema darbasbûyîna li hemberê tiştan(objeyan) ji ber vê ye. Qadên sempatîk lehengên tîp sehneyên vetûrî, xîzên derûnnasî, bi vî şiklî tîp diyar kirin. Sedemeke din jî ji bilî xemilandina çîrokê alikirina rêçûyîna û girêdana çîrokê ye. Teswîrên nav çîrokan, pêşveçûyîna û girêdana bûyerên çîrokê ne.

Teswîr ji ber ku armanca nîşandana rastîbûna bûyeran di hundirê xwe de dihewîne, alîkarîya eleqederbûna me ya bi rastiye jî dike. Ji ber vê jî bûye yek ji wan krîterên vegotina realist. Rasteqîbûn di realîstan de ne kopyakirina bûyerên tevlihev in. Armanca wan di nîşandayîna bûyerên rasteqîn de întîbayeke bêkêmasî ye. Pişt re jî bo berrahî fikrên îzafiyetên cuda derketîye meydanê. Ji sedsala 18 an pê ve ev mijar balê kişandiye li ser xwe. Exleq, tebîet û rih bi demê re tê guhertin. Bi vî awayî bi guhertina mirovan ve roman jî ew ê were guhertin. Di mijara rasteqîn de jî hatiye îfadekirin ku armanc ne kopyakirina tiştan e, bi sûdgirtinê rastiye, vegotina rastiye ye. Lê pîrsa krîterên vegotina rasteqîn çi ne? Baş nehatiye çareser kirin. Di vê xalê de

rêbazên cuda hatine tespît kirin. (Başaraslan,2010, s. 47) Teswîr her çiqas xwedî îddaaya nîşanê rastîyê be jî, ji bilî tiştên ku dixwaze nîşanê xwîneran bide, hin tiştên din jî nîşan dide. Îmajên ku di hundirê teswîrê de cih digirin rastîyê dide çîrokê û di tiştên rojane de guhertin çêdike. Ji ber vê teswîra mekanê, bala nivîskarê ku li ser cihanê ye û hêjahîya bala wî/wê nîşan dide. Nivîskar ji cîhanê derveyî xwe dûr dixê û cîhaneke nû ava dike û dixwaze cihanê ku avakiriye fehm bike, binase û bigûherîne.

2.4.3. Erka Cihî di Romanê de

Cih di romanên nûjen de ji fehmbariya giranbûyîna li ser mirovan, xwe dûr xistiye. Û xwe xistiye nava hêmanên sereke. Tenê bi nişandana derûnnasiya lehengan nemaye, di eynî demê de wateyeke felsefîk jî girtiye li ser xwe. Mînak temaya labîrentê, bêhtengîya mirovên ku, li ser cihanê ji xwe ra cihekî baş peyda nekirine, nîşan dide. Têgiha cihên din, bêrikirina cihên dûr e, yan bi wateyeke din em dikarin bibêjin ku rev e. Bi vî şiklî jî wêjeyê devlemend derdikeve meydanê (Purçak, 2019, s. 26) Disa di romanê de ditîna cihê wek tişteke hunerî, tişteke wiha derxistiye ku ew tişt jî gelek şaxên hunerî serkeftîtir e. Bi bikaranîna vegotina tiştan bi alikariya zimanê ve, pir zû dikare nivîskarê ji îmajekê derbasî îmajekê din bike û bi hêsanî dikare xwînerî bibe bûyerên cuda cuda. Di Komedyaya Îlahî ya Dante de bilindbûna beheştê û kêrahîya dogehê, yanê jor û jêr, an Canên Mîrî ya Gogolê de motîfa rê û di Çîroka Mûjîkê ya Çehov de hemberbûna tengbûna qulûbeyan û firehbûn û bêdawîbûna xwezayê, ji bo gelemperkirinê gelek watedar e. (Başaraslan, 2010, s. 47-48) Bi vî awayî ziman ji bo nivîskaran, dizayna cihê jî ronî dike. Lê dîsa jî wêjeyê pêşîkî dide dizayna demê

Di derheqê berhema Teoriya Romanê ya Stevick de D.S. Blond di gotara xwe ya ‘‘ Di Romanê de Cihê Fîzîkî û Sosyokulturel de’’ wiha dibêje: Teknîkên ku di avakirina cihên fîzîkî û sosyo-kulturel ên romanê de tên bikaranîn di bêtîya sedsala 20an de dihatin îhmalkirin û rexnegir, teswîrên ku tenê ji bo teswîrê hatine kirin, qebûl nekirine û rexne kirine. Lê teswîr ji bo romanê mijareke pir girîng e. Di sehneyê de divê bi qasî bandora ku li ser bûyer û qerekeran dike, xwedî bi bandor be û fonksiyonek wek perçeya temamê romanê, bi cih bibe. Di destpêkê de romannûs, teswîrên xwe ên tabîetê mîna wênesazan kirine û ev tişt jî aliyê hin xwîneran hatiye ecibandin lê ji aliyê hin xwîneran jî nehatiye ecibandin. Ji ber ku têkiliya teswîrê, bi leheng û bûyerên romanê re zêde tunebû. Teswîr divê tenê ji bo nasandina cihên ku

bûyer tê da derbas dibin, neyê kirin. Karên wê yê din jî hene. Di nav karên wê de sinordarkirina cihên bûyeran û di sehneyê de bicihkirina leheng û bûyeran jî hene. Teswîrkirina girava ku Robinson Crosoe tê da dijî, ji bo nîşandana karên ku Crosoe dikare bike jî girîng e. Teswîr ne tenê nîşandana tiştên erdnîgarîyê ye. (Başarslan, 2010, s. 48) Di eynî demê de ji bo nîşandana cihên sosyo-kultürel jî tê bikaranîn. Di destpêkê de tenê derdora leheng ji aliyê fizîkî û cîvakî ve dihat teswîrkirin. Ji ber ku lehengên wê demê ne gerdûnî bûn tenê xîtabê dema xwe û warê xwe dikirin. Lê bi demê re ev tişt guherî. Lehengên romanên êdî xîtabê gerdûnê kir. Ew jî bi xilasbûna cih û demê û bi teswîrkirina rihê lehengan çêbû. Di romanê de ‘‘filan leheng pir xemgîn bû’’ were gotin û li ser neyê sekinandin, ji bo romanê qelsîyek pir mezin e. Di şanoyan de nîşandana derûnnasîya lehengan, têkîlîyek di navbera listîkvan û tameşevanan de çêdike. Ew jî bi saya listîkvanan çêdibe. Ji ber ku listîkvan bi dengê xwe an bi tevgerên xwe dikare derûnnasîya xwe nîşan bide lê di lehengên romanê de ew tişt ne wiha hêsan e. Ji ber ku xwîner lehengê romanê nabînin, tenê xeyal dikin. Ji bo vê jî divê romannûs teswîrên wiha bike ku xwîner derûnnasîya lehengan fehm bike û di xeyalên xwe de karibe bi cih bike.

L.P. Haetley di romana xwe ya ‘‘Jineke Bêqisûr de wiha dibêje;

Di fikra ku tabîet hisên mirovan nîşan dide de tiştêkî şaş tune ye. Ji ber ku mirov hisên xwe nîşanê xwazayê dide. Di nav wan de têkîlî heye. Tunebûna têkîlîya di navbera wan bêhîsbûn e û nîşandana kêmasîya hêza xeyalî ye. Lê di her derê de divê teswîr di bitûna romanê de cih bigire. Piştê wê tiştê herî girîng ew e ku teswîr di cihekî lêhafî de were bikaranîn. Ew tişt divê were dîqet kirin. Teswîr divê di romanê de cihê xwe bigire û bi tenê ji bo kêfxweşîyê neyê xwendin û ji romanê cuda neyê qebl kirin. Derxistina teswîrê, ji romanê, ji bo romanê ew ê kêmasîyek pir mezin bibe. (Atay, 2013, s. 42) Heke em erken cih û teswîrê birêz bikin, em ê bi kurtasî karibin wiha bibêjin:

- Nîşandana cihên bûyeran
- Agahdarkirina xwînerê di derheqê cihên bûyerê de
- Xurtkirina romanê
- Nîşandana derûnnasîya lehengan
- Watedayîna sembolîk ji bo romanê

- Ritîmdayîna romanê
- Kelecanî û bêsebirbûndayîna xwîneran
- Mûzîkaldayîna romanê
- Di bûyeran de nîşandayîna cihên lehengan
- Watedayîna felsefî û ûtopîk
- Nîşandayîna têkîliyên leheng û nivîskaran, ji bo cihana derveyê ve. û hwd.

2.4.4. Têkiliya Cihî, bi Dem, Bûyer û Lehengî ve

Cih carinan wek nîşandana tişt û mişt û bûyeran were bikaranîn û bi vî şiklî were dîtin jî cih rûyê têgeh, tişt û mişt û bûyeran e. Wateya cihê ku ji aliyê vebêjer û ji aliyê kesên ku cihê bi kar tîne, ne bi objeyên hundirê wî, bi gelemperî di sinorên ku hatine diyar kirin de bi bûyerên ku pêk tên û bi şiklê pêkhatina bûyeran ve tê fehm kirin. Ji xeynê vê têgehên ku wate didin cihê; bi tişt û miştan ku bêralîkirina bûyerê dikin û têkiliyên ku bi bûyerê ve derdikevin holê, jî di watedayîna cihê de rol dilîzin. (Doğru, 2020, s. 330) Cih û bûyer gelek caran bi hevdû re şikl digirin. Bûyer di nîşandana cihê de rol dilîze, cih jî şikldayîna bûyerê ve erka xwe tîne cih.

Dem ji ber bastûra xwe di bitûnkirina niha û dahatû de dikare dabeş bibe û dike ku bi perçe û heyeman were veqetandin. Di pêkhatina bûyeran de hevbirek e. Bergso li hemberî hişmendîya dema dîrokî derdikeve. Li gorî wî dem bûyîneke hişê mirovan e. Mirov ne di hundirê demê de ne, dem di hundirê hişê mirovan de cih digire. (Doğru, 2020, s. 331) Di romanên de jî dem di hişê romannivîs de tê saz kirin, helbet demên diyar jî tên dîtin lê ew dem wek cihê di mêjiya nivîskar de şikl digire. Dem û cih bi hevdûre gelek têkildar in. Herdu jî di hişê nivîskar de tên saz kirin û cih bi gelemperî di bin bandora dem de şikl digire. Bi gelemperî di romanên realist de ev tişt derdikevin pêşîya me. Ji ber ku nivîskar dixwazin bûyerê wek rasteqîn nîşan bidin, bo vê jî gelemperî dem û cihên diyar bi kar tînin. Û ji bo xwîneran bidin bawerkirin ku ew bûyer, bûyereke rasteqîn e divê têkiliya navbera cih û dem xurt were saz kirin. Mînak romannivîsek dema ku qala bûyereke dîrokî bike, wek bûyereke hezar sal berê, di şayesandina cihê de nikare qala balafirana, erebeyan, telefonan bike. Nivîskar divê cihê li gorî wê demê saz bike ku roman ji rastiye zêde dûr nekeve.

Bê dem û cih qalkirina bûyerê zêde ne pêkan e. Ji ber vê di çîrokê de leheng heke bixwaze tevgerekê bike divê bi mecbûrî hebûna dem û cihê were qebûl kirin. (Doğru, 2020, s. 331) Wek ji agahiyên jor jî tê dîtin ku tevgerên lehengan bi temamî di bin bandora cih û dem de çêdibe. Leheng li gorî dem û cihê tevdigere û bi vî şiklî bûyer çêdibe. Leheng li gorî dem û cihê ve hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê derûnnasî ve tên ava kirin. Leheng li gorî cihê ku li dijî bi gelemperî tevdigerin, cilên xwe bi gelemperî li gorî vê cihê û demê ve hildibijirin û fikr û ramanên xwe bi gelemperî di bin bandora cih û demê ve saz dikin. Bi kurtasî em dikarin bibêjin ku leheng bi gelemperî li gorî cih û demê ve şikl digirin û bûyer jî di bin têkiliya cih, dem û lehengê de tên ava kirin.

3. TESWÎRA CIHÎ DI BERHEMÊN WÊJEYÊ DE

Şayesandin bi gotin an nivîsê ve vegotina tiştêkî ye. Bikitekit di roman, çîrok û hwd. de qalkirina cih, kes, ajal û hwd. ne. (Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi, 1998, s. 279) Di wêjeyê de şayesandin wek şayesandinên kes, cih, tişt û mişt û hwd. derdikevin pêşîya me. Li gorî Hüseyin Tuncer şayesandin bi wateya xwe ya gelemper, hunera nişandina bi awayekî eşkere yê derdor, cih, mal û hwd. ne. Bi kurtasî hemanên dekorê nişanî me didin. (Zambak, 2007, s. 9) Li gorî vegotinê cih bi du şiklê tên şayesandin. Yê yeke piranî girêdayî çanda wêneyê ye. Her tişt çawa be eynî wisa nişan dide. Tekstên girêdayê ‘mimesis’ in. Mimesis li gorî Arîsto û Eflatun mina eynîkê nişandana xwezayê ye. Yê duyem jî vegotina girêdayê ‘tecrîd’ in. Minakên wan yê herî baş mesnevî ne. Di berhemên bi vî şiklî de cihanê wek eynîkê nişan nadin. Dixwazin hestek jî tê da bihewînin. (Zambak, 2007, s. 9) Di berhemên ku bi awayekî li gorî Mimesis hatine nivîsîn de armanc li gorî rastiye nişandana derdorê ye. Lê di berhemên ku li gorî ‘tecrîd’ hatine nivîsîn de tiştên ku tên şayesandin ne tenê bi şiklê xwe yê fizîkî di eynî demê de armanc ew e ku hestên ku li ser mirovan çêdibin werin nişandan. (Korkmaz, 2005, s.168) Dibe ku pirseke wiha di hişê me de çêbibe. Cih ji bilî vegotinê mimesis û tecrîd gelo qet nehetiye qal kirin? Cih bi tenê şayesandinê gelo hatiye vegotin? Bersivên wan em dikarin wiha bibêjin. Di vegotinê de şayesandin divê xwedî fonksiyonê be. Cih jî bi şayesandinê ve xwe diyar dike. Lê ji vir neyê fehmkirin ku cih bi tenê şayesandinê ve tê vegotin. Lewra vebêjer di berhema xwe de divê her tiştî li ser zemîneke bi cih

bike. Mînak vebêjer qala du kesan ku di cafeyeke diaxifin dike, li vir cih cafe ye. Yanê qereker di vegotinê de tê bi cih kirin.

Di wêjeya Kurdî de her du şikl jî hatine bikaranîn. Beriya nişandana cudahiye wan, divê em pêşî qala şayesandinên heyberî û taybetî bikin. Şayesandinên heyberî bi kurtasî bi awayekî realist nişandana tiştan in. Tiştên ku di vebêjê de derbas dibin tî xwestin ku ji xwînerê re wek jiyana rasteqin werin nişandan. Her tişt bikitekî tî vegotin. Ev tişt bi gelemperî ji aliyê realist û natûralistan ve tê bikaranîn. Bi rastî jî sedsala 19an de nivîskarên girêdayê rêbazên realist û romantizme di vî mijarê de xwediyê prensîb bûn. (Zambak, 2007, s. 9) Realizm di şayesandina derveyî de gihiştîye asta herî bilind. Şayesandinên bi vî şiklî yek jî ji pozîtîvîzmê tê. Lewra nêrîn hine çavderiyê bûne. Ya din jî ji ber nêrîna nivîskarê ye, nivîskar bawer dike ku bandora derdorê li ser rihê heye. (Tekin, 2018, s. 44) Di natûralistan de derdor mina belgeyêke dîrokî ye. Emîla Zola di vî mijarê de wiha dibêje “êdî ji bo keyfê em şayesandinê nakin, ji bo şayesandinê em dişeyên. Mirov jî ji derdora xwe nayê dîrxistin. Cilên wan, malên wan, bajarên wan, wan temam dikin. Ji ber vî jî bûyerekî yê dil û mejiyên wan, em ê bê sedemên derdorî tespît nekin. Sedema şayesandinên bê dawî ev e. (Yetkin, 1967, s. 60) Di şayesandinên bi vî şiklî de şayesandin carinan xwîneran ji bûyerê dîr dixê ji ber vî jî di romanên wiha de wek Emîla Zola dibêje keyfa şayesandinê zêde namîne.

Ji şayesandinên taybetî re şayesandina empresyonist û şayesandina romantik jî tî gotin. Di vî şayesandinê de armanc ne nîşandana rastiyê ye, armanc li ser xwînerê avakirina hestek e. Nivîskarên ku şayesandinên taybetî bi kar tînin, cihê li gorî nêrînên xwe teswîr dikin. Li gorî nivîskarên romantik, rastî, bi dîrketina ji gel û bi nêrîna cihana hundirîn çêdibe. “Ev rev e, reva ku hunermend diçe cihana hundirîn û li wir xeyal û îdealan diafirîne” (Çetişli, 2001, s. 10) Şayesandina cihê ji bo eşkerekirina derdora lehengan pir girîng e. Şayesandin ji bo ji gotinên nivîskar zêtedir tişt werin gotin û tiştên ku bi dijwarî tî gotin bi awayekî bi kurtî were gotin tî bikaranîn. Lewra şayesandin di navbera vebêj û xwînerê de ragihandineke bênavgîn çêdike. Bandora ragihandina bênavgîn tenê ji qeweta çêkirina tediya şayesandinê ve eleqedar e. (Zambak, 2007, s. 10) Nivîskar li vî derê ji bo hestên ku dixwaze li ser xwînerê çêbike, şayesandinê bi kar tîne.

4. TÊKÎLIYA CIH Û EŞYAYAN DI BERHEMÊN WÊJEYÎ DE

Li gorî Rene Wellek û Austîn Varren wêje, jiyane temsil dike. jiyane jî bi wateya xwe ya fireh rastiyeke civakê ye. Li hela din wêje huner e û jiyane bi şiklên cuda cuda lasayî dike. Di nav tiştên ku lasayî dike de xweza, jiyana hundirî û jiyana subjektîf jî hene. Nivîskarê/a wêjeyî endamê gelê xwe ye. Ji ber vê di nav gelê xwe de heta astekî tê nasîn û berhemên wî/ê xitabê komeke dike. Lewra di navbera berhem û gel de têkîliyê derdikeve holê. Em dikarin bibêjin ku di hin civakan de helbestê, dibe ku em nikaribin ji ayîn, sehr an listikê veqetînin. Wê demê wêje rastûrast ne ji bo kesek, ji bo civakê jî tê bikaranîn. (Zambak, 2007, s. 14) Bêguman wêje hem derûnnasiya kesan nişan dide hem jî di bandora civakê de dimîne. Guhertinên rewşên siyasî û aborî li ser çand û hişê mirovan, guhertinan çêdike. Wêje jî bi gelemperî ji bo berhemên xwe tiştên wiha dike mijar. Di vê rewşê de cih û eşya jî bi şiklekî din dikare derkevin pêşîya me. R. Wellek û A. Varren di vê mijarê de dibêjin ku ‘ ‘ Her tişt ji berdarbûna xwe ya herî zêde ve tîne bikaranîn. Lê belê dema erkên wan yê bingeh namîne, bikaranîna wan ya bi erkeke din derdikeve pêş. Eşyayekî kevn wek xeml tîne bikaranîn an di mûzeyê de tîne nişandan. Piyanoya ku xêra bûye wek maseyek tîne bikaranîn. Bi vî şiklî tabiata tiştan girêdayî bikaranîna wan tê guhertin. Ew çî karî bike, ew, ew e. Her berhem xwedî erka xwe ye. Lê di eynî demê de li gorî dem, kes û cihan erkên cuda jî digirin li ser xwe. (Zambak, 2007, s. 14) Erkên ku digirin li ser xwe dibe sedema derketina wateyên nû ev jî di romanê de hestên cuda derdixe maydanê. Erka piyanoyê ya yekem derxistina dengê û çêkirina muzîkekê ye lê dema kevn bibe ji bo bîranînan jî dikare were bikaranîn wê demê dibe xwedî erkeke din.

Handan İnci Elçi di xebeta xwe ya ‘ ‘Türk Romanın da Ev’’ de dibêje ku ‘ ‘xanî’’ encam e. Di derheqê çand û wesfa takekesiya lehengê de agahiyan dide me. Gelek caran jî puxteya medeniyetê nişan dide. Lebefure dibêje ku cih hem mehsûla hem jî hawira pêvajoya civakî ye. Ji ber vê hemû cihan wek nişaneyên civakî em dikarin bi lêv bikin. Wek mînak qonax nişaneya dema Osmanî, apartmanan jî wek dema piştî têkçûyîna Osmanî dikarin nişan bidin. Qonax çawa ku çanda Osmanî nişanî me dide, apartman jî xwesteka rojavabûyîna nişan dide. (Elçi, 2003, s. 18-19) Eşya perçeyêke cihê ye ku wî tamam dike. Eşya li gorî cihê di asteke binê de cih jî li gorî eşyayan di astekî ser de ne. Lê belê di hin berhemên de eşya ne parçeyekî ku cihê tamam dike,

wek qadeke ku lehengê ji aliyê fizikî û derûnî ve dorpêç dike, derdikeve pêşîya me. Bi vî şiklî jî eşya ji parçebûyîna cihê derdikeve û bi serê xwe dibe cih. Hin eşyayên ku êdî dibin cih ev in; nivîn, mase, dolab, paldank û hwd. Heke tişt miştên wiha di nav ciheke de werin bi cih kirin wê demê êdî dest bi cihbûyîna dikin. Xaniyek çawa ji bo lehengê wek ji bo dûrketina ji civakî were bikaranîn. Nivîn û dolab jî wek ji bo dûrketina ji yana rasteqîn dikarin werin bikaranîn.

Wek encam em dikarin bêjin ku di navbera eşya û cihê de têkiliyeke xurt heye. Heke rewşa têkiliya wan baş neyê fehm kirin ew ê bibe sedema tevliheviyê. Ji ber vê jî di vê xebatê de têkiliyên navbera wan were nişandan û dîyar kirin.

5. CIH DI RÊBAZÊN HUNERÎ DE:

Di berhemana de cih li gorî dem û rêbaza hunerê tim tê guhertin. Di klasîzm de yekîtiya bûyer dem û cih pîvana sereke bû. Li gorî qeîdeya klasîzmê bûyer di 24 saetan de çêdibe. Mijar eynî ye cih nayê guhertin. Hemû bûyer di mekanekî de derbas dibin. Derdor dibe ku nişandana îradeya mirovan be. Bi cih û tişt û miştan re mirov zêde têkildar nîne. Mirov mîna demê bi cihê re jî bi hev re hesab dibîne. Romana Klasîk vê xalê vala dihêle. Di romanên Klasîk de eşya û cih tenê ji bo çarçoveya mirovên ku li wê derê dijîn, nişan didan. Dikare were gotin ku mirov li cihekî nejiya ne, romana klasîk qet qala cih û eşyayan nedikir. Nivîskar tenê şert û mercên derdorê bigotana. Têkiliya kes, bi eşya û cih, romannivîsên Klasîk eleqedar nake (Tekin, 2018, s. 134) Yanî cih ji bilî sehneya bûyerê xwedî ti erk nebû (Çetin, 2004, s. 108) Amiel ku analîza giyanan dike, wiha dibêje: Dîmeneke xwezayê, fikrên mirovan nişan dide. Romantîkan têkiliyên xweza û mirovan didîtin. Lehengên bihêrs, tengizî di hewayên bi bahoz de derdikevin derve. Kêfa lehengên kêfxweş jî ji hewayên sayî re tên. (Karaca, 2016, s. 74-75) Di romantîzmê de cih tenê ji bo şayesandina hunerî tê bikaranîn. Lê di realizme de cih xwe digihîjîne asteke bilind.

Di realizm de ji cihê re zêdetir giringî tê dayîn. Li vir armanc bi guherîna cihê ve nişandana guherînên lehengan in. Di romanên Klasîk de nêrîna derdorê gelemperî bi nêrîna nivîskar/vebêjer çêdibû. Statîkbûna romanên Klasîk ji vir dihat. Derdor biguhere jî nêrîna kesan ne diguherî. Loma derdor tenê bi nêrîna wî/ê kesê ve sinordar bû. Loma teng û aram bû. Lê realîstan rêyeke nû dîtin. Bi nêrînên lehengan ve li derdorê mêzekirin. Bi vî şiklî têkiliya cih û kes hat çêkirin. Yanî cih li gorî

derûnnasî, çandî û rewşa civakiya lehengê hat guhertin. (Karaca, 2016, s. 74) Nivîskarên realist ji bo her tişt mîna eynikê nîşanê xwîneran bidin dixwazin cihê bi her awayî li ber çavên xwendevanan zindî bikin. Realîstan ewqas girîngî didin ku carinan jiyana mirovan wek labarotuarê dibînin her tiştê, pisîtî, qirêjî û. hwd. nîşanê xwendevan didin.

Piştê realistan, naturalîstan derketin, ew jî cihê ji bo rasteqînê bi awayekî cuda nîşan bidin, bi kar anîn. Di têkilîya mirov û cih de cih derdixistin pêş. Bawer dikirin ku kes bi temamî di bandora cihê de ne. Digotin ku qedera mirovan bi cihê ku dayîk bûye û li dijî şikl digirin. (Çerî, 2014, s. 33) û berhemên xwe bi vê awayî dinivîsandin.

6. CIH DI BERHEMÊN HUNERÎ DE

Di wêjeyê de li ser roman û çîrokê gelek xebat hatine kirin. Lê di van xebetan de cih zêdetir tenê ji aliyekî xwe ve hatiye nirxandin. Rasterast xebatên li ser cihê gelek kêr in. Di wêjeya Kurdî de em dikarin bêjin ku xebateke serkeftî qet tune ye. Di wêjeyê de gelek tasnîfên cihê hatine kirin lê tasnîfên ku hatine kirin zêdetir bi awayekî ve cihê tasnîf dikin. Lê ew jî bi xurtî wateya mekanê nade me. Mînak Mehmet TEKİN ji bo cihê wiha dibêje ‘‘ yek ji wan hêmanên girîng yê romanê ye, ji ber ku pêwîstiya bûyerê bi cihê rast û xeyalkirî heye. (Tekin, 2018, s. 44) Wek tê dîtîn ku cih bi bûyerê ve girêdayî tê dîtin. Ti erkên cihê, pêwîstbûna wî, girîngîya wî ne hatiye gotin. Di pênaseya Şerif AKTAŞ de jî rewşeke wiha derdikeve pêşîya me. Li gorî wî cih ‘‘ sehnetiyê dike ji bo bûyerên ku tên qal kirin.’’ (Aktaş, 2003, s. 128) Mîna mînakê din ew jî cihê tenê bi bûyerê ve girê dide û bi wateyeke xurt tasnîfa wî nake. Di pênaseyeke din de jî cih dîsa wek sehneyê hatiye pênase kirin û wek cihê ‘‘bûyer û tevgerên lehengan’’ (Çetin, 2004, s.135) hatiye dîtin. Lê cih tenê ne sehne ye, gelek erkên wî hene. Atmosferê nîşanê xwîneran dide, derûnnasî û guhertinên leheng û gelan nîşan dide û hwd. Sevinç ERGİYDİREN jî cihê bi vî şiklî pênase dike ‘‘Ji Heideggerê ku hebûna mirovan bi cihbûna wan ya li ser cihanê ve girê dide’’em dikarin li gorî wî bêjin ku ji bo heyberekê ku tecrûbeyek bijî divê li ser erdeki were bi cih kirin. Di zimanê hin torîsyenan de ‘‘cih’’ li gorî hin kesan ve derdor di romanê de, ne tenê erdeke tevgerê ye. Bi awayekî di diyarkirina teşeya hebûnê de jî rol dilîze. (Ergiydiren, 2001, s.19) Bi vê pênaseyê Ergiydiren cihê ji sehnebûyînê xilas

dike û wî wek simgeya hebûnê dibîne. Di pênasseyî din de jî Hüseyin TUNCER dibêje ku “Cih hêmanê bingehîn e ji bo bûyerê”(Zambak, 2007, s. 2) ji vê hevokê em fehm dikin ku Tuncer jî cihê mîna yên din girêdayî bûyerê dibîne. Şerif AKTAŞ di pirtûka xwe ya bi navê “Roman Sanati ve Roman Incelemesine Giriş” de dibêje ku “Di her hal û karî de pêwîstiya peydabûna bûyeran bi kadroya lehengan, cih û demê ve hene”(Aktaş,2003, s. 45-46) bi vê gotinê Aktaş dixwaze bibêje ku tenê ne cih di eynî demê de kadroya lehengan û dem jî hêmanên bingehîn in ji bo bûyerê.

Di van pênasseyê jor de bi hin aliyan ve cudabûn, bi hin aliyan ve jî hevşibî derdikevin pêşiya me. Lê di pênasseyên jor de tenê li ser hin taybetmendiyên cihe ve hatine sekinandin. Lê di berhemên hunerî de ji bo ji cihekî re bêjin mekan, çi pewîst in? çi taybetmendiyên wan hene? û hwd. qet nayê qal kirin. Ev jî pirsgirêkek wiha derdixe pêşiya me. Di berheman de mijara cihê dikeve nav tevlihevîyek. Ew jî di tehlîla mekanê de dibe sedema qelsiyê.

Ji bo cihê (mekan) belkî pênasseyeke wiha were kirin bo fehmkirina cihê belkî baştir bibe: Mekan cihên wiha ne ku; tişt miştan bi awayekî pergala li ser wan digerin û girêdayî bûyerê ne. Tiştên candar û bêcan hem bi awayekî fizîkî hem jî bi awayekî ruhî tê da cih digirin û bi her aliyê ve ji aliyê mekanê ve tîr dorpêç kirin. Li gorî mijarê ji aliyê ruhî ve kesan bi mekanê re dikare bi şiklekî paradoksal an paralel têkildar bike. Bi vê pênasseyê girîngî û erka cihê ew ê zêdetir were fehm kirin û di tehlîla cihê de barê li ser piştta me siviktir bike.

7. SENIFANDINA CIHÊ DI BERHEMÊN HUNERÎ DE

Zikê dîya mirovan yekem war e. Piştî demekê mirov ji vir derdikeve û li ser cihanê jiyana xwe didomîne û cihana xwe li gorî xwe diguherîne. Carinan berevajîyê vê jî dibe. Bi gotineke din hin caran mirov derdora xwe dirûvîne û hin caran jî derdor şikl dide mirovan. Bi wateyê antolojîk cih di gerdûnê de cihê xwe pêgirtina mirovan e. Warê pêkhatîkirinê ye. Hem berhema serkeftina mirovan hem jî qada pratîkê ye.(Korkmaz, 2007, s. 400)

Wek romanên, mekanên romanên jî sazîkirîye. Esehîya bûyerên romanê û şertên ku lehengên romanê têde bi cih dibin, di nav pêkerên sazîkirina mekanê de karîger dibin. (Aktaş, 1991, s. 141) Bi gotineke din cih bi girêdayî aksiyon an derbasbûyîna

demê ve bi awayekî xurt, bi lehangen re tekîldar e. Hemû berhemên wêjeyî ji ber ku bi nêrîn û sekn re eleqedar in, paşhatiyên nêrîn û sekn jî cih e. (Atay, 2013, s. 41) Bi vî şiklî cihê vebêjer û lehangên romanê an hemû rewşên romanê li ser cihê rasterast xwedî bandor in. Digel vê, ji ber ku hem lehangên romanê dikarin şikl bidin bûyeran û hem jî bûyer dikarin li ser lehangen bi bandor bin û li gorî teknîka vebejerê ve cih dikarin werin senifandin. Bi vî şiklî em dikarin cihê vebêje bikin 2 beş.

1. Cihên ku vegotin zêdetir tên bikaranîn (Cihên Derdorî)
2. Cihên ku şayesandin zêdetir tên bikaranîn (Cihên Têgihî) (Korkmaz, 2007, s. 402)

Sehneyên romanê leyistokên biçûk yên romanê ne. Li gorî teknîka sehneyan û mentiqê tên saz kirin. dema ku em wan careke din jî bixwînin em ê bibînin ku ev tişt ti carî naguhere. Hemû sehneyên romanê di nav xwe de hev girtî ne û bi xwe bi vî şiklî ji nû ve saz dikin û dubare dikin. (Atay, 2013, s. 42) Di romanê de sehne biqasî ku bûyer û lehangen ve eleqedar e, ewqas bi bandor e jî. Bi kurtasî sehne, di romanê de divê erkeke dramatik bi cih bîne.

7.1. Cihên Derdorî

Di vebêjên bûyerî de tên bikaranîn û cihê ku li ser tên derbaskirin in. Cih-kes zêde bi hevûdû re ne tekîldar in. Derdor ne hatine xebitîn, bîrhatîkirin veguherandin. Tenê wek westîyerê bûyer lî ser tên daleqandin. Ji rêgehekê erdnîgarî wêdetir ne tişteki ye. (Korkmaz, 2007, s. 402,403) Cihên wisa tenê bi nav derbas dibin û têkiliya wan bi bûyer û lehangê ve zêde tunene.

7.2. Cihên Têgihî

Cihên têgihî têkiliya cih û kes bi awayekî problemîk nîşan dide. Hatine veguherandin û bîrhatîkirin. Ne cihekî topografîk in. Hêjahîyekî wiha ye ku wate dide û di hûndirê xwe de cih dide bîranînan û derûnnasîyên mirovan nîşan dide. (Korkmaz, 2007, s. 403) Di cihên wisa de zêdetir têkiliya cih û lehang û bûyer tên dîtîn. Cih hem şikl dide lehang û bûyerê hem jî li gorî wan şikl digire.

Li gorî Korkmaz ji aliyê erkê ve Cihên Têgihî divê bi 2 beşan ve binirxînin.

1. Cihana ku tê labirentkirin an bi bi navekî din cihên girtî û teng

2. Cihên ku sinorên ku sinorên wan bêdawî ne bi navekî din cihên vekirî û fireh (Korkmaz, 2007, s. 403) Lê hin erkên din jî paşê werin nişandan.

7.2.1. Cihana ku Tê Labirentkirin

Li vê derê ji peyvên girtî û teng divê bi wateyeke fizikî wek mal, loşman, nexweşxane û hwd. divê neyê fehm kirin. Di têgihîştina cihên têgihî de ne derdora fizikî, derûnnasîya leheng û nêrînên wî/wê unsureke diyarker e. Cihên ku tên labîrentkirin yalitik û rehendek in. Leheng bi cih, dem û hêmanên derdor re heta bi xwe re jî di nav pêvçûyînê de ye. (Korkmaz, 2007, s. 403) Ji ber vê jî li gorî bûyerên ku vebêjer vedibêje, kartêkirina ku vebêjer dixwaze li ser xwîneran çêbike û rewşa kadroyên lehengan dikare were guhertin. (Aktaş, 1991, s. 147) Jiyangeh car caran bi awayekî lêz ji pêşîya me derbas dibe, wek dekorek zêde watedar nîne. Carinan jî li gorî hestên lehengan ve tên saz kirin.

Cihên ku lehengan girtî dike, wek girtigeh, hucre, timarxane, hem ji aliyê fizikî ve hem jî ji aliyê derûnnasî ve cihên girtî ne. Hin armancen cihên ku lehengan girtî dike hene. Michel Foucault dibêje ku 2 erkên girtîkirinê hene. Di rewşa kriza aborîyê de nehiştina serhildankirina kesên bereday û bêkaran û kontrolkirina girtîyên ku krîz derbas kirine û bi awayekî erzan bikaranîna wan in. Û dîsa Foucault dibêje ku girtîkirina mezin di gelên kapîtalîst de çêdibe û dinya timarxane ye (Atay, 2013, s. 46) Li gorî her du fikran em dikarin bêjin ku di cihana modern de mirov wek girtî ye. Mirovên modern bi bê dilê xwe jî heke li gorî cihana kapîtalîst tevbigere jî ev tevgerbûna mirovan em dikarin bêjin ku girtîbûn e. Di romanên modern yê dawî de ev girtîbûn zêdetir derdikeve pêşîya me. Leheng dixwaze xwe ji cihanê dûrbixe lê cihana kapîtalîst vê bernade û di hundirê xwe de wî/wê asê dike.

Gaston Bechelard di berhema xwe ya bi navê Poetikaya Uzamê de li ser gotina Baudelaire ku dibêje “ di serayê de ti koşe tune ye ku mirov tê da mahremîyata xwe bijî” dibêje ku mirov mîna rehetiya mala xwe li ti cihê hevpar de bi eynî şiklê mahremiyet xwe nikare bijî. (Korkmaz, 2007, s. 400) Di romanê de jî tevgerên lehengan li gorî cihê diguherin. Di mal de zêdetir xwe rehet hîs dikin. Wek li jor jî tê gotin di nav gel de li ser tevgerên xwe zêdetir bi dîqqet disekînin.

7.2.2. Cihên ku Sinorê Wan Bêdawî ne

Cihên vekirî û fireh cihên jidil in. Di wan cihan de leheng bi xwe re û bi derdora xwe re û bi gerdûnêre lihevhatî ne. Cihên vekirî û fireh cihên aheng û asûdetî ne. Lehengên vebêje xwe di wan cihan de ewle hîs dikin. Nasnameyên wan, hebûna wan û nirxên wan di bin parastinê de ne (Korkmaz, 2009, s. 411) Em ê li jêr di senifandina cihê de tenê bi girêdayî Korkmaz nemînin. Em ê bi kêrahî li ser mijarê bisekînin û ji bo mijar baş were fehmkirin ji çavkanîyên din jî sûd werbigirin.

Di berhemên wêjeyî de cih bi gelemperî wek cihên şênber û razber bi 2 perçeyan ve hatine senifandin. Li gorî senifandina Nurullah ÇETİN cihên vekirî û girtî di bin sernavê cihên şênber de (Çetin, 2004, s.136-137) cihên ûtopîk, fantastik, metafizik û sehekî jî di bin sernavê cihên razber de cih digirin. (Çetin, 2004, s.138-139) Me pênasayên cihê li jor kir lê divê were zanîn ku cihên vekirî û girtî jî dikarin di hundirê cihên razber de cih bigirin. Ji ber ku di cihên razber de jî cihên girtî û vekirî hene.

7.3. Cihên Şênber

Cihên şênber wek cihên fizîkî em dikarin qebûl bikin. “Cihên şênber cihên nêzî rastiye ne, lehengên romanê mîna jiyana rasteqîn tê da dijîn û her karê xwe tê da çareser dikin. Wek gerdûna me şênber in û cihên ku tên zanîn in. (Çetin, 2004, s.136) Em ê cihên şênber bi 5 beşan binirxînin.

7.3.1. Cihên Vekirî û Fireh

Cihên vekirî ji bo şer, koç û bûyerên fireh di hundirê xwe de dikare bihewîne zêdetir tên bikaranîn. Di romanên dîrokî de zêdetir ji bo vê tên bikaranîn. (Çeri, 2014, s. 34) Ji bo cihên vekirî wek cihên fireh û cihên derveyî jî tê gotin. Bûyer dibe ku carinan di kuçeyeke, kolaneyê, zeviyeke, behreke an parkeke de derbas bibe. Bi gelemperî di romanên sergüzeşt, avantûr û hwd. de derdikevin pêşiya me.

Di cihên fireh de bi gelemperî tevgerên lehengan derdikevin pêş. Ji ber ku bo tevgerên lehengan divê sinordakirina mekanê tunebe. Mirovên çalak xwediyê xisleteke çalak in. Mirovên çalak hebûna xwe di cihên vekirî de derdixin holê. Di cihên girtî de eciz dibin, ditirsin. Di cihên vekirî de di rihên wan de asûdetî çêdibin. (Çetin, 2004, s. 136) Di cihên fireh de di derheqê takekesî û derûnasiyên lehengan

de hin agahî dikare xwe nişane xwîneran bide. Ji ber vê teswîrên wiha li gorî rewşê di derheqê rewşa lehengan de wek amaje ne. Mînak kesên ekstrowert bi piranî di cihên fireh de cih digirin. Lewra mirovên wiha di cihên teng de ewqas ew ê nikaribin xwe îfade bikin. Dîsa mirovên wiha di cihên fireh de xwe ewletir hîs dikin. Di cihên girtî û teng de xwe dilnerihet, bêewle û xwe sinordar hîs dikin.

7.3.2. Cihên Girtî û Teng

Ji cihên girtî re wek cihên teng û cihên hundirî jî tên gotin. Apartman, xanî, menzel, bûro, girtigeh û hwd. cihên girtî ne. Di romanên derûnnasî de cih girtine. Ev kûrahî dide romanê. (Şengûl, 2010, s. 532) Di vebêjê de cihên girtî piranî ji bo diyarkirina derûnnasiya lehengan tên bikaranîn. Mînak lehengên ku piranî cihên girtî bi kar tînin em dikarin bêjin ku kesên hindirîn in, ji gel dût in û ji mirovan direvin. Di navbera cihên girtî û qerekerên lehengan de têkilî dikare were çêkirin. Hin mirov dibe ku ji tenêti û înzîvayê hez dikin, ev mirovên ne çalak in. Bawer dikin ew ê xwe di cihên girtî de nişan bidin. (Çetin, 2004, s. 137) Cihên teng û girtî tenê tengbûn û girtîbûna cihên fizîkî nişan nadin, her wiha tengbûn û girtîbûna derûnnasiya mirovan jî nişan didin. Cih çiqas ji aliyê fizîkî ve fireh be jî li ser derûnnasiya kesekî/ê bandoreke erênî çêneke û ew kes xwe li wir nebaş hîs bike û xwe ne ewle bibine ew der ji bo wê kesê cihekî girtî û teng dibe.

Carinan cihên girtî û vekirî diguhere. Sedema wê derûnnasiyên lehengan in. Minak ji bo kesên ku rêya xwe winda kiriye sehra, ji bo fermanbarekî ku têk çûye, meydana şerê ne cihên vekirîne, ji bo wan cihên ku tên gotin êdî girtî û teng in. (Korkmaz, 2007, s. 403) Cihên girtî di romanên de piranî guherînen civakî û aborî nişane me dide. Mînak qonax malbatên fireh û statû nişane me dide. Apartman jî bi gelemperî nişaneya tenêti û malbatên biçûk in. Cihên girtî ne tenê guherînen aborî û civakî di eynî demê de jî guhertînen hişmendî, hinbûnî, xwestekî û hwd. jî nişan didin.

7.3.3. Cihên Çandî

Cihên ku folklor tên ava kirin bo çandî pir girîng in. Ji cihên wisa re cihên çandî tên gotin. Di veguheza çandî de girîngiya hosta û cihên bi pêşketina bajar, teknoloji û kadibûnê de zêdetir tên fehm kirin. Cihên çandî çawa ku wek cihên dayîkbûn, mirin, zevî çandinê û hwd. tê zanîn jî her wiha mizgeft, tirbe, gorîstan, cihên cejnê, zozan,

jiyana gund û hwd jî tèn qebûl kirin. (Oğuz, 2007, s. 32) Cihên çandî di jiyana mirovan de cihên taybet in. Mirov di cihên wiha de kom dibin û têkiliyeke datînin. Cihên çandî cihên baweriyên hevpar in mirov di cihên wisa de hesteke dibinin û wateyên cuda didin wan.

7.3.4. Cihên Olî

Sazkirina bajarên olî, cihên olî, di hin rewşan de bi tiştên kozmik tèn hilperastin. Avabûna bajar an bi wateyeke din cihên olî sazûn û pêkhatina wê ya dîrokî, bi rûdana pirozî ve tèn têkildar kirin. Bi vê awayî bi wateya xwe ya klasîk, perestgeh, gorîgeh, îbadetxaneyên ku navenda bajarê saz dikin, her yekî bi rûdana xwe ya taybet tèn çêkirin. Cihên pîroz ku di vê demê de xwe bi sedemek nîşanê mirovan didin û ji aliyê mirovan ve tèn kifş kirin. Cihên pîroz ku ji aliyê mirovan ve tèn kifş kirin di hin rewşan de bajarên ku ji aliyê mirovan niha jî wek pîroz tèn qebûl kirin û cihên tirb, ziyaret, meqam û hwd. jî derdixin holê. (Yıldırım, 2014, s. 138) Cihên olî di romanên de gelemperî wek cihên îbadetî derdikevin meydana û li ser derûnnasiya lehengan bandorê çêdikin û hisên taybet bi wan didin çêkirin. Leheng pîranî ya ji bo îbadetî yan jî ji bo aramiya hundirîn diçin cihên olî. Bi gelemperî wek mizgeft, der, sinagog, tirb, goristan û hwd. di romanên de tèn bikaranîn.

7.3.5. Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin

Atmosfer usluba romanê, temaya romanê, hêmanên pişt romanê û derûnnasiyên lehengan derdixe meydana. (Balık, 2016, s. 123) Lê atmosfera fizîkî tenê ji bo sehnebûna bûyerê tèn ava kirin. Li ser leheng û bûyerê zêde bandorê çênakin. Têkiliya cihên ku atmosfera fizîkî nîşan didin bi bûyer û lehengê ve zêde ne xurt. Bûyer bi awayekî serbixwe didome û wate û hebûna cihên ku atmosfera fizîkî nîşan didin nayê fehmkirin. Di romanên de qelsîyek derdixin holê ji ber ku hebûna wan kêrê tiştêkî nayê tenê ji bo şayesandinê tèn bikaranîn. Şayesandinên bi vî şiklî jî zêdetir xwîner aciz dike ji ber ku tê erka wan nayên dîtin.

7.4. Cihên Razber

Di vegotinê de wek cihên şênber, cihên razber jî derdikevin pêşiya me. Ev tişt li gorî mijar, leheng û hwd. tê guhertin. Cihên razber di cihanê de cih nagirin, bi gelemperî cihên xeyalî ne. Cihên wiha di nav xwe de wek li jêr tèn senifandin.

7.4.1. Cihên Ûtopîk

Di zimanê Grekî de eutopia''cihê xweş û baş'' outipia jî tê wateya ''cihekî tune''. Peyva ûtopya jî ji wan herdu peyvan hatiye çêkirin û tê wateya cihên ku her awayî ve pir baş û rind û cihaneke îdeal. Di xeyalê de bi taybetî hatiye afirandin û cihê ku di cihana rasteqîn de cih nagire (Çetin, 2004, s. 138) Ji wan re welatên xewn, welatên hêvî jî tên gotin. Bi gelemperî di vebêjan de wek cihên rev tên bikaranîn. Lewra leheng dixwaze ji realiteya jiyana rasteqîn bireve here cihekî xweş û li wir kêfxweş bibe.

Qereker dizane cihekî wiha tune ye lê ev daxwazên wî/wê, jê ra rêyeke vedike û wî/wê dibê xeyala cihê. Cihên ûtopîk her çiqas di derdora fizîkî de tunebe û cihekî xeyalî be jî di vebêjê de li pêşiya xwînerê re wek parestgeha ruhî ya lehengê an carinan jî aramiya beden û rihê derdikevin.

7.4.2. Cihên Fantastik

Cihên fantastik piranî vebêjên ku têde hêmanên fantastik zêdetir cih digirin de tên xuya kirin. Cihên fantastik jî wek cihên ûtopîk dikarin werin îdealize kirin. Lewra cihên ku tên îdealize kirin daxwazên fantastik yê lehengan dikarin bi cih bikin di hundirê xwe de û leheng li vê derê dikarin xwe kêfxweş hîs bikin. Wek pênaseyên jî jor tê fehmkirin cihên fantastik mîna cihên ûtopîk dikarin werin xeyal kirin. Lê belê di cihekî de ji hevudu vediqetin. Cihên fantastik di cihên rasteqîn de dikarin derkevin pêşiya me. Lê belê di vebêjê de leheng wek şênber tê da cih nagirin. Tenê ji aliyê hişê ve hatine avakirin û di nav cihên razber de cih digirin.

7.4.3. Cihên Derî Sirûştî

Di vebêjan de cihên ku ji aliyên olî ve tên teqdîm kirin, cihên derî sirûştî ne. Ji cihên wek bihuşt û dogeh re cihên derî sirûştî tê gotin.(Çetin, 2004, s. 139) Ji ber ku di cihana rasteqîn de cih nagirin û ji aliyê olan ve tên gotin ji wan re derî sirûştî tên gotin. Bi gelemperî di vebêjên olî de derdikevin pêşiya me.

7.4.4. Cihên Sehekî

Cihên sehekî li gorî derûnnasiyên ku leheng tê da ne, tên afirandin. Cihên xewnî ne. Cihên ku li jor hatine qal kirin di vebêjê de hemû di mekaneke de cih nagirin. Cih

li gorî bûyeran ji hevudu vediqetin. Roland Bourneur û Real Quillet di berhemên xwe yên bi navê “Cihana Romanê û Lêkolîn” de dibêjin ku cihên hin çîrokan carinan wek ku di trajediyên klasik de tên ditîn ji bo bi cihekî re girêdayî bimînin, bi girêdayê lempeyekî ku cihê belavbûna wî zêde tune ye, dikarin cihekî an çend cihan de cih bibin an dikarin tenê di hişê nivîskar an di hundirê sinora muhayîlleya wî/wê de wek cihek bimîne.(Zambak, 2007, s. 7-8) Cihên sehekî li ser lehengan bandorê çêdikin û leheng li gorî wê derê hin fikr û ramanan der dixin. Carinan bîraninan tînin hişên xwe û cihên li sehekî bi wan hin tiştan didin hîs kirin.

BEŞA DUYEM

ROMANA KURDÎ Û BIKARANÎNA CIH DI ROMANA KURDÎ DE

Wek ku tê zanîn roman wek têgih xwe dispêre peyvên “ lingua romana” Latîni û “ ramanz” a Fransî. Wek wateyên îroyîn bikaranîna peyva roman xwe digihîne sedsala 17 û 18 an.(Tepebaşılı, 2012, s. 17) Romana yekem ku ji aliyê Cervantes ve bi navê Don Kîşot hatiye nivîsandin wek ku em dizanin ew jî di sedsala 17 an de ket nava gerdûna wêjeyî. Roman ew cure nivîse ku bi gelemperî serboriyên mirovan, têkilî û rewşa wan, bûyer û dîyardeyên civakî bi awayê ku nêzî rastiyê yan jî di nava baregehek sêwirî de û bi awayekî berfireh tê vegotin. Wek cûreyeke wêjeyê, pênase û watedayina wê ne ewqas hêsan e. Lewra roman jî wekî hemû cureyên wêjeyê, wate û raveya wê li gorî dem û rêbazên wêjeyî an jî hunermendên demê ve tê guhertin.

Armanca romanê, xisletan bide nasandin, hizran ragihîne, îfade bike û hêza fikran pêşkêşî, pêşiya xwendevanan bike. Romana xurt dikare xwe bi her awayî nîşan bide, bikeve her dirûvê, cihê her mêjiyê û ji her bedewiyê û her mezinahiyê re bibe navgîn. Dikare bang li civakê, rêveberiyê, felsefeyê, rastîbîniyê û tevahiyê gerdûnê bike û gelek deriyên nepenî yên gerdûnê li mirov veke. Ew tişteki veşartî nahêle û dîmena ku dibîne bi awayekî êşkere hildide dest. Tişteki ku di jiyana rastîn de hebe û nekare derbasî romanê bibe nîn e. Li Rojhilata Navîn dîroka romanê di dehsala dawîn a sedsala nozdemîn ve dest pê kiriye. Wisa ku edebiyata kurdî de roman nivîsandin li gor edebiyata gelên din dereng destpê kiriye. Helbet sedema vê ya bingehîn di encama bê welatîyê de derketiye holê. Lê dîsa jî kedkarên kurd her hewl dane û ji 1935an ve romanên dinivîsîn. Ji xwe em ji destpêkê bigrin heta niha, mijara romanên nivîskarên kurd jî di çarçoveya bêwelatî û şerên di kurdistanê de diqewimin şikl girtine.

1. PÊŞVEÇÛNA ROMANA KURDÎ

Roman destpêka xwe jî Ewropayê girt û ji wir bela bû hemû cîhanê. Hin welat an jî em bêjin gel ev cureya nû ya wejeyê zû derbasî wêjeya xwe kirin hin ji wan jî di

vê karê da hinek dereng man. Wek me li jor jî got romana yekem sedsala 17an da hat nivîsandin lê gelên wek Tirk û Faris û hwd. gelek dem şûnda dest avêtin vî karî. Romanên xwe yên yekem di sedala 19an da nivîsandin. Di destpêkê de em dibînin ku diroka wêjeya kurdî ji ber gelek astengiyan dereng dest pê kiriye. Romana kurdî jî, ji ber wan astengiyan di wêjeya kurdî de dereng cih girtiye. Zimanin wek Erebî, Farisî û Tirkî bi gelemperî li ser wêjeya kurdî, bi taybetî jî li ser romana kurdî serdestî kirine. *Di xebatên romanên kurdî de muameleyên cûda yên van dewletên serdest li hemberî kurdan jî divê were ber çavan. Ji çar parçeyê kurdistanê astengî û qedexeyan nedihîşt romana kurdî pêşde here. Rewşa pir taybet a kurdên li Yekîtiya Sovyetan a di dehsalên ewil ên piştî Şoreşa Cotmehê de û çalakîyên wan a ji aliyê dewletê dihate fînansekirin, rê li ber derçûna romana kurdî ya yekem vekir.* (Uzun, 2007, s. 60) Roman li gorî Tirk û Farisan hinek din jî derengtir kete nava wêjeya Kurdî. Roman di wêjeya kurdî da cara pêşî di sedsala 20 an da xwe nîşan da. Di nav kurdan da cara yekem roman ji aliyê Erebê Şemo ve bi navê Şivanê Kurmanca hat nivîsandin û Kurdan jî bi vê romanê di nav wêjeya cîhanî da ji xwe re cihek girt. *Erebê Şamilov (1897-1978), ku di nav kurdan de Erebê Şemo tê nasîn û ji Yekîtiya Sovyetan nivîskarê kurd ê herî navdar e wek “bavê romana kurdî” tê pejirandin.* (Kutlay, 1996, s. 58) Romana wî ya yekem, Şivanê kurmanca di 1935an de li Yerîwanê hatiye çapkirin. Piştî em dibînin ku ji bo romana kurdî pêngavên din tî avêtin, Eliyê Evdirrehman dest bi nivîsandina romanê dîke. *Eliyê Evdirrehman romana xwe ya yekem “Xate Xanim” di sala 1958an de li Yerevanê çap kiriye. Heta 1980ê tenê duzîneyek romanên kurdî hebûn û pîrraniya wan li Yekîtiya Sovyetê hatibûn çapkirin.* (Ahmedzade, 2011, s. 49) Heta 1980 ê di nava Kurdên Sovyetê de bi tenê pênc romannivîs peyda bûne navê wan jî ew in: *Erebê Şemo, Eliyê Evdirrehman, Heciyê Cindî, Miroyê Esed û Seîdê Îbo. Van nivîskaran bi giştî 12 roman nivîsîne û ev hemû roman jî li Ermenîstanê, li Êrewanê hatine çapkirin.* (Aydogan, 2014, s. 111)

Romanên Kurdên Sovyetê bêtir romanên ideolojîk bûn. Lehengên wan kesên îdeal bûn û başî û nebaşî li gora pîvanên bîr û baweriyên nivîskar dihatin diyarkirin. Herweha, di romanên Erebê Şemo de kesên ku ji bo bolşevîzmê dixebitîn baş bûn û feodal jî nebaş bûn. Ev taybetmendîya romana kurdî ya sovyetê di seranserê wêjeya kurdî ya sovyetê de heye. Lewre, wêje di bin çavdêriya Partîyê de dihat kirin û mecbûr bû ku bi kêrî sîstema komûnîst bihataya lê, di salên 1980an de romana kurdî

gavek pêş de avêt. Hokerên ku li ber geşbûna romana kurdî bûne asteng, çespondina siyasî, hokerên çandî û civakî û asta pêşketina civaka kurd dihewîne. Di salên 1960an de pêşketina netewperweriya kurd, bi taybetî li Kurdistana Iraqê, enerjî da pêşketina romana kurdî. Pêwendiya di navbera netewperiya kurd a çandî û siyasî di geşbûna romana kurdî de dîyarker e. *Tespûtkirina romana kurdî ya yekem bi vê nevé girêdayî ye ku mirov wêjeya ji aliyê kurdên perçeyên cûda yên kurdistanê hatiye hilberandin, çawa dinirxîne. Romana kurdî wek netewperweriya kurdan, reaksiyonek li dijî netew-dewletên nûava bû ku wan, kurdî tê de nasnameya xwe bi rêya çespondina nasnameyên redkirî ava dikirin. Di dehsalên dawî ên sedsala bîstemîn, him li kurdistanê him li diasporayê şahidiya zêdebûna hejmara romanên kurdî kirine.* (Çoban, 2007, s. 12) û romanên Kurdî bi demê re zêdetir dibin.

Vejiîna romana kurdî ya ku di salên 1980 yî di nava Kurdên Ewropayê de dest pê kiribû. Çar romannivîsên Kurd yên bakurî nas kirin û bi dorê Brîndar, Mahmud Baksî, Mehmet Uzun û Nacî Kutlay bû. Heger em her sê Kurdên sovyetê Xemgînê Temê, Wezîrê Eşo û Egîdê Xudo û her du Kurdên binxetê Bavê Nazê û Şahîne Bêkîrê Soreklî ku piştî sala 1980 yî dest pê kirine lê zêde bikin heta 1990î, 9 romannîsên nû derketine û hejmara romanên ku bi Kurmancî hatine çapkirin gihiştîye 27an (Aydogan, 2014, s. 113) û piştê 1990î romanên Kurdî çiqas çûye zêde bûye.

Ji warê wêjeya kurdî de yek ji zehmetiyên mezin, perçebûyîna wê ye. *Ji ber dabeşbûyîna civakên kurd û tunebûna yekîtiya siyasî û netewî, niha wêjeya kurdî wek ‘wêjeyek netewî’ ku jêderka wê netew dewletek kurd be, nikare bê binavkirin. Digel hestên netewî yên kurdan û beravajî bernameyên gelek tevgerên netewî yên kurd, şertên herêmi û jeopolitik, bûn sedema hilberînên wêjeyî yên curbicir û ji hev dûr. Ji ber vê, romanên kurdî bi kurdiyêke yekgirtî û standart nayên nivîsandin, lê kêmtirîn bi du zaravên sereke, kurmancî û soranî, bi du sîstemên ortografîk, yanê bi ortografiya li gor qaîdeyên alfabeya erebî û li gor alfabeya latînî, tên nivîsandin. Lewra divê lêkolînvan romanûsên kurd ne di nav peywendek hevpar û yekgirtî lê di nav peywendên cûda de binirxîne.* (Ahmedzade, 2011, s. 111) Bi vî şiklî lêkolînên ku li ser romanên Kurdî tên kirin zehmettir dibe. Lewra wek Ahmedzade jî tîne ziman hem tîpên cuda hem jî zaravayên cuda derdikevin pêşiya xebatkaran.

2. CIH Û ROMANA KURDÎ

Di vebêjan de şayesandin û bûyer divê hevudu tamam bikin. Şayesandin bi bûyerê re ne hevgirtî be, ew ê bûyerê xêra bike û têkiliya tevger û dialogan bê wate bike. Lewra di vebêjê de ti şayesandin ji tevgerê cuda nabe. Ti tevger jî bê şayesandin nikare tevbigere. Di derheqê vê mijarê de Henry James di pirtûka xwe ya bi navê ‘‘Hunera Çêkirî’’ de wiha dibêje; Ez nikarim bifikirim ku di pirtûkekê de beşên cuda cuda hebin. Lewra di pirtûkekê de şayesandina ku erka wê ya vebêjefî tunebe û an dialogueke ku armanca wê ya şayesandinê tunebe an fikreke ku nayê tevger kirin jî nikarim bifikirim. (Todorov, 2001, s. 40) Roman jî mîna organîzmayên din tim zindî ye û dijî. Divê were zanîn ku roman bi girêdabûna perçeyên xwe ew ê jiyana bidomîne. Henry James li vê derê bi kurtasî dibêje ku vegotin, dialog û şayesandin ji hevudu cuda nabin. Ji bo berhem hevgirtî be divê têkiliyên wan hebe. Bo têkiliyeke xurt jî divê şayesandina cih di romanê de bi awayekî zanebûn were bi cih kirin. Di romanên Kurdî de cih di destpêkê de gelemperî ji bo nîşandana atmosfera fizîkî dihat bikaranîn. Ji ber ku romana kurdî ku li jor jî hat qal kirin ji romana Erebê Şemo ya bi navê Şivana Kurmanca destpê dike heke were nirxandin ew ê were dîtin ku romanên pêşî piranî bi daxwaza peyamdayîn û qalkirina bûyeran hatine saz kirin. Ji vê xwestekê romannivîsên pêşî zêdetir girîngî dane peyaman û rasterast xwestine qala bûyerê bikin. Romanên pêşî ya Kurdan gelemperî romanên bûyerî ne ji ber vê jî di romanên pêşî de cih bi awayekî xwedî bandor dernakevin pêşiya me. Lê bi demê re ew tişt tê guhertin şayesandin bi awayekî xurt tê kirin û girîngî tê dayîn ji şayesandina lehengan û cihan. Wek ku Heidegger dibêje bicihbûn hebûna bingehîn e ji bo mirovan’’ ...Heyberekî ku ew ê serpêhatiyek bijî divê di romanê de li ser zemîneke were bicih kirin’’ (Ergiydiren, 2001, s. 19) bi wan hûrgiliyan heke bicihkirin neyê çêkirin ew tenê ‘‘ amajê’’ ye. (Zambak, 2007, s. 12) Amajeyan ne ji bo erkekî, tenê ji bo nişandayinê tên bikaranîn. Di romana kurdî de jî di destpêkê de cih bi piranî wek amajê hatine bikaranîn lê dû re ew tişt guheriye. Di romanên diasporayê de cih ne bi sedî sed be jî bi xwesteka xwedî bandor hatine saz kirin. Lê dema ku romanên diasporayê werin xwendin ew ê were dîtin ku ew şayesandin her tim wisa xurt nehatiye kirin carinan nivîskar cih tenê ji bo nîşandana atmosfera fizîkî bikaranîne.

Amajeyên ku li ser qerektêrek hestekî çêdike, ji me re ji demê û cihê hin agahiyan jî nişan dide. Mînak “Bond di mijûlgeheke de dixebite. Di paceyên mijûlgehê de ewr mîna bazdarê bi lez derbas dibin û di nav wan de hîv xuya dibe.” Li vir şeveke havîna bi bahoz tê nişandan. Li vê derê rêyekî tê çêkirin. Ji bo bûyereki giran û nayê zanîn. (Zambak, 2007, s. 12-13) Di romana “Kela Dimdimê” ya Erebe Şemo de, Kurd di hundirê Kela Dimdim de bi awayekî aram dijîn lê Şaxê Îranê Şax Ebbas leşkerên xwe dişine li ser wan. Kurd bi serokatiya Xanoyê Çengzêrîn xwe diparêzin lê di dawî de têk diçin. Kela Dimdimê xera dibe. (Pariltı ve Galip, 2010, s. 32) Romana Kela Dimdimê ji çîrokeke Kurdan sûd wergirtiye. Bûyerek dîrokî ye. Kela Dimdimê pêşî ji ber erka xwe pêşî wek cihekî vekirî û fireh tê vegotin lewra Kurd xwe li hundirê kelê de ewle hîs dikin. Roman jî jixwe li ser vê Kelê hatiye nivîsandin.

Di romana “Xatê Xanim” a Eliyê Evdîrehman de nivîskar bi şayesandîna herêma Dêrsîmê dest bi romanê dike. Bi zimanekî wêjeyî giringiya erdnigariya Dêrsîmê dike. Paşê nivîskar bi qalkirina civakî û dîrokiya heremê giringiya Dêrsîmê tîne ziman. Di cihê kut ê vegotin de 138 eşîr dijîn. (Pariltı ve Galip, 2010, s. 39) Di romana Xatê Xanim de tê dîtin ku nivîskar di destpêka romanê de pêşî şayesandîna cihê dike. Paşê derbasî bûyerê dibe. Jixwe roman romaneke bûyerî ye lê dîsa jî cih di hin cihan de belkî ne ewqas xurt be jî xwe nişan dide.

Di romana “Jana Gelya” ya İbrahim Ehmed de sê heyam zêdetir tîne dîtin. Rewşa welatê ya pêşîya ku ketina girtigehê, rewşa girtigehê, rewşa welatê ya pişte derketina girtigehê. (Pariltı ve Galip, 2010, s. 36) Leheng pişte ku ji girtigehê derdikeve jiyaneke cuda dibîne. Jiyan guherîye û biyanî bûye. Pişte ku ji girtigehê derdikeve rewşa welatê xwe dibîne. Di nav rewşeke ne baş de ye welatê lehengê. Hem gel hem jî mirov guherîne. Roman li ser vê guhertina atmosferê dimeşe û guhertina cih û mirovan bi demê re xwe di vê romanê de xwe nişan dide.

“Gundikê Dono” ya Mahmut Baksî de ku di sala 1988 an de hatiye nivîsandin bi awayekî realist qala çîroka gûndekî ku çiqas diçe biçûk dibe tê kirin. Jiyan gundiyan ku tîkiliyên hişk yê feodalîzm û kapîtalîzmê ku li ser wan bandorê çêdike tê vegotin. (Pariltı ve Galip, 2010, s. 48) Di romanê de ji bilî evîna Aso û Bedo zilma axayek bi navê Hacı Zorav tê dîtin. Bi xurtbûna axatî feqîrbûyîna gundiyan di

romanê de dîtin. Di romanê de atmosfera cihê bi bûyera evînê re bi vî şiklî tê vegotin.

Di romana ‘‘Sorê Gulê’’ ya Süleyman Demir li ser evîneke trajik disekîne. Roman bi payîza Swedê ya ya ku heybeta xwe dide hîs kirin destpêdike. Li vir divê tesbîtek were kirin. Nivîskarên Kurd ên ku li Swedê dijîn, dibe ku ji tesîrkerbûna payîza wê derê be, romanên xwe bi payîzê didin destpêkirin. Minak Süleyman Demir, Fırat Ceweri, Mustafa Aydoğan romanên xwe bi payîzê didin destpêkirin. (Parlîti ve Galip, 2010, s. 78) Bandora cih çawa ku xwe di romana de tê dîtin bi eynî şiklê jî li ser nivîskaran jî bandorê çêdike û romannivîs dema ku romanên xwe dinivîsin di bin bandora cihê de dimînin. Romana ‘‘ Sorê Gulê’’ de peşî şayesandina xwezayê tê dîtin paşê jî di romanê kesera welatê xwe nişan dide. Leheng bêriya welatê xwe dike. Di navbera welat û leheng de têkiliyek tê dîtin. Cih li ser lehengê bandorê çêdike.

Labîrenta Cinan ya Hesenê Metê ku romana wî ya yekem e. Bi navê Kevanot mamosteyek ji bo gundiyan biguherîne û wan serwext bike diçe gundekî. Lê li vê gundê bûyerên ku bisir û raz çêdibin, mamosteyê diguherîne. (Parlîti ve Galip, 2010, s. 84) Carinan mirov derdora xwe diguherîne carinan jî derdor mirovan digehurîne, di vê romanê de jî cih li ser lehengê bandorê çêdike û leheng tamamî di bin bandora cih de dimîne û tê guhertin.

Mustafa Aydoğan ku bi navê ‘‘ Pêlên Bêrîkirinê’’ romaneke wî heye, di romanê de kesera welatê ya pênbarekî vedibêje. Di romanê de leheng bi derbeya leşkeriyê neçar dimîne ku dibistanê berbide. Piştê ji ber hin tiştên polîtîk dikeve girtigehê, paşê jî neçar dimîne ji welatê xwe bireve û biçê Swedê. (Parlîti ve Galip, 2010, s. 94) Di vê romanê de jî kesera welatê tê dîtin û nivîskar jî ji ber ku li Swedê dijî di bin vê bandorê de romanê xwe dinivîse.

Di romanên dawî de girîngiya têkiliya cih dem, leheng û bûyer zêdetir hatiye fehm kirin û romannivîs xwestine amajên xurt biafirinin. Bo mînak di romana Mehmet Uzun ya bi navê Bîra Qederê de têkiliya lehengê ku navê wî Celadet bi bîrê re ew xurtbûnê nîşanê me dide. Di navbera leheng û cih an jî objeyê de têkiliyeke xurt bi zanebûn hatiye saz kirin. Ew têkîlî di romanên nû ya romanên Kurdî de zêdetir tîr çêkirin. Romanên nûjen de romannivîs zêdetir girîngiya şayesandinê fehm kirine. Wek minak di romana Bextiyar Elî ya bi navê Qesra Balindeyên Xemgîn de

ew t kiliya cih   lehengan bi v   ikl  derdikeve p  iya me. Romanniv s dema ku lehengan dide nas n wan bi derdora wan ve dixwaze n  an  xw neran bi de bi v   ikl  leheng ew   ba tir werin nasandin. Sewsen F kret, wek ke eke ciwan, b y  ku   be derek  wir dizane, dinyay  ji kit ban dinase. Hem  jiyana xwe li kit bxaneyaya bav  xwe derbas dike. Mens r Esr n, xwendekarek  g nc   zanko, xortek  romantik. Kameran  Selma, k rk sek  j r, xortek   avsor. Xalid Am n, ji e  rek mezin, tolazek  dewlemend e. Dema ku  ayesandina lehengan were n r n ew   were d tin ku her yek  di bin atmosfera cih  ku li dij n hatine  ayesandin. Sewsen yek  xwende ye bi pirt kan dixwaze cihan  binase ji ber v  tim li pirt kxaney  de ye. Mens r ji ber ku di e zan ng h  xortek  entellekt el   romantik derdikeve p  iya me. Kam ran ji ber feq rt    x zan  y  b ye k rke . Xalid j  ji ber dewlemend  b ye tolaz. Hem  bi atmosfera xwe  ikl girtine. Heke mijara roman  were n r n ew   z detir t kiliya cih   b yer derbikave p  iya me di roman  de Mens r, Kameran   Xalid, her s  j  a iq  Sewsen in. L  ji bo zewac  ji her s yan re j   ertek  w  heye: gerek e bi in, 8 salan li dinyay  bigerin, teyr   balindey n ku k m t n d tin bib nin   b nin. Ew  daw  qerara xwe bide, ji her s yan yek  hilibij re   p  re bizewice. Her s  a iq j  soza xwe t nin cih, her yek bi sedan balindey n reng n   nenas re vedigere. Sewsen F kret, hem  balindeyan li malek  kom dike, nav  mala w  dibe; Qesra Balindey n  n. Ev qesr nav  xwe dide roman  j . Di nasandina lehengan de bandora cih  hatib  ni andan. Cih  ikl dida lehengan li dema ku bi gelemper  li roman  were n r n ew were d tin ku leheng j  bandor li ser cih   dikin.   cih li gor  xwe saz dikin. Ji wan m nakan were fehm kirin ku cih tim bi b yer leheng   dem  re t kildar e. Di romana ‘‘Ev n    ewat’’ ya Sidq  Hiror  de roman li ser  er n pol tik y n welatek  bindest disek ne. Bi nasnamey n per eb y  re mirov n gelek  di navbera du agiran de dim nin. (Parilti ve Galip, 2010, s. 68) Bi gelemper  di roman n Kurd  wek minak n jor pirsgirek n welat dert n p  i. Romanniv s di roman  de bo mijar  welat  xwe bi kar t nin.

Di romana Kurd  ya n jen de ev t kil  z detir derdikevin p  iya me    iqas di e  ayesandina cih giringtir t n d tin. T kliya navbera leheng, b yer, dem   cih bi zaneb n t n saz kirin. Bandora wan ya li ser hevdu nay n jib r kirin. Li j r roman n Kurd  ku hatine hilibjartin bi h rgil  werin nirxandin   bikaran na cih wein ni andan.

3. CIH DI ROMANÊN QAFQASYAYÊ DE

3.1. Şivanê Kurmanca ³

Roman romaneke otobiyografîk e. Romannivîs li ser jiyana xwe dinivîsîne. Bûyera romanê bi vî şiklî dimeşe. Şemo gundiyeke bê erd e. Di gundeki nêzî tixûbê Tirkîyeyê dijî. Piştê mirina jina xwe bi zarokên xwe re koç dîke. Paşê diçe li gundekî din dizevece û hin zarokên wî yê din jî çêdibin. Kurê wî Erebe Şemo mezin dibe û alikariya wî dîke. Erebe Şemo diçe ber pezên gundiyan. Rojekê, gurek erîşî pezan dîke û yek ji wan dixwe. Erebe Şemo dema ku diçe gund xwediyê pez dîkeve sere wî û têra xwe lêdixe.

Erebe Şemo diçe xulamtiya hin malan dîke û bi vî şiklî îdare xwe û malbata xwe dîke. Paşê li ber seydayekî fêrî xwendinê dibe. Rojekê li mala mamosteya xwe xwarinê dixwe li vir cara yekem kevçî û çetel dibîne û wek diyariyek fehm dîke û bi xwe re dibe. Pişt re bi diziyê tê tawanbarkirin. Paşê li dibistanekî de dest bi xebatê dîke. Li vir xwendina xwe pêş dixe.

Erebe Şemo fêrî gelek zimanan dibe û xwendina xwe pêş dixe. Paşê tevli leşkeran dibe û bi leşkeran re digere. Paşê diçe Sariqamişê û li wir tevli Bolşevîkan dibe. Li bajêr gelek mirovan nas dîke û ji wan gelek tişt hîn dibe. Pirtûkan dixwîne û êdî xwe wek komînîstek dibîne. Paşê dibe endamê Partiyên Komîstan. Dixwaze gundiyan hişyar bike, xirabiya axa, şêx û began nîşanê gundiyan bide. Rojekê vedigere Rewanê dixwaze xwe bigihîne malbata xwe lê dema ku diçe dibîne ku dê û bavê wî mirine.

³ Erebe Şemo

Erebe Şemo di sala 1897an de li Sûsîzê ya Qersê dayîk dibe. Di sala 1916an de xeta trenê de dibe karker. Li wir bi Bolşevîkan re têkilî datîne û bi wan re ji bo şoreşa Sovyetê. Ji ber tevgerên xwe demeke tê girtin. Piştê derketinê tevli artêşa sor dibe. Bi awayekî baş zimanên wek Ermenî, Tirkî, Rusî û Ingilîzî dizane. Piştê şer d'îdi sala 1920an de li Moskovayê dest bi zanîngê dîke. Di sala 1929an de bi tîpên latînî alfabeyê Kurdî çêdîke. Di sala 1930an de ji bo rojnamaya Rêya Teze dixebite. Di sala 1935an de romana Kurdî ya yekem bi navê Şivanê Kurmanca ji aliyê wî tê nivîsin. Di sala 1978an de dimire. (Parlîti ve Galip, 2010: 29)

3.1.1. Cih di Romana Şivanê Kurmanca de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Gundê Lehengî, Gundê azad
Cihên Girtî û Teng	+	Bajar, Qers
Cihên Çandî	+	Cihên Koçeran,
Cihên Olî	-	
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nişan Didin	+	Gundê Komesor, Gundê Kurmanca, Zozan, Qers, Tilbîs
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	-	
Cihên Fantastîk	-	
Cihên Derî Sirûştî	-	
Cihên Sehekî	+	Gundê Alêksandrovskê, Zozan, Di meha Avrêlê de derdor, Dersxane

3.1.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Gund cihekî vekirî/derveyî ye lê di çîrokên wêjeyî de wek maleke pir mezin yanî wek cihekî hundirîn tên nişandan. Di vê mijarî de hevgirtin û yekbûyîna wan roleke mezin dilîze. Gund ji ber ku hem madî, hem jî arişî cihekî homojen e, wek cihekî hevgirtî tê qebûl kirin.(Kanoğlu, 2017, s. 127) Romannivîs gelek cihan de bi awayekî ne rasterast firehbûna gundan tîne ziman lê li hevoka li jêr bi rasterast firehbûna cihê tîne ziman:

Gund ji şêher çêtire. Çolê çîqa dixazî bibez, têke gazî, bistre, bilîz, kê li te binêre, kê te pêpeske! (r.40)

Malbata Erebê Şemo ji bo kar peyda bikin gund bi gund geriyane. Şemo dema ku navê van gundan dide zêde ser wan nasekine. Xwendevan nizane gundekî darûber e yan hişk e. Avahîsaziya gund çawa ye? Di muxayyîleya leheng de gund çawa xwe dide der? Bersiva van pirsan kê e. Xwendevan jî zane di romanê de wekî cih gund dibore. Lê ev gund xwedî nasnameyek barbiçav nîne.(Yılmaz, 2015, s. 83) Azatbûna gund wê fireh û vekirî dike lê wek li jor jî hat gotin di derheqê gund de tişteke din nayê gotin. Wekî mînak wiha qala gundê Azatê tê kirin:

“Em hatne kêleka gundekî. Ew gund Azat bû. Merekeke tek li kêleka gund hebû. Me xwe li wê merekê girt, çûn, ketne merekê.” (r. 54.)

Di romanê de cihên vekirî wek li jor jî tê dîtîn zêde dernayên pêşiya me. Tenê bi çend beşan de cihên vekirî hatiye bikaranîn. Di derheqê cihên vekirî de jî zêde agahî nayê dayîn wek li jor jî tê dîtîn gundeke azad heye lê derheqê azadbûna gund de agahî tune ye:

3.1.1.2. Cihên Girtî û Teng

Romannivîs du cihan berawird dike û çêtirbûyîna gund ji bajêr dixwaze vebibêje. Bajar li gorî teorîyên ku me li jor qal kir li gorî gund cihê fireh e. Lê leheng ji ber ku gundî ye bajar ji re teng tê. Kolanên wî rêyên wî û her awayî. Romannivîs li vir jî ji bo romanê tişteke xweş derxistiye meydanê. Leheng ji ber ku gundî ye û bi ser de jî şivan e hinî cihên fireh bûye û dema ku diçe bajêr jê re xerîb tê. Û tengbûna mekanê hestên wî jî teng dike:

Ezî vegerandinêra şa bûm, çimku, şeber ji gund xirabtire. Lê vira meriv nikare derkeve, aza wxwera bigere. Ringe-ringa ereba, faytona û maşenîya serê meriv dibir. Ji wê şûnda meriv nikarbû lingekî aza xwera bîçûya, te dinêrî – hindik dima- pêpesî te kin, te têne nav dest-pê hespa yan bavejne bin maşenîyê, bikujin. Lê şeberli, qe xema wan nînbû, wexta dibû girmînîya maşîna, dihatin, min tirê, eynî dajone ser min ewana gelle cara qe ji piş xweva jî nedinêrîn. Ew merîyêd heyatê kum in dinêrîn, çewa meriv tevakî çolê bigre, bîne qe kesekî nedîtibe lê binerin, ussa jî teva li min dinêrin! Na! Gund ji şeber çêtire. Çolê çîqa dixazî bibez, têke gazî, bistre, bilîz, kê li te binêre, kê te pêpeske! (r.39-40)

Bajar li hemberî sirûştê cihekî, cihekî wek nebaş hatine dîtîn. Cihê mirovan di rastî de ne bajar in. Cihê wan xweza ye. (Kanoğlu, 2017, s. 105) Li jêr qala bajarekî dike em dizanin bajar jî gund mezintir in lê kuçeyên bajar rêyên qelebalixa wî li ser lehengê ji mezinbûnê zêdetir acîzîyek çêdike. Lewra leheng ji zêdebûna mirov û erebeyan bi rihetî nikare di rêyan de bimeşe ji ber vê jî wek cihekî teng derdikeve pêşiya me:

Qers hatiye avakirinê ber çîyakî mezin, serê çîyê keleke mezin ji zinara hatiye çêkirinê. Qers ketîye bin bandûra Êrisetê pey şerê 1877-1878 salê. Çewa kum ezin salixa didin, wextê qers hate standinê, sereskerîyê eskerî şêr. Lorîs Mêlikov, dikir.

Çarniqalî Qersê çîyanê, serê wan çîya hatne avakirin gelle tabîyê esker. Ew çend sal bûn, min şeher nedîtîbû, ez ecêmay dimam ji muxluqetê wê, hatin-çûyna wê. Meriv nikarbû hêsa kûçêda biçûya ji dest faîtona, firguna, ereba û îsanet. Berê jî, wextê eme nêzîkî şeher bûn, ez carekê duda hatme, idî qe nehatmê, çimku eme ro heta êvarê bi çolê bûn, ber dewarê xelqê bûn. (r.76)

Cihên girtî li gorî cihên vekirî zêdetir hatiye bikaranîn û şayesandina cihê girtî xurttir hatiye kirin. Qers ji gund mestir e lê ji ber rewşa xwe ji lehengê re teng tê. Romannivîs bi zanebûn, têkiliya derûnnasîya lehengê û cihê di cihên girtî de bikaraaniye.

3.1.1.3. Cihên Çandî

Cih hem derûnnasên mirovan hem jî çanda wan nîşan dide. Ji ber vê, ji bo di fehmkirina derûnnasî û civakî de roleke mezin dilîze. Mirov di cihekî de nasnameya xwe jî derdixe holê. (Balîk, 2016, s. 124) Leheng rojên ku li ser vê bandorê çêdike jî tîne ziman û bi saya vê jî em di derheqê civak û jiyana wan de agahdar dibin. Romannivîs li ji çanda wê demê hin agahîyan dide me:

Îsal çend sale derbaz bûn, min ew roja ezîze nava kurmancê koçerda dît, hetta niha hila hê bîra min ne çûye. Ew ken, ew şabûna cahila, kilam û listka wana, kincêd xorta: oyme, arxaliz, bîşmêt û çêrkezî bûn, kolosêd serê wan tijî şar-şimaqî bûn, rîşêd şar- şimaqîya dihat, dikete ser çavê xorta. Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandibûn: dêre, xirxal, enterîyê rind û teterîyê ezurmê. Qîz û bûka serê xwe jî xemilandibûn kofi- kitan, fînoyê qotikkirî, serê fîno û kofîyê wan tijî dirav bûn, bercênîk, morî-mircanê stuyê wanda meriv heyran hijmekar bû lê binihêrîya. Xorta simêlê xwe ba dabûn, qîza jî çavê xwe kil dabû, meriv tire dawetê teze ji hev berdaye. Qîz û xortê dilketî ber hevra derbaz dibûn, çev dikirne hevdu, kêleka hevda diçûn, xwe ber hevra davîtin diçûn.... (r.57)

Çanda wê demê bi paragrafeke dirêj derdikeve pêşîya me. Romannivîs dixwaze di derheqê çandê de agahiyên kûr bide lê ev tişt tenê di cihekê de tê dîtin.

3.1.1.4. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Berê romannivîs di destpêkê de derdorê bi awayekî fireh teswîr dikirin. Lê belê paşê qet venedigerîyan li ser derdorê. Di destpêkê de derdor gelek bi hûrgilî diharin

şayesandin, lê paşê çiqas jî hewce be qet qala derdorê nedikirin. (Karaca, 2016, s. 76) Di vê romanê de jî ev tişt tê dîtin. Romannivîs dixwaze di derheqê gundekî de xwîner agahdar bike. Nêzîkî 2 rûpelan di derheqê gundê de agahîyan dide. Di agahîdayînê de romannivîs ji ber ku leheng şivantî dike bi çavê wî gund teswîr dike ew jî ji bo romanê gelek baş e. Em ji fehm dikin ku romannivîs cihê li gorî çavê lehengê ji me ra vedibêje. Leheng û mekanê nêzî hevudu dike. Em dizanin ku ew romaneke otobiyografîk e. Romannivîs qala jiyana xwe dike lê heke haya me ji vê meseleye tunebûna jî ew nêzîkkirina leheng û mekanê di hişê me de wek bûyereke rast cih bigirta:

Ew gundê ku em çûnê, navê wî gundî hê berê wexta Romê da, jêra digotin Komesor, lê teze hatîyêd Ūrisa, melegena navê wî gundî danîbûne Alêksandrovska, bi navê padşê hatibû avakirinê ew gundê teze. Ew gund ji şehere Qersê hevt kîlometrê dûr bû. Lê çî cîkî zaf kaw hatibû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî welatîda îdî çem ji wî çemî mezintir tunne bûn. Dora çem hetta çav-çava dibirî, mêrg –çîmanê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz xwera bixemilînin – usssa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdatir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; cîna jî cewêd avê, nav sînorê wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava cewa tev dibiriqîn, te tire-zozanêd Eledaxêne xemilîne. Piş malava jî bostanêd rinde çêkirî bûn. li wan bostanada melegana diçand: kartol, kelem, gizêr, silq û pincarê bostanayî mayîn. Biharê wexta şînkayî bor dibû, gundê Aleksandrovska kulîlkada, mêrgçîmanada, bostana da ussa dixemilî – meriv heyran hijmekar bû lê binihêra, ji dest bîn- bixza kulîlka, ew deşt tev te tire baxê sêvane bîn jê tê... (r.20-21)

Romannivîs têkîlîya mirovan û mekanaan dixwaze nîşanî me bide. Cih li ser jiyana mirovan xwedî bandor e. Gel li gorî cihê jiyana xwe didirûvîne. Di deştê de pîranî çandin pêş dikeve lê di cihên çiyayî jî zêdetir zandarî pêş dikeve. Romannivîs qala gundê kurmancan dike û di derheqê jiyana û aborîya wan de agahîyan bide lê pêşî sedema jîna wan vedibêje:

Jîyîna gundê kurmanca herekî dinê bû. Merîyê melegan çewa min serîda got, gişke ekîncî bûn. lê kurmanca gişke koçerin, dêwêr xwey dikin, gundê wan du pa li çîyadanin. Raste, herke hinek kurmanca ekin diçînin. Lê dîsa ekine wan ji dêwêr hindiktire. Rastî jî nava milletêd wandera kese notlanî kurmanca, -mêl, dêwêr xweyke tunne, îlam xweykirina pêz.

Kurmanc nava çîya danin, li wan çîya heye çêrê rind. Li wan sera, diçêrin û kok dibin kerî-sûrîyê wan. Zivistanê çîyayê wan berfeke kûr lêdikeve, lê gava ku bihar tê, berf dihele, şînayî şîn dibe, wan dera cûre-cûre pincar kulîlk, ormex û tiştê mayîn lê şîn dibe. Li zozana hewa hênkaye, waqa ne germe, çewa li deşta. Loma jî şînkaya wêderê zû hişk nabe. Hine şînayî unda dibin, dewsa wan hineke dinê şîndibin. Kulîlk jî ussa ber hev têne guhastinê. Dewar sibê hetta êvarê diçêre, ji hênkayê û çêrê xweş kok dibe. Vira germe, mîna deşta, mêş mor heywên qenaêşîne, çim ku li wan zozana hene reşêle, - bi hezara nava dêwêr û pez digerin, ser pişta wan datînin û mêş-mora qir dikin. Alîkî jî hênkaye, mêş-mor, moz vira teyax nadin, sur wan qir dike... (r.53-54)

Di teswîrkirina zozanan de romannivîs xwe xwe naêşîne. Em dizanin ku leheng şivan e û zozan divê li ser vê tesîrekî cuda çêbike û bi awayekî berfireh ji me ra kala zozana bike lê romannivîs xwe ewqas di bûyerê de winda dike ku bi çend hevokan li ser zozanan ji me re agahî dide lê em baş têngahişin girîngbûna vê cihê çî ye li ser derûnnasîya lehengê. Ji ber vê hî wek zozan tenê nîşaneyê atmosferî derdikeve pêşîya me:

Li zozana hewa pir xweş bû. Li wan zozana hebûn cûre-cûre pincar, û tevayê çolê. Me şivana cara xwera nêçîr fikir, kewrîşk dikuştin, telle dadanîn, wekî kewrîşk saxe-sax têkevnê. Çem û kanîyê zozana zaf bûn. wan çemada hebûn masîyê ‘ale-baliz’. Zarêd bega û dewletîya sibê hetta êvarê vala bûn, dihatne ser wan çema, diketne avê, masî digirtin, pincar diçînin, bindarûk digirtin, dilîstin. (r.60)

Erebê Şemo dema ku yekem car bajarekî dibîne wekî paragrafa jêrîn pêşkêşî xwendevan dike. Tê dîtîn ku Şemo bi awayekî kurt li ser şayesandina bajarê Qersê sekiniye. Ne wekî kesekî ku nav bajar bisekine û hûrehûr dirûv û taybetiyên bajar vebêje, belkî wekî kesekî ku ji dûr ve li bajêr binêre û derbarê wî de çend tiştan bibêje. Ev yek jî pêşîya xwendevan digire ku ruhê bajêr fêhm bike. Xuyaye, Şemo ji nêz ve bajar raçav kiribe jî wî hewl nedaye vî cihî raxîne ber çavên xwendevan. (Yılmaz, 2015, s. 82) Roman wek me li jor jî anî ziman otobiyografîk e. Romannivîs qala jiyana xwe dike. Ji ber vê jî di teswîra cihê de zêde agahiyên taybet nikare bide. Ji ber ku gelek sal li ser derbas bûye û tişteke normal e ku her tişt nete bîra nivîskar:

“Qers hatiye avakirinê ber çiyayekî mezin, serê çiyê keleke mezin ji zinara hatîye çêkirinê... Çarniqalî Qersê çiyane, serê wan çîya hatne avakirin gelle tabîyê esker.

Ew çend sal bûn, min şêher nedîtîbû, ez ecêbmay dimam ji muxluqetê wê, hatin-çûyna wê. Meriv nikarbû hêsa kuçêda biçûya ji dest faîtona, firguna, eraba û îsanet.” (r.118)

Sînorên cihên ku navê wan di Şivanê Kurmanca de diborin, sînoreke fireh e. Di nav vî sînorî de bakurê Kurdistanê, Kavkas û Rûsya cih digirin. Çawa ku xuyaye erdnîgariyeke pir fireh e. Romannûs dema ku romana xwe diafirînin hewl didin ku seha cih jî di berhema wan de cih bigire. Ligel vê, hinekan jî karîne ku di berhema xwe de hesta şimûlê jî bi cih bikin. Li gorî Forster, girîngtirîn xîm a hunera Tolstoy ew e ku wî kariye hesta şimûlê ya cih di berhemên xwe de bi cih bike. Gava ku mirov bala xwe dide Şivanê Kurmanca em wê hesta şimûl a cih baş hîs nakin. Her çiqas sînorên cihê romanê fireh bibe jî Şemo di ser wan re serobero boriye. Dirûv û ruhê cih tam nezêlal e. Hew te dît di romanê de cih xwe dide der û hêj geş nebûyî ji holê radibe. (Yılmaz, 2015, s. 85) Leheng demeke li Tilbisê dijî. Heta navnîşana cihê xwe jî dibêje lê dema ku were dîtîn di derheqê Tilbisê de ti agahî nayê dayîn:

“Bilêta xwe min stand hetat Tilbisê. Şêherê Tilbisê min nas dikir. Berê ez du sala li şêherê Tilbisê, kûça Anastasîyêvskê No 11, mala gênêral Vasîlîyêv bibûme dvornîk. Maşênîyêda du, sê ûris bûne nasê min. Evana jî ber bi malê xwe diçûn. Ewana ji Stavropolê bûn, gundê wan nêzîkê wî şêherî bû...” (r.160)

Di romanê de cihên atmosfera fîzîkî nişan didin gelek caran tên dîtîn lê têkiliya wan ya bûyerî zêde tune ye. Wek mînak jor jî tê dîtîn tenê wek “Tilbîs, Anastasîyêvsk, Stavropolê” wek nav derbas dibin.

3.1.1.5. Cihên Sehekî

Dema ku mirov bi giştî bala xwe dide romana Şivanê Kurmanca em bi vî awayî bi teferrûatî şayesandin kêmin. Lê di vê paragrafa dirêj de jî xuyaye Şemo gundê Alêksandrovsê li gorî cihên di berfirehtir teswîr kiriye. (Yılmaz, 2015, s. 84) Gundê Alêksandrovsê li ser lehengê bandoreke xweş çî dike. Leheng di bin bandora gundê Alêksandrova de gelek tiştan hîs dike. Ji ber vê jî gund ji bo lehengê dibe wek cihekî sehekî:

Ew gund ji şêherê Qersê heft kîlometra dûr bû. Lê çî çîkî zaf kaw hatibû avakirinê, ser çemê Qerseçayê, wî welatîda idî çem ji wî çemî mezintir tune bû. Dora çem, hetta çav-çava dibîrî, mêrg-çîmenê wan bûn, notla xalîçeke xemilandî, qîz

xwera bixemilînin- ussa tev tijî kulîlk dibûn; ji mêrga wêdetir zevî bûn, çargoşe, notla kvadrata şîn dikirin; cîna jî cewêd avê, nav sînore wanra derbaz dibû. Rojêd havîna, wextê tavê dida wan cewa, şînayî û ava cewa tev dibiriqîn, te tirê- zozanêd Eledaxêne xemilîne. Piş malava jî bostanêd rinde çêkirî bûn. Li wan bostana damelegana diçand: kartol, kelemsilq, pincarê bostanayî mayîn. Biharê, wexta şînkayî bor dibû, gundê Alêksandrovskê kulîlkada, mêrg- çîmanada, bostanada ussa dixemilî- meriv heyran hijmetkar bû lê binêra, ji dest bîn- bixza kulîlka, ew deşt tev te ti rê baxê sêvane bîn jê tê.” (r.62)

Di navbera dem û cihê de t êkîliyê gelek xurt heye. Divê nivîskar li ser vê mijarê zêdetir bisekînin. Romannivîs jî di mînaka jêr de belkî ne bi awayekî fireh be jî li ser vê meseleyê jî disekîne. Di zozanan de berf zûtir û zêdetir dibare û gel jî berf direvin t ên deşta û li vir jî dema ku baran zêde dibare dema vegeerê dest pê dike ji bo şivan û gavanan. Ew jî kêfxweşî dide wan lewra êdî ew ê biçin mala xwe û heqê xwe jî ji xwedîyê heywanan bigirin. Li vir romannivîs belkî zêde li ser vê meseleyê nasekîne lê tişteke pir baş nîşanê me dide. Em bi saya romannivîs fehm dikin ku t êkîliya di navbera cih û demê li ser aborî û derûnnasîyên mirovan de xwedî bandor e:

Payîza jî berf dide ser wana, ewana ji ber berfê bere-bere direvin, t êne deşta, li qijlê xwe datînin. Eva yeka dibe wî çaxî wextê li deşta payîz dikeve, îdî baran time dibare, li qaxa tijî av dibe. Serê çîya jî idî teyrok û berf dibare, dewar û îsanet idî jî serme tejax nake. Paîzê jî kêfeke rind, şayîke pak nava kurmancada heye, çim ku wexta dagêrê malê wan goşt digre, şivan û gavan jî şa dibin, idî heqê wan nêzîk dibe, gereke heqê xwe bistînin...(r. 64-65)

Di hin cihan de romannivîs di derûnnasîya lehengê de bandora dem û cihê dixwaze nîşanê me bide. Lê dîsa bi çend hevokan mijarê diqedîne:

Ketibû meha nîsanê 1918-s. Rojêd bihara dirêj bibûn. Meriv tire idî ro xilaz nabe. Cara tavîya baranê dihat, alîkî tav bû, alîkî jî baran dinarî, keskesorê jî xwe dabû aliyê mêşe, roke zaf rind bû. (r. 135)

Romannivîs bi çavê zarokekî li cihê dinihêre û dîsa bi awayekî serkeftî cihê teswîr dike. Zarokek dema ku here cihekî pêşî tiştê ku bala wî/wê bikşîne tiştên zarokane ne. Wek resîm, leyîstok û hwd. nivîskar jî bi zanebûn di romanê de cihê bi vî şiklî teswîr dike. Tirsaz zarokekî li jêr hatiye vegotin:

Roja ewline ez ku hatme dersxanê, ecêmay mam- wan sifetêd dîwarada dardakirî. Çi li wan sifetada hebû tunne bû! Teyrtu, dabe, gur, meşmor, kartêd geografîyê, yê ku min qe tiştê wan kartada fam nedikir, lê dîsa min hiz ji wan kaxeza jî dikir.

Lê gerekê ez bêjim, -rex wan sifetêd rind, sifetekî way nerind darda kiribûn. Ew sifet gava ku min didît, ez ditirsîyam. Sifet xwe-xwe mîna şiklê merîya bû: çavne mezine kûr, pozî kort, qafê wî rût, movikê hestûyê canê wî yeko- yeko duxanê bûn, tiliyê linge wî yan tiliyê destê wî usa dirêj bûn, - meriv tirê- tiliyê şahba, çewa mera çîrokada, kala digot. Canê wî sifetê dardakirî, qe goşt lê tunne bû. Xwelese, gava ku meriv didît ziravqetîyay dibû. Rastî, min tire- ew sifetê cinane yan yê'' şahba'' ne, çimku cara kala wextê zivistanê mera gelle çîrok digotin û wan çîrokada gilîyêd ussa tirs hebûn. (r.44-45)

Bi du paragrafan di mînaka jor de jî cihên sehekî dertê pêşiya me. Leheng diçe dersxanê û liv ir wênayan dinêre û sifetek dibine û jê ditirse û ew sifet û ew cih li ser wî bandoreke sehekî çêdike.

3.1.2. Encama Tehlîla Romanê

Roman, romaneke otobiyografîk e. Nivîskar jiyana xwe nivîsandiyê. Armancên nivîskar zêdetir vegotina bûyer û fikrên xwe ne. Erebe Şemo pirî caran bi çend peyvan qala cihê dike. Wekî mînak bi xwendevan dide zanîn ku malbata wî xizan e û di cihên xirab de dijîn: *“Ew mereka em tê da diman me tendûr kiribîyêda, hema dendûra me zivistana gelle cara nedihate dadanê. Eme bê dewar bûn, sergîne me tunne bûn.”* (Şivanê Kurmanca, r. 56.) Lê ew xwendevan hilnade, wan nabe hundurî avahiya xwe. Gelo ew cihê ku dijîn çawa ye? Di hundur de çi heye û çi li ku disekine? Peywendîya leheng bi vê avahiyê re çi ye û di leheng de çi hizirîn û hestan çêdike? Ev pirs bê bersiv dimînin yan jî tam ne zelal in. Eger eşyayên hundurê malê li ber çavan bihata raxistin dê xwendevan xizaniya wan çêtir bidîta û dê cih alîkariya nasîna derûna lehengan bikira. (Yılmaz, 2015, s. 83) Di romanê de cih bi awayekî serkeftî nayê bikaranîn.

Ji ber ku roman hem otobiyografîk e hem jî romaneke realist e, di romanê de cihên ûtopîk, fantastîk, derî sirûştî, dernakevin peşiya me. Cihên olî jî ji ber ku roman romaneke otobiyografîk e û bûyer giringtîr hatiye dîtin ji ber vê şayesandin

zêde nayê kirin. Qala hin gund olên wan cuda tê kirin lê di derheqê cihên olî de agahî nayên dîtin. Ji cihên vekirî û fireh û çandî tenê mînamek hene. Em rastê 2 cihên girtî û teng û 3 cihên sehekî tîn. Zêdetir cih ji bo nişandana atmosferê tîn bikranîn. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku ji aliyê cihê ve romaneke ne serkeftî. Sedema wê jî roman, romaneke bûyerê ye.

Romannivîs bi ihtîmaleke mezin di bin bandora Maksîm Gorkî de dimîne ji hin agahîyan em dizanin ku maksim Gorkî jî romanê xwendiyê. Maksim Gorkî li ser jiyana xwe 3 romanên dinivîsîne û di bikaranîna mekanê de ew jî zêde xwe aciz nake. Di romana ‘‘Zaningehên min a Maksîm Gorkî were xwendin ew ê mijar baştir were fehm kirin. Herdu romannivîs jî qala jiyana xwe dikin armanca herduyan jî vegotina bûyerê ye ji ber vê jî herdu jî zêde girîngî nadin cihê.

3.2. Gundê Mêrxasan⁴

Di romanê mijar gelemperî şer e. Li ser eşîrên Kurdan û mêrxasîbûna wan bûyer dimeşe. Di romanê de peşî atmosfera demê tê nişandan paşê derbasî bûyerê dibe. Bûyera romanê bi vî şiklî ye: Eşîra Şikakiyan eşîreke kevn e. Erdên wan di nav erdê her du dewletan jî hebûye lê wan ji herdu dewletan jî netirsiyane û neketine bindestên wan. Salan ji bo azadbûna xwe şer kirine û vergi nedane herdu dewletan jî. Kengî dijminê erîşê wan kirine xwe sipartina çiyayan û bi dijminên xwe re şer kirine û wan têk birine.

Bi navê Çolo mêrxasek hebûye. Mêrxasiya wî di nav Kurdên Romê, Îranê û Iraqê de belav bûye. Bi navê Riza Efendî jî mirovek hebûye. Ew jî bûye mîna gur û agir li ser gel. Mirovan daye girtin û wan îşkence kiriye. Riza Efendî dixwaze bibe serokê Kurdan û Kurdan bike bindestên xwe. Ji bo wê jî gelek tedê li wan dike. Çolo û Riza Efendî şer dikin û Çolo, Riza Efendî têk dibe. Paşê Riza Efendî diçe Çolo giliyê dewleta Îranê dike. Dewleta Îranê leşkerên xwe kom dike û davêje ser Kurdan lê nikare Kurdan têk bibe. Kurd bi serokatîya Çolo xwe diparêzin çiyayan û leşkerên Îranê têk diçin. Cerdên qeçax jî davêjin li ser gundên Kurdan lê ew jî têk diçin.

⁴ Eliyê Evdilrehman

Eliyê Evdilrehman nivîskarê roman, kurteçîrok û bendan, helbestkar û wergêr, di 29ê Berfanbara sala 1920î de, li bakurê Kurdistanê, li gundê Bayrekê yê bi ser Wanê ve ji dayîk bûye. Di sala 1926an de bi 450 malbatên ji eşîra Brukan ve koçê Qefqasyayê dike. di sala 1937an de fakulteya Perwerdehî ya zaningeha Erîvanê diqedîne. Paşê tevî Şoreşa Sor dibe. Hin nivîsên wî di rojnameya Rêye Teze de tê weşandin. Di sala 1995an de dimire. (Pariltî ve Galip, 2010: 39)

Gogê û Evdilmecîd ji hevdu hez dikin lê nikarin bizewicin ji sedema hin tiştan. Riza Efendî jî dilê xwe xistiye Gogê û dixwaze wî bigire xwe. Riza Efendî bi leşkeran re davêje ser gundê Gogê û gund ji deste Kurdan tê girtin. Çolo û peyayên wî dora gund digirin û erîşê leşkeran dikin û gund ji deste dijminan derdixin. Gelek leşkerên dijminên tînan kuştin û gelek ji wan jî tînan girtin. Riza Efendî dixwaze Gogê birevîne lê Gogê wî dixapîne û cilên jinan pê dide li xwe kirin. paşê Gogê kevirek li ser Riza Efendî dixê û wî dil digire. Gogê Riza Efendî radestî Çolo dike.

3.2.1. Cih di Romana Gundê Mêrxasan de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Romê, Iraq, Îran, Kurdîstan, Çiya
Cihên Girtî û Teng	+	Gundên Kurdan, Zîndan, Xoy û Girîdax, Nexweşxanê, Odeya Qasimî
Cihên Çandî	+	Genc, Rewan û Bakû, Gundê Sûsê
Cihên Olî	+	Qible, Mescîd, Mizgeft, Dêr, Tirbe
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Kolozê, Çiyayê Girîdaxê, Gundê li ser Tixubê, Çiya, Welatê Êris, Çiyayê Xezalê, Gundê Sûsê, Xweza, Mala Teyar Beg, Bajat, Gundê Dudengê
Cihên Razber		
Cihên Êtopîk	+	Daweta Evdilmecîdî
Cihên Fantastîk	+	Ewr, Ezman, Çiya, Çem, Roj, Xweza
Cihên Derî Sirûştî	+	Cennet, Ava Kewserê, Cehennem
Cihên Sehekî	+	Merzelê Xwişk û Birayên Mêrxas, Zaxa Seyranê, Dema ku Gogê navê Evdilmecîd dibihîse derdora Gogê,

3.2.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Li jêr navê hin welatan derbas dibin û armanc zêdetir qalkirina bûyer û rewşa eşîreta Şikakiyan in ji ber vê cih ewqas ne xurt e:

Tarîxa eşîreta Şikakiyan zehf mezin e, wê çendik û çend salan ji bo azabûn û serbestiya xwe li miqabilî zevtçiyên Romê û Îranê şer kiriye û tu xerc û xerac nedaye her du dewletan, ew li ber tiştêkî hesab nekiriye, lê di hidûdê her du welatan de ji xwe re mesken çêkiriye û li wir jiyiye. (r.16)

Çiya bi gelemperî nişaneyê azadiyê bûne.(Kanoğlu, 2017, s. 96) Çiya wek parastgeh hatiye nişandan û gelê Kurd xwe bi saya wî diparêze û xwe li wir zêdetir azad hîs dike ji ber vê jî çiya ji bo Kurdan mekaneke fireh e:

Tarîx dide kifşê ku Kurd miletekî azayîhez û şervan e, meriv dikare Kurdan lehengê serê çiyayan bi nav bike. Kurdan ji bo azayî û serbestiya xwe timî li miqabilî dijminan şer kirine, kuştine û hatine kuştin, lê qeleçeyên xwe bi destên dijmin ve bernedaneî çunkî Kurdistan, an jî meskenê ku Kurd tê de dijîn, bi qewlên dinyazanebûnê îmkanê nade dijminan ku wan alt bikin. Her çiya, banî kevir, zaxeke welatê Kurdistana Romê, Îranê, Iraqê bûne piştovanên Kurdan, ji wan re bûne bira, lewma jî dijminan bi Kurdan nikaribûye. (r.51)

Li mînakên jêr jî navê welatan hatine bikaranîn lê derheqê wan de teswîrek nehatiye kirin:

Mêrxasiya êla Çolo û sekinandina şêr mîna sîmsiz û tîlefônê di nava Kurdistana Romê, Îranê û Iraqê de belav bû. (r.70)

Li welatên Romê, Îranê û Iraqê xebera heval ji me Kurdan re nehatiye gotin. (r.84)

Şahê Îranê wê bi min re hesab rûnê. Banken min ên pereyan wê li Îranê, Romê û heylo li Misirê hebin. (r.129)

Em ew qasî li welatê Romê, Îranê û Iraqê man, we qet rojekê nedît ku serkarên me bîn wiha tevî eşqa cimaetê bîn. (r.199)

Di mînakên jor de hin cih tenê wek bi nav derbas dibin. Me li jor gotibû ku cih bi erka xwe dibin cihên vekirî an girtî lê di minaka jor de romannivîs ji aliyê fîzîkî ve hin cihan bi kar tîne. Cihê ku bi kar tîne ji ber ku bûyer di gundeke de derbas dibe û gund ji aliyê fîzîkî ve li gorî welatan biçûktir e, welat wek cihên vekirî û fireh hatiye dîtîn ji aliyê fîzîkî ve mezintirbûna wan hatine bikaranîn.

3.2.1.2. Cihên Girtî û Teng

Ji ber ku cihê bûyerê gund e em dikarin bajar û welatan wek cihên fireh nîşan bidin. Li vir bajarên ku derbas dibin tenê bi navên xwe hatine qal kirin û behsa rewşeke tê kirin. Lê gorî rewşê tê dîtîn ku ji zilma zewtçiyên qeceran gundên Kurdan

di şîne de ne. Di rewşa wan nebaş e, ji ber ve jî cihekî teng û girtî derdikeve pêşiya me:

Zilma zevtçiyên qeceran wê havînê deşta Anadolîyê wergirtibû. Gundên Kurdan ên qezayên Wanê, Bayîzdê, Îdirê, Erdîşê û yên mayîn di nav şîne de bûn. (r. 16)

Armanca zindanan mirovan dîlkin e. Mirov li zindana azadbûna xwe winda dike ji ber vê zindan wek mînaka jêr cihên girtî û teng in:

Riza Efendî jî bûbû gur û agir, belapêjgarî xelqê qîşleya bûbû, destê serkarê bajarê Xoyê ji bo ne tu tiştî çend mêrên êlê dabûne girtin û di zindana zevtkaran de dabûne xezakirin (r.18-19)

Çiya aborî û civakî ya lehengan nişane me dide. Mirov carinan bi hişê xwe carinan jî bi rastî diçe çiyayê. (Kanoğlu, 2017, s. 95) Çiya carinan ji bo parastina mirovan dibe fireh carinan jî ji bo dijwarîyên xwe ji bo mirovan dibe mekanên teng li jêr jî ji ber ku zehmetiyan dide mirovan wek mekaneke teng divê were nişandan:

Ji Xoyê heta Girîdaxê gişk çiya û newalên kûr in û cî bi ciyinan bi mêşe ve hatine wergirtin. Li wir, hincirandina Kurdan zehf çetin e (r.54)

Canim, ew ciyine wisa asê ne, teyr bi teyritiya xwe çetin e li wan deran digere. (r.57)

Nexweşxane ji ber ku gelemperî di nav mirovan cihekî nexweş tê dîtin û mirov naxwazin zêde li vir bîmînin wek mekaneke teng dibê were qebûl kirin:

Cimaeta bajêr ji wê nexweşxaneyê re digotin, Nexweşxaneyê Mihaciran. (r.92)

Lewra ode û mal rêberiya nivîskar û helbestvanan dikin di tehlîlkirina lehengan de. (Bachelard, 2008, s. 64) Di romanê de bi piranî cih zêde nehat teswîrkin ku di minaka jêr de odeya Qasim bi atmosfera mekanê ve tê nişandan û ew atmosfer li xwendekaran bandorê çêdike. Rewşa Qasim baş tê dîtin û xuya kirin. Qasim di odeya xwe de di mitaleyan de ye:

Qasim li odeya xwe ya xebatê rûniştibû, serê xwe berjêr kiribû, mitaleyên xwe komî ser hev kiribûn, der heqa pîrsekê de bi lez dinivîsî û di binê gelek pîrsan de bi qelesa sor cixîz dikişand. Dûyê cixareya wî ode kiribû mihasureyê, te yê bigota ewrekî reş girtiye ser wî, lê li derve denge vizîniya bayê payîzê yê sar dihat. Pencereya odeyê dikuta, di qelîştekan re derbas dibû. Kirinên kûlakên gund û çend

fırçeçi û komsomolên ku ketibûnê bine qolên wan, mîna ava çê di ber çavên Qasim re bi lez derbas dibûn... (r.170)

Odeya Qasim di beşa jor de wek cihekî girtî û teng dertê pêşiya me sedema vê jî hin problemên wî hene. Ew rewşa Qasim dibe sedema atmosfereke teng û nivîskar jî bi paragrafeke dirêj ji me re ew têkiliya rewşa Qasim cihê teng nişan dide.

3.2.1.3. Cihên Çandî

Heke li cihekî gel bi gelemperî karekî bikin û di demeke diyar de ev kar were kirin tê fehm kirin ku êdî ev kar ne karekî normal e, êdî gihiştîye asteke çandî li jêr jî di gundan de di eynî demê de eynî tişt kirin û dem û cihekî çandî tê ava kirin:

Giva me bihiştîye li Gencê, Rewanê û dor û berê Bakûyê, di her gundekî de, doşek û orxanên bile't dirûtine, bi şev jin, qîz, bûk û mêrên wan deran di binê wê orxanê de radizên, kalan dikine sabûn, xurekê cimaetê gişkî di firaqekê de hazir dikin, kê berê gihiştî, dixwe, lê yên mayîn bê xurek dimînin. (r.176)

Dawet wek tê zanîn bûyereke çandî ye û li her welatê li her bajarê û heta em dikarin bêjin ku li her gundê bi awayekî cuda tê kirin. Li jêr jî di gundê Sisê de dawet tê kirin û ev cihê ku dawet tê kirin wek êdî cihekî çandî tê qebûl kirin:

Di gundê Sûsê de dawet bû. Daweta pênc cot dilên bi salan li hêviya hev sekinî. Di wê şahiyê de, mîrazê wan bi hev şa dibû û digihiştine mexseda xwe. Di radtali orta gund de, pênc def û pênc zorbeyan lê dixistin, pênc govend hatibûne girtin, her yekê bi qaydeyekî lê dixist, sergovendiyan destmalên xwe yên neqîşandî dibirin û dianîn...(r.198)

Di romanê de di hin beşan de cihên Çandî tê dîtin di mînaka yekem de zêde agahiyên kûr nayê dayîn lê di minaka duyem de şayesandina dawetê bi awayekî fireh tê kirin.

3.2.1.4. Cihên Olî

Hin cih hene ji bo hin olan pîroz in. Mirov li wan deran hestîyarîyeke taybet dest dixê û ev deranan wek cihên pîroz tîen hesabandin li minakên jêr jî cihên wek Qible, Kîlîse Mizgeft, Tirbe bi nav derbas dibin lê qet nayên teswîr kirin:

Xwedê min bu qurbana Quranê ke. Bi rastî jî ew qibleya me Misilmanan (r.33)

Deriyê mescîd, mizgeft û dêran dadane. Şêx û Mele ji gundan dane rawestandin
(r.157)

Bi serê Xelîfeyê Bexdayê û tirba bavê min, ez ê çend rojan û bi şûn de bê...
(r.169)

Di rûpela 154 an de cihekî êdî ji ber ku ji ola xwe dûr dikeve ji aliyê leheng ve wek cihekî ne baş wek cihekî oleke din tê nişandan û jê re gawiristan tê gotin. Êdî ew der ne ji wan e ew der li gorî leheng êdî mekanê xaçperestan e, û dêr jî dîsa tenê wek mînakên jêr tenê bi nav derbas dibe:

Ev der êdî bûye gawiristan, li vir derbaskirin nabe lawo, misilmanên vir bûne gawir. Xwedê hez bike, em herine Îranê, tu yê bibihîzî ku komsomol ê bi destê zorê misilmanên me bibine kilîseyan û di stûyê her yekî da xaçeke çarnikil dardabikin.
(r.154)

Şayesandina cihên olî di romanê de zêde nayê kirin lê di mînaka jor de ji ber nişandana rewşeke şayesandineke biçûk hatiye kirin.

3.2.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Romannivîs bi 4-5 rûpelan dixwaze atmosferê nîşanê xwîneran bide. Di wan 4-5 rûpelan de hem cihan hem eşîr hem jî hin kesan dide nasandin. Ji ber ku 4-5 rûpelan, me tenê destpêkê nivîsand û me sê xal danî ku were fehm kirin bi vî şiklî didome:

Kolozê Çiyayê Girîdaxê û etekê wê hela ji razana kibir a zivistanê hişyar nebûbû, kirasê spî berk li xwe alandibû ku necemide. Lê di binetara wê de, ji germe xal ketibûnê. Avên ji belekiyan hatî tevî hev dibûn, mîna maran çivane didane xwe, tewî kewan bi şewat distran û tevî kaniyan, çavkaniyan dibûn, hey lo ji bilindciyan pêberjêr dibûn, di nava gelî û gebozan re bê xwedî, bêxwêdan, nolî Kurdên ku ji bextê xwe bigazin, bi kevir û kûçikan re dikirine qal û ceng û carinan ji kenarê xwe derdiketin, hêrs dibûn ku ew av badilhewa, bê kêr dikişe, însan wê bi kar nayne û kare ji wê nastîne... (r.15-16-17-18)

Di mînaka jêr de nivîskar bi teswîra xwezayê atmosferê nîşanê xwîneran dide:

Êvar bû. Rojê hêdî hêdî emrê xwe dida, tîrêjên xwe yên zêrîn ji serê çiya û baniyan, ji ristan û berwaran berhev dikirin, hêdî hêdî di piştta çiyayê bilind re diqulibî. (r.29)

Li jêr jî romannivîs dixwaze berîya bûyerê derdorê nîşanê xwîneran bide ku xwîner di derheqê cihê de agahdar bibe:

Ew gund li ser sînorê Romê û Îranê ye, li pêşa gelî û gelîtorên Çiyayê Girîdaxê ye, ciyekî zehf bêfesal e. Hebûna Riza Efendiyê me li wir e; li wir, çend malen Kurdan dijîn, serekê wan Çolo ye. (r.37)

Fedayiyên Kurdan roja duduyan xwe gihandine serê Çiyayê Xezalê. Serê Çiyayê Xezalê di wextê de teqiyabû, di orta kolozê wî de meydanake leylankî ya fireh bi pêşde hatibû, gola avê jî rewş dida meydanê... (r.50-51)

Xweza li jêr hem fantestîk tê bikaranîn hem jî atmosferê nîşanê dide. Lê piranî ji ber ku xwesteka nîşandana atmosferê ye me wê mînakê di bin vê beşe de bi kar anî:

Şev bû şeveke sayî. Heyvê şemala xwe raweşandibû hemû ciyan, tu yê bibêjî wê jî dixwest îmdad bide fedayiyên Kurdan. Şerekî kefilîdeman bû, ji dest gulleyan, çawa dibêjin, dê ewledê xwe davet. Ji holkirina keviran pirîskên êgir mîna stêrkan diçirûsîn. (r.55)

Bayê sibehê bi hemdê xwe diwîland. Ewran rûyê rojê girtibûn, îmkan nedidan ku roj guliyên xwe yên zêrîn raweşîne ser bedewiya tebîetê. Ewr li esmanan mîna eskerên Îranê û fedayiyên Kurdan bi hev re ketibûne qal û cengê... (r.60)

Romannivîs ji ber xwesteka pesindayîna welatê Êrisê di derheqê wan de agahî dide û bi teswîrkirina nivîskarê xwîner fehm dike ku welatm Êris welatekî azad e û jiyan li vir xweştir e:

Welatê Êrisê tê welatekî baş e, padişahê wê qanûneke wisa daniye, kesek ji xatirê kesekî nakeve, mîna bira dijîn. Li wir, niha dest pê kirine xweliyê ji dewlemendan, axa û begleran distînin, didine gundiyan kesîn... (r.72)

Bi teswîra xwezayê romannivîs atmosferê diresimîne:

Payîza derengî bû, her bedewîyek tebîetê ji sermaya Çiyayê Xezalê ya sert qurçimîbû ser hev. Wê payîzê. Xên ji dara merxê darên mayîn gişk posîde bûbûn, rewşa xwe wehdelî ji ser xwe avetibûn. Bedena wan ji her sertayî û qeziya tebîetê zû zû dihate birîndarkirin... (r.75-76)

Atmosfera gundê Sûsê û gundên cîran tê qal kirin bi vê teswîrê bîratiya gundan ji xwîneran re tê nîşandan:

Gelek gundên Ermenî û Ezerî cîranên gundê Sûsê ne û ekînên wan di sînoren hev de ne. Xelqê wan gundan mîna bira bi hev re derbas dike, di xêr û şeran de li hev disekînin. (r.77)

Hin roj hene li ser mirovan rehetîyek çêdike li jêr şeveke xweş tê teswîr kirin û di vê şevê de gel xwe ji hemû nexweşiyên jiyane dîr dixin û bi dilekî xweş radizin. Û romannivîs jî wê atmosferê ji me re bi teswîreke kin vedibêje:

Ew şev şeveke taveheyv bû. Te derzî bavêta erde, wê bihata kifşê. Wê şeve xên ji birîndar, nexweş û lewendan, cimaeta mayîn gişk ketibû xewa şêrîn, ji te tire gişk bi dilekî razane, qet Şahtiya Îranê ew zilm neaniye serê wan... (r.80)

Bi zimanekî wêjeyî romannivîs atmosferê bi teswîra xwezayê ji xwîneran re vedibêje:

Karwanê stêrkên esmên hêdî hêdî kare xwe didît ji bo ku bar bike. Hinekan jî cî bicî 'emrê xwe didan. Sermaya sibehê jî qiraviya xwe ya zîvîn bi ser bedewiya tebîetê de elek kiribû. Her bêhnber û bedewiya tebîetê dixwest xwe ji xewa şevê dawêşîne ku bedena wî têkeve nava hereketê... (r.82)

Romannivîs mîna wêneyekê ji xwîneran re atmosferê dide xuya kirin:

Roj êdî şêrîn bûbû. Koçên Kurdên mihacirbi rê ketibûn, ji dîr ve ew mîna karwanên deveyan li dû hev û dur ez bûbûn. Kerî û sûriyên pêz, berxan û garana dewarên sewr li dû koçan dikirin toz û xubar. Siwar û peya jî bi koçan re hêdî hêdî diçûn û oxira xwe dicehdandin. (r.85)

Li jêr xweza tê teswîr kirin û bandora wê ya li ser gundên Dîlarê û Sûsê tê vegotin germa rojê dixwaze zêdetir mirovan germ bike lê mîna havînê nikare bi atmosfera jêr hem di derheqê wê rojê hem jî di derheqê demsalê de xwîner tê agahdar kirin:

Germa nava rojê dixwest biqijilanda, lê quweta rojê nedigîşt wê fesle mîna havînê ferm bike. Belê, besta di orta gundên Dîlarê û Sûsê de hinekî germ bû, te yê bigota ricaf, surr û sermaya Çiyayê Xezalê hela di bedena, mihaciran de bû, wê tavê encax ew germ dikirin. (r.93)

Mala Teyar Begê ji aliyê kûçikan ve tê parastin ji ber vê atmosferê jî çuyina mala Teyar Begê pir dijwar e. Nivîskar jî li jêr wê mijarê vedibêje:

Çûyina mala Teyar Begê zehf çetin bû, çunkî panzdeh bîst kelbên wî yên gurxenêq hebûn, siwar peya dikirin qasîdan ji sed, sed û pêncî mêtroyan dûr ve gazî wan kirin, lê tu deng û hîs nedihat. Tê yê bigota xwediyê kelban ew hîn kirin, berê gişk bi hev re diewtiyan, paşê hicûm dikirin. Kelbên Teyar Begê gişk belek û mîna hirçam mezin bûn... (r.110)

Carinan sirûşt bi xweşikbûna xwe dibe atmosfera romanê carinan jî bi dijiwariya xwe li jêr bi saya teswîrê hem zanin ku zivistan e û êvaran gelek serma çêdibe û jî ber vê sermayê mirov dijiwariyan dikşînin. Romannivîs jî li jêr vê atmosferê ji me re vedibêje:

Şev bû. Di gundê Sûsê de, çûyin û hatina merivan ji zû de hatibû birrîn. Her tişt steqirîbû, bi tenê li çend ciyan denge kelban dihat, demekê û bi şûn de, ew jî hate birrîn. Bi tenê wê şevê tebîet di nava hereketê de bû û bi şuxulê xwe re mijûl bû. Wê şeve, berfeke zor dibarî. Wê şevê, xên ji kirasê spî û kuliyên berfê, tiştê nedihate kifşê, wê xebata tebîetê heta nivê şevê kişand, paşê kire hişkesayî. Wê şeva bedew a steqirî, êşa diranan xew li Gogê herimandibû. (r.123)

Rewî dixwazin biçin bajarê lê berf hinekî karê wan dijiwartir dike lê jêr jî ev atmosfer tê vegotin:

Beriya nivro bû. Çavê merivan çî qasî dibirri, erde sîs dikir. Pasiyên berfê diçirûsîn. Pençen rojê yên zêrîn, hindik be jî, xwe reweşandibûn ser tebîetê. Berf jî mîna zîvê zêrkildayî diçirûsî û hinek, hûkmi ser dîtina ronayiya çavan dikir. Demekê û bi şûn de, rewî gihiştin nava bajarê. (r.125)

Gundê Dudengê de bi zêdetir atmosferek xweş xwe nîşanê me dide gel bi hevdû re xweş îdare dikin gelemperî lê carinan hin pirsgirêk jî derdikevin. Atmosfera gundê Dudengê li jêr bi vî şiklî hatiye nivisîn:

Gundê Dudengê di nava qezeya Şarûrê de gundê herî bile't bû. Hela zehf ji zû ve milletên Kurd û Ezerî li wî gundî bi tevayî dijiyan. Ew her du millet di roja hev î qenc û çetin de mîna bira piştê hev digirtin. Di gundê de, milletê Ezerî diha gelek bû, ne ku Kurd. De gund e, tê de her tişt deqewimî, carinan di orta cahilên Kurd û Ezeriyan de nerazîbûn bi pêş de dihat... (r.133)

Sirûşt carinan bi rûyekî şîrîn xwe nîşanê mirovan dide carinan jî wek ya jêr rûyê xwe yê hişk derdikeve pêşiya mirovan. Li atmosfera jêr meha payîzê û rojekî bi baran tê vegotin û ev baran û demsal jiyanê hinek zehmettir dike:

Şeveke payîzê ya tarî bû. Wê rojê, baraneke gurr baribû. Ji destê avê û heriyê cîran nikaribû biçûya mala cîrên. Wexta ku meriv derdikete nava gund, herriya benîştîki midasên merivan bi elbê re hûfî xwe dikirin û mecela bipêşdeçûyîne nedida. Ewran bedewiya tebiyetê di nava xwe de veşartibû, te yê bigota selama xwe ya ku her êvar dida, ji bîr kiriye. (r.147)

Gund bi surê ve hatiye dorgirtin û leheng dixwazin herin vê gundê romannivîs jî dixwaze di derheqê surê de û asêbûna wê de hin tiştan bêje û bi vî şiklî atmosferê gund tîne ziman:

Wan dîsa teletel dest bi cehdandina oxira xwe kirin. Berê xwe dan avahiya li fêza gund a duqatî. Avahî bi sûra bilind ve hatibû dorgirtin. Di hundurê sûrê de, tewle, loda gîhê, gom û tewleya menekiyan jî hebû. Sûrê ciyekî bile't girtûbû ku di sûrê re meriv derbas nebin, di wextê de, xulam û xizmetkaran dirrikên şîlanê bi ser sûrê de nikandibûn. Heke roviyê fêlbaz birçî bûya û bixwesta ji hundirê sûrê ji xwe re qismek xwarin dest bixe, fêlbaziyên wî di nava wan dirrikan re derbas nedibû... (r.148)

Dîsa atmosfera meha payîzê û serma wê tê vegotin di teswîrên jêr de:

Xêlekê xurt ji şevê derbas bûbû. Gund ji zû de steqirîbû. Viziniya bayê payîzê yê sar bû. Te yê bigota bê beledî dikir ku paşê berfê bi xwe re bîne. Bi tenê carinan ewtîniya kelban dihat. (r.173)

Li derve hişkî bû. Di bixêriyê de, qirçeqirça daran bû, dişuxulîn. Dûkêşê mîna dêwan dû hûfî dikir û di ser banê xenî re diquliband. Teyar mîna çivîka melisok melisîbû (r.173)

Hem di derheqê demê de hem jî di derheqê gundiyan de agahî tê dayîn. Ji vegotinên jêr em derheqê mijûliyên gundiyan de agahdar dibin:

Berêvar bû. Xelqê Sûsê her yek xebata xwe ya malê re mijûl bû. Hinekan alif didan pez û dewarên xwe, yekî peza xwe ya tevî pezên tevî pezên cîranan çûyî vediqetand, ber bi mala xwe ve dianî, hinekan lodên xwe yên gîhê dikirine nîzamê ku ba lê nexe, yekî basmeya li derê malê şimşat dikir û rast dikir ku biharê rind bê birrîn. Li ber derê îdareya kolxozê, gelek firqeqî û komsomol berhev bûbûn... (r.178)

Bi teswîreke fantastîk romannivîs atmosfereke dixwaze nîşanê xwendevana bide û dîsa di meha payîzê de dîmenek derdixe pêşiya me:

Şeveke payiza derengî ya hişkesayî bû. Bê bi hemdê xwe diwîland. Stêrk li esmanan ketine reqsê, te yê bigota hinek ji govendê dixeyidin û mîna tofanê berjêr, ber bi erdê be dihatin û bi rê be 'emrê xwe didan. Ewran jî car carinan mîna xêliyê bi serhinek karwanên stêrkan de digirtin, di binê xwe de vedişartin, lê carinan di binê xêliyê de mîna roja ji pişt çiyê be derketî diçirûsî. Meriv hijmekar bû demekê li wê şaneşînê temaşe bikira... (r.187-188)

Cerdên qaçaxên hin gundan tedê li mirovan dikin û atmosfereke nexweş ava dikin û cihêkî teng û girtî ava dikin lê ji ber ku romannivîs li vir dixwaze atmosferê derxe pêş me vê mînakê di bin vê beşê de nivîsand:

Ev çend roj in cerdên qaçaxên ên ji Yêvlaxê, Kelbecerê, Laçînê, Zengezûrê hatî rihetiyê nadine me. Rojê bi ser çend gundan de digirin, talan diki, eşya û pereyên dikanan dibin. Dikevine malan, bi zorê xişran hiltînin, merivê ku li xweşa wan nayê, dikujin...(r.190)

Bi hatina biharê ve sirûşt xwe nû dike û bi kulîlkan ve xwe dixemilîne û atmosfereke xweş saz dike li mînaka jêr jî ev tişt derdikeve pêşiya me:

Gulan bû. Meha Gulanê û kulîlkên rengawazî. Te yê bigota her gul û kulîlkek bi hev re ketiye lecê, her yek ji wan dixwaze diha rind, diha bedew û diha letîf bê kifşê ku însan ji wê hez bike, jê bêhnê bistîne... (r.197)

Ji mînakên jor jî tê dîtîn di romanê de herî zêde cihên ku atmosfera fizîkî nîşan didin tîn bikaranîn. Şayesandina xwezayê û derdorê tê kirin û li ser erka wan agahî nayê dîtîn. Meha gulanê ye kulîlk vedibin lê tê tîkilî bi lehengan re nayê kirin wek ji mînaka her dawî jî ew ê were dîtîn.

3.2.1.6. Cihên Ûtopîk

Cihên derî Ûtopîk ji hemû qirêjiyên, nexweşiyên dinyayê dûr ketiye, cihên xeyalî ne ku rihê mirovan beriya wan dike. (Kanoğlu, 2017, s. 10)Leheng xeyal dike û di xeyala xwe de ûtopyaya xwe nîşanê xwîneran dide. Daweta kurê xwe datîne û tîra xwe govendê digirin û direqisin:

Giva li ber mala wan dawet e, ew û mêrê xwe ketine govendê, di şahiya kurê xwe direqisin, hevalên Evdilmecîd şabaşê didin, bi mile wî digiri, dikine govendê, bi tevayî dilîzin. Evdilmecîd şerm dike, serê xwe bilind nak, li reqaşçiyên û temaşeyan nanihêre... (r.100)

Ji bilî vê mînakê cihên Ûtopîk di romanê de nayê dîtin.

3.2.1.7. Cihên Fantastîk

Di cihên Fantastîk de leheng ne bi awayekî şênber, bi awayekî razber tê de cih digirin. Cihên Fantastîk dikarin rastiyê nîşan bidin. Lê belê di romanê de razber in. (Kanoğlu, 2017, s. 10) Çiya, newal, çem û kevîran hatine kesandinkirin û cîhaneke fantastîk hatiye avakirin em dizanin ku di jiyaneke rasteqîn de tiştê wilo dernakeve pêşîya me. Ev tişt bi gelemperî di destan û çîrokan de tê gotin û romannivîs jî ji bo rexneyeke dixwaze vê tiştê bi kar bîne:

Lêbelê, eger ziman bikeve devê çeman, çiyayanî newalan û kevîran, ew ê mîna kalên zemanan rûnên, eê cimaetê topî dora xwe bikin, bi rojan, mehanî salan der heqa wê zilma Romê de qise bikin, ku wan çito qehr aniye serê mîletan, xusûsên Kurdan lê wextê ku meriv bi sidqê sadîq li wan bedewiyên Çiyayê Girîdaxê binihêre, bi wê elbê re tê derdixê ku ew ji bo Kurdan çiqasi hatine birîndarkirin û rojên çetin dîtine, wan bi hezaran mêrxas di paşîla xwe xwedî kiribûn, mecal dane wan ku ew li miqabilî dijminan şer bikin, teslîmî eclafan nebin. (r.16)

Romannivîs jî bo hin fikrên xwe bîne ziman carinan jî sirûştê alîkarî digire û fikrên xwe bi devê wan dixwaze bêje û bi vî şiklî mafdarîya xwe dixwaze bi alîkariya wan nîşan bide û bi vî şiklî ciheke fantastîk saz dike:

Roj ji nîvro şikestibû, serekê Xoyê bipîştovanên xwe re ji Têhranê derketin, hespên xwe bi gef û gurr ber bi Xoyê ve ajotin. Ewr û esman bi ser hev de dihatin, vizîniya bê bû. Çi qasî diçû, gurr dibû, pêlên bê mîna şemaqan li sîfetê serekê Xoyê û seyisên wî diketin, te yê bigota digot: " Hûn li Kurdan ne heq in, xwîna cimaeta am û tam seba tiştê neheq nerêjin." Carînan jî bê xwelî û qûm bi ser wan de dibarand. Dikire çavên wan, îmkana nihêrandinê nedida... (r.39)

Wek me li jorê jî anî ziman di mînaka jêr de jî eynî tişt tê kirin. Ji bo li ser xwîneran bandor were çêkirin xweza tê bikaranîn. Li jêr jî ji bo mezinbûn û

qewetbûna lehengên xwe derbixe pêş roj û hwd. tên bi kar anîn û bi vî şiklî hestîyarîyên xwîneran bi awayî tê poxpoxandin:

Êvar bû. Rojê jî, ji tîrê, dixwest demekê li fedayiyên Kurdan temaşê bikira û paşê biçûya ava. Di mêşeyê de li fêza qışleyê de, kewan bi şarûr û bilbilan re distran, te yê bigota digotin, ‘‘Gidî, zû bikin, ji nava qehr û zilmê xelas bibin, hêsîrên xwe careke din nekine destên zilmkaran...’’ (r.50)

Roman romaneke bûyerî ye lê ji bikaranîna cihên fantastik tê dîtîn ku romannivîs hestên xwe zêdetir bi kar tîne û bi vê xwesteka romannivîsê ve, cihên fantastik gelek caran dertê pêşîya me:

3.2.1.8. Cihên Derî Siruştî

Di vê romanê de cihên metafizik zêde nayên bikaranîn tenê li cihan de bi nav derbas dibin û teswîr qet nayên kirin:

Esker wisa dabûne bawerkirin ku kî di vî şerî de bê kuştin, wê şehîd bikeve û bê xeberdan wê here cenetê. (r.60)

Weleh, ev der xût cenet e.(114)

Lap arxayîn be, ev merivên me yên dîwanê mîna Ava Kewserrê temiz in û îmdatçiyên şuxulê me ne. (r.174)

Helbet cimaet bi wê yekê hisiya, lê di cehennemê de, bila ew qasî binihêriyana.. (r.200)

Cihên derî siruştî di romanê de wek mînakên jor jî tê dîtîn gelemperî bo şibandîne tên bikaranîn.

3.2.1.9. Cihên Sehekî

Navê hin deran ji hin bûyeran ve tên dayîn li minaka jêr jî ‘‘Merzelê Xwişk û Birayên Mêrxas’’ jî navê xwe ji bûyereke digere. Hin bûyer hene li ser mirovan gelek xwedî bandor in. Mirov jî ji ber ku wan jibîr neke navek didn wan û wê navê wî didin cihekê. Û bi bi vê cihê ev bûyer nemir dibe:

Ji sê sed mêrî û heşt jinan bi tenê hêjdeh mêr û Gogê bi ser Çoloyan de vegeyiran. Ji wê rojê de ew zax hate binavkirin. ‘‘Merzelê Xwişk û Birayên Mêrxas.(r.63)

Hin cih hene ku di dilê mirovan de ji xwe re cihekî taybet çêdikin. Hin gel jî hene ku ji bo ev der winda nebe wî derê wek ciheke pîroz dihesîbinin. Û wan deran dikin ziyaret û hurmeteke cuda nîşanê wan didin li jêr jî mînakek wisa derdikeve hemberî me:

Kuştiyên Zaxa Seyranê hela di saxiya xwe de ji hevalên xwe re wesiyet kiribûn: "Bila lawik meytên me ji zaxê dernexin. Heke dikarin, bila devê zaxê bi keviran hilcinin, çunkî ev zax ne bi tenê vê carê, lê hela di wextê kal û bavên me de bûye îmdad, dar û piştta me Kurdan. Ev zax ji bo me di wextê de bûye ziyaret û ziyaret jî dimîne. (r.64)

Carinan cih li ser mirovan hest çêdike carinan jî hin hest cihan ava dike. Li jêr jî Gogê bi navê Evdilmecîd re cihekî sehekî saz dike di dilê xwe de:

Wexta ku Gogê navê Evdilmecîd dibihîst ku ew nav danîne ser bextê wê, ew di alema xwe de şa dibû, reş û heşê seba bavê û bira wergirtî û diya nexweş pêşiya wê digirt, te digot qey fikir wê dibine ber bi dêmistan û qûmistanên xikexalî, paşê wê dîsa vedigerînin ser rîya heqiyê, dinyaya bengitîyê, dinyaya gul û sosin, çem û kanî. Gul û behren bengîtîyê.(r.64)

Di çend beşan de cihên sehekî tên dîtîn lê zêde şayesandin nayên çêkirin. 2 şiklên cihên sehekî jî di romanê tê dîtîn. Hem cih li ser kesan hest çêdike hem jî hin kesan li gorî hestên xwe cih ava dikin.

3.2.2. Encama Tehlîla Romanê

Hêmana cih di romanê de bê têkilya bûyer û leheng nayê fikirandin. Hin mezinên ku wek serafê merivan tên qebûl kirin, bi kurtasî bi tecrûbeyên xwe yên li ser mirovan ve dibêjin, mirov dişibe cihê ku li dijî, an cihê ku li dijî dişibîne xwe. hûn ji kijan dest pê bikin ew ê we bibe a dinê. Pêşî mirov dişibe cihê ku li dijî, hewa, kevir û axa wê derê. Paşê hewa, av, kevir û axa wê derê dişibîne xwe (Yılmaz, 2007, s. 17) Di romanê de ev tişt carinan derdikeve pêşiya me. Romannivîs di navbera çiya û gel de têkiliyeke bi vî şiklî saz dike.

Di romanê de ji hemû beşan mînak derdikevin pêşiya me lê bi gelemperî armanca romannivîs xwesteka vegotina bûyerê ye ji ber vê jî zêde girîngî nade teswîra cihê. Bi gelemperî cih wek nav derdikevin pêşiya me lê ev tişt nayê wateyê ku nivîskar ji aliyê teswîrê ne zana ye. Romannivîs carinan bi zimanekî wêjeyî hin

teswîran dike û ev teswîr li ser xwîneran bandoreke xweş çêdike lê ji ber ku me li jor jî anî ziman armanc zêdetir vegotina bûyerê. Ew roman romaneke bûyerî ye û ji ber vê jî ji aliyê teswîra cihê de ne ewqas xurt e.

Di romanê de cihên şênber zêdetir hatiye bikaranîn. Gelek mînakên cihên şênber tên dîtin. Tenê cihên olî de ji bilî mînakek cihên ku hatine vegotin tenê bi nav derbas dibin. Cihên ku atmosfera fîzîkî nişan didin zêdetir hatine bikaranîn û ji ber vê jî ji aliyê cih ve qelsîyek derketiye holê.

Di romanê de cihên razber jî bi hemû binbeşên xwe hatine bikaranîn. Lê li gorî cihên derî sirûştî û cihên ûtopîk, cihên din xurttir hatine saz kirin. Roman romaneke bûyeriyê û gelek caran cihên fantastîk hatine ava kirin, ev avakarîna cihên fantastîk şikleke destanî daye romanê. Cihên sehekî jî bi du şiklên cuda hatine ava kirin û ew jî xurtbûnek daye romanê lê gelemperî were nêrîn cihên sehekî jî gelek kêr derdikeve pêşîya me.

4. CIH DI ROMANÊN BAKUR DE

4.1. Bîra Qederê⁵

Roman li ser wêneyan dimeşe. Di romanê de 16 wêne hene. Roman ji dawî dest pê dike paşê vedigere destpêka bûyerê. Piştî mirina Celadet, Rewşen Xanim li mal bi êş rûdinê û wêneyên ku bela vela bûne kom dike û li wan dinêre. Di wêneya yekem de dibîne ku sal 1983 ye. Celadet wî rojê dayîk bûye. Roman bi vî şiklê dest pê dike. Celadet dema ku tê dinê deng jê dernakeve û dinêrin ku zarok miriye. Wî datînin li ber bîrê û piştî demekê dinêrin ku deng ji zarokê tê. Mêze dikin ku zarok digirî û nemiriye. Celadet bi vî şiklî tê dinê.

Celadet hêdî hêdî mezin dibe. Celadet bi navê Canan ji keçîkekê hez dike û di navbera wan de têkilî çêdibe. Ji hin tiştan Celadet û Malbata wî sirgûnê Sparta dibin

⁵ Mehmet UZUN

Mehmet UZUN di sala 1953an de li Sîveregê hatiye dinê. Di ciwantiya xwe de ket girtêgehê. Piştî derketina ji girtêgehê di sala 1977an de li Swedê bi cih bû. Uzun romanên xwe Kurdî, ceribandînen xwe jî bi pîranî Tirkî nivîsand. Hin nivîsên wî yên bi zimanê Swedî jî hene. Di sala 2007an de rehma kir. (Parlî ve Galip, 2010, 59) Niha di nav Kurdan de em dikarin bêjin ku Mehmet Uzun romannivîsê herî bi nav û deng e. Mehmet Uzun 7 roman û ji bilî romanên gelek pirtûkên din jî ji me ra hiştine. Haşîm Ahmedzade ji bo Mehmet Uzun di pirtûka xwe ya "Romana Kurdî û Nasname dibêje ku "vêga tevî heft romanên xwe, xuya ye romanûsê Kurdî yê herî çalak e. (Ahmedzade, 2011,72)

û birayê Celadet li wir dimire. Li Spartayê rewşa malbata Celadet pir xirab dibe lewra Osmanî pereyêke hindik dide bavê Celadet.

Piştî demekê dîsa vedigerin Stenbolê. Celadet dibe Zabîd û tevlî şer dibe. Celadet li şer bijîşkî dîke û di wê demê de bûyerên Sariqamiş û komkujiya Ermenan pêk tê. Piştî şer Celadet û Kamiran diçin Mûnixê li cem birayên xwe yên li Mûnixê dijîn. Birayê Celadet, Saffet, li Mûnixê dimire. Celadet gelek di bin bandora mirina wî de dimîne.

Celadet diçe Şamê û li wir dijî. Li Şamê bi Rewşen Xanim re dizewice û du zarokên wan çêdibin. Li Şamê Celadet û hevalên wî kovarên Kurdî derdixin. Piştî demekê gelek rewşa wan ya aborî xêra dibe. Ji Husên Beg dixwaze li ser erdê wî pembû biçîne. Li ser erdê Husên Beg bîrekê vedike û dixwaze ji bîrê av derxe lê bi motorê ve dişiqite û dikeve bîrê. Wî ji bîrê derdixin lê li nexweşxaneyê dimire.

4.1.1. Cih di Romana Bîra Qederê de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Stenbol û Kadiköy, Büyükkada, Seyrengaha Modayê, Lûbnan û Berûd, Bexçe
Cihên Girtî û Teng	+	Stenbol cihê mişextiyê, Qonax, Piştî hatina hezaran Stenbol, Di dema şer de cihan, Meydana şer, Piştî şer Elmanya û Munîx, Di dema Hîtlerê Ewrûpa, Piştî koçkirinê Lûbnan,
Cihên Çandî	+	Stenbol
Cihên Olî	+	Mizgeft, Medrese, Zîyaretgah
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Stenbol, Fotografxane-î R. Xendamian, Girava Büyükkada, Kiziltoprak, Dolmabahçe, Pira Galatayê, Osmanî, Dikana Signore, Pansiyon, Xweza, Cihan, Wiyana, Elmanya, Misir, Bajare Cuniyê, Şam, Lubnan, Aşxane
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	-	
Cihên Fantastîk	-	
Cihên Derî Sirûştî	+	Bihuşt, Roja Mahşerê, Dojeh
Cihên Sehekî	+	Odeya Celadet, Dîmenên wêneyan, Wiyana, Munîx, Beyrûd û Şam, Gundê Bilûrvanî

4.1.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Romannivîs bi teswîreke dirêj dest pê romanê dike. pêşî dixwaze mekanê nîşanê xwîneran bide paşê derbasî bûyerê be. Ewqas teswîreke dirêj dike ku her tişt li ber çavan xuya dibe. Em dizanin ku Bîra Qederê romaneke biyografîk e û li ser jiyana Celadet Bedîrhan hatiye nivîsîn. Romannivîs ewqas agahîyên kûr dide ku xwîner dibêje qey Romannivîs bi çavê xwe her tiştê ditiye. Ev tişt ji bo nivîskar serkeftineke pir mezin e. Mehmet Uzun bêriya bûyerê dixwaze xwendevanan bikşîne hundirê bûyerê ji ber vê jî bi gelek berfireh atmosfera wê demê li ber çavan zindî dike. Bi sê rûpelan nivîskar qala Stenbol û Kadiköyê dike. Ji ber ku di şayesandina mekanê de cihên fireh û vekirî hatiye bikaranîn em ê di bin vê beşê de binivîsnin. Romannivîs dema ku şayesandinê dike ti tengbûn dernakeve pêşiya xwîner. Destpêkê de Romannivîs dixwaze bi dîmeneke xweş derkeve hemberî xwîneran. Mînak :

Sal, 1893 ye. Demsal, bihar, ji mehan Gulan, ji rojan rojêke germ, vekirî û xweş e. Bihar û gulên hatine; der û ber hêşîn, dinya germ, esman gewher e. Stenbol û Kadiköy di nav govenda rengan de ne. Reng bi ser ketine, dinya ji nû ve vedije. Jiyanê nû dest pê dike.

Di bergehê de tiştê herî berbiçav, zerya (derya) ye. Zerya di nav rengê kesk û şîn de hemû wêne rapêçaye. Tonên rengê şîn lê ne. Li aliyê dûr spiyeke qerqas desthilat e. Li der û dorên qeraxên zeryayê tarîtiyeke qer li ser avê dixuye. Di navbera herduyan de jî hin celebên din ên rengê şîn hene. Esman çîkvekirî ye. Li cîhê ko zerya û esman bi hev re dibin yek, komên ewran çîlspî ne. Lê li jorê, cîhê ko êdî ewr diqedin, esman bi rengê şîn xemiliye. Rengê spî xwe qulipandiye ser rengê şîn. Ewr di nav hev de ne, lê nerm û sade dixuyin. Ne sawa berf û baranê, ne jî tirsê ba û bahozê lê ne. Ew di nav spehîtiyeke zarîf de ne, mîna ko ew mizgîniya jiyana nû bi dinyayê digihînin...(r.11-12-13)

Di gelek beşên romanê de hesta wî ya li ser Stenbolê tê vegotin. Di Stenbolê de jî cihên ku Bedirxaniyan dijîn derdikevin pêş. (Purçak, 2019, s. 28) Romannivîs wek nivîskarek realist dixwaze her tişt binivîse hemû agahîyên li ser cihê bide xwîneran. Ji bilî dubarekirina hin tiştan xwendevanan zêde eciz jî nake û cih bi gelemperî jî li ser rewşa bûyerê bandor jî çêdike. Romannivîs tenê cihên teng jî şîrove nake wek cihên fireh behr bajarên jî bi awayekî hoste teswîr dike. Di mînaka jêr de Romannivîs qala xaniyên Bedirxaniyan dike lê xwe bi tenê teswîrkirina xaniyan sinordar nake li

ber wê jî teswîra Büyükkadayê jî dike. Û dîsa ji bo fehmkirina xwendevanan, di derheqê atmosferê de gelek agahiyan dide:

Li Büyükkadayê, li milê bakur, li ber quntara girê Îsa ko tirk jê re dibêjin Îsa Tepesi, du xaniyên havîngeh ên malbata Bedirxaniyan hene. Herdu xanî jî mîna hev, lê ji hevûdu hinekî dûr in. Ew bi du qatan, ji ber û keviran lêbûne û bi siwaxeke spî hatine siwaxkirin. Xanî fireh in, lê bêguman ew têrî malbata mezin a Bedirxaniyan nakin. Loma jî endamên malbatê bi dorê tên Büyükkadayê. Büyükkada, xweştirîn havîngeha Stembolê, lûlûya Marmarayê, warê duwemîn ê Bedirxaniyan e. Ew bi hêsanî xwe radigihînin Büyükkadayê. Jixwe Kadiköy û Büyükkada ne zêde dûrî hev in. Ji lengergeha Kadiköyê, bi keştiyê, di bîskeke de, meriv xwe digihîne Büyükkadayê. Loma jî endamên malbatê kengê bixwazin, hingê derin Büyükkadayê(r.31)

Di gelek beşên romanê de Celadet hezkirina xwe ya li ser Stenbolê vedibêje. Di Stenbolê de jî cihên wek Moda, Kiziltoprak û Ûskûdar derdikevin pêş. (Purçak, 2019, s. 28) Romannivîs li jêr seyrangeha Modayê teswîr dike û li gorî wî cehekî ji cihên herî xweş ên Stenbolê ye. Pêşî dixwaze cihê wê vedibêje paşê qala xweşîkbûna wê dike ewqas jê hez dike paragrefek hemû dide teswîrkirina wê ji ber vê jê em dikarin seyrangeha Modayê wek cihekî fireh û vekirî bihesîbin:

Seyrangeha Modayê ko Osmanî jê re dibêjin Moda Çayiri, cihekî ji cihên herî xweş ên Stembolê ye. Moda Çayiri ji qonaxa Bedrî Paşa hinekî bi dûr, li ser çend giran, bi dar û ber tijî, li peravên Marmarayê, bihuşteke bira ye. Ew di navbera Moda Biçûk û Moda Mezin de, lê bêtir nêzikî Moda Mezin e. Moda Çayiri, nemaza bihar û havînan, dibe seyrangeheke yekta. Hingê her der di nav hêşnahiyeke bêpayan de ye. Gul û kulîlk bi rengên xwe yên cuda hemû hawirdor dixemilînin. Ji ser daran dengê bilbil û şalûran tê. Dengê ava coyên biçûk li dengên çûk û teyran zêde dibe. Li seyrangehê çend çayxanên havîne hene ko hertim tijî ne. Ji çayxanan, Marmara mîna xweştirîn bergeha cîhanê dixuye. Rojên îniyan, çaxa ko xelk ji kar û şixulên xwe vala ne, ew pêl bi pêl tên seyrangehê. Hingê, rojên îniyan, ne îşê aqil e ko meriv were seyrangehê. Lê niha, di vê roja sêşemiyê de, seyrangeh û çayxane hinekî sakîntir e.(r.34)

Li Lûbnan û Berûdê demeke xweş dest pê dike. Piştê Fransizan li Lûbnanê hikûmet saz dibe û ew bûyer jî li Lûbnanê jiyane xweştir dike û her tişt li gorî berî

xweştir dibe û xweşikbûna xwe nîşan dide. Romannivîs jî dixwaze ji xwîneran re welatekî azad bide nişandan û bi saya azadbûna wan firehbûna cihê bîne ziman:

Ji der û dor bîhna axê û dar û ber difûre. Li milê çepê yê şaneşînê, li ser çiyar, keskesoreke zêrhêlî, bi hemû rengên xwe, dibiriqe. Berî niha bi bîstekê, baraneke boş bi ser girê Qesra Mezin de hat, bi qasî kêliyekê barî û winda bû. Niha çiya bi rengên keskesorê diçirûsin.

Lubnan û Bêrûd bi rengên keskesorê diçirûsin. Hêvî ji Lubnanê difûre. Ew grewên karker, esnaf û parêzgeran, serhildanên kesab, goşkar û necaran, şer û pevçûnên gel û terîqetan rawestaye. Jiyana aborî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Jiyana siyasî nermtir dibe. Li Fransayê, piştî helbijartina giştî, hikumeteke nû ya Êniya Gel, bi serekiya Leon Blum, hatiye ser hikum. Piştî guherîna hikumeta Fransayê, li Lubnanê jî helbijartin çêbûye û serekekî nû yê lubnanî, (ne fransîz), Emile Eddé hatiye helbijartin. Tevî ewr û baranê, dinya nerm û germ dibe. Rengên keskesorê dixuyin. (r.224-225)

Bîlgîn li ser têkiliya cih û hiş wiha dibêje: Mal bi taybetmendiyên xwe yên cih, eşya û malbatê re cihê hafîzayê ne. (Purçak, 2019, s. 27) Celadet xwe di bexçeyekî de dibîne û bîra baxçeyê ronî ye û li wir zarok dilizîn ew tişt jî kêfa Celadet tîne ew der jê re dibe cihekî vekirî û fireh:

Celadet Beg dere, di nav rengê spî de, heşê wî, wî dibe bexçeyekî û bîra bexçe ronî ye, çend zarok li bexçê, dora bîrê dilîzin. Zarok li dora bîrê dizîvirin. Darên qaîm ên çinarê bi pelên xwe, bi esmanan ketine. Kulîlkên dareke henarê rengên germ ên keskesorê tînin pê. Gul û kulîlk bişkovîne. Mêş û moz li gulên nûbişkovî vedinjin. Çend çivîk li ser daran dixwînin. Ji hinekî dûr ve, dengê pêlên zeryayê tê. Kevirên bîra ko zarok li dorê çerx dibin, xwîdan dane, dilop, yek bi yek, ber bi bîrê gêr dibin. Zarok, bi gavên revê, dizîvirin. Yek ji zarokan, mezinê wan, bi çend gavan li pêş zarokên din dizivire. Zarokê pêşî hem dizivire hem jî carina vedigere û li yên din dinihêre. Ew dest li wan dike. Ew dizivire, ronahî hîn bêtir dibe, gewrahî hawirdor vedigire. Kêfa zarokê li pêş bêpayan e, »mehr licht«, ew dibêje û çerx dibe. Li dora bîrê, di nav ronahiyê de, ew dizivire... (r.294)

Bi teswîrên dirêj romannivîs cihên vekirî û fireh bi kar tîne carinan hin şayesandinên romannivîs 3 rûpelan dertê pêşiya me. Ev şayesandinên dirêj ji bo

romannivîsê xurtbûnek e lê carinan ev dirêjbûn dibe ku xwîneran aciz bike. Di mînakên jor jî tê dîtin di romanê de gelek caran cihên vekirî û fireh tên bikaranîn.

4.1.1.2. Cihên Girtî û Teng

Ev mijarên romana Kurdî bikaranîna hêmanên romanê jî diyar dikin. *Di romanên Kurdî de em dibînin ku “welat” mekanê sereke ye. Li dû vê mekanên sirgûnê dertên pêş, bi taybet Stenbol û rojavaya Tirkîyê. Di romana “Bîra Qederê” a Mehmed Uzun de em Stenbolê wek mekanê sirgûnê dibînin.* (Kaynar, 2020, s. 35) Dema ku li romanê were nêrîn ew ê were dîtin ku vebêjer qala Şamê dike û Şam jî wek welatekî sirgûnî tê dîtin. Cihê eş û kederê, goristana malbata Bedirxaniyan û wek şahide mirina Celadet tê nişandan. (Purçak, 2019, s. 27) Di romanê de Şam ji ber van tiştan wek cihekî girtî û teng e. Di beşa jêr de ew tişt tê vegotin:

Şev e. Îşev 22-ê tîrmehê ya 1951-an e. Şev, Şeva ko dora romana Bîra Qederê rapêçaye, bi giranî daketiye. Dinya germ e. Şam, bajarê sirgûnê, warê derd û keseran, goristana malbata Bedirxanan, şahîdê mirina Celadet Alî Bedirxan, westiyayî, dikeve xewê. Şeva giran û westiyayî rûniştevanên bajarê kevn û navdar Şamê dixê nav hêlekana xewê û dilorîne. Xalîçeya ji stêrikan pêkhatî, li jor, li esmanan, bi rengên xwe yê xas ên welatê rohelatê, li xewa şeva Şamê nobedari dike.(r.7)

Romannivîs ji bo romanê diyar e ku gelek xebîtiye an jî di xeyalên xwe de li ser cihê gelek fikiriye. Lewra dema ku qala qonaxa Bedirxaniyan dike agahiyên pir kûr dide. Wek avahîzayekî li ser qonaxê disekîne û bi rastî jî qonax tîne ber çavan. Û di eynî demê de jî ji wê demê jî agahîyan jî dide me. Wek me li jor jî anî ziman qonax nîşaneyê statûyê ye. Em ji qonaxê fehm dikin ku malbata Bedirxan malbateke mezin, esîl û devlemend e. Di nav gel de xwediyê statûyek e. Lê li minaka jêr de ji bo rewşeke xirab hazirî tê kirin. Tê xwestin ku xwînerê ji bo rewşeke xirab amade bike. Ji hevokan behntengî xuya dibe û hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê ruhî ve cihekî teng tê şayesandin:

Qonax, sê qat e û li gora avasaziya osmanî hatiye lêkirin. Du qatên jêrîn, ji herdu aliyan, fireh in. Lê qata jorîn, bi tenê dirêj e. Loma, ne sê qat, lê meriv dikare bibêje ko qonax du qat û niv e. Qata jorîn ji navenda xênî ber bi jor dibe û estetîkeke taybetî ya avasaziyê dide qonaxê. Li rûyê pêşîn ê qata jorîn pencereyêke dirêj û fireh

heye ko xweşiya avasaziyê dineqîşîne. Li ber pencerê jî balkoneke, bi gotina kevn, şaneşîneke biçûk heye. Ji wê derî meriv dikare hemû pêlên zerya, yek bi yek, bijmêre. Ji wir ebediyeta ewr û esman, av û zeryayê, mîna tabloyeke resamekî hoste, baş, pir baş dixuye. Bana qonaxê, ji herdu milan ve, ber bi jêr, xus dibe û bi qermîtên sor raxistî ye. Ev qermîtên sor pir xweş li rengên xênî û hawirdor hatine. Rengê qonaxê spî ye û hawirdor jî di nav rengên kesk û şîn de ye. Gava rengê sor jî li wan zêde dibe, cumbuşa rengan tamam dibe û rengên herî xweş ko li ber dilê kurdan pir ezîz in, derdikevin holê; kesk, sor, zer û gewher... (r.13-14-15)

Romannivîs pêşî dest bi xweşîkbûna giravan dike lê paşê dibêje ku ji ber hatina mirovên ji derdorên êdî ew der ne wek berê ye, çiqas diçe teng dibe û ji bo kargerîndeyên dewletê re têr nake. Em ji minaka jêr fehm dikin ku hin cih bi hatina mirovan re firehbûna xwe winda dike û xweşîkbûna xwe wek berê nikare nîşan bide:

Büyükada û çend giravên din, mîna yaqûdên zumrudî, gewriya Zerya Marmarayê dineqîşînin. Giravên Kinali, Burgaz, Kaşık, Heybeli, Büyükada, Pide, Tavşan û Sedefê bûne cihê starê, cihê bihnvedan û îstirehetê. Stembola kevnare, Konstantinopolisa cîhana xiristiyanan, navenda tevgera ronakbîrî û çandî ya dewleta Osmanî êdî roj bi roj teng dibe. Ji her aliyên tixûbên bêser û bêber ên Osmanî, ji her millet û gelî, bi hezaran kes tên li Stembolê bi cîh dibin. Stembol, payitextê dewleta Osmanî êdî ji kargerîndeyên dewletê re biçûk tê. (r.31)

Di sala 1914 an de li cihanê şerekî mezin derdikeve û welatên mezin dest bi şer dikin û êdî cîhan jî cihekî teng û girtî dibe ji ber mirov dikevin nav tengasiyê û gelek mirov tê wê şerê de dimirin û dijwarî çiqas diçe mezin dibe, mirov azadbûna xwe winda dikin û rojên tarî dest pê dike. Ji ber vê jî sala 1914 de ji minaka jêr jî tê fehm kirin ku cihanê ji bo mirovan tengtir dike:

Di van rojên dawiya tebaxa 1914-an de, nûçe û xeberên pir giran û girîng, bi leza birûskê, li pey hev tên. Şerekî pir mezin ê cîhanê dest pê kiriye, dewletên herî mezin û desthelatdar ên cîhanê ketine hev. Fransîz, ingilîz û îtalî li aliyekî ne, aleman, nemseyî û rûs jî li aliyekî ne. (r.87)

Li jêr Celadet di meydana şerê de ye. Wek ku em dizanin di dema şer de mirov azadbûna xwe winda dike. Celadet jî beye leşker û derketiye meydanê û welat û

cihan hemû êdî cihekî ne ewle ye. Ji ber vê jî her der êdî ewlebûna xwe winda kiriye bûye cihekî teng:

Celadet deriyê mezela eskerî vedike û derdikeve der. Bi qasî bîstekê, ew li ber derî radiweste, dest û milên xwe diguvişîne. Textê wî yê razanê, mîna teht hişk û sert e. Ew carina, bi qewlê fransizan »gymnastique« dike, lê ew zêde nikare xwe bilivîne, bilebitîne. Kar û şixulên wî her li garnîzona navendê ye. Tevî ko ew gelekî bala xwe dide xwarina xwe, ew qelew dibe. Ew hinekî li dora xwe dinihêre. Hewşa garnîzonê gelek fireh e. Garnîzon mîna keheheke biçûk hatiye lêkirin. Li ser dîwaran cîhên nobedaran hene, deriyê mezin ê garnîzonê ji hesin e. Hinekî ji mezelên zabitan bi dûr, bîreke mezin li hewşê heye. Di destpêka şer de, eskeran ew bîr vedaye. Bîr bûye navenda garnîzonê; ava vexwarinê ji bîrê tê kişandin, esker li kêleka wê kincên xwe yên tijî kêç û sipî dişon, zabitên mezin ên kuştî li wir tîn şuştin û kefenkirin, danê sibê û êvaran, zabit li kêleka wê dicivin û sohbeta rojê dikin. Bîr bûye bîra qedere ya enî û qada şer(r.94)

Elmanya qeweta xwe ya berê winda dike û ji her alî ve dikeve tengasiyê pere wan qîmeta xwe winda dike li hemberê dolarê. Li Elmanyayê êdî tê kar nayê dest xistin û ew jî rewşa Celadet û mirovên Elmanyayê xêra dike û Elmanya êdî dibe cihekî teng û girtî:

Rewşa me, ne tu rewş bû. Rewşa me şerpeze, halê me pêrîşan, neçarî û kambaxiya me bêpayan bû. Roj ji rojê xirabtir, bûyer ji bûyerê kirêtir bû. Alemanya bi leza birûskê ber bi geliyekî bêbinî gêr dibû. Aboriya Alemanyayê mîna hûtekî, mîna geremola lehiyekê her çi dihate berê dadiqultand. Diravê Alemanyayê mark, mîna pelê ber bayê, berfa ber tavê, her roj, her saet, her deqîqe, qîmet winda dikir. Dolar, bêpayan buha û bilind dibû. Li Alemanya jihevketî û hilweşiyayî tu kar û şixul jî nîn bûn ko meriv bi dest xista. Li milekî, li Alemanyayê rewş weha kambax bû. (r.134)

Wek me minaka li jor jî anî ziman êdî Elmanya qeweta xwe winda dike. Munîx ku ji berê cihê kêf û şahiyê bû êdî dibe cihê kîn, nefret û mirinê. Bêhna xwîn û mirinê jê tê û firehbûna xwe jê dest dixê:

Bîhna mirinê dor li Munîxê girtiye. Bajarê huner û musîkê, die weltstad mit herz, niha dilê xwe ji kîn û nefretê, ji mirin û kuştinê rê vekiriye. Bajarê kêfê, niha, bûye bajarê keserê. Tava ko jixwe pîrî caran winda ye, niha, yekcar ji bajêr xatir xwestiye,

Bajar, avahî, qesr, dêr, birc, heykel, kolan û navendên wî yên çand û hunerê, di bin ewrên tarî û girtî de, niha, şahîdî li esebiyetê dikin. Bîhna xwîn û mirinê dor li avahiyên spehî yên barok û gotîkê digire. Bajarê kevnar ko bi rengekî qurşûnî xwe xemilandiye û bûye navenda hunera germenî, niha, kesertijî û bêhuzûr e. Cîhan, Alemanyayê, Munîx û Celadet rojên pir dijwar derbas dikin. Bîhn li wan çikiyaye. Alemanyayê ko ji ber krîza nedîtî ya aboriyê li ber în tixarê ye, bi bûyerên siyasî û civakî diçelqe. Alemanyayê, navenda Awrûpayê, li pey riyên nû û çareyên saxbûnê ye. (r.138-139)

Sala 1925 an dinya dest bi demeke nû dike. Li jêr dibêje ku rojekî xweş e lê hev hevok divê me nexapîne ji ber ku li Ewropayê demeke ne xweş ew ê dest pê bike li Elmanyayê Hîtler tê serî. Li welatê din jî tevgerên wilo dest pê dikin:

ro, rojê xweş, 22-ê gulana 1925-an e. Bi qasî sê salên Celadet li vî aliyê dinê derbas bûn. Niha ew rûyê xwe dide aliyekî din ê dinê. Ev aliyê dinê, Awrûpa, mîna hêlekaneke bêserî, di nav aloziyan de dere û tê. Awrûpa avis e, guherînên nû dê, li her alî, biqewimin. Li Alemanyayê Hitler û hevalbendên wî şikesteke mezin xwarin, lê ew ji nû ve xwe didin hev da ko hikum bi dest xînin. Li aliyên din ên Awrûpayê jî tevgerên weha, roj bi roj, xurttir dibin. (r.145)

Celadet û hevalên wî li Lûbnanê ne li mijara wan welatê Kurdan e. Welatê Kurdan bûye 4 perçe û her perçe ketiye destê yekê. Xelk westîya ye bêquwet bêtaqet bûhêvî mane da ku rojên kambax biqede. Welatê Kurdan bûye gor û gorîstan û êdî welatê Kurdan rîng û girtî ye li gorî vegorînên jêr:

Celadet Beg, birayên wî Sureya û Kamuran, mamê wî Xelîl Ramî Beg, hevalên wî û bavê wî Mewlanzade Rifat, Memduh Selîm, Dr. Mehmed Şukrî Segban, Haco Axa û hin kesên din li bajarê biçûk ê Lubnanê Cuniyê, li mala Xelîl Ramî Beg civiyane. Cuniyê, bajarê biçûk ê file ko li kêleka Beyrûdê ye, îro mazûbaniya rêber û ronakbîrên kurdan dike. Ronakbîrên kurd li hev civiyane û ew ê li ser rewşa kurdan û welatê wan bipeyivin. Li welatê her tişt tevîhev bûye; welat bi destên dewletên biserketî perçe bûye, ji perçê herî mezin ko li nav tixûbên dewleta nû, Tirkiyê maye, dûman bilind dibe. Ew perçe di nav şewateke xedar de ye. Perçê Iraqê ketiye bin destê ingilîzan, ê Îranê di bin destê farîsan û yê Sûriyê jî di bin destê fransîzan de ye. Xelkê westiyayî ko di şer de li ber lîngan çû, niha, bêquwet, bêtaqet û bêhêvî, hewl dide dako rojên kambax biqedîne. Tevger û serhildanên kurdan bi ser neketine.

Gelek rêber û ronakbîr hatine kuştin, piraniya yê mayî bi derine xerîb reviyane. Bûm û kund li ser kavlên welatê kurdan venîştine û dixwînin. Welatê kurdan qulipiye ser gor û goristanê. (r.155)

Wek cihên vekirî û fireh, cihên teng û girtî bi şayesandinên dirêj gelek caran derdikeve pêşiya me. Carinan hin cih ji ber rewşa derûnnasiya lehengan ve teng dibe hin cih jî ji ber tengbûna xwe derûnnasiye lehengan xêra dike. Di minaka dawî de jî tê dîtîn ku gelek rewşenbîrên kurdan li Lubnanê bajarokekî biçûk kom dibin. Ev bajarok hem ji aliyê fîzîkî ve biçûk e hem jî ji aliyê rewşa Kurdan vetengbûn û girtîbûnek li ber çavên me dide xuya kirin. Di bikaranîna cihên teng û girtî de romannivîs bi gelek mînakên dirêj ve dertê pêşiya me.

4.1.1.3. Cihên Çandî

Stenbol bajarekî çandî ye. Di hundirê wê de mirov rastê her tiştê tê li gorî perçeyên jêr. Mizgeft, der, sinagog û her wekî din der tîna pêşiya mirov. Xwediyê ziman, ol û çanden devlemend e û gelek berhamên medeniyetên cuda tê de cih digirin. Romannivîs jî ev gotinên ku me di romanê de bi kar tîne û ji bo cihê çandî Stenbolê teswîr dike:

Stenbol, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, li ber lingên wan e. Stenbol, bajarê xwediyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwediyê mizgeft, dêr û sinagogên bedew û rengîn ên herî xweş; xwediyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwediyê keleh, birc û sûrên bilind, dirêj û bêdawîn; xwediyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwediyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwediyê çayxane û meyxaanên germ, esrar û heşîşxanên dûmantijî; xwediyê mal û kerxaanên kufîkî, medrese û kitabxanên zîvhêlî û neqîşandî; xwediyê tava germ, tîrêjên sor, heyva ron û stêrikên çirûsî... Celadet li Stenbolê dinihêre. (r.101)

Hin cih carinan bi erkên cuda cuda tîna bikaranîn. Stenbol jî di romanê de cihekî wiha tê dîtîn. Carinan nivîskar di bin beşa cihên vekirî û fireh de bikar tîne carinan jî wek ji mînakên jor di bin beşa cihê sehekî de bi kar tîne. Dibe ku li gorî dem û bûyerê ve ev erk were guherandin û di bin beşa girtî û teng ve jî were bikaranîn. Ji bo romanê ev xurtbûnek e lewra cih tenê bi rewşek nayê bikaranîn. Li gorî dem bûyer hest û hwd. yim diguhere.

4.1.1.4. Cihên Olî

Cihên olî bi gelemperî tenê bi nav di romanê de cih digirin. Romannivîs di hin cihan de qala wan dike lê tenê bi çend hevokan ve tîne ziman û qet teswîra wan nake:

Li aliyê din ê Pirê, mizgeft, minareyên wan ên dirêj, qonaxên li ber avê, banên xaniyan û çend ewrên nîvres, bi hev re, panoramayeke spehî tînin pê. (r.49)

Stenbol wek li beşa cihên çandî de jî hat vegotin bi gelek erkên xwe dertê pêşiya me. Di beşa olî de jî eynî hevok tê bikaranîn ji ber ku di hundirê hevokê de hem cihên çandî hem olî hem cihên vekirî û fireh tê dîtin:

Stembol, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, li ber lingên wan e. Stembol, bajarê xwediyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwediyê mizgeft, dêr û sinagogên bedew û rengîn ên herî xweş; xwediyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwediyê keleh, birc û sûrên bilind, dirêj û bêdawîn; xwediyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwediyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwediyê çayxane û meyhanên germ, esrar û heşîşxanên dûmantijî; xwediyê mal û kerxanên kufikî, medrese û kitabxanên zîvhêlî û neqîşandî; xwediyê tava germ, tîrêjên sor, heyva ron û stêrikên çîrûsî... Celadet li Stembolê dinihêre. (r.101)

Gor hem cihekî çandî ye hem jî cihekî olî ye. Li jêr jî Celadet gora bapîrê xwe daye çêkirin û gor bûye ziyaretgah û gel diçin vir xwestekên xwe mîrazên xwe tînin ziman:

Wî gora bapîrê xwe daye çêkirin. Gor bûye mîna maleke biçûk, her çar aliyên wê bi qorên keviran, bi dîwaran lêbûye, banekî biçûk jî rakişiyaye ser. Gor bûye ziyaretgah, cihê xwestek û mirazan, gazin û armancan. Îşev, di vê bêdengiya Sevê û Sewqa stêrkan de, Celadet Beg çiraya biçûk a gazê ya tîrbê vexistiye, li ber serê Mîr rûniştiye û geh li kaxizên ser çoga xwe, geh li tîrbê, geh jî li bilûrvanê xwe dinihêre. Bilûrvan jî li ber lingên Mîr rûniştiye, geh dibêje, geh lêdixe. (r.255)

Cihên olî carinan tenê bi nav derbas dibin carinan jî bi şayesandineke xurt tê dîtin. Dema ku qala Stenbol tê kirin bajarê xwediyê mizgeft, sinagog û der tê gotin. Cihên olî tenê bi nav derbas dibin lê dema ku qala gora bapîra Celadet tê kirin bi şayesandin ev vegotun tê kirin.

4.1.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Piştî destpêkê her hebê wê bi teswîrên wêneyekî 16 beş derdikevin pêşiya me. Di wan wêneyan de cihên girîng ji bo Celadet tên dîtin. Di navbera wan de cihê girîngtirîn bêguman Stenbol e. Lewra cihê dayîkbûna Celadet, cihê ku Celadet zaroktî û xortaniya xwe derbas kiriye Stenbol e. Û Celadet evîna xwe ya yekem li Stenbolê nas dike. (Purçak, 2019, s. 28) Romannivîs dîsa mezinbûna xwe bi agahiyên xwe nîşanê me dide. Bi xwendina romanê di serê xwendevanan de 2 pirs çêdibin. Gelo Romannivîs tiştên ku dibêje ji xwe dibêje? yanî her tişt Romannivîs afirandiye? Yan jî ev agahiyên ku dide me, hemû ji xebatên wî tîne? Lê di dawîya her du pirsan de jî di hişê xwîneran de bersîveke wiha derdikeve ku Romannivîs birastî nivîskarekî hêja ye. Mînakên jêr li ser atmosfera dema Celadet e. uzun dîsa gelek agahiyên berfireh dide xwîneran

Romannivîs qala sala 1895 an dike û atmosfera Kadiköyê ji me re vedibêje. Nivîskar ewqas hûrgilî agahîyan dide ku her tişt li ber çavê xwîneran ronî dibe. Di 2 rûpelan de em Kadiköyê nas dikin. Di rûpela piranî li ser fotografkêşan disekîne lê di rûpela 26 an de taybetî li ser 2 fotografkêşan ji me re agahîyan dide:

Ev fotograf di wan salan de ko êdî gotinên »Ceco, Cecoyê min« li ser lêvan in, tê kişandin. Sal 1895 e, ji deman payiz e. Li hemû Kadiköyê du fotografkêşên hoste hene; Th. Servanis û R. Xendamian. Yê yekemîn cihû, yê duwemîn ermen e. Mîna her tiştê Kadiköyê, fotografkêşî jî di destê endamên milletên têkel de ye. Fotograf û fotografkêşî, hem li Stembol û Kadikoyê hem jî di nav hemû tixûbên dewleta Osmanî de, nav û tiştên nû ne. Nav û tiştên nû ko pir bala xelkê, lê bi taybetî jî pir bala giregir, dewlemend û paşayên dewleta Osmanî dikişîne. Berê lewhe û wêne hebûn, niha jî fotograf. Berê wênekêş û resam radihiştin pênûs û firçan û li ser kaxiz û cawan bi rojan, mehan, dixebitîn da ko resimek, wêneyek bînin pê. Lê niha fotografkêş, bi alîkariya makîna xwe, di nav kêliyê de, xebateke demeke dirêj tîne pê. Meriv, rû, çav, dev, nihêrîn, awir di nav bîskekê de direşin ser kaxizên taybetî yên spî û dibin nemir.(r.25)

Stembolî, bi taybetî jî Kadikoyî hê nû bîr bi nemiriyê û hunera fotografê dibin. Ew yek bi yek, rêz bi rêz derin atolyên Servanis û R. Xendamian û xwe dikin nemir. Ew fotografên xwe nîşanê hev didin, wan mîna kitêbeke muqedes di paşilên xwe de vedişêrin û bi serbilindî, car bi car, li kopiya xwe dinihêrin. Şoreşa nû xwe gîhandiye

Stembolê û pêl bi pêl fireh dibe. Meriv bi hêsanî dikare bibêje ko eger di destpêka salên 1890-an de, li hemû Kadiköyê, du kesên ko şixulê wan herî baş be hene, ew jî Theodore Servanis û Rafael Xendamian in. Belê, pêşnavê wan Theodore û Rafael e. Lê belê tu kes wan bi pêşnavê wan bi nav nake, ew monsiuer Servanis û Xendamian in. Atolyên wan hertim tijî ne. Paşa, zabit, dewlemend, nivîskar, rojnamevan, beg, jin, zarok, pîr û kal hemû tîn, xwe didin hev, li hember makîna reş a ecêb rûdinin, li qulika biçûk dinihêrin û tiştêkî pîr nû û xweş li jiyana xwe zêde dikin; fotoğraf (r.26)

Lewra hiş kok berdaye li ser tevger, îmge û tiştan. Loma her tişt dikare bibe cihê hişê. Bibîr xistineke dikare di navbera berê û niha rêyeke ava bike. (Purçak, 2019, s. 28) Di rûpela 27 an de Romannivîs wêneyek li ber çavên me dide zîndî kirin. Û bi teswîreke dirêj atmosfera wêneyê ji me re vedibêje:

Di binê vê nivîsarê de, îcar ji jêr ber bi jor, bi tîpên latînî weha hatiye nivîsîn; Th. Servanis, Fotografhe - Cadi- Keuy. Herçî qertên Xendamian in, li piştta wan, berî her tiştî, du zarok dixuyin. Zarok li hember hev in. Umrê wan, mîna Celadet, lawê Emîn Beg, ne zêdeyî du salan e. Yek ji wan tazî, yê din bi pêşgîrêkî xwe dipêçe. Li ber zarokê tazî makîneyeke fotografê, li ser sêpiyê, heye. Destên zarok li ser sêpiyê, çavê wî li ser qulika makîne ye. Ew haziriya kişandina fotografê dike. Li hember wî jî, zarokê din, bi rûkenî, li kamerayê dinihêre. Kêfa vî zarokê pîr li cih e, wî piştta xwe daye stûneke xweş a kevnar, bi destan herdu milên pêşgîrê girtiye, piyên xwe di ser hev re birine û bi ken li hember dinihêre; sûretê wî dê, niha, li ser kaxizan derkeve, ew ê, di nav kêlîkê de bibe nemir. Ev herdu zarok, bi hev re, wê kurte-dema ko şoreşa nû dike nemir, dijîn. Doralîyê zarokan jî bi pel û gulan rapêçayî ye. Li ser serê zarokan jî, bi tîpên erebî yên mezin, Fotografhane-i R. Xendamian - Kadiköy hatiye nivîsîn. Îcar li ber lingên zarokan jî, bi tîpên mezin û neqîşkirî yên latînî û bi fransîzî Photographie, Raphael Khendamian - Cadi-Keuy hatiye nivîsîn(r.27)

Romannivîs di rûpela 32 an de li ser girava Büyükkada disekîne û qala vê giravê dike. Bi paragrafek atmosfera giravê ji me re vedêbêje. Û ji vir jî derbasî mala Samîha Xanim dibe û di derheqê xanî de agahiyan dide me:

Bi taybetî jî Büyükkada. Büyükkada, girava kulîlkan e. Sal donzdeh meh girav bi rengên gul, bineş, şîlan, nîlufer, sosin, nêrgiz, qerenfîl, berbiro, gulale û beybûnê dixemile. Rengek wînda dibe, yekî nû tê dewse. Büyükkada, girava rengên dewlemend e. Girav hemû zerya direngîne. Rûniştevanên giravê yên esasî, hema çi bigire hemû,

masîvan in. Ew adet û ûsilên hezar salan, ji dem û dewrên Bîzansê, didomînin. Ew ji zeryayê werdigirin û dîsan didinê. Büyükkada, girava tarîxî, bi qasî ko havîngeh e, ew parêzgeh e jî. Ew, di nav zerya de, adet û ûsilên kevnare, li hember wext, dewr û dewranê diparêze.

Xaniyê ko Samîha Xanim û lawên wê tê de ne, li kêleka avê, li ser kaşekî, ava bûye. Wî piştta xwe daye girê Îsa. Li dora xênî darên spîndar û bî hene. şaneşîneke fireh û dirêj a xênî heye. Dora şaneşînê bi caxên textîn rapêçaye û ji şaneşînê hemû Marmara bi rengê xwe yê yaqûdî li ber lîngan e. Li herdu koşeyên şaneşînê du mêwên stûr ên tirî hene. Qurnên mêwan fireh in û ta û çiqilên wan, mîna banekê, hemû jorê şaneşînê dagirtiye. Mêw mîna holikekê, bi dûzan, taldeyekê dide şaneşînê. Çaxa dinya germ û xweş e, şênîyên xênî li wir rûdinin. Samîha Xanim û lawên wê Celadet û Kamuran li wir, li ser cilên raxistî rûniştine (r.32)

Di romanê de gelemperî Kızıltoprak derdikeve pêş. Ji ber ku mala Celadet û malbata wî li wir in. Ew bavê wî û birayên wî ji ber qedexebûyîna nîkarin derbasî bajarê xwe bibin. Loma Kızıltoprak cihê bîranîna wan e. (Purçak, 2019, s. 28) Romannivîs gelek caran teswîra xaniyan dike li jêr jî xanî wek atmosferek were ava kirin tê teswîr kirin. Mala ku Celadet wan li rûdinin li Kızıltoprakê ye û nivîskar heta hundirê odeyan jî ji me re vedibêje:

Mal, li Kızıltoprakê, hinekî ji taxê bi dûr e, ew ji bexçeyekî fireh û xaniyekî duqatî tê pê. Her qatek çar ode hene. Odeyên qata jorîn, yên razanê ne; oda Emîn Beg û Samîha Xanimê, oda Sureya, oda Celadet û Kamuran û oda Hikmet, Tewfik û Safter. Di qata jêrîn de jî saloneke fireh û dirêj ko ji du milan tîn pê, odeyêke fireh a xebatê, odeyêke mêvanan û odeyêke mezin a hizmetkarên malê hene. Oda xebatê, odeyêke fireh e û li bexçê dinihêre. Li aliyê bexçê, li ber pencerê maseyêke dirêj û li koşeya rastê ya masê sandûqeke biçûk heye. Li kêleka sandûqê jî pênûsin û du murekebdank, bi dûzan, hatine rêzkirin. Li ber sandûqê jî kitêbek, di nav bergekî çerm de, mîna remzê masa xebatê, hertim bal dikişîne. Kitab, destnivîsa Mem û Zîn a şairê navdar û milî yê kurdan Ehmedê Xanî ye. (r.41)

Romannivîs sereya Dolmabahçe li jêr teswîr dike. Qala ji mezinbûn û xweşikbûna wî bigirin heta xaliçeyn erdê jî dike:

Dolmabahçe, salona herî xweş û mezin a hemû Awrûpayê bû. Salon, tîmsala xweşî, mezinahî û spehiyê bû. Li erdê xaliçên mezin, fireh û rengîn raxistî bûn.

Kêlekên deriyê mezin ên salonê bi mehfûrên rengîn ko ji her aliyên welatê fireh ê Osmanî hatibûn, raxistî bûn. Dîwar û banê salonê bi neqîşên naqaşên herî hoste hatibûn rengandin. Çira û şamdankên zêrîn û zîvîn xweşahiya dîwaran temam dikirin. Pencereyên salonê fireh û dirêj bûn û bi rengên keskesorê hatibûn xemilandin. Ji hemû salonê bîhneke mîna bîhna gul û emberê difûrî. Niha, Celadet, tevî bav û mamên xwe, li vê salonê bû!(r.45)

Romannivîs dîsa wêneyekî şîrove dike tiştê ku tê de dibîne ji xwîneran re vedibêje. Di wêneyê de Pira Galatayê xuya dibe. Bi Pira Galatayê ve derdora wê jî bi hûrgilî tê wesifandin:

Fotograf bergeheke xweş a Pira Galatayê nîşan dide. Hemû pir, doralîyên wê, meriv, hemal, ker, erebe, fayton tê de ne. Fotograf ji ber devê aliyê Galatayê tê kişandin. Ev ne bêsebeb e. Jiber ko kesên ko fotografê dikişînin, li aliyê Galata yê pirê dijîn. Ew wê ji aliyê xwe dikişînin. Fotograf bi devê pirê yê aliyê Galatayê dest pê dike û hema çî bigire, dev hemû pêşiya fotografê dadigire. Bi dû re, pir û herdu aliyên wê, her ko diçe, tengtir dibin. Li aliyê din ê Pirê, mizgeft, minareyên wan ên dirêj, qonaxên li ber avê, banên xaniyan û çend ewrên nîvre\$, bi hev re, panoramayeke spehî tînin pê. Hem însan hem jî bergeheke xweş a Stembolê di vê fotografê de dixuye. Yekîtiya însan û bajêr, kes û civatê tê de heye. Hejmara merivan pir e. Pêşî pênc nobedar û tehsîldarên pirê, pir xweş, heta simbêlê xwe, dixuyin. Sisê ji wan li aliyê çepê, yê din li aliyê rastê rawestane û di nav kincên xwe yê çîk î spî de nobedarî dikin. Tehsîldarê ko li ber devê aliyê rastê sekiniye, destê xwe yê rastê vekiriye û heqê derbasbûnê ji merivekî distîne. Yê din jî, çavên wan li ser şêniyan, rawestî ne. Li kêleka tehsîldarê herî rastê, çend kes, bi kincên reş ên spehî, di destên wan de sîwanên reş, ber bi aliyê Galatayê tînin. Du barkêş, barên giran li ser piştên wan, derin. Du jin, di nav kincên xweş de, li kêleka hev, derin. Du mêr, fes li serê wan, bi dest û piyan dipeyivin û tînin. Du ker bi barên bilind û li pey wan jî du hemal tînin. Kes û komine biçûk, li herdu aliyên pirê, xwe dane ber caxên pirê û li avê dinihêrin. Li jor, du payton li pey hev, derin. Dîsan li jor çend kes û çend sîwan dixuyin. Eger meriv bixwaze bihijmêre, li ser Pirê jî sed û pêncêyî zêdetir meriv derin û tînin û radiwestin. Yanê hejmar, li gora pira Galatayê kême e. (r.49-50)

Romannivîs qala sala 1905an dike û dibêje û derzî bavêjî nakeve erde li Pira Galatayê û di derheqê Galatayê de û derheqê demê de agahiyan dide me. Bi agahiyên xwe nivîskar di derheqê atmosfera wê demê de gelek tiştan hinê me dike:

Di vî danê êvarê yê payiza 1905-an de, pira Galatayê, Pira evîn û evîndariyê, xwenasîn û xwebûnê, mirin û kuştinê, di nav dengên 2 rengîn û heydadaneke şêrîn de ye. Bi gotina cihûyên Galatayê, eger meriv derziyê bavêje erdê, ew nakeve. Ewçend kelebalix e, ewçend şênî heye. Hin derin, hin tên, hin rawestane. Hin diqîrîn, hin dikenin, hin digirîn. Hin bi lez in, hin jî, mîna Evdilrezak Beg, Sureya û Celadet, kêfa vî danê êvarê, bi kêfxweşî dadiqultînin. Ji her derî deng tê; ji merivan, ji pirê, ji textên pirê, ji erebe û paytonan, ji keştî û qayikên doralî, ji aliyên Galatayê. Bi gotina kurdên Kadiköyê, dê weledê xwe avêtiye. Roj, roja mahşerê, roja axirzemanê ye. Ziman ketine nav hev, tirkî, kurdî, erebî, romî, îtalî, fransizî, slawî, bulgarî, îngilizî rabûne govendê. Rojêke din ji rojên bêhesab diqede. Ro, hemû giranî û westa rojê li ser milan, diçe ava. Roja payizê, bi rengên xwe yên cuda û taybetî, hêdî hêdî xatir dixwaze. Bajar û şênîyên bajêr haziriya êvareke nû dikin. Ji dûrve, du keştiyên dûkelî, bi mij û dûmanê, xwe berdidin nav zikê zerya Marmarayê, çend keştiyên biçûk ên bayî, xêliyên wan bi ba tijî, li ser avê, hêdî hêdî, xwe dilivînin û derin. Esmen çikî sayî ye, bi tenê tîrêjên tavê yên sor, li cihê ko tav dere ava, rengê sor û zer dide gewheriya esman. Li ber lingên pirê jî, masîvan di nav qayikên xwe yên biçûk de, ko bi pêlên avê hêdî hêdî xwe dilivînin, hem li pey masiyan in hem jî masiyên ko girtine, li ser agirê komirê, bigotina wan,»duqulipînin ser masiyên biraştî.«

Bîhneke têkel ê boş hemû Pira Galatayê vegirtiye. Bîhna zerya û avê, masî û agir, xwîn û xwîdanê ketiye nav hev. Bîhna lewantên xanimên Galatayê û xwîdana hemalên Stembolê bûne yek, bi hev re dimeşin... (r.51-52)

Bi paragrafa jêr Romannivîs piştê meşrutiyetî rewşa Osmanîyan ji xwîneran re vedibêje. Di derheqê atmosfera wê demê û rewşa sîyasî de bi çend paragrafan gelek agahîyên kûr dide. Bi saya nivîskar em fehm dikin ku piştê meşrutîyê atmosfera azad û xweş li Osmanî ava bûye:

Belê, li gora »waqa-nûser« û tarîxnasan, rûpeleke nû ya dewleta Osmanî vebûye; Meşrûtiyeta Duwemîn dest pê kiriye. Êdî Siltan Evdilhemîd ne desthilat e. Gerçî ew hê jî siltan û serekê dewletê ye, hê jî li saraya Dolmabahçê, Yildiz Sarayiyê mîna

padîşeh, li ser textê zêrîn rûniştiye, lê nema »hakîmê mutleqê« dewletê ye. Êdî sadrazamên wî nîn in, hukumetên wî nîn in, teşkîlata wî ya îstîxbarat û sîxuriyê nîn e, ordiya wî nîn e. Stêrkên ko di esmanên Boğazîçiyê de dixurûcin, yên wî nîn in. Karîna dewletê û çerxa gerandina karên wê ketiye destê komeleyekê ko jê re dibêjin »Ittîhat we Terakkî Cemiyeti.« »Ittîhat we Terakkî« ko xwe mîna »Nigehbân-i Meşrutiyetê« dibîne û dê di rûpelên bê de gelekî tesîr li rê û xaçeriyên romana Bîra Qederê bike, piranî ji zabit û sereskeran hatiye pê.

Kes, hêz û quwetên ko ji hukimdariya Siltan Evdilhemîd nerazî bûn, gihîştin hev û di rêberiya »Ittîhat we Terakkî Cemiyetî« de li dijî Evdilhemîd serî hildan. Û niha serhildan bi ser ketiye; Evdilhemîd hemû Şertên serekên serhildanê qebûl kirine. Sadrazam guheriye, hukimet guheriye, gelek ji paşa û sereskeran guherîne. Kanûn-i Esasî ko ji sala 1876-an û vir ve bi kar nedihat, qebûl bûye, Qanûna Tatîl-î Eşgal ko pêwendîya karker û karbidestan bi rê dixîne, derketiye. Azadiya çap û çapemeniyê qebûl bûye. Hilbijartina giştî çêdibe, Meclis-î Mebûsan ko daxwaza herî girîng a serhildanê bû, vedibe. (r.63-64)

Celadet diçe dikana Signore. Dikan biçûk û teng e zêde ronahî li hundirê tune ye lê bêhna pirtûkan li dûkanê bela bûye. Atmosfera dûkanê bi vî şiklî li jêr hatiye vegotin:

Dûkana Signore biçûk û teng e, tarî û kevn e. Çend mist ronahî, bi zehmetî ji derî û pencera fireh a pêşiyê, xwe bi hundirê dûkanê digihîne. Hemû aliyên dûkanê, heta dêv, bi kitab, kovar û weşanan tijî ye. Serê maseya ko li ber devê derî ye, bi çend qorên kitêban dagirtî ye. Bîhn û hilma taybetî ya rûpelên zer û rîzyayî bi ser dûkanê ketiye. Nêrdewaneke kevn bi çend pêpîlokan, li aliyê hundir rawestayê. Signore destekî xwe daniye ser pêpîlokekê û bi Celadet re, bi zimanê xwe yê taybetî ko ji îtalî û osmanî hatiye pê, dipeyive. (r.72)

Celadet û Canan diçin pansiyonek û Romannivîs di derheqê pansiyonê de agahiyan dide ku derbasî bûyerî bibe. Pêşî qala pansiyonê dike paşê derbasî odê wan dibe û hundirê odeyê teswîr dike:

Pansiyon sê qat e. Di her qatê de sê ode hene. Celadet û Cananê odeyek li qata herî jêrîn, lê li aliyê paş, hilbijartine. Ji ber ko oda wan li kêleka bexçê aliyê dawîn e. Bi hêsanî û bêyî ko ew kesekî bibînin yan jî kesekî wan bibîne, ew dikarin derkevin bexçê biçûk. Oda wan îro jî, mîna her car, tevlihev e; ode, odeya evînê û hezkirinê

ye, her kursiyek li derekê, li ser kursiyan cil û bergên Celadet û Cananê, bahlîf û lehîf li erdê, li ser masê jî xwarin û vexwarin û şûşeyên mey û araqê. Ew jî li ser textê razanê, di nav cîhan de, peregende, dirêj bûne.(r.80)

Dîsa li jêr bi wesifandina wêneyê Romannivîs ji me re atmosferê dide xuya kirin:

Lê belê, tiştên din ko bergeha fotografê tamam dikin, mana wê jî didinê. Li pêşiyê, li ber devê rê, li herdu aliyan cendekên merivan dixuyin. Li gundê nêzîk bi tenê du seg û çar ga yan jî çêlek dixuyin. Meriv nîn in. Li gundê aliyê jor ê li ber quntara çiyayê, bi tenê dûman heye, dû û dûmaneke zirav ber bi esmanan dibe. Li aliyê din ê şiverê, li ber konên reş, bi qasî heft, heşt hesp - heye ko ew qantir in - dixuyin. Ji konan hinekî bi dûr û hinekî nêzîkê rê, çar topên eskerî, lûleyên wan ber bi gundan, dixuyin. Li pey van hemû tiştan jî çiya hene, serê wan di nav ewran de, bi hev ve girêdayî, bêyî rê û bihur. Çiya rût û tazî ne, ne devî û dahlek, ne dar û berek, ne giya û hêşnahiyek û ne jî av û kahniyek. Ewrên li ser çiyayê jî, bergeha çiyê tamam dikin.(r.83)

Di sala 1914an de atmosfera cihanê diguhere şerekî mezin li dinyayê derdikeve û gelek welat tevî vî şerê dibin. Romannivîs jî li jêr atmosfera sala 1914 an vedibêje:

Di van rojên dawiya tebaxa 1914-an de, nûçe û xeberên pir giran û girîng, bi leza birûskê, li pey hev tên. Şerekî pir mezin ê cîhanê dest pê kiriye, dewletên herî mezin û desthelatdar ên cîhanê ketine hev. Fransîz, inglîz û îtalî li aliyekî ne, aleman, nemseyî û rûs jî li aliyekî ne. Herdu alî jî bi xurtî derin ser hev û bi xurtî hewl didin ko eniya xwe, bi dewletên dost û alîgir, fireh bikin. Ji bo herdu aliyan jî hebûn û piştgiriya Dewleta Osmanî pir girîng e û herdu alî jî li pey dostiya Dewleta Osmanî ne. Lê belê, Dewleta Osmanî ko di destpêkê de ne xwediyê siyaseteke diyar bû, niha siyaseta xwe diyar kiriye; ew piştgirî li eniya alemanan dike. Dewletê bi alemanan re peymaneke dostiyê îmze kiriye, generalekî alemanî kiriye serokê hêzên eskerî yê dewletê, seferberî îlan kiriye, hemû peymanên kevn ên bi dewletên din ên ewrûpî re, bi serê xwe, fesh kiriye û niha jî di nav haziriyên nû de ye.(r.87)

Di sala 1915 an de êdî şer dest pê kiribû. Şer çiqas diçû germ dibû. Kurd jî bi Osmanîyan re tevî şer bûbûn. Romannivîs jî wê mijarê li jêr vedibêje û atmosfera sala 1915 an bi çavê Celadet tîne ziman:

Wê roja zozanê çiyayên Torosê, em li ser riya eniya şer, bi gotina osmaniyan »şark Cephesi« bûn. Sal 1915 bû. şer pir germ bûbû. Agirên şer pêl bi pêl bi ser welêt de dihat. Welat bûbû dûjeh, meriv tê de difetisîn, dişewitîn. Herkesî ji xwe û ji der û dora xwe dipirsî; çima? Ji bo çi? Ji bo kîjan amanc û hedefan? Bi sed hezaran, bi milyonan meriv dihatin kuştin, xwîn diherikî, bajar dişewitîn, xirbe dibûn... Lê çima? Ji bo min û me kurdan jî bersiv nediyar bûn. Em ne ji rewşa welêt û kargirên wî ittîhatçiyên razî bûn ne jî ji rewşa kurdan û Kurdistanê. Siyaseta ittîhatçiyên hem li dijî welatê Osmanî hem jî li dijî Kurdistanê bû. Lê çare nîn bû. Em di nav şerde bûn. Welatê Osmanî welatê me bû jî. Diviya me ew biparasta. Loma kurdan jî, ji bo parastina welêt, çek hildan û ketin nav refên ordiya Osmanî. Em, kurd û bi sedan endamên malbata Bedirxanpaşazade, ketin ber bayê şer û her yek bi derekî deç ûn.»şark Cephesi «bû para min. Min cilên eskerî li xwe kirin û ez bûm zabî. Di destpêka şer de, Stembolî, rûniştevanên Stembolê, nedîçûn şer. Lê gava xeberên nexweş ên eniya Çanaqalê hatin û hejmara miriyên wê eniyê gihîştin sed hezaran, birîndar bûn çar sed hezar, hingî çek û pûsad bi Stembolîyan jî hate girêdan û ew jî ketin nav refên şer. (r.90)

Heybereke ku li cihekî dijî, di navbera wî/ê û cih de hesteke çêdibe. Li vê derê bi fikrên xwe û hestên xwe dijî (Bachelard, 2008, s. 33) Stenbol bi xweşikbûna xwe û bi atmosfera xwe ya wê demê ji aliyê Romannivîs ve li jêr tê vegotin:

Stenbol, bi hemû xweşî û bedewiya xwe, li ber lingên wan e. Stenbol, bajarê xwediyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwediyê mizgeft, dêr û sînogogên bedew û rengîn ên herî xweş; xwediyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwediyê keleh, birc û sûrên bilind, dirêj û bêdawîn; xwediyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwediyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwediyê çayxane û meyhanên germ, esrar û heşîşxanên dûmantijî; xwediyê mal û kerxanên kufîkî, medrese û kitabxanên zîvhêlî û neqîşandî; xwediyê tava germ, tûrêjên sor, heyva ron û stêrikên çirûsî... Celadet li Stembolê dinihêre.(r.101)

Romannivîs atmosfera Wîyana û Stenbolê dide berhev û di derheqê atmosfer û jinên Wîyanayê de agahiyan dide xwîneran:

Ev cîhana Wîyanayê ji ya Stenbolê û welatê osmaniyan, bi her tiştê xwe, pir cihê ye. Paqijîya bajêr, dûzan û rêkûpêkiya jiyana rojane, aramiya civatê, lixwekirina

şêniyan, aheng, neqîş û lihevhatina avahiyan û hejmara pir a rojname, kovar û weşanan gelekî bala wan dikişîne. Lê bêtir jî jinên Wiyanayê. Ew jinên Wiyanayê, bi bejna dirêj, por û guliyên dirêj, kirasên teng, fîstanên dirêj û fireh û bi kena periyên û bîhnên buhiştî, ne bi tenê bala wan dikişînin, heşê wan jî bi firê dixînin. Ew jinên ko bi kena periyên dibin periyên bê perwaz, niha, bi gavên nazenîn, tên, li maseyên dora wan rûdinin û germahiyeke bêpayan û bîhnên xweş ko Celadet û Kamuran baş nenasin, direşînin salonê (r.120)

Li jêr jî atmosfera sala 22-ê gulana 1925 an de nivîskar agahiyan dide. Ji agahiyan tê fehmkirinê ku li Ewropayê atmosferek ne xweş xuya ye. Ewropa avis e û li benda guherînê y. Li Elemanyayê Hîtler hatiye serî û tewgeren mîna Hîtlerê roj bi roj xurttir dibin:

Ro, rojê xweş, 22-ê gulana 1925-an e. Bi qasî sê salên Celadet li vî aliyê dinê derbas bûn. Niha ew rûyê xwe dide aliyekî din ê dinê. Ev aliyê dinê, Awrûpa, mîna hêlekaneke bêserî, di nav aloziyan de dere û tê. Awrûpa avis e, guherînên nû dê, li her alî, biqewimin. Li Alemanyayê Hitler û hevalbendên wî şikesteke mezin xwarin, lê ew ji nû ve xwe didin hev da ko hikum bi dest xînin. Li aliyên din ên Awrûpayê jî tevgerên weha, roj bi roj, xurttir dibin. (r.145)

Misir di romanê de cihekî girîng e. Lewra rojnameya yekem bi navê Kurdistan li wir dest b weşanê dike. Ji ber vê weşanê Misir hem ji bo malbata Celadet hem jî ji bo gelê Kurdan cihekî sembolîk e. Û jê pê ve kekê Celadetî li wir dijî û bavê Celadetî jî ji ber ku mişextî ye hatiye li ba Sûreyya dimîne. Piştê demeke bi mirina Emîn Alî Beg wateyeke nû digire Misir. (Purçak, 2019, s. 29) Romannivîs gelek cihan de teswîrên xaniyan dike û bi agahiyên hûrgilî dixwaze xanî li ber çavên xwîneran biresîmîne li jêr jî xaniya Sureya Beg ku li Misirê ye ji me re teswîr dike:

Piştî ko Emîn Alî Beg, tevî jin û keça xwe, hatiye Misirê, ew li mala Sureya Beg dijîn. Mala Sureya Beg xaniyekî kevn ê mezin e. Ew ne bi tamamî qesr e, lê jê ne zêde bi dûr e jî. Çav û odayên xênî bêhejmar in. Bexçeyekî fireh û dirêj ko hertim bi rengê kesk û hêşîn, bi ber û fêkî ye, bi xweşiya xwe jiyana aram a gund û malê direngîne. Sureya Beg, jina wî ko ji malbateke mezin e û keça begzadeyekî navdar ê Misirê ye, lawê wan Heqî û keça wan Kudret, ji zû ve ye, li vê mala mezin dijîn. Emîn Alî Beg, Samîha Xanim û Meziyet jî, ji çend salan û vir ve ye, bûne pardarên jiyana mala mezin û gundê xweş.(r.149)

Celadet Beg bi hevalên xwe re li bajarê Cuniyê li ser welatê Kurdistan diaxifin û niviskar di vê navberê de di derheqê atmosfera welatê Kurdistan de agahiyan dide:

Celadet Beg, birayên wî Sureya û Kamuran, mamê wî Xelîl Ramî Beg, hevalên wî û bavê wî Mewlanzade Rifat, Memduh Selîm, Dr. Mehmed Şukrî Segban, Haco Axa û hin kesên din li bajarê biçûk ê Lubnanê Cuniyê, li mala Xelîl Ramî Beg civiyane. Cuniye, bajarê biçûk ê file ko li kêleka Beyrûdê ye, îro mazûbaniya rêber û ronakbîrên kurdan dike. Ronakbîrên kurd li hev civiyane û ew ê li ser rewşa kurdan û welatê wan bipeyivin. Li welêt her tişt tevîhev bûye; welat bi destên dewletên biserketî perçe bûye, ji perçê herî mezin ko li nav tixûbên dewleta nû, Tirkiyê maye, dûman bilind dibe. Ew perçe di nav şewateke xedar de ye. Perçê Iraqê ketiye bin destê ingilîzan, ê Îranê di bin destê farisan û yê Sûriyê jî di bin destê fransîzan de ye. Xelkê westiyayî ko di şer de li ber lingan çû, niha, bêquwet, bêtaqet û bêhêvî, hewl dide dako rojên kambax biqedîne. Tevger û serhildanên kurdan bi ser neketine. Gelek rêber û ronakbîr hatine kuştin, piraniya yên mayî bi derine xerîb reviyane. Bûm û kund li ser kaviên welatê kurdan veniştine û dixwînin. Welatê kurdan qulipiye ser gor û goristanê. (r.155)

Meha gulanê ya 1932 an de de li Şamê Celadet û hevalên wî kom dibin. Ji rojan 15 Gulanê ye û kovara Hewarê derdetye. Celadet û hevalên wî derketina kovara Hawarê pîroz dikin. Atmosfereke xweş tê resimandin ji aliyê Romannivîs ve. Paşê Romannivîs dîsa dest bi teswîra mala Celadet dike:

Di destpêka êvareke meha gulanê ya 1932-an de, li şamê, li mala Celadet Beg, heval û dostên wî civiyane û derketina kovara Hawar'ê 3 pîroz dikin. Ji rojan 15'ê gulanê ye, dinya germ û vekirî ye. Hê êvara ronî ya Şamê dest pê nekiriye. Li esmanan tu ewr naxuyin. Mêvan, nas û dost, bi cil û bergên tenik ên havînê, li hewşa malê, li ser piyan in. Ne xanî bi xwe, ne jî hewş mezin e. Lê hewş serrast e; di navenda hewşê de bîreke xweşlêkirî heye. Devê bîrê bi çend qor kevirên nehîr ên ferîşî lêbûye. Dora bîrê, mîna bexçeyekî biçûk, rengîn e. Giya hêşîn dike, kulîlk û gul vebûne. Li pey bîrê jî, çend mêw xwe li dora caxên textînan ên kepirekî rapêçane û ber bi jor bûne. Pelên mêwan, minare qaseye kewelatê ereban, bi hêşnahiyeke tarî, li text, cax û dîwêr piçikîne. (r.184)

Li Lubnanê bi guherîna hikumeta Fransayê hikumeteke nû ya Ênîya Gel ava dibe. Û Romannivîs atmosfera Lubnanê ji me re vedibêje:

Ji der û dor bîhna axê û dar û ber difûre. Li milê çepê yê şaneşînê, li ser çiyar, keskesoreke zêrhêlî, bi hemû rengên xwe, dibiriqe. Berî niha bi bîstekê, baraneke boş bi ser girê Qesra Mezin de hat, bi qasî kêliyekê barî û winda bû. Niha çiya bi rengên keskesorê diçirûsin.

Lubnan û Bêrûd bi rengên keskesorê diçirûsin. Hêvî ji Lubnanê difûre. Ew grewên karker, esnaf û parêzgeran, serhildanên kesab, goşkar û necaran, şer û pevçûnên gel û terîqetan rawestaye. Jiyana aborî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Jiyana siyasî nermtir dibe. Li Fransayê, piştî helbijartina giştî, hikumeteke nû ya Êniya Gel, bi serekiya Leon Blum, hatiye ser hikum. Piştî guherîna hikumeta Fransayê, li Lubnanê jî helbijartin çêbûye û serekekî nû yê lubnanî, (ne fransîz), Emile Eddé hatiye helbijartin. Tevî ewr û baranê, dinya nerm û germ dibe. Rengên keskesorê dixuyin.(r.224-225)

Di paragrafa jêr de qala aşxana tê kirin û ji masa Yusif Malik û hevalên wî dest bi teswîrkirinê tê kirin. Û qala hundirê aşxana tê kirin. Bi şiklê atmosfera aşxane tê wesifandin:

Aşxana ko bêtir cihê mal û malbatan e, hêdî hêdî, vala dibe. Garsonên ko cil û bergên rengîn ên durzî li xwe kirine, di navbera masan de digerin û mase vala dikin. Li ser masa Yusif Malik û hevalên wî jî, ji çend teyfikên meze, meywe, fûl û humusê pê ve, tiştêk nemaye. Çima fûl û humus li ser masê ye? Kes pê nizane. Tevî ko kesî destê xwe nedaye wan, ew hê jî li ser masê ne. Mase li kêleka pencereyên pir fireh e. Der di nav tariya şevê de ye, bi tenê stêrk ji esmanan diçirûsin. Û carina ronahiya lampeyên ereban jî dûr ve dixuyin. Ji penceran jî agirê findên ko li ser masê ne û êdî ber bi xelasbûnê derin, dixuyê.(r.245)

Gelek cihên ku atmosfera fîzîkî tîn bikaranîn. Di mînaka dawî de bi paragrafek cihên ku atmosfera fîzîkî nişan didin tê bikaranîn. Lê gelemperî were nêrîn carinan bi çend rûpelan şayesandina cihên ku atmosfera ku fîzîkî nişan didin tê kirin, ew jî xwîneran jî romanê hinek dûr dixê. Wek mînaka jor qala aşxana tê kirin lê tmkiliya aşxana zêde bi bûyer û lehengan ve tune ye ji ber vê jî xwîner jî şayesandinên bi vî şiklî dibe ku aciz bibe:

4.1.1.6. Cihên Derî Siruştî

Cihên Derî Siruştî tê wê romanê de zêde nayê bikaranî tenê di hin deran de mînakên biçûk derdikevin pêşîya me ew jî qet nayê teswîr kirin:

Ew xwe davêjin cîhê havingeh û seyrangehan. Girav, bi av, plaj, çem, rûbar, ger, hêşinahî, daristan, bax, baxçe, rez, gelî û girên xwe, bûne koşeyekî bihuştê. (r.32)

Roj, roja mahşerê, roja axirzemanê ye. (r.52)

Welat bûbû dûjeh, meriv tê de difetisîn, dişewitîn (r.90)

Ew jinên Wiyanayê, bi bejna dirêj, por û guliyên dirêj, kirasên teng, fîstanên dirêj û fireh û bi kena periyên û bihnên buhiştî, ne bi tenê bala wan dikişînin, heşê wan jî bi firê dixînin(r.120).

Cihên derî siruştî wek ji mînakên jor jî tê dîtîn gelemperî ji bo şibandinê hatine bikranîn.

4.1.1.7. Cihên Sehekî

Di beşa yekem de odeya Celadet tê şayesandin. Paldanka wî vala ye, dengê wî û kenê wî di nav dîwaran de ne, peyvên wî yên nazîk nayên bihîstin, maseya wî ya nivîsînê bêziman û bêdeng li benda wî ne.... Vebêjer bi van gotinan di cihekî girtî de pişte Celadet tişt miştên ku cihên hişê saz dikin tîne ziman (Purçak, 2019, s. 28) Ew odeya Celadet ji bo Rûşen Xanimê cihekî sehekî ye. Lewra her tişt bi bîranîna Celadet ve tijî ye:

Celadet Beg niha tune ye, winda ye. Meriv çawan hînî windabûn û windakirinê dibe? Kursiya wî ya ko ew hertim li ser rûdinişt, niha, vala ye. Ken û dengê wî yê navdar di nav dîwaran de, li derekî, veşartîne. Peyv û gotinên wî yên kîbar nayên bihîstin. Masa wî ya xebat û nivîsînê, bêzar û ziman, li hêviya wî ye. Pênûs, defter û kitabên wî, peregende, li ser mase û refan, li hêviyê ne. Pakêtên wî yên cixarê, plakên wî yên musîka klasik li hêviyê ne. Kinc, cil û bergên wî li hêviyê ne. Zarokên wî li benda bavê xwe ne. Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê wî, nexweş, di nav nivînan de, li hêviyê ye. Kewên wî yên yekta, çavgirtî, li benda fitika wî ne... Lê ew nayê, ew tune ye. Ne li vê odê, ne li oda razanê, ne li hewşê, ne li kêleka bîrê, ne li çapxanê, ne li klûba tucaran a bajêr, ne li qahwexana taxa Muhacirîn û ne jî li tu derekî din...(r.8)

Bîra Qederê wek ji navê wê jî tê dîtîn, hêmanên cih di romanê de derdikeve pêş. Bi temamiya romanê dema ku were nêrîn ew ê were dîtîn ku roman li ser biranînên lehengê sereke yê Celadet hatiye saz kirin. Nêrîna Celadet yê li ser cihan, wan cihan dike cihên bîranîn. Di nav wan de cihan de welat, bajar, mal û bi wan re gelek hin tiştan û bîr wek leitmotîf tê dîtîn. (Purçak, 2019, s. 27) Vegotina wêneyek li jêr tê kirin. di vê wêneyê de gelek tişt hene lê tiştên ku hene tenê atmosferê nîşan nadin ji ber ku tiştên ku di wêne de tune ne jî tînen vegotin. Ji ber vê jî em fehm dikin ku hestên xwe ji me re bi alikariya wêneyê vedibêje û bi hestên xwe wêneyê dixemilîne û atmosfera wêneyê ji xwîneran re dide xuya kirin:

Fotograf weha ye. Sar, bi xof, kesertijî. Û bêdeng. Ji cendekên devê rê pê ve, tê de tu însanên zindî naxuyin. Nîşana merivan tê de hene. Lê ew bi xwe tune ne. Meriv dikare bibêje, siya wan tê de heye. Tevî siya wan, xof û sawa wan jî tê de heye. Ne bi tenê sî û sawa wan, herweha sî û sawa ruhistîn jî di vê wêne de heye. War, warê şer e. Dem, dema şer e. Merivên ko di wêne de naxuyin, heye ko mîna cendekên kêlekên rê, kuştî ne, heye ko reviyane û xwe spartine çiyar, heye ko êriş birine ser ciyekî din, heye ko ji şer û pevçûnê westiyayî, di nav xeweke neşêrîn de ne, heye ko ew li şîne rûniştine, -eger wexta wan ji bo şîne hebe. Her çi be jî, merivên nediyar ên vê wêne, war û demê, di hembêza ruhistîn de ne. Ew dîlên mirin û kuştinê ne. Cendekên bêkes, heywanên tiral, gundên bêxwedî, şewata gund, topên lûlemezî rewşê baş nîşan didin; şeneyê ruhistîn li vî cîh û warê fotografê li kar e. (r. 84)

Xweşikbûna jinên Wîyanayê li ser Celadet û Kamuran bandor çêdikin û hesten xweş ji wan re didin hîs kirin. Ji bo vê jî Wîyana ji wan re dibe cihekî sehekî:

Ev cîhana Wîyanayê ji ya Stembolê û welatê osmaniyan, bi her tiştê xwe, pir cihê ye. Paqijîya bajêr, dûzan û rêkûpêkiya jiyana rojane, aramiya civatê, lixwekirina şênîyan, aheng, neqîş û lihevhatina avahiyan û hejmar a rojname, kovar û weşanan gelekî bala wan dikişîne. Lê bêtir jî jinên Wîyanayê. Ew jinên Wîyanayê, bi bejna dirêj, por û guliyên dirêj, kirasên teng, fîstanên dirêj û fireh û bi kena periyar û bîhnên buhiştî, ne bi tenê bala wan dikişînin, heşê wan jî bi firê dixînin. Ew jinên ko bi kena periyar dibin periyên bê perwaz, niha, bi gavên nazenîn, tînen, li maseyên dora wan rûdin û germahiyeke bêpayan û bîhnên xweş ko Celadet û Kamuran baş nenasin, direşînin salonê (r.120)

Piştê şer Celadet 3 salan li Munîxê dijî. Ew sê sal jî bo Celadet Gelek dijwar e. Xizanî dikşîne û birayekî wî li wir dimire. Loma Elmanya ji bo Celadet dibe cihekî hişê (Purçak, 2009, s. 28) Munîx berê cihekî fireh û xweş e lê piştê şer xweşikbûna xwe winda dike û dibe cihekî teng. Bi tengbûna xwe hestên berê yên mirovan diguherîne û hestên ne baş dide wan mirov bêhna xwîn jê digirn, esebîyet bajarê dorpêç dike. Êdî Munîx cihekî teng e u hestekî ne xweş dide mirovan:

Bîhna mirinê dor li Munîxê girtiye. Bajarê huner û musîkê, die weltstad mit herz, niha dilê xwe ji kîn û nefretê, ji mirin û kuştinê 4 rê vekiriye. Bajarê kêfê, niha, bûye bajarê keserê. Tava ko jixwe pîrî caran winda ye, niha, yekcar ji bajêr xatir xwestiye, Bajar, avahî, qesr, dêr, birc, heykel, kolan û navendên wî yên çand û hunerê, di bin ewrên tarî û girtî de, niha, şahîdî li esebiyetê dikin. Bîhna xwîn û mirinê dor li avahiyên spehî yên barok û gotîkê digire. Bajarê kevnar ko bi rengê qurşûnî xwe xemilandiye û bûye navenda hunera germenî, niha, kesertijî û bêhuzûr e. Cîhan, Alemanya, Munîx û Celadet rojên pîr dijwar derbas dikin. Bîhn li wan çikiyaye. Alemanya ko ji ber krîza neditî ya aboriyê li ber in tixarê ye, bi bûyerên siyasî û civakî diçelqe. Alemanya, navenda Avrûpayê, li pey riyên nû û çareyên saxbûnê ye. (r.138-139)

Jê pê ve Beyrûd û Şam jî ji ber ku Celadet li wan deran de mişextî dibe di vê wek cihekî girîng were dîtîn. Beyrûd ji ber cihê dawîye ku Celadet û Caban li wir hev dibînin û ji hevdu vediqetin. Loma Beyrûd û Lûbnan bo Celadet cihekî girîn in. (Purçak, 2019, s. 29) Guherîna rejîma sîyasîya Lubnanê atmosfereke xweş saz dike û ji bajarê bêhna ax û dar û ber difûre. Keskesor bi hemû rengên xwe dibiriqe. Ji jêr tê fehm kirin ku tiştên xweş bi xwe re tiştên xweş tîne. Ew jî hestekî xweş li ser mirovan çêdike:

Ji der û dor bîhna axê û dar û ber difûre. Li milê çepê yê şaneşînê, li ser çiyay, keskesoreke zêrhêlî, bi hemû rengên xwe, dibiriqe. Berî niha bi bîstekê, baraneke boş bi ser girê Qesra Mezin de hat, bi qasî kêliyekê barî û winda bû. Niha çiya bi rengên keskesorê diçirûsin.

Lubnan û Bêrûd bi rengên keskesorê diçirûsin. Hêvî ji Lubnanê difûre. Ew grewên karker, esnaf û parêzgeran, serhildanên kesab, goşkar û necaran, şer û pevçûnên gel û terîqetan rawestayê. Jiyana aborî hêdî hêdî bi ser xwe ve tê. Jiyana siyasî nermtir dibe. Li Fransayê, piştî helbijartina giştî, hikumeteke nû ya Êniya Gel,

bi serekiya Leon Blum, hatiye ser hikum. Piştî guherîna hikumeta Fransayê, li Lubnanê jî hilbijartin çêbûye û serekekî nû yê lubnanî, (ne fransiz), Emile Eddé hatiye hilbijartin. Tevî ewr û baranê, dinya nerm û germ dibe. Rengên keskesorê dixuyin.(r.224-225)

Bilûrvan li bilûrê dixê û difikire û gundê xwe jiyana xwe tîne bîra xwe. Gundê wî mala wî li ser wî bandorê çêdike. Keser dikeve dilê wî û hin hestîyarî li ser wî çêdikin. Ji vê hezkirinê em fehm dikin ku gundê Bilûrvan ji bo wî cihekî taybet e. Ji ber vê jî em gundê wî cihekî sehekî dikarin bihesîbînin:

Bilûrvan li bilûrê dixê û difikire; li jiyana xwe ya kal, li qedera xwe ya bi bal difikire, li gundê xwe, li xaniyê xwe yê gund difikire. Xanî bi qorên kevirên reş lêbûbû. Mîna hemû xaniyên gund. Reşahiya dîwaran di bin tîrêjên royê yên danên êvaran de, mîna pişta şûr, dibiriqî. Hundirê malê, ji karîte û mertekan heta rojîn û teqan, bi rengê spî, siwaxkirî bû. Ji rojîn û teqan, hertim, çend kulm ronahî direşîha hundirê malê. Her du salan carekê, ji bo temamkirina ahenga rengên reş û spî, mal siwax dibûn. Mal, malên jiyana kurdî ya neçar bûn. Axur li kêleka malan bûn, pez û dewar, hesp û mehîn, mirîşk û dik, seg û tajî, her, bi wan re bûn. Li malê mehfûrên ko ji aliyê jinebî û pîrejinên gund hatibûn hûnandin, raxistî bûn. Ew rengên wan ên germ! Zerahî û sorahiya wan a şewatê! Ew neqşên wan ên basîd, lê yekta! Çima ev nivîskar, zane û alîmên ko tîna mala Mîr Celadet rojekê narin wan gundan? Ew hertim behsa rengan, neqşan dikin, lê çima ew narin gundê ko xwediyê xaniyên reş û spî ye û pişta xwe daye çiyar? Çima? Argûn û bixêriyên malê hertim ronî û germ bûn. Gulok û xêlekên agirê êzingan ji wan ber bi jor dibûn. Ferşên doralîyên argûnê, ji agirê sor, sor dibûn. Di şevên zivistanan de agirê gur govend digirt. Govendêke bêpayan ko çavê merivan tu carî jê nedibû. Paşê, li dîwarên malê, tifîng, xençer, qiloçên xezal û pezkovîyan û bilûr hilawestîbûn. Tifîngê ew diparastin, xençerê riya tarîx, bav û kalan, qiloçên xezal û pezkovîyan jî riya zozan, gelî û çiyar nîşanî wan didan. Herçî bilûr bû, jiyana wan bû, dengê dewr û dewranên wan ên jibîrbûyî bû. Bilûr sir û sihêrên wan bû. Herçend xaniyê wan li ser hîm, stûn, kutek û karîteyan ava bûbû, jiyana wan a gund jî ewçend li ser deng û awazên bilûr û bilûrvanan ava bûbû. (r. 255)

Bilûrvan dîsa li bilûrê lêdixê û dîsa demên xwe yên berê tîne bîra xwe. Di navbera denge bilûrê û bîranînên Bilûrvan de têkilî tê dîtin. Dengê bilûrvan li ser

Bilûrvanê hest çêdike û Bilûrvan gundê xwe, zarikatiya xwe bîr tîne. Gundê Bilûrvanî ji wî re cihekî sehekî ye.

Bilûrvan gewriya xwe, bi xweziya xwe, şil dike, zimanê xwe li ser lêvan digirîne, bîhna xwe berdide û dîsan bilûrê dibe devê xwe û lêdixe û difikire; umir gihîştîye sedî, sed salên rengîn ji ser wan rojên zaroktiyê bihurîne... ew difikire... li gundê zaroktiya xwe, li bêriyên gund difikire. Xaniyên gund, mîna lat û zinaran, piştta xwe dabûn çiyayê asê û bilind. Di şevên aram ên gund de, çiyê bi heyv û stêran re hevaltî dikir. Serê çiyê warê teyrên eylo û bazan bû. Hêlînên wan li ser tehtên asê yên çiyê bûn. Ji çiyê dengê ba û baranê, eylo û bazê dihat. Di danên êvarê yên biharan de, gava şivanan keriyên pêz ji çêrê dianîn, teyrên eylo û bazan jî, mîna mûyekî, xwe ji tehtan berdidan jêr. Wan xwe nedilivandin, nedidan per û baskan, bê hereket, hêdî hêdî, xwe berdidan jêr. Pez dihatin. Wexta bêriyê bû. Keçên xama yên gund, ew keçên bedew ko her nêrîneke wan bi umrekî bû, elb û sitîl di destan de, ber bi wan diçûn. Guhanên miyan tijî şîr bûn. Bêrvanên ko memikên wan mîna sêv û purtaqalan bûn, diçûn ber guhanên miyan... Dengê teyran, mî û bêrvanan dikete nava hev. Û dengê bilûrê. Bilûra şivan û bilûrvanan... (r.258)

Şam jî ji ber ku gelek sal Celadet li wir dijî, dixebite û dawîde liv ê derê dimire divê wek cihekî taybet were dîtin. Hem jî ji ber ku gora Mîr Bedirxan Li Şamê ye ji bo Celadet û Kurdan cihekî sembolîk e. (Purçak, 2019, s. 29) Li jêr ji atmosferêk tê avakirin Celadet li mala xwe ya Şamê zarokên xwe dike xew û dest bi xebatê dike. Lê di denge ku ji gramofonê tê her tişt diguherîne hesreta welat dikeve dilê Celadet û em ji vir jî fehm dikin welat bo Celadet cihekî Sehekî ye:

Şev daketiye, Celadet Beg Cemşîd û Sînem maç kirine û ew kirine xew. Rûşen Xanim û yên din jî razane. Celadet Beg û şev bi tenê mane. Na, ew ne bi tenê ne. Stêr jî hene. Celadet Beg li salonê, li erdê, ser xalîçê, xwe dirêj kiriye û dinivîse. Rojeke nû dest pê kiriye. Lê hê şev e, saet li dora diduyên şevê ye. Ronahiya stêrkan xwe ji pencerên vekirî yên salonê digihîne hundir. Xwelîdanka li ber Celadet Beg nivtîjî ye. Dora wî tijî kaxiz e; kovar, rojname, kitab, defter, rûpel, resim û ansîklopedî, perege, li ser xalîçê ne. Ji gramofonê jî dengê Emû Kalsûmê tê; ela bela bîhn mehmûdî... welatê min ê delal were, min werbigire û bibe... (r.280)

Cihên sehekî gelek caran di romanê de hatine bikaranîn. Têkiliya cih û leheng girîng hatiye dîtin. Û li gorî rewşê ve cihên sehekî hatine saz kirin. Li mînakê dawî

de Celadet li malê ye û her kes di xew de ye ji bilî Celadet. Pêşî şayesandina odeya Celadet û atmosfera odeyê tê kirin lê di dawî de tê dîtin ku welatê Celadet wek cihekî sehekî tê bikranîn û Celadet gelek beriya welatê xwe dike.

4.1.2. Encama Tehlîla Romanê

Roman ji ber ku romantike biyografîk e û qala jiyana rasteqîn tê kirin di romanê de cihên ûtopîk û fantastîk nayên dîtin. Heke cihên ûtopîk fantastîk hatina bikranîn dibe ku rastiya romanê qelstir bikira dibe ku nivîskar bi vî şiklî fikirî be û ji ber vê jî di romanê de cihên fantastîk û ûtopîk bi kar neaniye. Lê ji beşên din gelek mînak hene û gelek mînak jî her yeke tê dîtin û di romanê de gelek şayesandinên dirêj dertê pêşiya me.

Roman romaneke biyografîk e ji ber vê jî armanc vegotina bûyerê ye. Lê bûyerê ve jî nivîskar dixwaze atmosferê jî nişane me bide. Bi gelemperî nivîskar şayesandinan dike lê şayesandinên ku dike bi piranî li hewayê dibîne. Lewra nivîskar atmosfer û bûyerê zêde bi hevdû re girê nade. Di romanê de nivîskar wêneyan bi kar tîne û bûyerê zêdetir bi wêneyan re girê dide. Lê Romannivîs jî mîna wênekêşek tevdigere û di şayesandinan de em tenê ji aliyê fizîkî ve tînin agahdar kirin. Di navbera leheng û cihan de zêde têkilî çênabe.

Bîr ji navê romanê jî wek tê dîtin di her beşên romanê de derdikeve pêşiya xwîneran. Nivîskar bîrê wek leitmotifê gelek serkeftî bi kar tîne. Bîr di zimanê dayîka nivîskarê de tê du wateyan. Yek ji wan hiş e ya din jî çalav e. Di hemû romanê de motîfa bîrê di sehneyên girîng te herî kêr carekê tê dîtin. wek cihekî bellek hiş derdikeve pêşî lê wek çalav jî tê bikaranîn. (Purçak, 2019, s. 47) Pierre Nora dema ku qala cihên hişê dike dibêje ku: Armanca wan yê ewil sekinandina deme, nehiştina jîbîrkinê, tespîtkirina rewşa tiştan, nemirkirina mirinê û tiştên razber kirina tiştên şênber in. (Purçak, 2019, s. 48) Nivîskar jî dixwaze ev tiştê bi hünere xwe re pêk bîne ji ber vê motîfa bîrê bi awayekî serkeftî bi kar tîne.

Em ji minakên jor fehm dikin ku Romannivîs beriya nivîsandina romanê gelek xebitiye û gelek agahiyên hûrgilî bi dest xistiye. Ê wan gahiyan bi awayekî serkeftî daye xwîneran. Roman romaneke biyografîk e. Ê qala 58 salan tînin kirin. Di 58 salan de cih gelek diguherin. Ev guhertin qelîteya romanê qels nake ji ber ku Romannivîs bi xebatên xwe yê serkeftî wê guhertinê bi awayekî baş ji xwîneran re nîşan dide.

Di romanê de gelek teswîr tên kirin. Armanca teswîrê pîranê em fehm dikin ku avakirina atmosfera bûyerê ye lê du qadên de jî teswîrên xweş derdikevin pêşîya me.

Ji aliyê şayesandinê ve tenê teswîrkirina qonaxan dibe ku xwîneran aciz bike ji ber ku Romannivîs carinan pîr agahiyên hûrgilî dide xwîneran ew jî herîkbarîya romanê hinekî qels dike. Bi gelemperî em dikarin bêjin ku roman ji aliyê cihê ve xurt hatiye ava kirin.

4.2. Rojnivîska Spînoza⁶

Di romana Rojnivîska Spînoza de gelek çîrokên lehengên cuda cih digirin lê bi gelemperî bûyer li ser lehengekî bi navê Yasîn diqewime. Ji bilî çîroka Yasîn di romanê de çîrokên Peyman, Simko, Helbest, Musa, Yilmaz, Silêman, Bala û Newroz, jî tên vegotin. Bi navên wan di romanê de beş hatine nivîsandin. Li wek me got zêdetir çîroka Yasîn derdikeve pêş. Çîroka Yasîn bi vî şiklî destpê dike û didome. Yasîn zaningehê berdide û tê mala xwe. Navbera wî û bavê wî nebaş e. Yasîn hin tiştan dike û bavê wî jixwe ji sedema berdayîna wî ya zaningehê gelek ji aciz e û lêdide. Yasîn sedema berdayîna zaningehê nabêje. Yasîn ji keçikeke bi navê Nûrşen hez dike lê ji ber hin pîrsgirêkan ji hevdu vediqetin.

Paşê roman diçe destpêka bûyerê. Yasîn zaningehê qezenc dike û diçe zaningehê li wir ji xwe re hevalan dibîne. Nûrşenê nas dike. Yasîn diçe li mala hembajariya xwe dimîne mehek, lê jina hembajariya wî jê ne razî ye ji ber vê jî Yasîn diçe pansiyonekê. Nêzikî 3 mehan li pansiyonê dimîne. Di pansiyonê de xwarinên nebaş derdikevin paşê rojêke di xwarina wan de kurm derdikevin. Yasîn vê tiştê qebûl nake û ji pansiyonê tê avêtin. Paşê bi hevalê xwe Yilmaz re malek kîrê dikin. Yilmaz ji Nûrşenê hez dike û rojêke tê malê serxweş e û digirî. Yasîn sedema rewşa wî dipirse. Yilmaz dilê xwe ji Nûrşenê re vedike lê Nûrşen qebûl nake. Nûrşen jî ji Yasîn hez dike.

⁶ Şener ÖZMEN

Şener Özmen di sala 1971 de li Hezexa Şîrnexê ji dayîk dibe. Dibistana seretayî û navînê li wir dixwîne. Li zanîngeha Çukurovayê beşa Nîgarkêşiyê ya Fakûlteya Perwerdehî dixwîne. (Parlîti ve Galip, 2010: 138) Digel ku di temenekî gelekî berwext de nasîya wî li gel karîkatur û helbestê çêbû, dest ji van her du waran jî kişand da ku bi hunera hevçax û wêjeya kurdî rabe. Hindek helbestên wî yên ku di kovarên huner û wêjeyên wê heyamê de hatibûn weşandin. Mirin û Dîyalektîk, kurteçîroka wî ya ezmûngerayî ya pêşîn a ku bi kurdî nivîsandiye, bi nasnavê Sîyabend Z. Di kovara Warê (1999) de hate weşandin. (Özmen, 2008: 138)

Rojekê Yasîn xew dibîne lê hin kes dikevin mala wî û wî ji xew hişyar dikin û mala wî serobino dikin. Ji Yasîn hin tiştan dipirsin û teypa wî guhdar dikin. Di teypê de strana Şivan Perwer heye ji ber vê jî, wî digirin siwarê torosek dikin û wî dibin. Paşê tê fehm kirin ku Yılmaz wî gilî kiriye. Paşê Yasîn tê berdan. Şevkê Serpîl tê mala Yasîn û dixwaze li mala wî bimîne, Yasîn jî qebûl dike. Serpîl dixwaze xwe nêzî Yasîn bike lê Yasîn qebûl nake û dibêje ez ji Nûrşenê hez dikim.

Rojekê Nûrşenê tê mala Yasîn û dibêje ez hez ji te nakim ez ji Sînanê hez dikim. Yasîn berê wê dide û wê ji mal derdixe, paşê Yasîn jî baholê xwe digire û dikeve rê diçe otogarê.

4.2.1. Cih di Romana Rojnivîska Spînoza de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Taxa Suryanan
Cihên Girtî û Teng	+	Kolan, Tixûb, Zexê
Cihên Çandî	+	Bihara Xoyê
Cihên Olî	+	Tirba Medaq Siltan, Mizgefta Nameyê, Gorîstana Morgen
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nişan Didin	+	Zexê, Ode, Bajar, Mala Musa, Bजारok, Sala 1980an, Meydana Mîhrîcanê, Odeya Belayê
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	-	
Cihên Fantastîk	-	
Cihên Derî Sirûştî	-	
Cihên Sehekî	+	Kolanên taxa Suryanan, Zexê, Odeya Lehengê

4.2.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Rewşa esman, dengên jin û mêran, kuxtekuxta pîremêr û pîrejînan û.hwd. wêrektî dide lehengê. Ev tişt jî nişanê me dide ku cih li ser lehengê bandoreke xweş çêdike. Hemû berhemên wêjeyî taybetmendiyên dem û cihên bûyeran nişan didin. Ev tişt li gorî berhemên bûyerê diguhere. Hin ji wan bi îmajan agahî dide, hin ji wan jî rasterast dide. Ji wan hêmanan yek jî cih e. Cih hem qerekerên mirovan saz dike hem jî şikl dide gelan. (Yeşilyurt, 2018, s. 196) Taxa Suryanan di bajarê de taxa herî ewle û aram e. Ji wan agahiyan em derbikêvin rê em ê bibîbin ku ew der ji lehengê re

cihekî fireh û vekirî ye. Ji ber ku leheng liv ir hem kêfxweş e hem jî xwe ewletir hîs dike:

Esman çikîsayî bû, ji maline şibakronî, dengên jin û mêran, kuxtekuxta pîremêran, pîrejinan, giriyên landikan û haşkirinên dayikan ên biaheng dihatin û vê yeke wêrekiyeke bêterîf dida Yasîn. Di taxa Suryanan de bû û her tişt, bi zimanê pîroz î Îsa Mesîh tev digeriya. Çu taxeke bajarokê, wek vî taxî ewle û aram nebû. Piştî bîskeke Yasîn ghişt dawîya kolanê û li ber derîyekî biçûk î darîn rawest, behna xwe vekir û zengil bitirs, sê caran lê da. Kêlîyek neçû, pejna gavine hate ber guhên wî. Mûsa li malê bû.(r.35)

Wek ji jor jî tê dîtin di romanê de cihên vekirî û fireh pir kêr hatiye bikaranîn. Bi awyêkî eşkere tenê taxa Suryanan wek cihekî vekirî û çandî hatiye bikaranîn.

4.2.1.2. Cihên Girtî û Teng

Ji paragrafa jêr tê fehmkirin ku kolan hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê hestî ve teng e ji bo lehengê ji ber vê jî ev der cihekî girtî û teng:

Ew bêhn û bûxara alkole, dûkêlên cixareyê çavên wî sotandibûn, sergêjî bûbû, lezand û berê xwe bi kolaneke reştarî ve kir û ji kaşeke dirêj û teng, bilez û bez hilkişîya, ewtehta kûçikên Suryanan êdî ji nêzîk de dihatin. (r.34)

Sînor ji bo merivan astengî çêdike. Ji ber sînoran mirov ji cihekî nikarin derbasî cihekî din bibin ji ber vê li cihekî sinor hebe ev der cihekî teng û girtî ye:

Her roj xebereke mirinê ji sînor dihat. Hê do bi şev leşkerên Ûrî li komeke qacaxçiyên reşandibûn, sê ji wan hatibûn kuştin, ên din ji tirsan re li qula mişkan gerîyabûn. Ma wê karibûya bi rêkên fermî derbasî Başûr be?(r.59)

Yasîn dixwaze here malê li ji kolaneke tarî derbas dibe û nigê wî çend çaran keviran dikeve û dest bi sixêfan dike û ji bo pêşiya xwe bibînî diwarên xaniyan digire bi van gotinan tê fehm kirin ku ev kolan ji bo yasîn cihekî teng û girtî ye:

Sûka Zexê bi tevayî hatibû girtin. Yasîn xwe ji reqîrê xelas kir û berê xwe da kurterêyeke malê, ku ji çend kolan û fetlonekên kurt dihat pê, du lempeyên li serê kolanê ji ber ewlehiya çiyageran da bi hêsanî derbas bibin û bi dilê xwe tev bigerin, ji layê zarokên taxê ve hatibûn şikestin, kolan xwe bit arî û zilûmateke lertzîdar ve pêçabû, mirov serê pêçiya xwe nedidît, Yasîn korkanî ket kolanê, xwe bi dîwarên

xaniyan girt, leqîti, piyên wî çend car li keviran ket, bi zimanê Ergenokonî sixêfin kirin... (r.77-78)

Li derekî ewlehî tunebe, mirovên ku li vir dijîn nikarin bikevin xeweke şîrîn û her tim li benda tiştêkî baş dimînin li jêr cihê teng û girtî tê qal kirin:

Xew zû dihat Zexê, xewekî ku naşibe xewê, xewkî li ser derzîdankê, azardolî, kêr, nîvco, bi reşxewnan dorlêgirtî, tirstije, dest di dil de, neasayî, bi qewlê wan ‘‘ olağanüstü’’ nasnameya di bin balgîfa bavo de, Qur’ana li jor hilawestî, Ayet-ül Kûrsîya di çarçoweyê de... (r.79)

Di romanê de cihên girtî û teng gelek caran tên bikaranîn. Roman ji ber ku wek jiyanên têkçûyî dixwaze nişan bide bo wê jî di gelek beşan de cihên girtî û teng tê dîtin. Carinan Zexê wek cihekî girtî û teng tê erkkirin carinan sînora welatê carinan jî ode û mala lehengek bi vê erkê tên bikaranîn:

4.2.1.3. Cihên Çandî

Di bihara Xoyê de xort û keçên qeşeng cilên xwe yên xweşiktirîn li xwe dikin û ala netewî digirin destên xwe û derdikevin meydanaê êdî ew dem û meydana ji wan re dibe cihekî çandî ji ber ku bi hevdû re her sal eynî tiştê bi kar tînin:

Bihara Xoyê ligel pîrozbahiyên şoreşê, şahî û mihricanên rengîn dest pê kir. wê roja çarşemê jî mêrên Xoyê bi şal û şapikên xwe yî nûdirûtî, jinên wan jî di nav fistanên rengorengo de qefle bi qefle ber bi meydana Xoyê ve dimeşyan. Xort û keçên qeşeng xweşiktirîn û balkêştirîn cilên xwe li xwe kiribûn û di destê hemûyan de ala netewî, ala rengîn ê ku ji sê rengên sereke, ji sor û spî ûkeskê dihat pê û di navînê de, li nîva çenge spî jî heteveke zer û gerêim, tirêjên xwe yên hevdar li seranserî şênîyê belav dikirin... (r.93-94)

Cihên çandî tenê di şayesandina bihara Xoyê de tê bikaranîn ji bilî vê di romanê de cihên çandî nehatiye bikaranîn.

4.2.1.4. Cihên Olî

Di romanê de cihê olî tenê bi nav derbas dibin di paragrafa jêr de jî ew tişt derdikeve pêşya me Tirba Medaq Siltan, Mizgefta Nameyê, Gorîstana Morgen ji bilî navên xwe qet nayên vegotin û li ser wan teswîr ti carî nayê kirin:

Wêneyên ku di der û dorên cihê yê zaningehê de hatibûn girtin, di poleyê de, ew û Bala, Bala û hevalên wê, ew bi tenê, Bala bi serê xwe, li kafeyê, li aşxaneyê, li bexçeyê û li seyrangehên Badê, digel heval û dostan, li ser Tirba Medaq Siltan, li Mizgefta Nameyê, li pêş Hemama Mîrza Asûl, li kevîyên Gola Bendeve Badê, di şikefta Holanê yan bi navê wê yê dîtir Konê Cotir de dîsan digel yek û çend wêneyên din, ew û Bala, li ber Persetgeha Zende Bende, li ber bermayiyên Kela Ximximê, Kela Narîm Beg, Gorîstana Morgen... (r.53)

Di vê romanê de jî cihên olî tenê bi nav derbas dibin û şayesandin nayê kirin. Di beşa jor de gelek cihên olî tê vegotin lê ewqas di derheqê wan de ti agahî nayên dîtin.

4.2.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Li jêr bi şayesandineke kurt atmosfereke biçûk hatiye afirandin lê ewqas biçûk e ku di hişê xwîneran de zêde cih nagire:

Rojek ji rojên havîna germ, gerokeke Elman, porên wê mîna simbilên genimê Eşhedê Sînî zipîzer, bejna wê temet dartûya li ber derê mala me, çavên wê wek şîna rûpişta lihêfa we, welhasil yeke bedew tê Zexê, da ku li kenîştoka Suryanan lêkolînê bike û çend wêne jî ji bigire. (r.27)

Xweşikbûna mal di hundirê odeyên wê de veşartîye. Ji ber vê ode ji mal giringtîr e. (Bachelard, 2008: 37) Di paraprifa jêr de em wesifandina odeyekî dibînin ji bilî eşyayan û rewşa wê demê ti tişt dernakeve pêşîya me ji ber vê jî em fehm dikin ku ev wesifandin tenê ji bo atmosferê hatiye kirin:

Di wê kelîyê de veciniqî, pêlûyên çavan di cî de vebûn, awir çûn derdorê, di ser tiştên nas ên di menzelê de bi dorfirehî geriyan, cil û bergên Viyanê ku wê belav kiribûn, wilo li ser merşîkê bûn, bahola vekirî li ber serê wê bû, sêpêya şikestî, sirahîya avê, qedeha avê ya nîvcobûyî, li diwêr peşberî wê, salnîgarên xezal û teyrê tawis, du sê posterên stranbêjan wek Ciwan Haco, Şivan Perwer, Sibel can ku hin kêmasiyên dîwarê kilskirî vedişartin. Fanos, mîrêka ji nivî de derizî, her tişt, her tişt wekî xwe bû. Awir çavan çûbûn, welê jî vegeriyan. Peymanê li xwe nihêrî. Porên zer ên kêmgulgulî, rû, gerden û pêsîr ji tesîra xew û xewnê xweêdaneke ecêb dabû, wê xwe bêhnçikiyayî, tî, sergêj û melûl dît, rabû, cil û bergên Viyanê li hev dan û hema bi ser hev de avêtin garditobê, deriye menzelê vekir û ber bi serşokê de çû. (r.40)

Li bajarê du kom derdikevin pêş. Ya yekem Mihemedî ne ya duyem jî Îsayê. Di nav wan de hin pirsgirêk hene. Romannivîs jî di paragrafa jêr de ew atmosferê diafirîne û datîne li ber çavan:

Çima ew kafîr bûn, ên me Mihemedî, Mihemed kî bû, Îsa kî bû? Kûçikên wan bi hovîtî dihatin kuştin, ma ew jî kafîr bûn, ne ji me bûn, ne Mihemedî bûn? Guh û teriyên wan jê dikirin, çavên wan derdixistin, ew didan ber kevir û gopalan, êgir bi laşen wan didan, ben diavêtin stûyên wan û kolan bi kolan digerlandin, di kişkişandin, digevizandin ta ku bimire, can bide, kef bi devan bikeve, wilo jî hêrs û nefreta Mihemiyan danediket, îcar bi pihînan diçûn kûçikên mirî, bi candekê wan de dimîztin û wê hingê qîrînên serkeftinê bi wan diketin, sermest vedigeriyan malen xwe... (r.76)

Lewra mala me qeraxa cihana me ye. Gerdûna me ya yekem e. Mal kozmoseke rasteqîn e. Kozmosek ku tam wateya peyvê dide. Bi dil were mêzekirin mala herî rût jî ne xweşik e? Nivîskarên ku teswîrên malen rût dikin, her tim li ser qala poetikaya cihê dikin. Lê mixabin gelek kêr li ser wê disekînin. Nivîskar dema ji bo vegotinê tiştêkê nebînin li ser malen rût zêde nasekinin. (Bachelard, 2008, s. 32)Wek me li jor jî di minakekê de vegot eynî rewş dîsa derdikeve pêşiya me. Li vir jî mala Musa tê şayesandin lê dîsa tê hîs tune ye tenê ji bo avakirina atmosferê şayesandin hatiye bikaranîn:

Musa got, “Derbaz be... û li serê xwe jî miqate be, wek wê carê li qorziya derî nexî...” Keniya, keneke ne jidil, tehl, simbêlên boq û qeytan, (bi qewlê Yasîn şeytanî) bi her du aliyên dêmên wî ve vekîşyan, ji rêyeke kin û teng ku bi kevirên pan û teysok pêçayî re bilez derbas bûn, ketin hundirê xênî. Xaniyekî ji derewan, bes ji menzelekê – heke ku em qedemgeha ku li təketa hewşê, li rexê çepê derî, bi çend prîket û derebeyine kevnare lê bûbû nehesibînin-, dihat pê û mitbex û serşok jî di heman menzelê de bûn û hê li ber derî mirov tê derdixist ku bêhn û bûxareke giran bi menzel ketiye. Yasîn berava nivcomayî dît pêşî, li rexê çepê menzelê, di quncikekî loş de teştêk ku derpî û goreyên Mûsa yên kufikîbûyî tê de avjeniyê dikirin, xuya dikir û teyfikine qirejî, mirov tê digihîşt ku pir berê xwarin di wan de hatine xwarin, digel qutiyeke teneke ku ji boçik û xweliya cixareyan, qalikên pirteqalan, sêvan, mûzan, yên ter û yên hişkbuyî, tovên çayê, çend jilet, gilokên ji mû heya dev tije, mîna ku ew

der sergoya malê be; û wilo bû, zîrqîtîkine reş î qelew û talanker li serê govend digirtin... (r. 69-70)

Yasîn di kolaneke de dimeşe û li jêr jî di derheqê kolanê de hin tişt bi çend hevokan ji bo atmosferê tê dayîn:

Yasîn li pişt xwe nenihêrî, bi gavîne sivik û bi şayîs xwe berda tariya şeve, şibakên ronî kêr bûbûn, çi deng û pejn jî nedihatîn ber guhan, ne ewtîna kûçikên Suryanan û ne jî kûçikên Ergenekon (r.75)

Bakhtîn ji bajarokan re ‘‘ Taxên demen vegerok’’ dibêje. Di bajarokan de zêde tevger tune ye, jiyanêke monoton heye. Di van cihan de bûyerên ku pêk tên gelemperî dişibin hevdu. Di bajarokan de gelemperî bûyerên cuda çênabin. Her roj tevgerên wek hev çêdibin. (Kanoğlu, 2017, s. 116) Li bajarokê atmosfereke nû ava dibe. Mêrên gel piranî bi hatina Seksê li kafeye kom dibin û jiyanêke cuda bo wan tê afirandin. Li minaka jêr bi hatina seksê guhertina atmosfera bajarokê tê nişandan:

Seksê, rewşeke nû anîbû bajarokê. Ne bi tenê tolaz, lê keken wan ên xwedî jin û zaro, esnafên derdorê, çend kalên xirîfî ku mudayimê qehweyêbûn, karmend, telebeyên ji dibistanê reviyayî, şilatî û dizen binav û deng, sofîyên mizgeftê, leşker û mamoste, li ser kursiyên dep û lingkurt ku yek dû yeke rêz bûbûn, bi saetan, hem çay û oralêta k udi serê her deh deqeyan de dihat belavkirin û ew ê ku bigota ‘‘Na!’’ bi dahf û sixêfan ji kafeye dihat avêtin... (r.77)

Di sala 1980 an de atmosfer çawa bû û şiklê cilên mirovên wê demê bi paragrafa jêr ji me re tê vegotin:

Dawîya salên 1980’yî bû, lê mode û şeweya cil û bergên 80’yî hê muteber bûn; guharên mîna awîzeyan, kirasên şeşvatka, pantolên model şelwêr, solên spî ên werzişê, tîşortên di bin pantolan de, porên ji patik de berdayî, Bîksî Kola, Jaws, Adidas, jetonên ji bo telefonê, pop û Semra Özal di heman dîmenê de xuya dikirin. (r.82)

Bi qîrîna Peymanê Romannivîs dest pê dike û qala derdorê dike û atmosferê nişanê me dide, kê li ku derê çi dike? bê hîs ji aliyê Romannivîsê ve tê vegotin:

Qîrînek bi Peymanê ket. Çend beytik di nav çiqlên darhêjîrê re fir dan xwe û li dûriyan, li dûriyan jîyan di halê xwe de diajot, jinikeke çaqrût gûyê fînoya xwe bi kaxizekî girt û ew avêt sêrgoyê. Xortekî pazdeh salî di parkekê de bîra vedixwar,

hevala qî distra, dilşad û bextewar bûn. Di kolaneke teng û ronîsor de bazarên laşan dihatin pê. Keçikeke reşik navtenga müşteriye xwe girtibû û mist dida, li aliyê çepê kolanê, du xortên reşik kokain difirotin...(r: 97-98)

Li paragrafa jêr jî Meydana Mihrîcanê wek resm ji me re tê vegotin:

Meydana mihrîcanê di nav toz û dûmaneke reş de bû, çavan çav nedidîtin, bûxareke germ ji laşen kiziri diçû, cendekên bêserî, bêling, bêdest, seriyên bêgewde hûr û toviyên şîn û reşbûyî, pêçiyên qutbûyî li doraliyê teqînê, hinek sî mîtrojê dûr, li ser bertavkên dikanan, li ser banan, li ser dîregên karebayê belav bûbûn û teqîn kortaleke kûr, heye ku du metre li şûna xwe hêlabû... (r.99)

Bela dikeve rewşeke nexweş. Cilên wê qetiyaye, laşe wê tazî bûye û di ketiye ber pihînan heta vê derê bûyer tê vegotin paşê ji vir jî nivîskar derbasê odeya Belayê dibe û geremola mezê vedibêje. Odeya belayê ji me re atmosferê nîşan dide:

Şevkirasê li ser Balayê ji hev çiriyabû û dewşên xwinê li serê bûn, laşe wê yî tazî ketibû ber pihînan, xwîn ji dev û pozê wê diherikî û di wî halê de jî li ber xwe dida û radestî wî nedibû, te digot qey bombeyek di zikê mezê de teqiyabû ku hindî tarumar bûbû derdor, pelên pasaporta çiriyayî li ser nivîna wê bûn û nivîn di nav xwînê de mabû, Bala kêr di dest de, li pêşberî Sirxayî sekinîbû û diricifî... (r.188)

Wek romanên ku hatine tehlîl kirin dîsa zêdetir cihên ku atmosfera fizikî ku nîşan didin hatine bikaranîn. Romannivîs cihê piranî ji bo rêbirina bûyerê pêk aniye û girîngî cih nehatiye nîşandan.

4.2.1.6. Cihên Sehekî

Yasîn dikeve kolaneke tarî û tirsek dikeve dilê wî pişte wê kolanê derbasî kolaneke din dibe. Ew kolan tirsê dilê wî dukuje û yasîn xwe li vir ewle hîs dike. ew kolan li ser Yasîn bandoreke xweş çêdike ji ber vê jî ev kolan hem kolaneke fireh dikare were hesabandin hem jî bo Yasîn kolaneke sehekî dibe:

Yasîn li pişt xwe nenihêrî, bi gavîne sivik û bi şayîs xwe berda tariya şeve, şibakên ronî kêr bûbûn, çî deng û pejn jî nedihatî ber guhan, ne ewtîna kûçikên Suryanan û ne jî kûçikên Ergenekon. Gava ku xwe gihand quncikê mala Pitrisê Kor, ku pir berê kirêdarî wî bûn, şewqên lempeyên rêkirê jî xuya bûn û tirs û şayîsa ku bi dilê wî girtibû, lepên xwe hebekî sist kiribûn. (r.75)

Zexê hem cihekî teng û girtî ye hem jî di bin atmosfereke nexweş de ye. Ev tişt jî bi van hevokên jêr ve ji aliyê nivîskar ve tê gotin Zexê jîyan zû diqede û meriv ji tirsê hin tiştan zû dikevin mala xwe li vir jî xwe ewle hîs nakin ji ber vê jî nikarin tehma xeweke xweş bigirin ji ber vê jî ev der ji bo mirovan hem cihekî teng û girtî ye hem jî ji ber ku hîsên ne xweş dide cihekî sehekî ye jî:

Xew zû dihat Zexê, xewekî ku naşibe xewê, xewkî li ser derzîdankê, azardolî, kêma, nîvco, bi reşexewnan dorlêgirtî, tirstije, dest di dil de, neasayî, bi qewlê wan ‘‘ olağanüstü’’ nasnameya di bin balgîfa bavo de, Qur’ana li jor hilawêstî, Ayet-ûl Kûrsîya di çarçoweyê de... (r.79)

Di paragrafa jêr de heta hevoka dawî teswîrekî atmosferî xwe nîşan dide lê di hevoka dawî de êgirê ku sebr û aramîyê dide wan, wê cihê bo wan dike cihekî sehekî:

Çentikên xwe yêna piştê kirin balgîf li bin serê xwe û xwe li ser erd dirêj kirin, reşaşên xwe jî danîn teniştê, qirçeqirç ji êzingan dihat, şewqa êgir li rûyê wan dixist, li ser textê di pişt wan de siyên lertzok dihatin pê. Êgir, sebr û aramiyêke bêpayan dida wan. (r.175)

Di romanên modern de di navbera leheng û cih de têkilî tîn çêkirin. Cih li gorî derûnnasiyên lehengan ve tîn saz kirin. (Karaca, 2016, s. 75) Derûnnasiyên mirovan li ser cihan bandorê çêdike û rewşa cihan diguherîne. Mirov heke kefxweş be li derdora xwe jî nexweş dinêre lê heke mirov bi dilekî xweş li derdora xwe binêre wek mînakê jêr ew der ji wî/wê re xweş xuya bibe û ew der bibe cihekî sehekî:

Yekem car bû ku menzel ev çend li xweşa wî diçû, bi wî sar nedihat rûçikê dîwarên reşûzerbûyî, qorzik û quncikên wê, nivîn û lihêfa wî ya bihevdayî, masenûs û kursî, kitebên ku ji boz ari-okan danîbûn aliyekî, ên ji bo xwendinê, ên ji bo rengandinê, çend defter û pênûs, firçe û neştêrek ji bo vebirîna kaxizan û hecîreşka wî ya bi tîjîk... gêrikên wî... yêna ku xwe bi destmala vî ve zeliqandibûn rojekê û avika wî diçêjandin... (r.191-192)

Di mînakê jor de menzelek wek cihekî sehekî derdikeve pêşîya me lê di hin beşên din de odayên hin lehengan wek cihên girtî û teng derketibû pêşîya me ev odayên cuda nîşanê me dide ku romannivîs li gorî rewşê û lehengan cih saz kirine.

4.2.2. Encama Tehlila Romanê

Di romanê de cihên Ûtopîk, Fantastîk û Derî Siruştî nayên ditîn. Ji cihên vekirî, çandî û olî tenê ji her yekî minakek derdikeve pêşiya me. Bûyera romanê ji dema me zêde ne dûr e. Dema romanê nêzîkî dema niha ye. Ji ber vê jî cihên fantastik dibe ku cih nedabe romanê. Cihên ûtopîk jî wek xeyalên lehengan romannivîs dikaribû bikar bîne lê di romanê de nehatiye bikaranîn. Cihên derî siruştî ji ber ku di romanê jiyânên trajedîk hatiye bikaranîn, bi şayesandineke xurt bihatana şibandî, lê dîsa romanê nayê ditîn. Romannivîs gelemperî cihên girtî û teng, sehekî û atmosferî bi kar tîne.

Roman, romaneke psikolojik e. Di romanê de çîrokên lehengên cuda cuda hene. Jiyana hemûyan jî bi pirsgirêkan ve tijî ne. Ji ber vê jî Romannivîs jiyana lehengan bi cihên girtî û vekirî re girê dide. Atmosfereke giran di romanê heye. Jiyânên trajîk derdikevin pêşiya me.

Heta ku em dikarin bêjin ku bêcih dem û leheng nayên analîz kirin. Di vê mijarê de M. Tekin wiha dibêje: Cih li ser hêmanên din yê romanê bandorê çêdike qewet dide wan, armanc û daxwazên nivîskarê nîşan dide. (Yılmaz, 2007, s. 17) Wek li jor jî hat gotin roman romaneke derûnnasîye divê zêdetir ji cihê re girîngî bihatana dayîn lê romannivîs ji aliyê cihê ve ne ewqas xurt e. Belê di navbera cih û lehengê de têkilî çêdike lê ew tekili ne têkiliyeke xurt e. Nivîskar şayesandinên piçûk çêdike lê di romanê de cih bi piranî ji bo avakirina atmosferê tê bikaranîn.

Roman têkiliya cih û lehengan zêdetir bi hevdu gire bidaya ew ê roman serkeftitir bibûna. Cih li ser lehengan nikare zêde bador çêbike an li gorî rewş û derûnnasiyên lehengan cih zêde xurt nehatine afirandin. Dîsa jî em dikarin bêjin ku ji aliyê cih ve roman ne xurt e lê zêde qels jî nîne.

5. CIH DI ROMANÊN ROJHILATÊ DE

5.1. Pêşmerge ⁷

Romana Pêşmerge bûyera xwe ji bûyereke dîrokî digire û bi êvîneke ve tê xemilandin. Bûyerên romanê li ser lehengekî bi navê Pîrût diqewimin. Bûyera romanê bi nişaneya rewşa kambax ya malbata Mamed dest pê dike û bi mirina Mamed jî diqede. Bûyera romanê bi vî şiklî ye. Zivistana 1945an e Mamend ketiye derdê belangaziyê. Zarên Mamend li malê birçîne. Mamend bi rê dikeve ku daran bide hev, daran bifroşe û zarên xwe re tişteke xwarinê bîne. Lê dinya nexweş e, ba û bahoz mij û dûman bi çiyayan ketiye. Mamend dikeve şikeftê ku şeva xwe li wirê biborîne. Li milê din Qererî Axa û mevanên xwe li mala Qererî Axa pokerê dileyzin. Ji ber ku dinya berf e biryar dîdin ku sibe herin nêçîrê. Ev bûyer nêzîkê daviya romanê ne. Roman her çiqas bi van bûyeran dest pê kiribe jî peşiya van bûyeran heye.

Pîrût kurê Mamend e. Pîrût alîkarê bavê xwe ye. Wan rojan navûdengê delalekê, Mîrût, li ser Kanîsewzê bilind dibe. Mîrût ji Kanîsekelê ye. Pîrût ji ber ku nav û dengê û delaliyê wê dibîhîze berê xwe dide Kanîsewzê. Brayekê Mîrût heye, Şerko û xwişkeka Pîrût heye, Xezal. Ev jî rêyek vedike ber Pîrût ku Pîrût dil dikeve Mîrûtê; Biryar dîdin ku piştî havînê bizewcin. Lê mixabin disa axayeke xwînmij dertê û vi bextiyariyê nivîde dihêle. Ji ber bînamûstiya Mîne Axa Mîrût xwe bi darê ve dialiqîne. Pîrût û Şerko son dixwin ku tola xwe ji axa hildin.

Wan rojan hêzên Komele'yê mezin dibe û komele nîzîkê Seqîzê dibe. Leşkerên li wir dixwazin birevin û herin Tehranê. Ji bo tişteke nêyê serê wan biryar dîdin herin ba Qererî Axa û ji wirê derbasê Têhranê bin. Gava nîzîkê Kanîsewzê dibin Pîrût û havalên xwe peşiya wan digrin. Pîrût serleşkerê dikuje û dû çekan ji makineye (erebe) wan ji xwe re hiltine. Ev bûyer ji alî wan ve ji keseke re naye gotin

⁷ Rehîmê QAZÎ

Di sala 1925an de li gundê Gwîgceliyê ya bi ser Mukriyanî ve ye hatiye dinyayê. Ji Kurdên Îranê ye. Ew jî mîna gelek nivîskarên Kurd di nav tevgerên siyasî de cih digire. Piştî şerê duyem ya cihanê li Mehabadê komarek tê saz kirin. Bi destê Komara Mehabadê nêzî 60-70 kes bo perwerdehî tîn şandin, Rehîmê Qazî jî yek ji wan kesan e. Bakûyê, Beşa Dîrokê ya Zanîngeha Kîrov qedandiya. (Pariltî ve Galip, 2010: 43) Di sala 1954an de teza doktorayê ya bir navê 'Tevgerên Azadiya Kurd û Qazî Mihemed' dinivîsîne. Demekê li heman zanîngeha dersên dîrokê dide. Bi navê 'Kurdistan' rojnameyeke ku 14 sala dom dike derdixe. Di 1958'an de yekem romana soranî 'Pêşmerge' qedand. Pêşmerge: 1959an de li Erîvanê. Di 1961'an de li Bexdayê, di 1963an de li Bakûyê çap dibe. Rehîmê Qazî, di sala 1991ê li bakûyê di 66 saliya xwe diçe ser dilovaniya xwe. Gora wî li Bakûyê ye.

û hemû kes dizane ku vi êrîşê komeleyê kiriye. Pîrût radije çekan û diçe ba Şerko. Planên xwe dikin û Mîne Axa dikujin. Êdî dizanin ku cî û mesken li gûnd û bajeran ji bona wan nemaye. Xwe disperin Mîrza Qûtas. Peywendiyên Mîrza Qûtas bi Komeleyê re heye. Mîrza Qûtas qala Komeleyê dike û Pîrût û Şerko dibin endamên komeleyê. Mîrza Qûtas wan dibe ba Kek Bînayî ku Kek Bînayî Qazî Mûhammed bixwe ye lê ew nizanin.

Şerko û Pîrût perwerdeyê dibînin xwendinê hîn dibin. Piştî perwerdehiya siyasî û leşkerî gelek çalakiyên serfiraz ji bo komeleyê tînin cî û rojbiroj xwe peş ve dixin. Şoreş geş dibe û roja standina Kanîsewzê tê. Gava dikevin Kanîsewzê Pîrût dixwaze bavê xwe û malîyên xwe bibîne. Lê mixabin bavê wî ne li malê ye û malbata wî nav belangaziye de digevze. Bavê wî ji bo daran çûye çiyayê. Berê xwe dide çiyayê ku bavê xwe bibîne. Gava digeje wirê dibîne ku bavê wî hatiye kuştin. Ev kuştin ji aliyê Qererî axa ye. Piştî van bûyeran tê bihistin ku Qererî Axa û zabitên li ba wî cilên jinan li xwe kirine û ber bi Tehranê ve çûne.

5.1.1. Cih di Romana Peşmerge de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Kanîkîselê
Cihên Girtî û Teng	+	Zivistana Kurdistanê, Zivistana 1945an
Cihên Çandî	+	Bihara Kurdewarî
Cihên Olî	-	
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nişan Didin	+	Gundê Kanîsewzeyê, Kolanên Gund, Mala Qerenî Axa, Mala ku Şerko û Pîrût diçin hundir,
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	-	
Cihên Fantastîk	+	Bi hisên Pîrût û Mîrût rewşa Stêrkan
Cihên Derî Sirûştî	-	
Cihên Sehekî	+	Dema hevdiîtina Pîrût û Mîrût derdora wan, Kanîkîselê

5.1.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Cihên ku di romanê de tên bikaranîn, bi gelemperî bi rihê mirovan re di eynî çarçove de cih digirin. Ji nêrîn û fikrên leheng û mirovan û heta bikaranîna wan ya di

cihê de, di derheqê derûnnasiyên mirovan de agahiyan dide me. (Kanoğlu, 2017, s. 85) Pîrût ji mal derdikeve û diçe tivinga xwe digire û dikeve rê û dixwaze biçê Kanîkîselê. Di rê de dema ku bi ser Zênoya li hemberê malan dikeve bi şefeqa sibê dengên musîqayê ku ji Kanîkîselê tîndîlê wî xweş dike. Romannivîs dibêje ku kesên ku guhê xwe bide vê musîqê ti derd û kulê wî/wê namîme. Ji van agahiyan fehm dikin ku ew der kefxweşî dide mirovan ji ber vê jî cihekî fireh û vekirî divê were qebûl kirin:

Pîrût eynî şevê ji mal derket û çû tiving û fişek ji nav gidîşa genim derxist û bi riyek rêder re ber bi Kanîkîsele ve ket rê. Dema ku bi ser Zênoya li hemberê malan ket şefeqa sibê jî avêtibû û bayê sehera sibê dengên musîqayê yên ji Kanîkîsele dihatin digihand guhê mirov. Eger kesên bi kul û derd guhê xwe bidana vê musîqayê, bê şik wan dikarîn hemû derd û kulên xwe bi van ahengên musîqayê jibîr bikirina û bêyî hay lê bin dest bi govend û şahîniyê bikirina. Çi musîqe, çi musîqe! Dengê kilîna meşkan, çelekdolina keçan, bangên dikên berê beyanê, hîre-hîra hespan, kare-kara karik û berxan, waqe-waqa qaz û werdekên gola ber malan, hawara şivan, gavan, golikvanan û bi sedan dengên din têkelê nav hev bûbûn û ahenga musîqayek wisan saz bûbû ku ji destê tu nivîskarên musîqayê yên bi nav û deng yên dinyayê nivîsandina musîqayek wiha nedihat... Lê ji wê ahenga xweş û dilbikul dengê din jî dihat ku heta Xwedê hez bike nexweş û dilêş bû. Bi dengê qaz, quling, kew, qîqî, teyrê şivanan, reşîle, mirîşkên avê, kotir, pepûk, kûresol û bi sedan teyrên din yên xweşik ku şahîniya biharê girtibûn, dengê kundan li ser kulavê zivistanê bi tundî rûniştibû û bi dengê xwe yê nexweş bersîva wan dida û digot: "dê rojek bihara we jî kivil be û dê zivistan bi ser de bê, xwe ewqas mezin nekin", dihat. Bi van gotinan tevan bêdeng dikir û xem û kul bi ser wan de diwerand. Ew dengê ku ahenga musîqaya tabî Kanîkîseleyê xera kiribû û wek dengê kundê ji nav hemû wê ahengê dihat û diket guhê mirov, dengê muxtarê mala axê bû ku, wê beyana zû ketibû nav kolanan û xelkê bangê ulamê dikir. Lê Pîrût guhê xwe neda wî deng (r.58-59)

Wek ji jor jî tê dîtin di romanê de cihên vekirî û fireh zêde nehatiye bi kar anîn. Roman li ser bûyereke ne baş hatiye nivîsandin loma jî di romanê de cihên vekirî û fireh zê de tune ye.

5.1.1.2. Cihên Girtî û Teng

Dem û demsal carinan li ser hin cihan bandorê çêdike û erkeke cuda dide ciham. Di minaka jêr de meha zivistanê ye û li Kurdîstanê sermayeke wiha heye ku xwîna mirovan cemed dike. Bi serma û rewşa aboriya lehengê bi hevdû re di romanê de cihekî girtî û teng saz dikin:

Zivistana Kurdistanê ye, ewqes sir û serma ye ku hindik maye xwîna nav demarê mirov bimeyê. Tu tif dikî dibe qeşa û dikeve erdê. Ewran pêşiya asîman girtine, deng ji zîruhek nayê. Teyr ji çeng û bask ketine, ji bo xwe bihewînîn, li gund, deşt û perçepalên çiyay li ciyekî reşbelek digerin. Rêzên çiyay, deştên rast û rewan û ew malên di kolanên wan de dukelên reş derdikevin, bi kefenê berfê hatine rapêçan. Erd, tu dibêjî li muqabilê zulma asîman gazindan dike û dinale, karêzên kaniyan bihna xwe vedidin û car caran bayekî sar bi ser gund de diheje, ew xortên ku li qeraxên sergoyan û li ber penayê kalaxan ji bo parastinê sekinîne, mecbûr dibin biçin mizgeft û malan(r.7)

Kek Mamend ji sermaye xwe kiriye şikeftê, heke şikeft wî biparastina şikeft bo vê bûbûna cihekî vekirî û fireh lê dema ku bi temamî were xwendin tê dîtîn ku ew cihê ku ji bo xwe ji sermaye biparêze ketibû hundirê wê dibe cihê mirina wî. Ji ber vê şikeft destpêkê de dibe ku cihekî vekirî û fireh were dîtîn lê di dawîyê de dibe cihê girtî û teng lewra Kek Mamedî ji sermaye nikare biparêze:

Di zivistana sala 1945an de, eynê ew şeva ku kek Mamend ji bo xatirê bidestxistina pariyeke nan bi kerê xwe ve di wê sir û sermayê de xwe kiribû kona şikeftê û wek tîrê subhanê diricîfî û zarokên wî li mal birçî mabûn, li mala Qerenî Axa yê xwediyê Kanîsewzeyê bi kêf û xweşiyek ji bo nêçîra kêrwoşkan a sibê re tedarik dihatin kirin (r.13)

Di romanê de cihên girtî û teng zêdetir bi bûyerê re girêdayî ye. Ji bo cihekî taybet zêde nayên bikaranîn. Cihên girtî û teng gelemperî ji bo temamê romanê tê bikaranîn. Tê dîtîn ku ji serî heta dawî feqîrî û xîzanî heye û welat bi deste hin kesan ve hatiye dagir kirin. Gel piranî feqîrîn ji ber vê jî serî rakirine û li hember wan şer dikin. bi kurtasî dikare were gotin ku ji bilî hin cihan welat di vê demê de bi temamî di atmosfereke teng û girtî de ye.

5.1.1.3. Cihên Çandî

Meha Biharê ji paragrafa jêr tê fehm kirin ku bo Kurdan demsaleke taybet e. Nivîskar ji bo biharê dibêje ku “ bihara kurdewarî heta Xwedê bixwaze xweş e”. Di vê demsalê de her tişt xweş dibe û dawet û govend dest pê dikin. Em ji wan gotinan fehm dikin ku meha biharê bi xwe re atmosfereke çandî ava dike:

Bihar e... bihara kurdewarî heta Xwedê bixwaze xweş e. Xûre xûra çem û kaniyan, qebe qeba kewan li çiya û pesaran, stiranên bi hezar meqamanên şalûl û bilbilan, hîre hîr û destkola hespên xama yên ji zivistanê derketî li meydana, kare kar û bare bara bizin û miyên ji hol û govan derketî yên bi hêviya çûna zozanan, hezar deng û ahengên din ên mizgîniya hatina biharê û xweşkirina pîreşivanan bi şimşal û bilûrên xwe ahenga şahî û govendan, yek di bi yekê de bi hezaran naz û xemze ve serîavêtina ciwanên nazik û sava bi rengên awa û awa li çîmen, bax, mêrg, zevî û berpâlên çiyayî, li qeraxên çem û kaniyan, destgirtin û li darxistina wan govend û dawetan, ew hemû aviyên ser wan ên dilop dilop dirijin ser erdê û di bin coyên avê yên sed bihên û ruh û berhênerê sergovenda serihildanên gulan, girtina baxên gulên ciwan bi qure, mezintî û bi naz û nazenîn sergovendiya dawetan...

Di demsala biharê de keçên gundan revde û revde berhev dibin û ji bo pincarên wek dûkalo, gîlaxe, siping, pincar, kereng û ispanax ber bi daristan û qetpalên çiyayî ve diçin û ber bi êvariyê her yek ji wan bi çentik, çar û torikên xwe yên teji pincar ve bi dilxweşî û bi ken ber bi mal ve vedigerin (r.31-32)

Roman ji ber bûyerî ye zêdetir li ser vegotina bûyeran ve dimeşe ji ber vê jî ji bilî hin mînakên cihên çandî nayê dîtin. Di mînaka jor de jî çand bi dem ve hatiye girêdan û bi hatina biharê ve cihê çandî hatiye şayesandin.

5.1.1.4. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Ji bo destpêka romanê nivîskar pêşî dixwaze atmosferê bide ber çavan. Ew dişibe muzîka fonê ku di destpêka filmê de derbas dibe. Temaşevan bi rêbariya vê muzîkê ve tê amadekirin û germ kirin. Bi gelemperî di destpêka romanê da xwîner bo bûyerê ku were vegotin tê amade kirin. (Tekin, 2018, s. 150) Dem zivistan e li Kurdîstanê û sermayeke heye ku heta xwîna mirovan jî cemed dike. Romannivîs bi van gotinan bi demsalê ve dest pê dike paşê derbasê gund û derdora wî dibe û şayesandina xwe didomîne:

Zivistana Kurdistanê ye, ewqes sir û serma ye ku hindik maye xwîna nav demarê mirov bimeyê. Tu tîfdîkî dibe qeşa û dikeve erdê. Ewran pêşiya asîman girtine, deng ji zîruhek nayê. Teyr ji çeng û bask ketine, ji bo xwe bihewînin, li gund, deşt û perçepalên çiyay li ciyekî reşbelek digerin. Rêzên çiyay, deştên rast û rewan û ew malên di kolanên wan de dukelên reş derdikevin, bi kefenê berfê hatine rapêçan. Erd, tu dibêji li muqabilê zulma asîman gazindan dike û dinale, karêzên kaniyan bihna xwe vedidin û car caran bayekî sar bi ser gund de diheje, ew xortên ku li qeraxên sergoyan û li ber penayê kalaxan ji bo parastinê sekinîne, mecbûr dibin biçin mizgeft û malan.

Gundê Kanîsewzeyê nêzîkî Seqizê ye û gundekî herî xweş û bi dêmen ê Kurdistanê ye. Dikeve ber perçe pala çiyayekî bilind, her çar aliyê wî bax, mêrg û çîmen in. Ew kaniyên ku ji hemû milan ve diherikin û di palan de bi xure-xur ber bi geliyan ve ber bi jêr dibin û ji geliyên aşan derbaz dibin, spehîtiyeke taybetî ya tabû dane Kanîsewzeyê. Nêzîkî sed malên biyanî û cot û bend di Kanîsewzeyê de (r.7)

Gund bi cihana derveyî re zêde têkilî danayne. Bi şertên xwe yên taybet wek cihekî girtî tê dîtin. Ji ber ku ji cihana derveyî re zêde têkilî danayne ji xwe re qanûnên cuda diyar kirine. Yanî gund dema xwe dijî, zagonên xwe diyar dike. Ceza û xelatan dide û bi vî şiklî jiyana xwe didomîne. Li gund dem bi qasî pêvistiyan gundiyan ji aliyê xwezayê jî tê diyar kirin. (Kanoğlu, 2017, s. 127) Piştî teswîra dem û demsalê û derdora gund Romannivîs derbasê hundirê gund dibe û di derheqê Kanîsevê de agahîyan dide atmosfera gund nişanî me dide:

Nêzîkî sed malên biyanî û cot û bend di Kanîsewzeyê de hene. Hemû kewşenê gund ê axê ye. Çar malên xwediyê cot û bendan bi jina axa re û pênc malên din jî bi kur, keç û bûkên axa re nîvekarî zîraetê dikin. Xwediyê cot û bendan, tenê şeş mal bûn ku xwediyê wê taqetê bin bi şertê ji dehan didu cotkariyê bikin.

Ji biyaniyan jî bîst malan ji bo xwediyê milk û zarokên wî li gor ji sisiyan yekê kar dikirin û yên din jî bi paletî, karkerî û çerçîtî xwe îdare dikirin. Kek Mamend, yek ji wan biyaniyan bû ku li gor ji sisiyan yekê kar dikir û tam neh mehan bi jin û zarokên xwe ve li ser erda axê dixebitî û bi rojên nemir-ne jî zivistana xwe derbaz dikir.

Kek Mamend, yek ji wan biyaniyan bû ku li gor ji sisiyan yekê kar dikir û tam neh mehan bi jin û zarokên xwe ve li ser erda axê dixebitî û bi rojên nemir-ne jî zivistana xwe derbaz dikir. (r.8)

Piştî gund Romannivîs vê carê derbasê rewşa lehengên xwe dibe û derheqê wan de agahîyan dide bi wan gahîyan em fehm dikin atmosfereke ne baş heye lehengê me feqîr e. Feqîrî, rebeniya kek Mamend ji me re bi kera wî û cilên wî tê wesifandin:

Roja din serê sibê, kek Mamend ku temenê wî ji şêst salan derbaz bûbû, siwarê kerê boz bû, di kolanên gund ên teji berf de ber çiyê ve meşiya. Cil û bergên li ser kek Mamend paltoyek ji sed perçeyên pênekirî, di ciyê piştiniyê de çend perçe kapên di çend ciyan bi hev ve girêdayî, di ciyê pêçek rîşî de cawekî spî yê ji ber qirêjahiyê reş bûyî û cotek lakaşên ji çermê gayê mirarbûyî bûn. Vî dîmenê han ji dûr ve feqîrî, rebenî û lêqewmiya siwarê kerê ji hemû kesî re dida nîşan(r.9-10)

Ev cih ji mal û cihê jiyanê wêdetir nîşaneyên statûya mirovan in. (Yeşilyurt, 2018, s. 385) Romannivîs piştî xîzaniya gundiyan derbasî dewlemendiya Qerenî Axa û dest bi şayesandina mala wî dike. Li vir di atmosferên cuda nivîskar dixwaze bide ber hev:

Mala Qerenî Axa li milê herî jorê yê Kanîsewzeyê bû û kele û xaniyekî bilind ê duqat bû. Kele û xaniyê axa du perçe bû, perçeya yekan jê re enderûn digotin, ku jin, keç, bûk û qerwaşên axê tê de diman. Ew beş di nav hesareke mezin de bû û ji gund ve nedihat dîtin. Perça din jî, ku jê re bîrûn digotin, li hemberî gund bû, dîwanxane û bergeha xanî li wirbû. Axa, bi kur û xulamên xwe ve li wir diman... (r.13-14)

Dîwanxana axê bi xalîçe û mehfurên mezin û sipehî hatibûn raxistin. Di nav dîwanxaneyê de çar sitûn hebûn, her sitûnek çend balge li ber hatibûn danîn û doşekê biçûk li ber hatibûn raxistin. Di konceke dîwanxaneyê de radyoyek baterî hebû. Ji ber dumana cigaran temamê arîk û dîwarên dîwanxaneyê reş bibûn. Çend lambeyên dufitîl yê neftê dîwanxane ronî dikirin. Sobeya ji mefreqê ku têjî dar kiribûn, qirçe qirça wê bû û herçar aliyên wê wek pelên êgir sor bûbûn. (r.14)

Şêrko û Pîrût dikevin maleke. Bi ketina wan re nivîskar hem bûyerê didomîne hem jî atmosferê malê ji xwîneran re vedibêje:

Qasek derbas bû Kek Siwar hat û heval dan pê xwe û meşiya û nêzîkî deriyekî bû, çar caran lêxist û derî vekirin. Di nav xaniyekî tarî de meşiyan û pişt re çend

kapangan derketin jorê û çûn odeyekê. Di odê de çirayek fitîl diteyîsiya, kesek li wir tunebû û çend kursî li ortê hatibû danîn. Di koncek odê de perdeyek bi dîwêr ve hatibû daliqandin û berê hemû tiştên wê perdeyê bala Şêrko û Pîrût kêsa. Gelek bi dîqqet li perdeyê dinêriyan ku, ji nişkave ji pişt wan ve mirovek ket hindur û got (r.82)

Roman ji ber ku romaneke bûyerî ye û armanc xwesteka vegotina bûyer û dayîna fikra nivîskarî ye cih gelemperî wek ji jor jî tê dîtîm gelemperî wek cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin hatiye bikaranîn.

5.1.1.5. Cihên Fantastik

Em dikarin heta hevoka “ her te digot bi wê dixwazin bêjin” rewşa stêrkan fantastîk bihesîbinin ji ber ku em dizanin ku stêrk nikarin mîna mirovan binêrin û ew nêrîna ku tê qal kirin bi zanebûn nakin. Ji vir ew tişt tê fehm kirin ji bo nîşandana hin hestan romannivîs teşxîs bi kar tîne:

Êdî roj ji asoyan ava bûbû, tariya şevê dikir perdeya xwe ya reş bi ser dinya ronî de bikêşe. Stêrkan ku nû serê xwe ji asîman anîbûn der, li wan herdu ciwanên dilgeş, gelek bihêvî û xweşik dinihêrî, ku li ser kaniyê sekinîbûn û ji ber dilxweşiya wan ketibûn semayê û bi girje-girja xwe çavên xwe yê fêlezaniyê li wan girtibûn û her te digot bi wê dixwazin bêjin: "hê, hê xwe ji xelkê veşartine, lê haya me ji we heye û hê ji niha ve me dest bi govend û şahîniya daweta we kiriye..." (r.28)

Bi bikaranîna teşxîsê cihekî fantastik hatiye bikaranîn lê ew jî wek me got tenê ji bo nîşandana hesteke tînan bikaranîn.

5.1.1.6. Cihên Sehekî

Mîrût dema Pîrûtê dibîne dibe aşîqê wê. Romannivîs jî ev dema dîtîne ji me re vedibêje ava kaniyê ya zelal dişibîne çavên Kêvjalê û ev av dibêje wek wênekêşekî herî şareza wêneya wan dikşîne em fehm dikin ev tiştan di rastî de tune ye. Hemû bi hisên Pîrût wisa tînan xuya kirin:

Pîrût, tam li muqabilê Mirût li milê din yê kaniyê sekinî û ava kaniyê ya zelal ya wek çavên kêvjalê ku bi xure xur di ber wan re diherikî, wek wênekêşekî herî şareza wêneya wan herdu ciwanên xama yê li rexê wê sekinîbûn dikêşa. Pîrût cara yekê bû ku evqas ji nêzik ve çavê wî bi gula dilê wî diket û bi dîtina bin çavan a bi hezar

me'neyan dagirtî ya wê nazdara şox û şeng, pirça reş û hûnandî ya şevê, biriyên wek hîva yekşevî û hinarikên wê yên wek hinara sava çiqas diçû zêdetir şid û şidayî dibû.(r.26)

Li paragrafa jêr bi hîsên Pîrût û Mîrût cih diguhere û bi şiklekî fantastîk digire em dikarin bêjin ku ev hevok sedî sed fantastîk e ji ber ku di hevoka dawî de gotinekî ji me re nîşan dide ku her tişt bi bi hîsên wan çêdibe. Romannivîs divê gotinê de dibêje ku ‘te digot qey bi wê dixwazin bêjin’ yanî em ji vê hevokê fehm dikin tiştên ku nivîskar vedibêje pêk nayên tenê bi hîsên wan ji wan re wisa tê xuya kirin:

Êdî roj ji asoyan ava bûbû, tariya şevê dikir perdeya xwe ya reş bi ser dinya ronî de bikêşe. Stêrkan ku nû serê xwe ji asîman anîbûn der, li wan herdu ciwanên dilgeş, gelek bihêvî û xweşik dinihêrî, ku li ser kaniyê sekinîbûn û ji ber dilxweşiya wan ketibûn semayê û bi girje-girja xwe çavên xwe yên fêlezaniyê li wan girtibûn û her te digot bi wê dixwazin bêjin: "hê, hê xwe ji xelkê veşartine, lê haya me ji we heye û hê ji niha ve me dest bi govend û şahîniya daweta we kiriye..." (r.28)

Me beşa jêr di bin cihên vekirî û fireh de jî bi kar anî lê ev cih ji ber ku li ser hestên Pîrût bandorê çêdike û di dilê wî de ew hêrsbûnê digire û aramiyê de wî em dikarin di bin vê beşe jî binivîsin:

Pîrût eynî şevê ji mal derket û çû tiving û fişek ji nav gidîşa genim derxist û bi riyek rêder re ber bi Kanîkîsele ve ket rê. Dema ku bi ser Zênoya li hemberê malan ket şefeqa sibê jî avêtibû û bayê sehera sibê dengên musîqayê yên ji Kanîkîsele dihatin digihand guhê mirov. Eger kesên bi kul û derd guhê xwe bidana vê musîqayê, bê şik wan dikarîn hemû derd û kulên xwe bi van ahengên musîqayê jibîr bikirina û bêyî hay lê bin dest bi govend û şahîniyê bikirina. Çi musîqe, çi musîqe! Dengê kilîna meşkan, çêlekdotina keçan, bangên dikên berê beyanê, hîre-hîra hespan, kare-kara karik û berxan, waqe-waqa qaz û werdekên gola ber malan, hawara şivan, gavan, golikvanan û bi sedan dengên din têkelê nav hev bûbûn û ahenga musîqayek wisan saz bûbû ku ji destê tu nivîskarên musîqayê yên bi nav û deng yên dinyayê nivîsandina musîqayek wiha nedihat... Lê ji wê ahenga xweş û dilbikul dengê din jî dihat ku heta Xwedê hez bike nexweş û dilêş bû. Bi dengê qaz, quling, kew, qîqî, teyrê şivanan, reşîle, mirîşkên avê, kotir, pepûk, kûresol û bi sedan teyrên din yên xweşik ku şahîniya biharê girtibûn, dengê kundan li ser kulavê zivistanê bi tundî rûniştibû û bi dengê xwe yê nexweş bersîva wan dida û digot: "dê rojek bihara we jî kavi be û

dê zivistan bi ser de bê, xwe ewqas mezin nekin", dihat. Bi van gotinan tevan bêdeng fikir û xem û kul bi ser wan de diwerand. Ew dengê ku ahenga musîqaya tabîî Kanîkîseyê xera kiribû û wek dengê kundê ji nav hemû wê ahengê dihat û diket guhê mirov, dengê muxtarê mala axê bû ku, wê beyana zû ketibû nav kolanan û xelkê bangê ulamê fikir. Lê Pîrût guhê xwe neda wî dengî (r.58-59)

Ji Pîrût re Kanîkîselê ji hemû cihê dinyayê xweştir e. Sedama wî jî li vir hebûna Mîrût e. Ji ber hebûna Mîrût hestên Pîrût çoš dibin û ev der jê re xweş tê. Ji ber vê jî em dikarin Kanîlîselê wek cihekî sehekî bihesîbin:

Ji Pîrût re Kanîkîsele ji hemû ciyê dinyayê xweştir bû. Çunkê cara yekê li ser kaniya vî gundê bi me'neya hezkirinê ya rasteqînî gihîştibû û hemû hêvî û daxwazên xwe yên dahatû bi jinanîna keça vî gundê xweş kiribû. Pîrût ji ber xatirê gula ciwana ruhê xwe hez ji dar û berên Kanîkîseyê jî fikir. Dema ku ew ser Zêno ket û Kanîkîsele pêş ve hat xuyakirin, hemû ew keç û jinên meşk dikilan, tepik çêdikirin, gulkan berdidan, av dianîn, tendûr vêdixistin û taştê dibirin dihatin ber çavê wî û di dilê xwe de digot: "ev hemû nas û destxwîşkên Mirûta min a şêrîn in û bêhna Mirût ji wan tê...(r.59)

Cihên sehekî, gelek caran wek cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin hatiye bi kar anîn. Ev jî ji bo romanê xurtbûneke ku di navbera cih û lehengan de bi vî şiklî têkilî tê dayîn. Ji ber evîna Pîrût Kanîkîselê jê re dibe cihekî sehekî ev tişt nîşanê me dide ku hin hestan wateyeke cuda dide hin cihan û wan cihan ji cihên din vediqetîne.

5.1.2. Encama Tehlîla Romanê

Di romanê de cihên Ûtopîk, Derî Sirûştî, Olî nayên dîtin. Sedema wê jî ew e ku roman hem romaneke dîrokî û bûyera xwe ji jiyana rasteqîn digire hem jî romaneke bûyerî ye ku armanc zêdetir vegotina bûyerê ye. Lê wek me li jor jî anî ziman romannivîs ji bo xurtbûna romanê ji aliyê cihê ve dikaribû cihên Ûtopîk wek xeyalên lehengan ava bikira û şibandinên bi şayesandineke dirêj qala cihên derî sirûştî bikira. Lê romannivîs girîngî daye vegotinê û ji ber vê jî bi şayesandinan cihan nexwestiye romanê dirêj bike. Jixwe ji cihên çandî û fantastîk jî, ji her yekî mînakek tê dîtin.

Cih bi kesên ku li ser dijîn û bi kesên ku pê re têkilî datî re wate destdixe. Caddeyên ku bi bîranîn an re têkilîya wan tüne ne, ji bilî axa ku li her du aliyê wê bi malan re dorpêçkirî ne tişteki ne. (Yılmaz, 2007, s. 19) Di navbera leheng û cih de di

hin cihan de têkilî tê çêkirin. Lê ev têkilî ne ewqas xurt in. Rewşa bûyerê gelek caran di şayesandina cihê de xwe nîşan dide, ji ber vê yekê şayesandina cihê dişibe muzîka beriya destpêkirina filmeke sînemayê. (Yılmaz, 2007: 21) Di romanê de tiştên bi vî şiklî zêde dernakevin hemberî me.

Romannivîs cihên sehekî li gorî cihên din zêdetir bi kar tîne lê bi gelemperî cih ji bo nîşandana atmosferê tê bikaranîn. Roman, romaneke bûyerê ye. Armanca romanê vegotina bûyerê ji ber vê jî Romannivîs giringî nedaye cihê. Xwestiye rasterast fikrên xwe û bûyerê vebije. Bo vê jî roman ji aliyê cihê ve qels maye. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku romaneke qels ji aliyê bikaranîna cihê ve.

5.2. Balindeyên Li Ber Bê⁸

Di romanê de teknîkê ku tê bikaranîn tevlihevî dide romanê. Di romanê de çend çîrok hene di nav wan de têkilî heye mirov dikare bêje ku eyn çîrok e. *Di romanê de du vebêja du jiyan û qederên paralel e ku pirr nêz in û dişibin hevdu. Herdu vebêj, bi jinûdetarîfikirina demen borî, romanê dike "awayekî înkarkirina versiyona heqîqetê ya siyasetmedarên fermî.* (Ahmedzade, 2011, s. 77) Bûyera romanê bi vî şiklî ye. Çîroknivîs rojêke ji bi qîrînek ji xew radibe û diçe li odê rûdinê û dibêje Ferhad te jî bihîst lê deng jê Ferhad dernakeve. Paşê kesekî din dikeve hundir û diaxifin. Çîroknivîs dixwaze çîroka Ferhad binivîse lê nizane çawa dest pê bike. Ferhad lehengê çîrokê wî ye û ew kesê ku dikeve hundir û bi hevdu re diaxivin di rastî de tune ye.

Rojekê radibe û diçe derve. Dixwaze hin tiştan bixwe, paşê kesekî tê ji cixare dixwaze. Çîroknivîs wî nas dike. Navê wî Nasirî ye. Çîroknivîs dixwaze pê re biaxive û hîn bibe çima ketiye vê rewşê. Lewra Nasirî berê mîrovekî dewlemend bûye û aşiqê keçeke bi navê Efsana bûye lê Efsane ji yekî din hez kiriye. Çîroknivîs

⁸ Eta NEHAYÎ

Di sala 1960î de li bajarê Ban eli rojhilatê Kurdîstanê ji dayîk bû. Qonaxa seretayî û navendî li dibistanên bajarê Bane de qedand. Qonaxa paş navendî, li esntûtuya mamosteyan, li bajarokê Weramîn yê nêzîkî Tehranê paytexta Îranê, xwend. Dû re di sala 1978 an de bû mamoste û sê salan li dibistanên gundên Kurdîstanê ders da zarokan. Piştî şoreşa Îslamî ya Îranê bi tawana çalakîyên siyasî pêlekê hat girtin û ji mamosteyiyê jî hat avêtin.

Di şanzdeh salîya xwe de helbest bi zimanê Kurdî nivîsand. Di hivdeh salî ya xwe de tekem çîroka xwe nivîsand. Piştî şoreşa 1979an bi awayekî cidî dest bi nivîsandin û belvakirina kovarên Kurdî kir. Yekem pirtûka xwe ya çîrokan di sala 1993an de li rojhilatê Kurdîstanê çap kir. Ji wê demê heta niha sê pirtûkên çîrokan, sê roman û dehên gotarên edebî û teorik belav kirin. Gelek xelatan heta wê demê dest xistiye.

Eta Nehayî endamê Yekîtiya Nivîskarên Îranê ye jî. Vêga li bajarê Banê li rojhilatê Kurdîstanê rûdinê. (Nehayî,2013: 4)

çîroka wan hîn dibe. Di dawî de Nasirî û Efsane dizewicin lê Efsane dimire û Nasirî jî her tiştê xwe winda dike.

Çîroknivîs di navbera du çîrokan de dimîne nizane çîroka kê binivîse. Dixwaze çîroka Nasirî binivîsîne lê paşê dest bi nivîsandine çîroka Ferhad dike. Ferhad zaningehê berdide û dixwaze bibe wênesaz diçe kolanên kevn yên bajêr û derî û pencereyên malan boyax dike. Ferhad ji xwe re malek dibîne û li wir dijî. Cîraneke Ferhad heye bi navê Kalê. Ferhad û Kalê ji hevdu hez dikin. Paşê polis dikevin pey Ferhad ji ber hin tiştên siyasî. Ferhad ji mal digirin û gelek lêdidin. Çîroknivîs nexweş dikeve û wî radikîn nexweşxane dema ku jê nexweşxane derdikeve çîroka Ferhad didomîne. Polis diçin mala Ferhad û mala wî digerin. Xwediyê malê pîrejinek e. Polîs jê re dibêjin Ferhad êdî nema tê. Ew ê Ferhad bikujin. Gotinên polîsan diçe Kalê jî. Paşê Ferhad di xewa xwe de Kalê dibîne lê nikare bigihêje wî û Çîroknivîs bi vî şiklî çîrokê diqedîne.

5.2.1. Cih di Romana Balindeyên Li Ber Bê de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Cîhana Efsaneyê, Ewropa, Çiya, Îran, Iraq, Tirkiye
Cihên Girtî û Teng	+	Girtîgeh, Odeya Ferhadî, Tehran, Kolan, Dînxane
Cihên Çandî	+	Meydana Dawetê, Şîn
Cihên Olî	+	Dêr, Mizgeft
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Odeya Lehengî, Nav Bajêr, Bexçe, Hewş, Dêrdor, Kolan, Mala Ferhadî, Bajar, Qehwexane, Meha Zivistanê
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	+	Hewşa malê, Bajar
Cihên Fantastîk	-	
Cihên Derî Sirûştî	+	Dojeh
Cihên Sehekî	+	Jin û atmosfer, Sînema, Odeya Ferhadî, Hêlên li ser tabloyê, Dinyaya Hunermendî, Mala Ferhadî, Tabloyên Ferhadî, Hewş, Bajêr, Kolan

5.2.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Walter Benjamîn dibêje ku cihên hundirîn tenê ne gerdûna kesan in. Di heman demê de kewdanka wan in. Ji yana cihekî tê wateya şop hiştinê. (Balık, 2016, s. 122) Carinan hin cihan ji bo hin mirovan teng in. Lê ew cihên teng ji bo hin mirovan jî fireh in. Ji bo lehenga jêr dinya wê ya piçûk jê re vekirî û fireh e:

Efsane ne keça wan meydanan bû. Efsane ne keça tu meydaneke bû. Keçeke bi tenê û dinyaya wê ya piçûk bû. Dinyayeke piçûk, lê ronak û jidil.(r.19)

Romannivîs hin welatan jî bilêv dike. Em dikarin wan wek cihên vekirî û fireh qebûl bikin:

Bi dirêjîya van hemû salan li tişteki geriyabû da ku bixwe. Li her kû bû, li çiyê li Iraq, li Tirkîyê... tew li Ewropayê jî... (r.27)

Mirov çawa ji Ewropayê, ji navenda xweşî û ji yana xweş vedigere vir?(r.35)

Çiya di çanda Kurdan cihekî girîng digire. Li vir jî cihekî wek bêhn berdanê hatiye bikaranîn:

Du rojan em ê herin li wan çiyayan bêhna xwe berdin. (r.36)

Min zanibû bêzar û betilî ye û çiku bêzar û betilî bû, divabû here derve. Di cade û kolanan de bigere. Yan li baxçe û seyrangehan bizîvire. Ew baxçe û seyrangehên ku civangeha vala ya civanên wan ên dawî bû. Rojên payîz û zivistana heyameke berê gava destên xwe dixistin nav destên hev de, wî û Efsane. (r.105)

Ji bo cihên fireh hin navên ku di pirtûkê de derbas dibin ew in:

li Almanyayê gerafi xwendiyê. (r.111)

Wê dema ku Îran Iraq di şer de bûn. (r.112)

Tenê jinên me dikarin bi me re debar bikin. Tew li derveyî welat jî. Li Ewropayê jî.(r.168)

Gava ew çûbû Tirkîyê, Kûreş jî piştî çend mehan vegeriyabû vir. Zêde li çiya û li Iraqê jî nemabû û ranehiştibû çek jî. (r.168)

Celalî got: “ Di aştîya Îran û Iraq de Nasirî, zirarmend dibe. (r.181)

Li Tirkîyeyê û pişt re li Ewropayê name jê re nivîsandine. (r.183)

Di romanê de cihên vekirî hem ji aliyê erkê ve hem jî ji aliyê fizîkî ve tèn bikaranîn. Carinan di romanê cihên vekirî û fireh bi bandora xwe ya li ser lehengan ve hatiye nivîsandin carinan jî wek mînakên jor tenê bi firehbûna xwe wek navên welatan hatine bikaranîn.

5.2.1.2. Cihên Girtî û Teng

Zindan hem ji aliyê fizîkî ve derûnnasiyê ve dinyayê ji mirovan re teng dike. Zindan cihê girtî û teng e:

Bi têkoşîna xwe, bi veqetana xwe ji zar û zêçên xwe û bi zindan û îşkence û ... nikaribûn dinyayê biguherînin. Dinya nehatibû guhertin.(r.13)

Serê xwe bilind kir. Ne li mal û odeya xwe bû. Li mal û odayke din bû. Odeya Ferhad? Ode tarî bû. Tarî û tijî duman. Bêhna kevnî û bêhna zibla şewîtî jê dihat. Ferhad li qorzîyeke hundir li ber ronahiya qels a pencereya wê ya piçûk dirêjkirî bû. Çarşefeke diriyayî pê de bû. Jê wêdetir ez rûniştûbûm. Li ba agirdankê. Çaydanekî reş li ser agirdankê bû... (r.29)

Leheng heke li cihekî xwe ne ewle hîs bike û li ser wî tirsek çêbibe ew der ji bo wî/wê cihekî teng û girtî ye. Ji ber ku leheng xwe rehet hîs nake:

Li odayeke teng û tarî tê ser hişê xwe Ferhad. Odeyek bi qasî avdestekê. Bê tu kun û çaviyekê. Dîwarekî odayê hesin e. bi bêhdana ziwa û sar fêm dike Ferhad. Deriye hesinî gava tê kutan dengê ecêb û bi tirs dide. Wek ziringiya naqûsê dêran. (r.56)

Tehran bajarekî mezin e lê leheng li Tehranê xwe ewle hîs nake û xwe vedişêre ji ber vê jî Tehran ji bo lehengê cihekî girtî û teng e:

Ferhad xwe pêlekê li wir, li Tehranê veşart. Çend şevan li malen biraderên xwe û çend şevan jî li hotelan ma. Gava pereyên wî neman, veqerîya vir. Veqerîya mala bavê xwe. Pir zû jî fêm kir ku li mala bavm xwe jî ne ewle ye.(r.58)

Mal çawa ku mirovan ji birûskên asîmanan diparêze eynî wiha jî ji nebaşiyên jiyanê jî mirovan diparêze. (Bachelard, 2008, s. 35)Lê heke mîrovek dîl be tê wateya ku ne azad e. azadîya wî/wê ji dest hatiye girtin. Ferhat jî xwe dîl hîs dike û odeya wî jê re wek zindan xuya dibe û ji tiştê tehm nagire û her tiştê ditirse. Ji wan agahiyan tê fehm kirin ku êdî dinya ji Ferhat re teng û girtî ye:

Ew lehiya ku dîl û nemaze Ferhad ji zindanê, ji odeya wî ya tarî û piçûk aniyê derve, ji bo her cihekî bixwaze, dibe. Behitî ye Ferhad. Hawar, sirûd, dirûşim û pîkutana tund a gencên çosdar wî ditirsîn. Tirsiyaye Ferhad. Ji hemû xweşî û şeydayiyê tirsiyaye... (61)

R.Wellek- A. Warren di derheqê têkiliya cih û mirovan de wiha dibêjin: Di berhemekê de cihên bûyerê derdora bûyerê ne. Derdor, bi taybetî jî hundirê mal, binavgîn vegotina lehengê ye. Mala kesekê, parçeya wî/ê ye. Hûn qala mala wî/ê bikin tê wateya ku hin qala wî/ê jî dikin. (Karaca, 2016, s. 75) Mala Ferhat kevn û piçûk e. tenê pencereyekê wê ya piçûk berê wê li hewşê ye. Ji odeya wê behna kevnî û ziblê şewitî tê û bi dûmanê hatiye fetisandin û ronahiyeke qels dikeve hundir. Elbet ji wan agahyan em derbikevin rê em ê bibînin ku ew der cihekî teng û girtî ye:

Ev cara yekem bû min li wê qorziyê, xaniyekî kevn û piçûk didît. Xanî odeyek ku tenê pencereyeke wê ya piçûk berê wê li vê mal û hewşê bû. Min xwest bipirsim kî di wê odeya kevn û piçûk de dijî? Min nepirsî. Ferhad kete bîra min ku di odeyeke tarî û piçûk de, odeyeke ku behna kevnî û ziblê şewitî jê dihat û bi dûmanê hatibû fetisandin, li ber ronahiya qels a pencereya dû û duman girtî, rûdinişt. Di hişê nivîskarekî de. Nivîskarek ku bilez bû berî mirinê (mirina kê?) çîrokekê binivîse. Çîrokek ku heyamek bû ji bîra wî çûbû. (r.100)

Hem kolan teng e hem jî mala Ferhat piçûk e. Ronahiyeke qels dikeve hundir û derva jî berf bariyaye û sar e. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku cihên girtî û teng in mal û kolana wî:

Got: " Hêj Ferhad di xilweta wê kolana berteng û girtî de ye."

Ferhad li ber ronahiya qels a pencereya odeya xwe bû. Destên xweyên zirav û hestîkolî li dora çokên xwe alandibûn. Serê wî bi stûyê wî ve xûzî ser mile wî bûbû. Nola termekî rûniştî. Termê momiya zilamekî. Ew rabû; nêzikî pencereye bû. Pencereya odeya xwe yan odeya Ferhad? Li pişt pencereye nêrî. Derve sar bû. Ew berfa tenik ku do şev bariyabû... (r.163)

Dînxane jî mîna zindanê ne li vir jî mirov di bin çavan de dimînin û hemû tevgerên wan tîna temaşê kirin. Ê azadîya nexweşan ji destên wan tîna girtin. Lê cihekî azadî tunebe ew der teng û girtî ne:

Dibêjin tekane xalê wî jî li dînxaneyê mir. (r.171)

Şayesandina cihê ji bo tehlikirina xwînerê bo romanê gelek girîng e. vebêjer ji bûyerê aciz be, atmosfera ku saz bike di eynî pîle de gebsayî û acizkar bibe. (Kanoğlu, 2017, s. 26) Valabûna kolanan kêfa lehengê nayne û cihekî xembar dibîne kolanan. Romannivîs liv ir tesvîrekî piçûk û acizbûyî nişane me dide:

Vala ye kolan; vala û xembar. Tu dibêjî qey xweliya goristanê bi ser de rijiyaye.(r.204)

Odeyeke tarî û bi duman û nêrîneke windayî û tirsayî paragrafa jêr bi wan hevokan dest pê dike û bi vî şiklî didome. Paşê Romannivîs qala reşbûna dîwarê û neynika şikestî dike. Bi her awayî ve cihekî teng û girtî tê şayesandin:

Di nav odeya tarî û bi duman de. Nerîna windayî û tirsayî bi tiştêkî bend nedibû. Bi dîwarên reş. Bi resm û neynikên şikestî yên li ser refîkan ku dû û dûman ew nuxumandibûn. Reş û tarî kiribûn. Demjimêra ji karketî ya li ser singa dîwêr jî reş û tarî bû. Pencere jî... derve nû rohn bûbû. Ronahiyeke qels û lawaz nû ji çaviyên piçûk hatibû hundir. Ronahiyeke ku hêj jenga serma û tarîtiyê pê ve bû. Serma û tarîtiya şeveke dirêj. Payîz û zivistaneke dirêj. (r.209)

Ji ber mijara xwe di romanê de cihên girtî û teng gelek caran tên dîtîn. Carinan di şayesandineke odeyekê de carinan bi kolaneke û carinan jî bi hemû bajarê ve cihên girtî û teng hatine vegotin.

5.2.1.3. Cihên Çandî

Dawet li her herêmê bi awayekî cuda tê kirin. Govend, lêyistok û hwd. li deverê bi awayekî cida tê kirin û ew jî nîşaneya çanda gel e:

Daweteke bêyî da hol û zurna û govend û dîlan. Zava destê bûkê girtibû ew bi xwe re biribû Tehranê. Biribû malekê ku qaşo berê bavê wî jî jê re kiribû. Maleke xweş li taxeke li aliyê jorîn ê bajêr. (r.177)

Hin gel hene mirovên xwe dişewîtînin. Hin gel hene miriyên xwe datînin li ser çiyayekî û hin gel jî hene miriyên xwe binax dîkin. Di hevoka jêr de jî welatekî misilmanan de piştî binaxkirina mirîye şîn datînin. Şîn jî nîşaneya çandê ye. Û mizgeft li jêr hem cihekî olî hem jî wek cihekî çandî rol dîlîze:

Geriyabû da bibîne li kû, li kijan mizgeftê şîna wê danîne. Li tu mizgeftê şîn jê re nedanîbûn. (r.178)

Li wek li jor jî tê dîtin cihên çandî di romanê de zêde nayên bikaranîn tenê di çend hevokan de bi şayesandineke biçûk hatine bikaranîn.

5.2.1.4. Cihên Olî

Cihên Olî di romanê de tenê bi navên xwe derbas dibin li ser wan agahî qet nayên vegotin:

Deriye hesinî gava tê kutan dengê ecêb û bit irs dide. Wek ziringiya naqûsê dêran. (r.56)

Ew bi çend biraderên xwe re li mizgeftê bû. Mizgeft jî qerabaliz bû. (r.59)

Nûçeya kombûna xelkê li ber deriyê zindanê gihşt mizgeftê. (r.59)

Bavê Nasirî salekê piştî daweta kurê xwe miribû. Li vir, li mizgefta mezin şîna wî girêdabûn. (r.178)

Li quncikeke li rêxê xwarê yê mizgeftê rûniştibû. (r.178)

Berê sibehê vegeriya mal. Wê dema ku dengê melayan ji mikrofonên hemû mizgeftên bajêr bilind bûbû: “ Hey ela el-salat... Hey ela el-felah...” denge bangbêjan di nav xilwet û tarîtiya bajêr de, û di nav gilokên berfê de, ku ji destpêka şeve ve bêrawestan bariyabûn û xuya dikir wê heta hetayê bibarin, belav bûbû. (r.185)

Vala ye kolan; vala û xembar. Tu dibêjî qey xweliya goristanê bi ser de rijiyaye. (r.204)

Ji bilî rûpela 185 an di romanê de şayesandina cihên olî nayê kirin di rûpela 185 an de jî tenê denge melayan di bajêr de bela dibe lê ji bilî şayesandin nayê kirin.

5.2.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Leheng bi dengê ji xew radibe û li dora xwe mêze dike. Nivîskar jî bi çavên lehengê ji me re derdorê teswîr dike:

Qîjeke tûj û bi tirs ew ji xew veciniqand. Têkçûyî, çavê xwe li çarmedora xwe gerand. Hundir tarî bû. Ji çavika piçûk a li rexê jor ê pencereyan, li pişt perdeyên neqîşandî, çend xalên ronahiyê yên xwe û sor dîtin. ew jî wê yeke bêhêztir bûn ku di hundir de belav bibin yan rêçîka xwe zirav heta dîwarê beramber bibirin. Sergerdan

ber bi pencereyekê şemîtf. Ji wir jî çû eywanê... Derve jî tarî bû. Ji xeynî sir û hejîna tarî ya şax û çuqliyên darên hewşê, tu tiştî bala wî nekişand.(r.11)

Mirov li gorî rewşa xwe nêrîna xwe saz dike. Carinan hin cihan bala mirovan nakşîne li gorî rewş û derûnnasîyê mirov carinan tiştên ku salan li ber wî/wê ne hay dibe. Romannivîs jî li jêr ji bo atmosfereke fîzîkî bûyerek wiha saz dike:

Carna jî berê xwe dida wan dikan û avahiyên ku berê neditibûn. Berê nebûn, an hebûn û wî guh nedabû wan? Dikanên mezin û avahiyên bilind, ew hemû rêveberî, ofîs û bank.(r.16)

Romannivîs carinan teswîrên dirêj dikin di mînakên jêr de nivîskar 2-3 rûpel cih bi bûyerê re giredayî teswîr dike. Di vê teswîrên dirêj de Romannivîs cihê li gorî rewşa lehengan saz dike:

Hawûz tijî av bû. Li çarmedora hawûzê guldankên tijî gulên rengîn bûn. şemedanî, jale û etrçayî... wêneyê gulên di ava hawûzê de û di şînê kaşiyên de, tev li şax û çuqliyên daran bûbû. Tava berî evarê tîrêyên zer û narincî li ser laşê nerm û şemitok ê avê û li ser liq û şaxên dar, guldank û gulên belav kiribûn. Wêneyê bavê wî jî di avê de bû... (r.25-26-27)

Dîsa Romannivîs li jêr bi du rûpelan atmosferê nîşanê me dide:

Hawûz niha miçiqî bû. Li şûna avê bi qehfîkên şikestî yê guldankan tijî bûbû û renga şîn ê dîwarên wî yê xwar jî, weriya bû. Kaşiyên bine hawûzê jî piraniya wan derizîbûn, şikestibûn. Li aliyekî hawûzê, qaseyek qehfîkên şikestî avêtî bû û li qorzîyekê du pisîkên lawaz li ser zibl û qilêrê kermişî bûbûn... (r.25-26)

Leheng li ser kursiyê tozgirtî rûniştîye û li hewşê dinêre, Romannivîs jî bi çavên leheng li derdorê dinêre û ji me re qala atmosferê dike:

Ne li pişt maseya xwe bû. Ne li odayê jî bû. Li eywanê, li ser kursiyê tizgirtî rûniştîbû û li hewşê dinêrî. Hawûz dîsa ziwa û li ber ketine bû. Dar dar jî pelên wan diweşiyên û dara tûyê ya mezin a hewşa mala cîranê wan jî. Li dara tûyê ya hewşa mala cîranê xwe jî dinêrî. Li hêlîna vala ya leglegan li ser şaxên wê yê bilind. Leglegan rojekê berî vegera wî koç kiribûn. Ger li vir bûna wê li wan jî nerîba û gihdariya teqteqa şêrîn a nukilên wan jî bikira. Balindeyekî mezin jî carna bi çarokeya reş a baskên xwe yê vekirî li ser mal û hewşê digeriya. Guhdariya denge wî yê tûj û bi tirs jî dikir... (r.47-48)

Carinan hin cih û eşya ji erka xwe ya yekem dûr dikevin û bi erkeke din derdikevin pêşiya me. Mînak li jêr qase ji erka xwe dûr ketiye û di mûzeyê de ji bo dîtina mirovan tê bikaranîn:

Dîsa ji bîra wî çûbû. Sê roj bûn rêveberiya mirata kultûrî li mûzexaneyê bajêr pêşangeh ji bo qaseya Zêwiyê vekiribû. Qaseyek ku piştî hezar salî hatibû dîtîn. Ji jêr axm hatibû deranîn. (r.65)

Jin û mêr hêj ji temaşekirina towa zêr û bazina çêlîka mar û guharê gulên nîlofer têt nebûbûn. (r.74)

Eşya û cih carinan dîroka mirovan jî nîşanê me didin:

Celalî parçeyeke ‘ace ya şikiyayî ya piçûk, bi qasî berê destê zarokekî berşîr nîşanî wî da, û got: Li van hemû karwan, ereban, şah, wezîr, siwar û peyayan binêre; li ser vî parçeya piçûk ê ‘acê hatiye neqîşandin. Hunermendekî aliyê me nexşeke dîwara mezin jê saz kiriye. Helbet te dîtiye. Êdî pêwîst nake em rahêjin Qurâneke û bêjin bi vê Qur’anê ji berî sê hezar salan em li vir jiyane. Leşker û artêş û şah û şahjinên me hebûn.’ (r. 66)

Romannivîs carinan dixwaze bi hin tiştan atmosferê nîşan bide û gel rexne bike:

Ev hewldan ji keçeke helbestvan re di civakeke kevnperest de wek civaka me de ku her tişt, tew hezkirin jî danasîn û wateya wê ya çespanî, giştî û neguhêr heye; hewldaneke bi cesaret e. (r.70)

Romannivîs di perçeya jêr de pêşî şayesandina demsalê dike û pişt re jî bi lehengê xwe hin tiştan dide nivîsandin. Leheng jî di nivîsê xwe de wesifandina kolan û malekê dike:

Derve sar bû. Sireke bayê dihat. Ewrên xwelîreng jî di hemêza asmanan de veçiriyabûn. Em derbasî kolanekê bûn. Nivîsand:

Kolan zirav û berteng in. Mal piçûk û ban herifî ne. Diwar kelpîç û pencere şîn in. Guldankên vî alî û wî aliyê pencereyan û keviya balkon û eywanan tenekeyên mezin û piçûk serê xwe hildane. Tijî şemedanî û rîhan û... hilma nane nû yê nanpêjgeha li ser qorziya xaçerêyê di hemû taxê de belav bûye. (r.76)

Carinan jî Romannivîs bi hevokekê de ji me re atmosferê vedibêje:

Jê wêdetir kalemêrekî hestîkolî li ber derîzaneke malake din rûniştibû. Ji kemberê ber bi jor, bi ser teneyekeyê tijî agir de xûz bû ji ber ranebû. (r.77)

Leheng diçe ber pencereyê û ji wir kolanê dinêre û Romannivîs dîsa bi çavên lehengê dest bi şayesandina cihê dike:

Diçe ber pencereye û ji wir li mala wî rexê kolanê dinêre. Maleke piçûk a yekqatî. Kevokxaneyeye mezin li ser banê mahlê ye. Qefeseke moxilkirî. Kevok, ji xeynî du-sê heban li ser ban belav bûne. kevokîstan e ban. Kevokên spî, şîn, reşbelek, bi tirî û bê tirî. Tik tik dixwînin. Li dora hev digerin. Li jêr bân, pencereya piçûk a li ser kolanê diyar e. Gula hinarê jî hêj nehatiye avdan. Nerîna xwe ya windayî vediguhêze hewşa mala Ferhad. Hewşeke piçûk û derîyekî teneke. Li wir jî çend kevok hene. Kevokeke bask rengîn li ser keviya hawûzekî piçûk serê xwe hildaye, nukilên xwe di avê de kirine. (r.78)

Dema ku di navbera mirov û mal de têkiliyek hebe mal bi qîmet e. Dem jî şahîdê vê peymanê ye. Bi îzn û rêberiya wê hînî derdor û eşyayan dibin. (Kanoğlu, 2017, s. 10) Di perçeya jêr de jî Romannivîs dixwaze hundirê mala Ferhad nîşanê xwîneran bide û bi vê armancê dest bi şayesandinê dike:

Mala ferhad bû. Du ode, li ser korîdoreke piçûk.

Min got: ‘‘ ev ode kargeha wî ye’’

Li odeya ser kolanê bûn. Her çar dîwarên wê bi tabloyan nuxumandî bûn. kursiyê li rasta odayê jî tabloyeke nivcomayî li ser bû. Qutiyek reng u firçe li jêr kursî rijiyabû. Wî di navbera hêlên tund û rûyê tirş û bê me’ d û renga sar ê tabloyan de serma girtibû. (r.80)

Roman ji bo nêzî rastiyê be nivîskar carinan navê hin cihan jî dide. Dixwaze di hişê xwîneran de bûyereke rasteqîn bi cih bigire:

Êvara rojekê ku diçû Tehranê, di otobûsekê de dîsa Kalê dît. (r.84)

Wek me li jor jî got leheng dikare cihê xwe biguherîne û wî bixemilîne:

‘‘Ferhad gava ji zanîngehê reviya û vegeriya vir, pîşeya ressamîyê hilbijart. Tîn da rengkirina derî û pencereyên malen taxên kevn û qedîm.’’ (r.85)

Ferhad di kolaneke de dest bi kar dike û dixwaze kolanê bixemilîne. Li kolanê jî mala pîrejineke heye û nivîskar jî şayesandina mala pîrejinê dike:

Wê rojê ferhad li mala pêrejinekê, li hember mala Kalê kar dikir. Mala pirejînê du destê bûn, li vî ber û wî berê hewşeke piçûk. Desteya wî berê hewşê du ode bûn ku pirejîn bi tenê di wan de dijiya. Desteya din serzemîn û jêzemînek bû li ser kolanê. Hêrzemîn korîdoreke tarî ya zirav û îmbareke kevn a vala bû. Serzemîn du ode û rajoreke piçûk. Berê kireçî têde bûn. (r.91)

Kale diçe mala Ferhad ji mala Ferhad li mala xwe dinêre. Romannivîs jî vê atmosfera her dû malan ji xwîneran re vedibêje:

Kalê di koridora tarî de, bi pêpelûkan de hildigire. Pêşî diçe odeya li ser kolanê. Odeya li ser kolanêkargeh e. Pencereya wê hêj perde pê venîne. Li pişt pencereyê dinêre. Li kolan û jê wêdetir li mala xwe. Li ser ban û kevokxana Rehîmê birayê xwe... (r.92)

Romannivîs li perçeya jêr de jî dixwaze malên ku li kolanê ne bi me bide nasîn:

Digotin: " hemû malen ku di destpêka kolanên girtî de ne, malen Savakiyan e." çend malen jê wêdetir, mala Re'naya Heft derpê bû... Jê wêdetir mala Maşellayê Postecî hebû. Ew kalemêrê hestîkolî ku her roj li ber deriye mala xwe rûdinişt... Li beramberî mala Êaşella, mala Xaltîka Perîzade bû. Jineke rûxweş û mihirvan... (r.120-121)

Romannivîs di paragrafa jêr de jî atmosfera sîyasî û atmosfera bajarê ji xwîneran re dibêje. Li vir ev şayesandin ji me re hem atmosferê nîşan dide hem jî ji ber êş û kederê tengbûn û girtîbûna bajarê:

Rojên xwepêşandan û meşan jî li bîra Celalî bûn. Wê heyamê ku xelk bi her behaneyekê bana dadiketin ser kolanan û... her tim behabeyek hebû. Komkujiyek li bajarekî dihat kirin û xelkê nerazîbûna xwe nîşan dida. Daxuyaniyek ji serokayetiya şoreşê dihat dayîn û xelkê pêşwazî lê dikir. Kesek an çend kes şehîd diketin û xelkê terme şehîdên xwe didan ser milên xwe û ber bi gorîstanê dibirin. Ew bi xelkê re bû. (r.126)

Cih her tim di nav guhertinê de ne. Carinan hin cih xêra dibin an tên xira kirin û ji dewsa wan jî cihên nû tên saz kirin ji beşa jêr jî ev tişt derdikeve pêşiya me. Maleke kevn tê xira kirin li aliyekî din jî avahiya mezintirîn banka bajêr tm saz kirin:

Demêke din hewş û mal hildiweşiya; hildiweşandin. Helbet di pêşî de darên hewşê dibirîn û çivîk sergêj dibûn. Pisîkên malen cîran jî... du pisîkên lawaz ku ji

tirsa azara zarokan, dihatin û li qorziyeke hawûzê hişk û hilweşiyayî li hev ditewiyan, hawûz li ber wan dihat girtin. Hewş didan erdê. Hingê diketin canê malê. Derî eywanê dirûxandin. Mal jî didan erde. Dû re avahiyeke mezin; ne wek niha berê wê li qible û tavê, lê berê wê li kolanê, li cigê vê hewş û malê xişt xişt bilind dibû. Avahiya mezintirîn banka bajêr. Banka millî yan millet ?(r.144)

Di qehwexaneyan de mirov tevlî civakê dibe, çay vedixwe, sohbet dike. Li vê derê mirov gelemperî bêkar û navsere ne. (Kanoğlu, 2017, s. 40) Ji sermayê xelk cihê xwe diguherîne ji derva direvin hundirê çayxanê li vir çayxana ji ber ku mirovan diparêze ji bo mirovan cihekî fireh e. Derva ji ber ku sar e û xelk ji direve cihekî teng e. Lê piştê wî Romannivîs atmosfera çayxanê ji me re vedibêje:

Çayxane qerebalix bû. Sermaya derve xelk dehf dida û deste deste dihatin hundir. Ew li rûyên wan yeko yeko hûr dibû. Rûyên matmayî û perişan û hestîkolî, li pişt hilm û dûmana çayxaneyê... (r.169)

Carinan hin kesan bi cilên xwe bi cihên xwe bi şikl û şemalên xwe tên nasîn:

Wî got: ‘nasirî lawekî ciwan û cilxweşik bû. Peugeotteke kesk a model nû di bin de bû. Carna jî Sêtar dijenî...’ (r.170)

Leheng berê sibehê vedigere mal û dengê melayan dibihîse dengê mela di atmosfera bajarê de belav dibe:

Berê sibehê vegeriya mal. Wê dema ku dengê melayan ji mikrofonên hemû mizgeftên bajêr bilind bûbû: ‘Hey ela el-salat... Hey ela el-felah...’ denge bangbêjan di nav xilwet û tarîtiya bajêr de, û di nav gilokên berfê de, ku ji destpêka şevê ve bêrawestan bariyabûn û xuya dikir wê heta hetayê bibarin, belav bûbû. (r.185)

Bi sê rûpelan Romannivîs atmosferê vedibêje. Meh zivistan e û yekem berfa giran a salê dibare. Leheng jî di vê berfê de di kolanan de digere:

Destên xwe hepişandibûn berîka paltoyê xwe û bi serberjêra kolana vala de, li jêr xunafa berfê, dageriyabû. Ne yekem berfa salê bû. Lê yekem berfa giran a salê bû. Heta wê demê bostekê bêhtir bariyabû. Piyên wî ji bostekê bêhtir di berfa nerm û spî de, diçû xwarê. Şûna piyên wî li keviya kolanê, şûna piyên kesekî bû ku bi giranî û aramî meşiyabû... (r.186-187-188)

Romannivîs dîsa bi şayesandineke dirêj dest bi vegotina atmosferê dike. Leheng li kolanê dinêre û bi valabûna kolanê ve dest bi mêzekirina li pencereyan dinêre û nivîskar jî şayesandinê dike:

Vala ye kolan; vala û xembar. Tu dibêjî qey xweliya goristanê bi ser de rijiyaye. Bi ser mal û banên stûxwar û herîfî yên malan de. Bi ser dîwarên kelpîç de. Bi ser pencere û... hêj şîn in pencere. Şîn? Xwelîreng in. Felqên wan hatine asê kirin. Derz û birînên wan bi kaxezan ve hatine veşartin. Kes li ber pencereyan nîne. Tew keçen genç jî. Perde û pişt perdeyan hatine daran... (r.204)

Leheng odeya xwe berê nas nake ji re xerîb tên. Bo lehengê ti tişt îfade nakin. Û leheng dest bi gerandina hundirê malê dike û em jî bi wê gerê re atmosfera hundirê dibinin:

Destekî bi dîwar ve digire û radibe. Ji wê odeyê ji bo odeyeke din û jê re xerîb in ode. Kelûmel jî jê re xerîb in. Resmê li ser singa dîwaran, guldankên nav pencereyan û tew neynik jî. Tê bîra wê, çi neynikên mezin û piçûk ên nav malê hene kom dike. li odeya xwe wya piçûk, ea ku divê bê helawîstin. Hildawêse... (r.206-207)

Di romanê de herî zêde cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin tên bikaranîn. Şayesandina cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin carinan bi çend rûpelan didome. Wek jî jor jî tê dîtîn ev şayesandinên ku tên kirin gelemperî bi bûyerê ve girêdayê tên vegotin:

5.2.1.6. Cihên Ûtopîk

Carinan di nivîsên hin nivîskaran de hin cih ne fena rastiya xwe ye Romannivîs li gorî cihan dikare saz bike. Minaka jêr elbet ji bo ûtopîk em dikarin bêjin sedî sed were qebûl kirin. Lê ji bo mînakek me xwest li vir binivîsin. Lewra ji bo Leylayê ev cih wek ûtopîk dibe ku were xuya kirin:

Li hewşê, leyla careke din li çep û rastê xwe nêrîbû. Gotibû: " Nihat ê bîra min, min berê ev baxçê û hewş dîtine. Hawûzekî mezin a tijî ava rohn, rêza gulên rengîn û ev dar û ber jî... bawer dikim ew dara tûyê ya mezin jî ku hêlîna leglegan li ser e, di vê hewşê de be." Di çîrokê de dîtibûn. Xwendibû. Wî nepirsî kijan çîrok ?" Lê niha, wek tu dibînî vala û kavil e." (r.53)

Romannivîs dixwaze bi lehengê xwe çîrokek binivîse û bi pêûsa lehengê xwe ji xwe re jiyaneke ku xeyal dike diafirîne:

Xelk, bi jin û mêr û zarok û naşiyan li ser kolanan belav bûn. pîrejin û kalemêrên malnişîn jî ji pencere û balkonên malen xwe qevd bi qevd gulan direşînin. Bi ser xelkê çoşbûyî û bi ser dilên azadkirî de. Gulan li wan dibarînin. Bajar demeke bixêrhatina lawên xwe yên bendkirî dike. roj, roja qiyametê ye. Qiyameta xelkê îmandar. Kêfxweş û serketî ne xelk. Tew polis û leşker jî li ser tank û neferberên xwe jî kêfxweş in. (r.60)

Di romanê de di du cihan de cihên ûtopîk tên dîtîn. Xwesteka jiyaneke xweş heye û cihên ûtopîk jî bi xwestekê tên ava kirin. di cihê ûtopîk ya yekem de bi çîrokeke cih tê şibandîn ya duyem de jî romannivîs bi lehengê xwe çîrokek dide nivîsandîn û dixwaze jiyaneke xweş saz bibe.

5.2.1.7. Cihên Derî Siruştî

Dojeh peyveke Derî Siruştî ye. Di romanê de dojeh tenê bi nav derbas dibe ew jî şî teşbîxê tê bikaranîn:

Pişt re berê xwe jê guhert. Pêşî li dora xwe û dû re di hundurê odayê de, geriya. Tirsîyabû. Heta bîra wî ku bireve. Hate bîra wîku jî wê odeya dojhî derkeve. (r.31)

Di dojhê kîjan qederê de em dibin xwelî? (r.31)

Qiyameta xelkê îmandar. Kêfxweş û serketî ne xelk. Tew polis û leşker jî li ser tank û neferberên xwe jî kêfxweş in. (r.60)

Wek li jor jî tê dîtîn ji bilî şibandîna ti erka wan tune ye.

5.2.1.8. Cihên Sehekî

Li paragrafa jêr nivîskar pêşî dest bi pirsan dike paşê derbasî bersîva dibe. Ji bersivan tê dîtîn ku ew der cihê sehekî ye. Ji ber ku agir di asmanê belav dibe û bayê hişk û sar pergî wî tê. Lê pişt re nivîskar dibêje ku jin gîlokek agir bû di hemêza bayê de semaya mirinê dikir. Romannivîs jin û atmosferê bi hevdu re girê dide û têkiliyeke di navbera her du de datîne:

Ew li kû bû, gava jin gilokek agir bû di mal û hewşeke piçûk de? Piçûktir ji dinyaya piçûk a xewn û xeyalên wê yên qaçax û heram. Piçûktir hemû daxwazên wê. Ji wê pişka piçûk ku wê ji jiyanê dixwest...

Ew li kû bû, gava deriye teneke yê hewşeke piçûk carekê, du car û sê caran diderîzî û xilmaşî û bêdengiya kolanê dişikand? Laşê agirgirtî yê jinê carekê du car û sê caran derdiket derve û xilweta qerîsî ya kolanê têk dida. Agir di asmanê kolanê de belav dibû û ba bayê hişk û sar; bayê koçber pêrgî wî dihat. Dostê kevnar ê bayê bû agir, hemêza xwe jê re vedikir. Bêriya wî kiribû, ew bi xwe ve diguwaşt. Ew ji erde bilind dikir û li dora xwe dizikand. Wê çaxê jin gilokek agir bû û di hemêza bayê de semaya mirinê dikir. (r.9)

Cih her tişt e. Lewra dem nikare bîranînan zindî bike. (Bachelard, 2008, s. 37)
Hin cih hene bîranîn mirovan zindî dikin. Bîranîn jî girêdayê hestên mirovan in:

Ew li ser kursîyekî, berê wî li derve rûnişt. Ofîs li hember sînemayê bû. Sînemayek ku ji salên berê bû. Ji wan salên ku ew zarok bû. Naşî bû. Çiqasî ji sînemayê hez dikir. Hinek rojan çend demjimêran li ber deriye wê, li perdeya wê ya mezin dinêrî. Li wêneyê ekteran û vêga li ser perde wêneyê keç û xortekî ciwan hebû. Keç û kur her yek ji wan li aliyekî perdeya bû, li hemberî hev. (r.19)

Victor Hugo ji bo “ Quasimodo ” dibêje ku: Katedral bi dorê ve hêk, hêlîn, mal, welat û gerdûn bûbû ji bo wî. Heta salyangoz çawa ku şiklê qalika xwe digire ew jî şiklê Katedralê girtibû. (Bachelard, 2008, s. 111) Cih û derûnnasî bi hevdu re girêdayî ne. Ferhad di odeyeke teng û tarî de dijî. Pencereyeke wî ya biçûk heye li derve hewşeke mezin, fireh û xweş heye. Romannivîs li vir dide fehmkirin ku Ferhad di derûnnasîyeke ne xweş de ye:

Ber bi Ferhad çû. Ber bi pencereya piçûk a odeya wî. çavikên bistên wê bi dûmanê tarî bûbûn. Ronahiyeke qels û lawaz ji wan dihate hundir û din av reşahî û tarîtiya odeyê de belav dibû. Berê destê xwê bi çavikî pencereye ve anî. Berê destê wî reş bû. Guh nedayê û li pişt pencereye nêrî. Li derveyî pencereye, hewşeke mezin a tijî dar hebû. Hewşeke payîzî ya serzemîn. Eywaneke mezin a sê stûn û rêzeke pencereyan. Li ba wî ne xerîb bûn. got: Ew hewû û mal li ba min ne xerîb in. Ez dibêjim mine wî berê dîtine. (r.29)

...Te digot qey terme mûmyayî yê mêrekî ye ku piştî hezar salî ji jêr axê derketiye û li ber ronahiya qels a pencereyeke piçûk, di odeyeke tarî û tijî duman de; di odeyekê ku bêhna kevn û bêhna ziblê şewîtî jê tê. Bi dîwêr ve helawîstibin. (r.30)

Ressam herwiha di nav tebarek reng û firçeyên gir û hûr de rûniştîye û ji xeynî çend helan, tiştêkî din li ser spîtiya tabloyê nekişandiye. Çend hêlên xwar û reş û zirav, ku her yek ji wan wî ber bi aliyekî ve dibin, lê yek ji wan jî wî ber bi Kalê nabin. Tevzînokek mîna tîreke di ber cênîka wî re dibuhure. Tablo û kursiyê wî yê perpitî li jor serê wî dizîviri. (r.42)

Carinan hêlek li ser mirovan hezaran hest diafirîne:

Ditirse ku Kalê nebine. Diponije, wiha baş e bide dû wan çend hêlên xwar û zirav ên li ser tabloyê. Nizane heta kû. Hêla yeke dibe hewşa malekê wî dibe bin sîbera darekê. Hewş û dar li jor serê wî dizîvirin. Yek dibêje: ‘‘ Wiha baş e heta demekê dev ji wênekişandinê berde. Betili ye. Pêwist e vehese...’’

Betilî ye; dizane ressam ji wexta ku ji mal û hewşê hatiye veqetandin, çiku kolan bi kolan geriyaye westiyaye. Kolan bi kolan geriyabû, dû re di kolanekê de winda bûbû. Her wekî Kalê ku winda bûyeû wê nabîne ressam. Çipeçip dev jê bernadin. (r.42)

Hin cih li gorî derûnnasiyên lehengan diguherin û her leheng ji pacê xwe li dîmenê dinêre:

Leyla got: ‘‘ gava li odeyan digeriyam li wê yeke difikirîm, ji bo nivîskarekî wek we ev mal û hewşa mezin –negot ev mal û hewşa kavi û vala- baştirîn cih e bo nivîsandinê.’’

Qedereke ecêb bû. Mal û hewşeke vala û kavi... wê keçêçiqasî dilrunîştî digot baştirîn cih e ji bo nivîsandinê. Neşmîl got: ‘‘Baştirîn cih e ji boş ahî û dawetê jî’’(r.51)

Cih derûnnasiyên mirovan nişan didin:

Ode wek herdem tarî û ewrekî dûmanê li jêr serê wî çêbûbû. (r.58)

Li gorî Suut Kemal YETKIN çawa ku ji axaftina mirovan di derheqê cihê ku li dijî agahiyan tîn dîtin. Eynî şiklê jî ji derdor, mezel û eşyayên wan, di derheqê

lehangan de agahî didin. (Karaca, 2016, s. 76) Carinan mirov derdora xwe saz dikin, carinan jî derdor mirovan saz dikin:

Wî di cî de bersîv neda. Bîstekê ponijî, dû re got. “ Dibe ku da ku dinyaya derdora xwe bi wan bixemilîne. Xemilandin hertim beşek keda mirov bû. Xemilandina xwe û dinyaya derdora xwe” (r.67)

Bedew? Yanî ew peyker jî ji bo xemilandina cihekî hatibû sazkirin. Xemilandina dinyaya derdora hunermedê peykersaz. Gava dinya bi berhemên hesret û meraqa mirovan bixemilîne... (r.69)

Cih em dizanin ku li ser mirovan bandorek çêdike lê hin cih hene ku bandora wan zêde ye. Hestên ku li ser kesan ve çêdikên li gorî cihên din cuda ne. Li jêr jî em ê mînakek ji wan cihan bibinin:

Gotibû: “ hinek cih qet naguherin.” Şaş bû. Wê rojê zanibû ku şaş bûye gava ji bo cara yeke piştî vegera xwe, di kolanan de geriyabû. Mal, kelpîçên dîwaran, rege şîn ê pencereyan, şemedanî û rîhanên di guldankên teneke de û... lê belê xelk jî guheribûn. Kes ji wan nas nekiribû... Her quncik û enîşkeke malê tişteke dianî bîra wî. Kesek. Neda pey şopa bîranînên xwe. (r.81)

Evîn nayê veşartin. Di kolaneke berteng û girtî de. Nêrîn û pistepista dildarî û civanên bi dizî ji çav û guhên kesî winda nabin, dizane Kalê. Guh naiyê. Çima guh nadiyê? kêfxweş e. Bila kolan eşqa wê li ser zimanan bigerîne. Pistepist û girnijînên xelkê dostane ne. Bila keçen tevîkar bilind bistrên. Nêrîna pîrejina xwediya mala Ferhad mihirvan e. Lê Ferhad... xemgîn û dilgiran e Ferhad. (r.99)

Mirov berhemên xwe jî li gorî hestên xwe diafirîne û cih jî li ser hestan bandorê çêdike:

Xemgîn û dilgiran e Ferhad. Mest û dilteng. Li pişt sêpî û tabloya xwe rûniştiye. Rengîn kiriye. Reş û şîn û... firçeyekê reng dike û bi tabloyê ve tîne. Hêleke din mîleke din. Dû re xwe dikişîne û li tabloya xwe diponije. Merek li pişt hêlan... êsîr e mêrik; dîl e. Di zemîna reş û şîn a tabloyê de... (r.101)

Leheng ji bo hin hestên xwe ji mal derdikeve. Di kolanan de digere. Bi hestên leheng kolan êdî dibin cihên sehekî:

Min zanibû bêzar û betîlî ye û çiku bêzar û betilî bû, divabû here derve. Di cade û kolanan de bigere. Yan li baxçe û seyrangehan bizîvire. Ew baxçe û seyrangehên ku civangeha vala ya civanên wan ên dawî bû. Rojên payîz û zivistana heyameke berê gava destên xwe dixistin nav destên hev de, wî û Efsane. (r.105)

Li jêr Romannivîs pêşî teswîra cihê dike û atmosferê nişane me dide. Di hevoka dawî de jî dibêje ku dîmenekî tirsnak, xembar û diltezen bû. Ji wan gotinan em fehm dikin ku dîmen li ser hestên wî bandorê çêdike û cihekî sehekî saz dike:

Min li pişt pencereyê nêrî. Li hewşeke kavil. Li daran ku ji qurm ve hatibûn birrîn. Dar bi şax û pelên xwe yên rût ketibûn erdê. Hewşa wan nuxumandibûn. Li wî derê hewşê jî avahiyeke mezin hilweşiyabû. Stûnên wê herifbûn. Ban û eywana wê ketibûn. Balindeyekî reû û mezin jî li ser lûtjeya kavilê lûsiyabû. Dîmenekî tirsnak bû. Tirsnak? Dîmenkî xembar û diltezen bû. (r.202)

Di paragrafa jêr de bajêr wek cihekî sehekî tê nişandan ji ber ku qeweta germkirina hevrebûna wan di hundirê xwe de dihewîne:

Demsala sermaye qediya Kalê. Pêwistiya me bi agir nîne. Bi hevrebûna me ne ku me bi tenê, li bajêr jî germ dike.’’ (r.211)

Cihê sehekî di romanê de pir tê bikaranîn ji mînakên jor jî tê dîtin di navbera leheng û cih de têkilî tên çêkirin. Carinan baxçeyek li ser lehengan hest çêdikin carinan hestên lehengan li ser cihan rol dilizîn û mînakên li ser wan di avakirina cihên sehekî de bi vî şiklî rol dilizîn.

5.2.2. Encama Tehlîla Romanê

Di romanê de tenê cihên fantastîk nayên dîtin. Sedema wê jî ew e ku roman mijara xwe ji bûyerekî dîrokî digire û armanc zêdetir vegotina bûyera vê demê ye. Heke cihên fantastîk bihatana bikaranîn ew ê dibe ku li ser vegotina bûyerê bandoreke nebaş çêkira ew jî rastiya bûyerê hinekî kêmbikira. Ji bilî cihên fantastîk, ji hemû cihan tê îstîfade kirin. Ji cihên Derî Siruştî tenê çend mînak derdikeve pêşiya me ew jî ji bo şibandinê tên bikaranîn.

Di romanê de cihên olî gelek caran derdikevin pêşiya me lê ti carî wesifandina wan nayê kirin. Cihên olî tenê bi navên xwe derbas dibin û di derheqê wan de em ti agahî jî nayê dîtin.

Di romanê de cih, ji bilî cihên Fantastîk, Derî Sirûştî û Olî gelek caran derdikevin pêşiya me û bi avayekî serkeftî tîk bikaranîn. Mîrov werin tehlîl kirin di derheqê cih de, cih werin tehlîl kirin, di derheqê mirovan de agahî tîk dest xistin. M. Tekîn di derheqê vî mijarê de wiha dibêje: Cih li gorî derûnnasiya kesên ku li dinêre, li gorî felsefe û nerîna wî/ê yê li ser cihanê diguhere. (Yılmaz, 2007, s. 17) Di romanê de romannivîs di navbera cih û lehengan de tîkîlî çêdike. Hem leheng li ser cih xwedî bandor e hem jî cih li ser lehengan bandorê çêdike.

Di romanê de şayesandinên hem dirêj hem jî kin derdikevin pêşiya me. Nivîskar ji aliyê şayesandinan jî serkeftî ye. Cih tenê ji bo sazkirina atmosferê nayê bi kar anîn. Bi zanebûn cih ji bo bûyerê tîk ava kirin. Roman ji aliyê cihê ve romaneke serkeftî ye.

6. CIH DI ROMANÊN BAŞÛR DE

6.1. Apê min Cemşîd xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir⁹

Roman li ser bûyereke Fantastîk hatiye nivîsandin. Di romanê de Cemşîd Xan ji aliyê dewletê ve tîk girtin û gelek dem li zindanê dimîne û li wir îşkence dibîne. Ji ber îşkenceyan pir qels dibe. Ewqas qels dibe ku rojekê bayek tîk û wî radike hewayê û wî bi xwe re dibe. Cemşîd Xan ji hiş diçe, dema ku tîk li ser hişê xwe dibîne ku bayê wî aniye bajêr. Malbata Cemşîd li hemberê rewşa Cemşîd gelek şaş dimînin. Ji bo cemşîd dîsa ji aliyê dewletê ve neyê girtin wî bi du biraziyên wî re dişinin gundeki bi navê Baranok.

Cemşîd bi piştî demekê ji aliyê dewletê ve tîk efû kirin û dewlet wî û biraziyên wî dibe leşkerîyê. Cemşîd bi ben tîk girêdan û wî berdidin hewayê ku cihê dijminana diyar bike û ji fermanarê xwe re bêje. Bi vî şiklî gelek dijmin bi saya Cemşîd tîk

⁹ Bextiyar ELÎ

Bextiyar ELÎ, li bajarê Silêmaniyê li Başûrê Kurdistanê di sala 1960an de ji dayik bûye. Li Silêmaniyê xwendina seretayî li dibistana Şêx Selam qedandiye, dû re li dibistana navendî ya Ezmîr xwendiyê, qonaxa amadeyî jî li dibistana amadeyî ya Helkewt xilas kiriyê. Li zanîngeha Silêmaniyê û pişt re Hewlêrê, di fakulteya zanistî ya zanîngeha Selaheddîn di beşê zevînasî Jeolojî de xwendekar bû, lê xwendina xwe ya zanîngehê xilas nekir. Di salên 80yan de, Bextiyar ELÎ hejmareke helbestên dirêj dinivîse, weke “bajar”, “guneh”, “karneval” û çend helbestên din. Destnivîsa yekem a romana Mirîna Tekane ya Duyem jî vedigere wê heyamê. Di payiza sala 1989an de, gotara xwe ya yekem di rojnameya paşkoya Iraqê de belav dîke.

Piştî derketina şerê navxwe di Îlona 1994an de, ji Kurdistanê bar dîke û berê xwe dide Sûriyê, piştî neh mehan ji jiyana li Şamê diçe Almanyayê û heya sala 1999an li bajarê Frankfurtê bicî dibe. Di sala 1998an de romana Êvara Perwaneyê dinivîse. Ji sala 1999an ve li bajarê Kölnê rûdinê. (Eli, 2012: 4)

kuştin lê dilê Cemşîd li hemberî vê bûyerê gelek diêşe û benê xwe diqetîne û ba dîsa wî digire û ji wir dûr dixê. Piştî hin bûyeran Cemşîd dîsa xwe digihîne Baranok û ji wir jî diçe bajêr û li wir dizewice lê ji aliyê jina xwe ve tê xapandin. Jina wî, wî gire dide û wî berdide hewayê paşê benê Cemşîd dibire û ba dîsa Cemşîd bi xwe re dibe. Cemşîd diçe li ser çiyayekî û ji aliyên gerîllayên PKK ve tê dîtin. Cemşîd xwe dîsa digihîne bajêr û li bajêr ji aliyê meleyekî ve tê xapandin. Mela Cemşîdê wek pêxemberek nîşanê gel dide û bi devê Cemşîd fikren xwe bi xelk dide qebûl kirin.

Cemşîd diçe rojavayê û ji tixûba Tirkiye YÊ mirovan direvîne Ewropayê. Paşê ji aliyê leşkeran ve tê dîtin û Cemşîd dîsa li hewayê dikeve. Dîsa vedigere bajêr û ajanseke vedike. Biraziyê wî Smayîl tê kuştin û Cemşîd gelek di bin bandora wî de dimîne û dixwaze ji wir dûr bikeve. Herî dawî Cemşîd dîsa bi hewayê dikeve û diçe rojavayê li wir dijî û qelew dibe paşê nikare bifire ew jî dibe mîrovekî asayî.

6.1.1. Cih di Romana Apê min Cemşîd xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Navçeyên azad, Asîman, Baranok, Çiya, Daristan
Cihên Girtî û Teng	+	Girtîgeh, Gund, Çiya, Mal, Iraqû Îran, Bajarê Lehengî, Odeya kevin ya dapîra lehengî, Qefes
Cihên Çandî	+	Daweta Cemşîdî
Cihên Olî	+	Mizgeft
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Sala 1979an, Şerê Iraq û Îranê, Ordîgeh, Meydana Şer, Xuremşehr, Dema şer, Baranok, Iraq, Stenbol, Yewnenistan, Mala Mensûre Xanim, Welatên Asyayê, Odeya Cemşîdî
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	+	Xeyalên Melayî
Cihên Fantastîk	+	Rêwitiya Cemşîdî, Berhewabûna Cemşîd
Cihên Derî Sirûştî	+	Dojeh, Bihuş
Cihên Sehekî	+	Deşt, Meydana Şer, Odeya Cemşîdî, Guherina hewayê, Welat, Behr, Baranok, Mala Cemşîdî, Asîman, Kumbeta herî bilind a nêzîkî bajêr

6.1.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Cemşîd berê xwe dide navçeyên azad û li wir ji sixurên nehenî dûr dikeve. Ev navçeyên azad cihên vekirî û fireh in ji ber ku leheng li wir xwe ewle hîs dikin:

Berê xwe bide navçeyên azad yê çiyayî da ji destê dewletê û ji çavê sixurên nehenî dûr be, gundê me yê kevin jî li cihekî sar û asê di nav çiyayan de bû. (r.13)

Îran ji ber zordariya xwe cihekî teng e. Leheng li wir ne ewle ne û tim ji kuştina xwe ditirsin ji ber vê biraziyê Cemşîdî dixwaze, Cemşîd bifire û xwe ji wê welatê dûr bixe. Li vir asîman wek cihekî fireh û vekirî tê dîtin. Lewra deriye azadbûnê li asîmanê ye:

Ez ji nav gelek benden bi xof ên wê cengê de ji wê yeke ditirsiyam îranî carekê ji caran Cemşîd bibînin û wî li ezmanan bikujin, gelek caran min ji apê xwe re digot ku êdî bes e bila dev jê berde û carekê çavê xwe binuqîne û xwe di hewayê de berde û ba wî bi kû ve dibe bila bibe, heye ku dilê ezmen pê bişewite û wî hilgire erdeke din û ji van herdu welatên xwînmij azad bike. (r.32)

Leheng ji bo neyê qefaltin ji leşkeran direve û ji bo xwe veşîrê diçe Baranok. Baranok ji ber ku wek parastgeh rol dilîze cihekî vekirî û fireh e:

Da ku nekewim destê wan grûbên taybet de jî ku li dû leşkerên reviyayî digeriyan, hilkişiyam serê çiyayan û çûme Baranok. (r.40)

Baranok ji bo gelek kesan wek cihê veşartinê tê bi kar anîn. Cemşîd, biraziyê wî û çend leşkerên reviyayî ji bo xwe veşêrên ji dewletê diçin Baranokê. Baranok ji bo wan cihekî fireh û vekirî divê were qebûl kirin:

Cemşîd xan bi rêwîtiyeke dûr û dirêj, ku çend heftiyên dirêj kir û çend bajar dan ber xwe, gihişt ser sînor û nivroyekê bi şivanekî Îranî re û bi hêstireke zeîf xwe gihand Baranok. Gava Cemşîd xan veşeriya, ji xeynî min û çend leşkerên reviyayî kesî din li Baranok nedijiya. Gund di hesabên dewletê de weke cihekî vala hatibû hesibandin... (r.43)

Erselan ji ber zilma bavê xwe direve û li çiyayan xwe vedişîre. Çiya li vir wek parastgeh û cihê veşartin û rizgarî tê xuya kirin. Ji ber van sedeman jî cihê vekirî û fireh e:

Erselan kurekî nûciwan yê perişan bû ku xwendakarekî zîrek yê dibistanê bû, lê xirabiya bavê wî wiha kiribû ji bajar bireve û xwe di van çiyayan de asê bike. (r.45)

Cemşîd piştî ku hînî hewayê dibe êdî erd jê re teng tê ji ber vê biraziyê Cemşîdî û Erselan ji bo bêhna Cemşîd derbikeve wî di nav daristan û peravên çeman û hinek bexçeyên pagij de digerin. Piştê gerandinê bêhna Cemşîd derdikeve ji ber vê ew derên ku digerin cihên vekirî û fireh in:

Min dizanîbû ku pêwistiya apê min bi hewayê pak, tevger û dilrehetiyê heyerojek xweş bana û tirsê me nebaya min radihişt wî û ew didanî ber rojê, yan min û Erselan ew li xwe girêdida û me ew di nav daristan û peravên çeman û hinek bexçeyên paqij de digerrand, da ku laşê wî tiştêkî ji şiyayên xwe yê xwezayî werbigire. (r.46)

Lehengê me bi temaşekirina ezmanan xwe rehet hîs dike. Bêsinorbûn û boşahiya ezmanê ji re xweş tê. Ji ber vê jî ezman ji bo lehengê cihekî vekirî û fireh e:

Temaşekirina li ezmanan nişana dagerandina herdemî ya jiyana min bû ber bi boşahî û valahîyeke bêsinor, lê valahîyeke ku rastî min jê hez dikir û ti pirsgirêka min a mezin pê re nebû. (r.84)

Wek me li jor jî qal kir Baranok ji bo lehengên me cehekî taybet e. Ji bo ji dinyayê dûr bikevin û serê wan hinekî rehet bibe dixwazin herin wir. Û ji xwe re maleke çêbikin. Wek dîsa me li jor jî got Baranok her tim bo lehengên me cihekî vekirî û fireh e:

Em dikarin herin Baranok û li wir xaniyekî çêbikin û dûrî vê dinyayê, dûrî van hemû rojnameyên pûç û kelevajî û malparên pûç û hîç ên înternetê bijîn, weke berê pak û dilrehet... min got em dikarin Smayîl bi xwe re bibin û romanên xwe yê îngilîzî bîne û li wir ji me re bixwîne û em ji vê cihana pîs û kîrê dîr bikevin. (r.110)

Cihên vekirî û fireh di romanê de gelek caran derdikeve pêşiya me lewra di dema bûyerê de gelek tişt diqewimin. Ji wan tiştan yek jî şer e û dema şer de gundeke gelek derdikeve pêşiya me ji bo cihê ewlebûnê ew cih jî Baranok e. Lehengê me kengî bikevin tengasiyê diçin wir û xwe li wir vedişêrin.

6.1.1.2. Cihên Girtî û Teng

Cemşîd li zindanê îşkence dibîne û li wir azadiya xwe winda dike ji ber van sedeman zindan cihekî girtî û teng e:

Cemşîd bi berxwedaneke mezin û qehremaniyeye bêhempa li hember îşkenceya zindanan li ber xwe daye. (r.9)

Cemşîd di navbera girtigehên bi nav û deng û bi tirs yên Iraqî de tê gerandin. Li girtigehê ji ber ku mirov ne azad in, cihên wiha cihên teng û girtî ne:

Pêlekê, be'sî Cemşîd di navbera girtigehên bi nav û deng bi tirs yên Iraqê de dibin û tînin. (r.9)

Cemşîd li zindaneke taybet li Kerkûkê dimîne. Û li wir îşkenceyan dibîne:

Qasî kut ê zanîn firîna wî ya yeke li zindaneke taybet li Kerkûkê dest pê dike û dema wê jî şeveke sar a zivistanê dibe. Di wê şeve de nobedarek wî dide pêşîya xwe da wî bibe pêşberî pîrskarên bi xof ku çend meh in Cemşîd li jêr zext, şêdan û gefên wan yên berdewam, dijî. Lê ji bo ku ji zindana xwe bihihe odeya îşkenceyê divabû meydaneke mezin derbas bike(r.10)

Li gorî Simmel kesayetiyan bajarî, bimesafe û acizbûyî ne. Jê pê ve bajar azadiyê cuda jî dide. (Balık, 2016, s. 127) Leheng naxwaze li gund bijî lewra gund jê re girtî û teng tê:

Diyar e ti wateyek jê re nebû em hemû jiyana xwe li wî gundê dûr û çep biqedînin. (r.23)

Di romanê de çiya carinan cihê vekirî û fireh e carinan jî cihê girtî û teng e. Li jêr ji ber dijiwariya jiyana çiyayan, çiya wek cihên girtî û teng tê xuya kirin:

Çiku jiyana li van çiyayan fîran e û zivistanê dirêj jî li pêşberî me ye ku destpêka wê diyar e û dawîya wê ne diyar e. (r.46)

Ji tîrsa hewa û komandoyên Iraq û Îranê lehengê me nawêre pencereye xwe vebike. Û ji ber tîrsa xwe ji malê dernakeve. Êdî ew mal û ew diyar jê re girtî û teng tê:

Di rojên bê de nediwêriya ji pencereye jî li derve binere, guveguva bayê li hundir jî tirseke kûr dixist dilê wî. Sehmeke derûnî ya ne ji rêzê û efsaneyî jî tê de şîn bûbû ku dewleta Iraq û dewleta Îranê bi komandoyên taybet û hêzên mezin li dû wî digerin. (r.47)

Li derekê qedexekirin hebe li wir mirov ne bi tamamî ne azad in. Qedexekirin çiqas zêde bibe azadî jî ewqas kêmtir dibe. Li minaka jêr jî bi navê Îslamê gelek tişt tê qedexekirin û bi vî şiklî jî ew bajêr dibe bajarekî girtî û teng:

Carekê Cemşîd xan li jor lîsteyeke dirêj ji berîka xwe derxist û got ku Xwedê te'ala heram kiriye mêr van tiştan bikin: binkiraskên jinan, hebên qedexekirina avîsbûnê, kelûmelên ciwankirinê, kamerayên video, herwiha heram kiriye jin bê agahdariya mêr û mirovên xwe bazara rêwîtiyê bi qaçaxçyan re bikin, herin ba terziyên mêr... (r.74)

Du bajêr tên berawird kirin. Qehpikên bajarê lehengê qasî qehpikên Stenbol ne azad in. Stenbol ji bo qehpikan bajarekî vekirî û fireh e lê bajarê lehengê ji qehpikan bajarekî girtî û teng e:

Qehpikên belengaz ên bajarê min bi awayekî din û li jêr barê tirs û şert û mercên giran ên kar dijiyan ku ji jiyana van qehpikên azad û bêtirs û bextewar ên Stembolê, ku xweşî ji kare xwe didîtin, cuda bû... (r.83 -84)

Mirovekî were dîl kirin, azadbûna xwe winda dike li jêr leheng di odeya kevin ya dapîra xwe de tê dîl kirin:

Eê dema ku min di odeya kevin ya dapîra min de dîl kir, min nedizanî êdî heta çend mehên din çavê min bi Cemşîd xan nakeve. (r.112)

Cemşîd tê qefeskirin û zincîrkirin û re tişt wî birîndar dike. Cemşîd wek lawirekî tekane tê dîtin û mîna meymûnekî bi kêfîkirinê tê bi kar anîn. Di dema asayî de di zindaneke de tê girtin:

Qefeskirina wî ya neheq û zincîrkirina wî, ew birîndar kir. Ji şeva yeke ve hest kur ku Hîcrî Begê weke lawirekî tekane li dinêre û dûr û nêzîk wî ji cinse mirovan najimêre, ji şeva yekê ve wî hest kir Şîwar Begê ew daniye da weke meymûnekî yan babeteke matmayîkirin û kêfîkirinê bikar bîne. Apê min di vî warî de şaş neçûbû. Cemşîd êdî di dema asayî de di zindaneke rût de, bê ti şert û merceke baş a jiyane dihat dîlkirin... (r.116)

Cemşîd di qefeseke tê dijî azadbûna wî ji dest hatiye girtin:

Xanê apê min bi dirêjîya wê demê di qefesa xwe de azareke mezin dikişand û bi bêdengîyeke mezin piçûkxistin û laqirdiyên giran ên hemûyan li stûyê xwe digirtin. (r.118)

Piştrast bû li her cihekî din derkeve wê siyasetvan wî bigirin û bixin qefesekê û cilên bûkên lastikî lê bikin û wî bikin û bifiroşin. (r.122)

Roman ji aliyê naverokê ve gelek xurt te û gelek bûyer di romanê de cih digirin ji ber vê jî gelek cih tên bikaranîn. Cihên girtî û teng jî gelek caran tên dîtin ji ber ku di welatekî tevlihev de bûyer derbas dibin. Di romanê de şer tê dîtin, tixûb tên dîtin zindan tê dîtin. Di cihên wiha cihên girtî û teng zêdetir çêdibin. Carinan nivîskar li gorî derûnnasiya lehengan ve cihan saz dike. Di minaka dawî de jî leheng wek ajalek di diki qefesekê û qefes hem fizikî hem derûnnasî ve cihekî girtî teng e.

6.1.1.3. Cihên Çandî

Cemşîd û Safînaz dizewicin û dawetek tê dayîn. Bi mase û kursiyên cade û kolan tê xemilandin. Bi dawetê re cihekî çandî tê çêkirin:

Li ser heman ritim û awazê şêraniya Cemşîd û Safînaz efsaneyî bû. Hezaran kes hatin vexwendin, cade û kolan û ser banên malen derdorê jî bi sedan kursî û maseyan hatin xemilandin... (r.62)

Di romanê de cihên çandî ji bilî minaka jor nayê dîtin.

6.1.1.4. Cihên Olî

Di romanê de ji bilî mînakên biçûk cihên olî tenê bi nav wekî derbas dibin. Gelemperî nayên teswîr kirin. Tenê di rûpela 71 an de hin şayesandin derdikevin pêş:

Lê her carêkê biçûya mizgefta gund hebên xwe diavêtin avdestê. (r.17)

Li tenîştê mizgefta kevin ya Baranok dît. (r.44)

Di hundirê mehekê de me bi xwe û bermalên xwe ve çend mizgeft ceribandîn, heta di daî de em li mizgefta ‘Dû Gumez’ ku rojên înan refek derwêş diherikîn orta meydana wê ya mezin û dest bi zikir û hawarkirinê dikirin, hewirîn. (r.71)

Di romanê de dibe ku kêmasiya herî mezin kêmasiya şayesandina cihên olî be. Ji ber ku beşeke romanê bi temamî li ser mijareke olî ye û di mizgefteke de derbas dibe

lê şayesandina mizgeftê û agahiyên li ser mizgeftê qet nayê dayîn romannivîs dixwaze rastûrast bûyerê vebibêjê:

6.1.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Di destpêka romanê de Romannivîs dixwaze beriya bûyerê ji me re di derheqê atmosferê de agahiyan bide. Em ji agahiyan fehm dikin ku di sala 1979 an de li Iraqê rewşeke nebaş heye:

Di destpêka sala 1979an de, gava Cemşîd xan cara yekem hat girtin temenê wî hivdeh sal bûn. wê çaxê li seranserê Iraqê Be'siyan dest bi şopandin, girtin û îşkencekirina komunîstan kiribûn, ku heta berî hingî bi demeke kurt yek ji hevpeymanên sereke yê '2 Şoreş û serokê fermanîdar' bûn. (r.9)

Bi du rûpelan nivîskar bi bûyerê re diwaze derdorê û atmosferê jî nîşanê xwîneran bide:

Di demkê de ku ew bi endamekî ewlekariyê yê ereb re gav bi gav wê meydanê derbas dikin, zabîtekî pilebilind bi qapûtekî dirêj li odeyeke hinekî dûr ya li ser heman meydanê, hewcedarî wan kilîtên ku weke gilokekê di destê nobedarê Cemşîd de ne, dibe... (r.10-11)

Romannivîs rewşa Cemşîdê bi şerê mezin yê Iraq û Îranê re ji me re vedibêje em bi saya Romannivîs li ber bûyerê ve li ser atmosferê jî agahiyan digirin:

Her di wê demê de ku Cemşîd çû testê, şerê mezin yê Iraq û Îranê jî li çend bereyên cuda agir girt û pêket. Ger ne ji wî şerî ba, dibe ku Cemşîd ji ber lawazî û bêkêriyê li artêşê nehata wergirtin, lê şer ji heftiya yekê ve rûyekî wiha bi xof û tarî nîşan da, wiha kir ew doktorên ku di komîteya testê de dadwer in, bi qeflan kesên kêmendan, bê dest û ling, nîvkor û dîn tevî artêşê bikin. (r.25)

Lehengên me dema ku diçin ordîgehê Romannivîs bi şayesandineke piçûk derheqê odeyên wan agahiyan dide:

Gava em gihîştin wê ordîgehê, dotira rojê odeyeke taybet dan min û Smayîl jî, odeya me heta tu bêjî sade û seretayî bû, her yek ji min û Smayîl textek, dolabek û maseyeke me ya piçûk hebû. (r.27)

Bi hin şayesandinên piçûk em di derheqê cihê de agahiyan dibinin:

Şevêkê pir dereng em li maşîneke leşkeri ya weke qefesê siwar kirin û ber bi başûrê welêt birin... wê şeve em berê sibê ghiştin cihekî nenaskirî, ji dûr me denge topxaneyê Iraq û Îranê dibihîst ku bi dînîtî li hev didan, ji denge topan me zanî ku me ber bi bereyên şer dibin. (r.29)

Lehengên me dibin leşker û diçin şer û nivîskar jî atmosfera şerê ji me re nîşan dide:

Hemû erkên me di pêşiya pêşî yabereyan û di cihên şer yên agrînî de bûn, güle û top û roketavêjên giran li hemû bereyan zevî dax dikirin û agir berdidan ezmanan. Em di wê demê de dehên caran ketin nav topbaran û erîşa vî alî û wî alî de. (r.32)

Cemşîd ji ezmanê li bajarên wêrankirî dinêre. Dema ku dinêre dibîne ku hezaran laşên mirî li jêr in. Hovitiya Iraqîyan, kuştina dîlan, şewitina Xuremşehr û hwd. dikevin ber çavên wî:

Wî li ezmanan çend bajarên Îranî yên wêrankirî dîtîn, li jor dehan hezar laşen tev li hev yên artêşan ketin pêşberî wî, bi çavê xwe ew dirindi û hovîtîya ku iraqîyan nîşan dide, dît... li jor kuştina dîlan nerî, kûçe bi kûçe bi şewitina Xuremşehr re li wir bû, di ser zeviyên petrole yên şewitî yên Abadan re fîriya. (r.33)

Cih hêmaneke bingehin ya bûyerê ye, li ser çêkirina aksiyonê an li ser şikl girtina aksiyonê, li ser lehengan bandor çêdikin. Hin cih alikariya kesan dike hin cih astengî derdixin. Pirek ji bo ghiştina cihekî alikarî, çem jî astengî derdixin. (Yılmaz, 2007, s. 18) Di perçeyên jêr de atmosfera piştî şer ji aliyê nivîskar ve bi bûyerê re girêdayî tê vegotin:

Min Cemşîd dinuxmand û derdiketim nav zevî û baxên gundên nêzîk yên derdora ku hemû ji ber cengê vala bûbûn, li wir berbangana, berî ku hingûr ber bi ronahiyeke tevahî wergire, heta hêza min têr dikir min gwîz û tirî kom dikir û hêjîr û xox ji daran diçînin... (r.45)

Çend şevan em herdu ber bi nav gundên pelixî daketin û di nav kavil û xirabeyên wan de, me hinek lihêf û doşekên kevin lê kêrhatî kom kirin û me ew di çend şikeftên cuda de asê kirin. (r.46)

Du caran di nav dar û beştan de, min radyo dît lê patriyên wan nebûn. Di hinek şevan de, min tîn dida xwe û dida ser riyeke dûr, dibe ku li cihekî bigihim nav avahiyan, min dixwest têbigihim heta kû dera vê deverê hatiye valakirin û jiyana

adetî ji kû derê dest pê dike. Em li kaviên Baranok bi dora 0 km cihekî avedan ji me ne nêzîk bû, çekdarên dewletê li hemû cihî bûn... (r.47)

Di bihara dû re de ew herêma me bûbû herêmeke vala, ew çend leşkerên ku li ser hinek girên dûr jî çeper girêdabûn, li wir neman û dewletê ew kişandin jêr. (r.48)

Lehengê me li Baranokê xwe vedişêrin. Û haya wan ji tiştêkî tune ye. Bi saya du civanên ku xwe li Baranokê vedişêrin fêr dibin ku Sedam Husên careke din dest bi şer dike:

Di havîne de rojêke gerê, du ciwan ji yên ku di salên borî de û di dema revê de xwe li Baranok veşartibûn, dîsa derketin û xebera wê yeke ji me re anîn ku Sedam Husên careke din li başûr xwe li cengeke din alandiye. (r.50)

Romannivîs di romanê de gelek caran atmosferên piçûk diafirîne:

Piştî du mehan rojêkê dûrbîn di detê min de bû û li ser kevirekî, li ber bayê sar ê destpêka payizê rûniştibûm gava min ji dûr rêbiwarek dît (r.51)

Dîsa li Iraqê amadekariya şer tê kirin. Lewra qeweta dewletê Iraqê li ser navçeyên çiyayên bakur sisttir û lawaztir dibe. Û leşkerên reviyayî ji xwe re pênagehekê digerin:

Ew çend mehên dû re, her ku diçû dewleta Iraqê li başûrbehtir ji vegera cengê dialiya, lewra roj li pey rojê destê wê li ser navçeyên çiyayî yên bakur sisttir û lawaztir dibû. Hêdî hêdî li wan navçeyên me tek tek leşkerên reviyayî derketin ku careke din ji tirsê şer li penagehekê digeriyan... (r.52)

Romannivîs hewayê çiyayan bo atmosferê nîşan bide dibêje:

Çiyayên li ser sînor bi şev sar û badar in (r.81)

Di paragrafa jêr de navê çend welatan derbas dibin lê di derheqê wan de ti tişt nayê gotin:

Min baş didît ku em zêde ji wan kurdên din dûr nekevin ku bi hezaran ji bakurê Iraqê diherikîn Stembolê û bi piyan ber bi Yewnenistanê diçûn û dû re di çend kemyon û keştîyên şikeştî de derbasî Îtalyeyê dibûn... (r.82)

Cemşîd û biraziyê wî bi hev dû re diçin kolanekê ku bi "qehpikan" ve tijî ne. Biraziyê Cemşîdî qehpikên bajarê xwe û Stenbolê dide ber hev:

Şevê xortekî kurmanc ku navê wî Feysel bû, em birin kolanekê ku tije bû ji qehpikên tirk, hinek jinên di cil û bergên wiha de ku min û Cemşîd berê di xew de jî nedîtibûn, min li bajarê xwe û li wan cihên din ku li başûrê Iraqê li wan jiyabûm ew hemû qehpikên ciwan bi hev re nedîtibûn (r.83)

Di paragrafa jêr de jî bi şayesandineke piçûk mala Mensûre Hanim tê vegotin:

Şevê ji şevan, li maleke vexwarin û laşfiroşiyê ku me jê re digot mala Mensûre Hanim, cihek bû bi krîstalû perdeyên sor û dekore stîla osmanî haribû xemilandin, li piştê ji hemameke tirkî ya mezin hebû. (r.85)

Romannivîs bi wesifandineke piçûk apartman û navnîşana wê vedibêje:

Êdî me cihê niştecibûna xwe guherand û li apartmaneke nazik û pak û temîz ku diket navbera Teqşîm û Taşqîşle de qateke mezin girt. (r.88)

Dîsa wek me berê jî got nivîskar ji bo bûyerê navên hin welatan bi kar tîne lê zêde agahî li ser cihê nade:

Şeveke havînê tevî hemû neferên xwe ber bi sînora em ketin ser rê, me gelek şirît kiribûn û me şîretên tekûz li neferan kir. Em li ser sînorê Yewnenîstanê daketin û li çiya û darîstaneke mezin li xalekê ku ne pir dûr bû ji sînorê Bulgarîstanê, em daketin. (r.89)

Ba Cemşîdê bi xwe re digerin û Cemşîd her carê xwe li cihekî din dibîne. Wek Malta, Qibris, Grîtya û hwd. Lê li ser bajaran agahî nayê dayîn:

Her carekê jî gava dikeve xwarê xwe li ser erdeki û li cihekî din dibîne, carekê li Malta, carekê li Qibris, carekê li Grîtya, carekê li peravên Albaniya û carekê jî li ser sînorên Balkan... bi vî awayî li nav hemû neteweyan digere, çend caran biranînên xwe ji dest dide... (r.95)

Romannivîs ji bo rewşa lehengê vebêje atmosfereke piçûk saz dike:

Bi şev gava veşerîya ez li salonê di nav gîzegîza pêşiyên û xwêdana germ a havînê de li ser qenepeyê raketibûm (r.107)

Romannivîs dema bûyerê û dema Stalîn û Hîtler û hwd dide ber hev. Bi saya wî em di derheqê atmosfera wê demê da agahdar dibin:

Got berê tenê dîktatorên mezin weke Stalîn û Hitler û Musolînî dikarîbûn tişteki wiha bikin, yên ku artêş û dewlet û polîsên wan ên nehenî hebûn; vêga bes e ku malpereke te hebe da ku tu vî karî bikî, xeyal û mêjiyê hezaren kesan bi wî awayî bilivîne ku tu dixwazî, wan kesên ku tu ji wan hez dikî li ba li ba wan şerîn bikî... (r.111)

Bi şikleki binavgîn di derheqê rewşa welatên Asyayê agahiyan ji me re tê dayîn. Welatên Asyayê tev xemgîn in. Li hin cihan şer heye, li hin cihan jî sînorên hesînî:

Nameye min serwext dikir ku di dawî de piştî geşteke dirêj di tevahiya Asyayê de, piştî ku bê ew ji vî bajarî firandiye wî bajarî û ji vî welatî xemgîn biriye wî welatê xemgîn, ew di ser vî şerî û di ser wî sînorê hesînî re derbas kiriye, ji vê daristanê ew daye destê wê daristanê; di dawî de li erdeki hêwiriye ku erdê wî bi xwe rawestgeha dawî ya jiyana xwe lê dinêre. (r.125)

Leheng name digire û derdikeve derva û nivîskar jî şayesandina hewayê dike:

Ez name û wêneyan hildigirim û derdikevim derve... bayekî dîn dike guveguy, xwelî weke ku bixwaze me bi saxitî binax bike bi giranî dibare, hest dikim tekane tiştê ku min bi vê erdê ve girêdide ew ben bûn ku min ji bo Cemşîd xan digirtin. (r.126)

Leheng dikeve hundir ji bo hin tiştan binivîsîne. Di vê demê de li derva bayek mîna dirindeyekî birîndar dinale. Leheng bêyî ku guh bide gefên bayê dest bi nivîsînê dike. Romannivîs atmosfer û bûyerê bi hev dû re girê dide:

Bilez vedigerim hundir û li ser maseya xwe rûdinim û biryar didim binivîsim... li derve ba mîna dirindeyekî birîndar dinale, bêyî ku guh bidim gefên bayê dinivîsim. (r.136)

Di romanê de ji ber ku gelek bûyer hene romannivîs jî bûyeran bi atmosfera fizikî vedibêje. Di nav leheng û cih de têkilî nayê dayîn. Sedema vê jî romannivîs naxwaze herîkbariya bûyerê xira bike.

6.1.1.6. Cihên Ûtopîk

Mela dixwaze ji xelkê re bihûştê biwesîfîne lê Mela her tişt li gorî hestên xwe diafirîne. Ji dewsa bihûştê xeyalên tîne ziman û cihekî ûtopîk diafirîne:

Mela bihûşt weke bajarekî wêne dikir ku kolanên wî ciwan in, elektrîk tê de nayê vemirandin, av jê nayê qutkirin, tişt tê de erzan in, le her serê kolanekê dikaneke

baqleweyên belaş herdem vekirî ye, jin cilan li xwe nakin û bêyî ku hebên qedexekirina avisbûnê jî bixwin zarokan nayînin û siyaseta jî lê nîne. Yanî bajarek bû bi her tiştê xwe berevajî bajarê me (r.72)

Mela bihuşteka diafirîne û dixwaze gel pê bawer bike. Lê dema ku li ser ev afirandinê were sekinandin ew ê were dîtin ku ev temamî xeyalên Mela ne.

6.1.1.7. Cihên Fantastîk

Di romanên postmodern de bi gelemperî cihên razber hene. Ji cihên razber qesta me, cihên Ûtopîk, Derî Siruştî, Fantastîk û cihên Sehekî ne. (Kanoğlu, 2017, s. 10) Em dizanin ku di jiyana rasteqîn de mirov mîna Cemşîd dikare bifire ew tişt tenê di filmên fantastîk de derdikevin pêşya me. Cemşîd jî dixwaze bizewice û paşê sebiyên ku mîna wî difrin bi jina xwe re bîne dinyayê. Bi kurtasî armanca Cemşîd afirandina cihekî fantastîk e:

Mêrê dinyayê yê herî sivik hinekî vehese, malekê çêbike, dibe ku di sîberojê de zarokên min çêbibin ku mîna min ba wan bi xwe re bibe hemû aliyan. (r.57)

Cemşîd ji dewsa bûyerên rastî ji mirovan re behsa jiyaneke fantastîk dike. Qala dêwan, periyên, cinawiran dike. Ji xwe re cihên fantastîk diafirîne:

Xan di rêwitiya xwe de di şûna ku behsa geşta xwe ya rastî bike, behsa geşteke kiribû ku tê de ew serdarê keştiyeke mezin bû, dêwên mezin hatine pêşberî wî, periyên avê ew xapandine, ketiye giravekê ku hemû xanimên qeşeng bûne, li deverêkê bûye dîlê cinawirekî mezin ê bi çavekî. (r.102)

Roman bi temamî li ser bûyereke fantastîk hatiye afirandin. Ji ber ku di jiyana rasteqîn de mirovek bi vê şiklî nikare bifire. Di hemû beşên romanê de cihên fantastîk tê avakirin. Cemşîd Xan di minaka dawî de jî wek me nişan da ji mirovan re qala cihekî dike lê em dibinin ku di jiyana rasteqîn de ew cih tune ye ji ber ku di vê cihê de dew û perî tiştên fantastîk hene.

6.1.1.8. Cihên Derî Siruştî

Dojeh di hevoka jêr de tenê bi navê xwe derbas dibe û armanca Romannivîs şibandin e:

Cemşîd di wê qinyatê de bû Sedam Husên û sîberên wî di dogehê de jî bin wê vegerin da ku tola xwe ji me bistînin. (r.53)

Cihên Derî Siruştî cihên ne fizîkî ne. Di cihana rasteqîn de cih nagirin. Rasteqînbûna wan di cihaneke din de ne.(Kanoğlu, 2017, s. 10) Cemşîd bawer dike ku Xwedê ditiye û dixwaze dîsa bifire û here cem Xwedê. Em dizanin ku Xwedê tiştêkî metafizîk e:

Piştî meh û nîvekê êvarekê gazî min û Smayîl kir û got ku divê careke din bifire, çikû piştrast e careke din wê Xwedê bibîne. (r.69)

Mela Qasim şayesandina bihuşt û dogehê dike. Lê tiştên ku em dizanin ew tiştên ku dixwaze teswîr bike cihên metafizîk in:

Lê tiştê mela Qasim ê ecêb nerînên wî yên xeyalî bûn derbarê Xwedê, bihuşt û dogehê ku sergirtî û vekirî dxistin serê apê min Cemşîd. (r.72)

Cemşîd hin xeyalan dibîne yan tê mêjiyê xwe de saz dike û bi wan tiştan bawer dike. di çîrokên xwe de Cemşîd bi milyaketan re diaxife di korîdorên ronak de digere. Ew tiştên ku Cemşîd dibêje tev cihên metafizîk in:

Di çîrokên xwe de qaka wê yekêdikir çawa çûye ezmen û pile pile bi milyaketan re, di korîdorên ronak û nûsîngehên bêdawî û riyên dirêj de buhuriye, çawa milaket ew daye destê milyaket û çilo çend caran di riyên pir yên di nav 'erş de û di nav rêveberiyên aloz ên ezmanan de winda bûye. (r.72-73)

Li paragrafa jêr li ser H.z. Adem e. H.z. Adem li bihuştê aciz dibe û ji Xweda hin daxwazan dike. Çirokekî metafizîk tê vegotin:

Ew cenabê "Adem Efendî" li bihuştê hest bi bêzariyê kiriye û xwestiye koç bike lê koçî kû derê bike, mirov li bihuştê dikare tenê li çarmedora xwe bizivire, yanî ji destpika baxekî here dawîya wî û vegere. Cemşîd piştrast bû Adem ji Xwedê daxwaz kiriye ku cihekî din jê re çêbike, cihek ku koçî bike û rê bidiyê carna ji acizî û dubarebûna ebedî ya di nava bihuştê de, derkeve... (r.87-88)

Wek me li jor jî anî ziman di romanê de beşek bi temamî li ser olê bû lehengê me wek pêxemberek dihat dîtin û ji aliyê Melayekî ve tê xapandin û Mela cihên metafizîk li gorî xeyal û zanebûna xwe ji mirovan re vedibêje. Di minaka dawî de jî çirokek li ser Hz. Adem tê vegotin çîrok jî li bihuştê derbas dibe.

6.1.1.9. Cihên Sehekî

Cemşîd naxwaze were girtên. Di nav çem û darên çinaran de digere. Biraziyê Cemşîdî wî wek aşîqekî mezin yê gul, fekî û daran nas dike. Em ji vir fêhm dikin ku piştî girtigehê Cemşîd bêriya jiyana azad kiriye û ew cihên ku digere li ser wî hestên evînmî diafirine ji ber vê ew der ji Cemşîd re cihekî Sehekî ne:

Cemşîd nedihîşt em wî bi şîrîtê girêdin, dida pêşîya me û di nav zevî, çem û darên çinaran yên li derdorê de, dimeşîya. Wê demê min apê xwe weke aşîqekî mezin yê gul, fêkî û daran nas kir, zilamek digel ku nirxeke mezin nedida jiyana mirov, lê pir ji meş û ger a di nav deşt û der de, hez dikir. (r.18)

Şeveke reş û tarî bi gelemperî dibe ku li ser mirovan hestên ne baş saz bikin. Lê Cemşîd ji vê tarîtiya kûr xweşîyeke mezin dibîne:

Ew şev bi awayekî reş û tarî bû, em li ser wî girî û Cemşîd jî li jor tiştêkî wiha girîng ji me ne diyar bû, lê Cemşîd xweşîyeke mezin ji wê tarîtiya kûr didît. (r.20)

Bi qasê vegotinên Cemşîd nebe jî em fehm dikin ku aliyên tarî û bêrehm yên şer, bereyên tijî term û meydanên tijî mayîn û zeviyên tijî laşen parçebûyî û gundên pelîxî û bajarên şewitî jî li ser lehengê hestên kûr diafirine:

Di wan çend salan de me hebû aliyên tarî û Bêrehm yên şer ditîbûn, di nav bereyên tijî term û meydanên tijî mayîn û zeviyên tijî laşen parçebûyî û gundên pelîxî û bajarên şewitî de bihurîbûn, lê vegotinên Cemşîd ewqasî bi bandor bûn min digiriyandin. (r.35)

Hin tirsên Cemşîd dikevin xewa wî û li ser wî gelek bandor çêdikin. Ew tişt li ser cihê jî bandor çedik. Cemşîd ji lihêf û doşeka xwe ditirse û biraziyê wî heta li nav lihêf û doşeka wî negere nikara li wir razê:

Hinek şevan wî min ji xew radikir û dengen nediyar ku nebûn dibihîst, pilingên xeyalî didîtin ku erîşî me dikin, marên dirêj ku tenê di xeyala wî de biban ve diçûn û dihatin, her şev jî di wê zivistanê de berîku raze divabû ez li nav lihêf û doşeka wî bigerim heta dilê wî bikeve cî ku dûpişk tê de nînin. (r.48)

Cemşîd piştî gelek bûyeran vedigere mala xwe û ode xwe qedexe dike ku ji bilî wî ti kes nekeve hundir. Guherînen ku bi hestên û fikrên Cemşîd çêdibe, xwe bi

guhertina odeya Cemşîd nîşan dide. Cemşîd li gorî hestên xwe odeyekî ji xwe re saz dike:

Her ji roja yekê ve jî vegeriya odeya xwe li qata jor a mala bapîrê min ku zêdeyî diwazde salan bû li pey xwe hiştibû. Êdî weke salên berê li me heram kir ji deriye wê odeyê nêzik bibin, wê cara tenê ku min bi dizî û di dema razana wî de çavê xwe li odeya wî gerand, reng û dekora wê eynî mîna berê bûn, ji xeynî wêneyên Marx û Engels ku êdî ne bi dîwaran ve bûn, tiştên din hemû weke xwe bûn. guherîneke ecêb ku li bajêr di apê min Cemşîd de çêbû ew meyl û dilxwaziya wî ya ecêb bû ku tev li jinan bibe... (r.54)

Guherîna hewayê li ser Cemşîd bandorê çêdike. Cemşîd bi dîtina bayê ku daran li hev dide û cilan li ser telan difirîne û hwd. kêfxweş dibe:

Piştî du rojan di dema nîvro de bayekî xurt hat. Cemşîd xan her ku ba dît û dît çawa daran li hev dide, cilan li ser telan difirîne, çapûnan hildide û camxaneyan tîne xwar; pir kêfxweş bû û tevgera wî bi me re hat guhertin. (r.59)

Cemşîd sedema xwesteka koçkirinê ji biraziyê xwe re wiha dibêje. “ mirov gava li jor li vî welatî dinêra, bêhemdê xwe çend wêneyan di rûhê xwe de gencine dike...” ji vê hevokê tê fehm kirin ku ev der bi Cemşîd re hestan diafirîne:

Cemşîd ji saeta ku hatibû ser hişê xwe xeyaleke tenê hemû jiyana wî dagir kiribû, ku em herin u ji vî welatî dûr bikevin. Carekê wî bi xwe ji min re got, “ mirov gava li jor li vî welatî dinêra, bêhemdê xwe çend wêneyan di rûhê xwe de gencine dike, ku di dem û saeta xwe de wateyeke wan ya berçav nîne... (r.79)

Sînor cihên girtî û teng in. Bi ber wê jî gelek hestan jî li er mirovan çêdikin. Di hevoka jêr de hemû nefer ji tirsan dilerizin, heta lehengê me bi xwe jî:

Li ser sînor hemû nefer ji tirsan dilerizîn û ez jî dilerizîm. (r.89)

Şeydabûna Cemşîd ya mezin bi deryayê re ye. Cemşîd kengî nêzikî behrê bibe ji biraziyê xwe dixwaze wî bilindtir bike ku li jor li avê binêre û sira paqij ya behrê hilmije:

Hinek caran gava mest dibû zêdegavî di nîrxê kare xwe de dikir û xwe wekê pexemberekî didît ku neteweyeke nû ji erdeki vediguhêze erdeki din û ji zemanekî vediguhêze zemanekî din. Her carekê digot, “ penaber neteweyeke nû ne li ser rûyê

erdê.” Tiştê ku bala min dikişand ew şeydabûna wî ya mezin bi deryayê bû, gelek caran gava em ji deryayê nêzik dibûn sê moriyên çarçik dişandin jêr ku dihat wateya ez wî bilindtir bikim û jê bigerim li jor li avê binêre û sira paqij ya behrê hilmije... (r.91)

Lehengê me bi guherandina hewayê diçe Baranok li vir bi hefteyan dimîne û şevan di nav daran de û li nav çiyayan de digere. Bi alikariya gerên şevê gelek xeyalên reş ji serê xwe derdixe:

Gelek caran ji bi meş û guherandina hewayê diçûme bilindahiyên Baranok, li wir bi heftiyan di nav sirûştê de dimam, çend şevan di nav daran de û li nav çiyayan digeriyam, van gerên şevê alikariya min kirin gelek xeyalên reş ji serê xwe derxim. Gelek şevan diçûme cihên herî bilind yên Baranok û min dixwest bifirim. (r.100)

Gaston Bachelard dibêje ku: Mal tunebûna mirov ew ê belavela bûbûna (Bachelard, 2008, s. 35) Nivîskar li vir dixwaze bibêje ku mal, mirovan û xeyalên wan, hevqirtina zihnî wan çêdike û diparêze. Maleke ji bo nola bîranîneke kevin a bav û kalan ji bo nifşên nû bê hilgirtin, nayê firotan. Em ji wê biryarê fehm dikin ku ew mal ji bo wan cihekî Sehekî ye:

Ez bi tenê di malê de mam ku hemû li ser wê yekê hevdeng bûn ku qet neyê firotin û nola bîranîneke kevin a bav û kalan ji bo nifşên nû bê hilgirtin. Min sûdeke mezin ji wê biryarê dît û bi tenê di wî xaniyê mezin de mam ku piştî mirina bapîran an bêdengiyêke kujer an dengê bê di nava wî de ew dixeniqand. (r.101)

Lehengê me kengî rojname yan kovarekê dixwîne bilez direve li asîmanê dinêre ku xwe ji bandora peyvên pûç û kelevajî derxîne ku bêhna wî teng û zikêşî dikin. Li vir asîman hem cihekî vekirî û fireh e hem jî ji ber ku li ser hestên lehengê bandorê çêdike cihekî sehekî ye:

Her ku min xwendina rojname yan kovarekê xilas dikir divabû bilez birevim û serê xwe hildim û li kûrahiya bêsînor a ezmen binêrim, da bikarim xwe ji bin bandora wan hemû peyvên pûç û kelevajî derxînim ku bêhna min teng dikirin û zikêşî dikirim. (r.107)

Mal xiyalan di hundirê xwe de dihewîne, kesên ku xiyalan dikin ji aliyê mal ve tîr parastin. Ê mal alikariya me dike ku em bi aramî xiyalan bibînin. (Bachelard, 2008, s. 34) Em ji paragrafa jêr fehm dikin ku leheng li gorî guherînên hestên xwe

hundirê mala xwe diguherîne. Hestên leheng li ser cihê bandorê çêdike û cih li gorî hestên wî saz dibe:

Rojekê min du karker anîn û çî rojname û kovarên ku di malê de kom bûbûn xistin piştî pîkabekê û li derveyî bajêr min hemû şewitandin. Dû re min mal ji serî heta binî bi dekoreke nû rêkxist, min dîwar boyax kirin, min mobîleke giran a zêde kirî. Çûm ba wênegirekî û min çend wêneyên xortaniyê yên xwe û Smayîl mezin kirin û li tevahiya malê hilawîstin. (r.114)

Cemşîd biryar dide ku here û venegere. Her kes ji bo wî diçin kumbeta herî bilind a nêzîkî bajêr. Beriya firîna Cemşîd hevdû hembêz dikin. Cemşîd li ser wê kumbetê li dinyayê dinêre û keserek vedide. Ew der êdî hem ji bo Cemşîd hem jî jo bo kesên ku tên oxira Cemşîd cihekî taybet û sehekî dibe:

Wê şevê ku biryar da here û venegere, em tevî hezaren metroyan ji benan çûn ser kumbeta herî bilind a nêzîkî bajêr, li wir berî ku bifire me hevdû hembêz kir. Cemşîd xan li ser wê kumbetê li dinyayê nerî û keserek veda...(r.124)

Cihên sehekî di romanê pir tên bikaranîn ji ber ku di gelek cihên cuda de bûyer derbas dibin û hin cih li ser lehengan bandor çêdikin. Carinan cih li ser lehengan hestên nebaş diafirin ji ber rewşa demê, carinan jî hin cih ji ber xweşikbûn, wateya xwe û ewlehîbûna xwe li ser lehengan hestên xweş çêdikin.

6.1.2. Encama Tehlîla Romanê

Di romanê ji hemû beşên cih mînak derdikevin pêşîya me. Di romanê de ji cihên ûtopîk, çandî û fantastik tenê çend minak derdikevin pêşîya me. Cihên olî jî tenê di rûpela 71 an de tê şayesandin. Ji bilî rûpela 71an cihên olî tenê bi navên xwe di romanê de cih digirin, li ser wan tê şayesandin nayên kirin. Beşeke romanê gelemperî li cihekî olî derbas dibe lê belkî kêmasiya Romannivîsê ew be ku di vê beşê de jî bi şayesandineke baş dernakeve li hemberê me.

Alîkarî girtina ji cihê li gorî hin berhemên tên guhertin. Hin ji wan mîna wêneyê digirin têdixin berhemê, hin ji wan jî li gorî xeyalên xwe û li gorî berhemê saz dikin. (Yılmaz, 2007, s. 19) Roman bi gelemperî ji aliyê cihê ve gelek serkeftî ye. Têkiliya leheng û cih xweş hatiye honandin. Roman, romaneke bûyerê ye lê ew jî bo bikaranîna cihê ji nivîskarê re astengî dernaxe. Romannivîs di romaneke bûyerê de giringî dide cihê jî û ji aliyê atmosferê ve jî û ji aliyê sehekî ve jî romaneke xurt

nivîsandiye. Bi kurtasî em dikarin bêjin ku ji aliyê cihê ve romaneke serkeftî ye. Têkiliya leheng û cih di gelek cihan de derdikeve pêşiya me û cih li gorî demê ve erka xwe diguherîne. Romannivîs bi zanebûn vê guhertinê bi kar tîne.

Di nav romanên de zêdetirîn cihên derî sirûştî di vê romanê de tê bikaranîn bi şayesandineke xurt derdikeve pêşiya me. Di romanên din de cihên derî sirûştî gelemperî ji bo şibandinê hatine bikaranîn lê di vê romanê de bi wateya xwe yekem hatiye şayesandin. Roman bi temamî li ser bûyereke fantastik hatiye ava kirinê ji ber vê jî cihên fantastik bi taybet ji bilî mînakek nayê dîtin.

6.2. Hotel Europe ¹⁰

Roman li ser pênerên Ewropayê hatiye nivîsandin. Lehengên romanê ji ber hin sedeman koçê Ewropayê dikin. Lehengê romanê Ferhad, ji ber rewşên nebaş yê welatê xwe koçê Ewropa dike. Li Ewropayê di hoteleke de dixebite. Navê otêl, Hotel Europe ye. Xwediyê otêl cihûyekî ye û navê wî Monsieur Luciana ye. Monseieur Luciana pir dixwaze biçe Îranê lê ji ber ku li Îsraîlê hin malên wî hene û çend caran jî çûye Îsraîlê dewleta Îranê wî qebûl nake. Pir baş Farîsî dizane û gelek agahiyên wî jî li ser Îranê heye. Sedema xwesteka çûyina Îranê jî ew e ku li Îranê keçekê heye û Luciana gelek jê hez dike. Luciana jî dixwaze rêyek peyda bike ku xwe bigihîne keçikê.

Hevalekî Ferhad heye bi navê Mihemmed Hacîzade. Mihemmed Hacîzade berê li Îranê meletî kiriye. Lê ji ber hin tiştan meletîya wî ji destê wî hilanîne. Ew jî neçar maye bireve Ewropa. Mihemmed Hacîzade li Ewropayê gelek tahdeyiyên biyanîbûnê dikşîne. Mafê pêneriyê nikare ji dewletê bigire. Rojek rastê zilamekî pîr û dewlemend tê. Piştî demeke neçar dimîne ku pê re bikeve tîkiliyê cinsî. Mêrik jî bo vê tiştê gelek pere dide Mihemmed Hacîzade.

10

Ferhad PÎRPAL

Di sala 1961an de li Hewlêrê ji dayik bû. Di sala 1979 an de, yekemin berhema wî ya belavkirî çirokek bû, bi piştgiriya M. Zamdar di kovara Rojî Kurdistan de(Bexda) hat weşandin. Di sala 1984 an de, yekemin kitêba wî bi navê şanoya Malava ey welatê min li çapxaneyê şehîd Îbrahîm ' Ezo ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê li Çiyim hat çapkirin. Di sala 1984an de, ji Iraqê koç kir û li Îranê bû penaber. Piştê wê bi salekê ber bi Polonya û Almaniyayê û pişt re jî li Denmark mafê penaberîya siyasî wergirt. Di sala 1987 an de li zanîngeha Sorbonne dest bi xwendinê kir. di 1994an de vegeriya Kurdistanê. (Pîrpal,2019: 6)

Di navbera Hazîcade û Luciana de tişteke pir ecêb heye. Hacîzade û Luciano gelek dişîbin hevdu. Ferhad wan bi hevdu dide nasandin û demeke Hacîzade li ba Luciano dixebite. Luciano ji Hacîzade dixwaze ku pasaportên xwe biguherînin ku Luciano karibe biçe Îranê. Pasaportên xwe diguherînin û Luciano diçe Îranê lê Hacîzade wî gilî dike û Luciano ji aliyê Polîsên Îranê ve tê girtin. Hacîzade jî xwe dixwe şiklî Luciano û mîna wî tevdigere û perên wî hemû digire. Ferhad fehm dike ku Hacîzade Luciano xapandiye lê nikare îspat bike. Paşê ew jî ji wir diçe.

6.2.1. Cih di Hotel Europe de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Gîtîgeha Lehengî, Ewropa, Kurdîstana Iraqê, Bakurê Iraqê
Cihên Girtî û Teng	+	Îran, Iraq, Filîstîn, Benqladeş, Lubnan, Tehran, Tîrkiye, Kamp, Girtîgeh, Welatên Lehengan, Welatên Misilmanan, Îtalya, Parîs, Saint Malo, Mehabad,
Cihên Çandî	+	Çandên Emerîkî, Çandên Kurdîstanê
Cihên Olî	+	Mizgeft
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Parîs, Îran, Odeya Lehengê, Stasyona Veniseyê, Venise, Iraq, Kolanên Parîsê, Dênmark û Portekîz, Sedsala 16an, Esfehan, Tel Avîv, Di sala 1991ê de Kurdîstan, Odeya Lehengî, Meyxaneyên Îspanî, Îrlandî, Karwenseray, San Francisco, Hotêlekê Parîsê, Mala Lehengî
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	+	Xeyalên Hunermendan
Cihên Fantastîk	-	
Cihên Derî Sirûştî	+	Bihuşt, Dojeh
Cihên Sehekî	+	Montmartre, Tixûba Tîrkiye û Îranê, Medbexa hotelê, Bi baranê re kolan, Esfehan, Rojhilat, Meydana puta Son Yat-Sin, Saint Malo, Parîs, Meyxane, Cîhan, Hundirê apartmana Saqî Gulçînê

6.2.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Zindan em ji agahiyên jor dizanin ku cihekî teng û girtî ne. Lê di mînaka jêr de berawirdkirina zindanan tê kirin. Leheng zindana xwe ji zindanên din xweştir dibîne. Zindana lehengê jê re li gorî zindanên din vekirî û firehtir e:

Her çawa be jî, zindana min û Humeylaya 'hevvjina' min hinekî ji zindana mezin ya penaberên ditir xweştir bû. Hemû kampa me jî bi awayekî giştî, hinekî ji zindana rastî xweştir bû. (r.23)

Ewropa dixwaze gelên xwe azadtir bike ji ber vê jî dixwaze sînor û paseportan ji holê rake. Cihekî vekirîtir û firehtir saz bike:

Va ye mijûl in bi wê yeke difikirin ku bi riya Yekîtiya Ewropayê mirovê ewropî bi tevahî ji destê paseport û sînoran azad bikin. Ev kare herî girîng e ku Ewropa ji dîroka mirovatiya xwe re dike. (r.32)

Di hevoka jêr de dibêje ku Ewropiyên bi xwe Ewropaya xwe çêkirine, dibê hûn jî Ewropayekê ji xwe re çêbikin. Ew gotin ji pênbarekî re tê gotin. Ewropa cihekî vekirî û fireh e lê welatê penaberê cihekî girtî û teng e:

Ev tê wê wateyê ku ewropiyên bi xwe Ewropaya xwe çêkirine, divê hûn bi xwe jî Ewropayekê ji xwe re li ser xaka xwe çêbikin! (r.82)

Mirov dema ku dest bi karekî nû bike dibe û ev kar jiyana wî biguherîne û bi vê guherîna dibe ku li ser cihana wî jî bandor çêbibe û jê re cihekî vekirî û fireh saz bike:

Wextê karekî cuda dibîni û piyên xwe davêji cîhanê nû, baweriya min wiha bû; jiyana te ji wateya xwe nû dike û dibe ku te ber bi riyeke xweştir û şadtir bibe. (r.149)

Leheng dixwaze bakeve welatê xwe li welatê wî welatekî teng û girtî ye. Ji ber vê jî heta wê rojê neçûye. Lê 1991 bi şûnde hikûmeteke nîv otonomi li Kurdistana Iraqê tê damezrandin. Ev der li gorî Iraqê vekirî û firehtir e:

Cara yekê bû bêriya wan bikim û kelkela wê yeke bikeve serê min herim serîkî li mirovên xwe li Hewlerê bidim, hîç nebe qena bikarim diya xwe bibinim. Nemaze jî çimkî çend sal bûn, ji serhildana 1991 bi şûn de, hikûmeteke nîv otonomi li Kurdistana Iraqê damezrabû û ji her desthilat, zordarî û hêzeke Sedam dûr bû. (r.167)

Bakurê Iraqê bi xilasbûna destê Sedam cihekî fireh û vekirî dibe:

Min got: Na. Bakurê Iraqê azad e. Êdî destê Sedam nagihiyê. (r.193)

Cihên girtî û teng li gorî rewşê û demê dikare bibe cihên vekirî û fireh. Bakurê Iraqê jî di dema Sedam de cihekî girtî û teng e lê piştî Sedam atmosfereke cuda çêdibe û Bakurê Iraqê ji bo gelê wê derê dibe cihekî vekirî û fireh:

6.2.1.2. Cihên Girtî û Teng

Gelek kes ji destê dîktatorî û şerê Iraq û Îranê direvin. Dixwazin koçê Ewropayê bikin. Ji ber ku li Îran û Iraqê jiyaneke ne xweş heye û ev her du cih cihên girtî û teng in:

Melayekî Îranî, mirovekî ji destê şeran reviyayî weke hevalên min yê wênêkêş yê din, weke me hemûyan, weke sedên kesên din yê ji destê dîktatorî û şerê Iraq û Îranê reviyayî (r.16)

Li Îranê gelek di zindanan de gelek mele hene. Ji jêr fehm dikin ku Îran ji bo meleyan cihekî teng û girtî ye:

Ne tenê ez, lê hezaren meleyên din li Îranê, ku pileya hemûyan ya bilin dli ‘ Hewzeya Îlmî’’ hebû, hatine xel’îlîbaskirin. Zindan heya îro jî bi mele û oldaran tije ne... bi taybetî jî ji roja hepskirina ayetûlla Muntezerî û vir ve.(r.17)

Li jêr navên gelek welatan tê gotin lê di nav wan de tenê welatek vekirî û fireh e. Ji ber ku ji welatên din gelek mirov ji bo jiyaneke xwe koçê wê derê dikin. Fransa cihekî vekirî û fireh e li gorî welatên din:

Lê ev halê piraniya wan xelkên din jî bû ku ji Filistîn, Efxanistan, Iraq, Benqladeş û Libnanê hatibûn Fransayê û daxwaza mafê penaberiyê kiribûn. (r.19)

Tehran welatekî mezin e li gorî lehengê lê nikare bi dewamî xwe li wir veşîre. Lewra ew mezinbûna Tehranê têra lehengê nake û leheng dizane rojeke ew ê were qefaltin û di dawî de ew ê bikeve zindanê. Hem Tehran hem jî zindan cihên girtî teng in:

Tehran rast e bajarekî mezin e û min dikarî xwe tê de veşêrim, lê nedibû heta hetayê di bin çavnêriyê de bimînim. Bi ser de jî, qe ne dûr bû çarenivîsa min jî mîna çarenivîsa Muntezerî biketa nava zindanê. Ditirsyam min bigirin.(r.20)

Îran ji ber ku cihekî girtî û teng e, hem komunîst hem jî mele dixwazin ji wir birevin:

Min û wê keça azaerî jî, digel ku ez mele bûm û ew komunîst lê me herduyan dixwest bi çî awayî be jî wê dojecha Îranê rizgar bibin. (r.21)

Cihê ku leheng dimîne ji avahî û mirovan dûr e. Haya wan ji derve tune ye û her tim dengê teq û teqîna çekdarên PKKê dibihîsin. Leheng xwe ne azad hîs dîke û jiyanekê bi tirs dijî:

Dûr ji avahî û mirovan, te digot qey em li bine dinyayê ne Tu caran hîç rojekê, li derveyî wê kampa dîwarstûr guhê me li tu hest û nesteke derve nedibû, ji dengê teq û teqîna çekdarên PKKê zêdetir ku her derengî şevêkê ji dûr ezman diqelişandin. (r.22)

Her du welatên teng tîn berawirdkirin. Tirkiye ji Îranê faşîstir tê ditîn. Em ji biryarê fehm dikin ku jiyana Tirkiye ji ya Îranê ne xweştir û diwartir e yanî Tirkiye ji Îranê girtîtir û tengtir e:

Tirkiye ji Îranê zehf faşîsttir e. (r.22)

Di kampê de leheng xwe mîna kuçikan dibîne. Kamp kampeke mezin e lê sedan kes li dijî û ji bo xwarineke nexweş dikevin dorê. Leheng kampa xwe dişibîne hepîsxaneyekê îşkencekirinê ya sedsala navîn:

Di nav wê kampa Şemzînan de halê me halê kûçikan bû. Her nivro û êvarekê, sedên penaberên li wê kampa mezin, em hemû bi carekê, di dema tenê niv saetê de, bilez û bez, diçûn me xwe rêz dikir bo wergirtina lalîleke şorbê ya tije pêşî û lewitî... bi parçe goştêkî re ku parçeyekî nane hişk li ser hatibû danîn. (r.23)

Ew kampa me ya pîs, ku li hepîsxaneyekê îşkencekirinê ya sedsalên navîn diçû, bi tevahî ketibû tenişt avahiya 'Rêxistina Mafên Mirovan' li bajarê Şemzînan, ji dûr ve, me aleke piçûk ya wê rêxistinê, ku li ser banê avahiyê li ba dibû; didît. (r.23)

Zindan cihên teng û girtî ne:

Got " Ez di nava vê zindanê de mirim, nikarim êdî çaverê bikim. " (r.24)

Di welatê leheng de ewqas tundî û dijwarî û zordestî heye ku heta ji bajarekî diçin bajarekî din çend caran tîn sekinandin û daxwaza nasnameyê ji wan tîn kirin:

Li ba me jî... ne ku ji welatekî ber bi welatekî cînar, lê belê ji bajarekî di nava heman welatê xwe de heya digihijî bajarekî din çend caran daxwaza nasnameyê ji te dikin (r.32)

Heke t kiliy n b yer   cih were d tin, di derheq  p vajoya b yer  de j  em   agahdar bibin. Niv skar ba b n   neba b n, k fxwe     xemginiya b yer  bi  ayesandina cih , ji xw neran re dide h s kirin. (Karaca, 2016, s. 73) Leheng hem ji welat  xwe t  qewitandin hem j  welat n rojava j  re deriy n xwe venakin. Ji ber v  j  di c haneke girt    teng de dij :

Ji ber ku hem welat  me, me diqewit ne   azadiya ji me dist ne, hem ji welat n rojava deriy n xwe di r y n me de digirin. Sergerdan   derxistiy n herdem , tu caran em nabin xwediy  nasnameya xwe ya taybet. Tu nasnameyeke me n ne. (r.33)

Serok n  slam    r ber n Misilmanan welat n wan dikin m na zindanan. Ji ber ku li xaka misilmanan mirov nikare bi dilrehet    aram  bij  em dikarin wan wek cih n girt    teng bihesib nin:

Hehe serok n  slam    r ber n misilmanan welat n me nekira ev zindana mezin ya  ro; em   ji ber  i li welat n gawiran li Ewropay  bib na penaber? (r.33)

Ji ber ku li ser xaka misilmanan bostek j  ku mirov bikare t  de dilrehet   aram bij , nema ye. (r.34)

Me desthilatdar n  slam  welat  xwe li xwe kiriye dojev. (r.35)

L  bel  jiyane   dewlet n misilman li rojhilat piraniya xelk n me... va ye... kirine diz   m rkuj   he   vexwer   av tine ser kolan n penaberiye y n Ewropa (r.41)

 talya welatek  mezin e. Leheng bi sedama vekir    firehb na w  di e wir. L  ji ber b yerek  dikeve tengasiye   ti kes alikariya w  nake. Ji ber v  j   talya j  re welatek  teng   girt  t :

L  bel   hameta v   talyaya mezin n ne li hember v  helwesta xwe ya kir t, ten   end l reyan heya sibe bi deyn bide min! (r.47)

Li  ran  her ti t t  qedexekirin. Ziman    anda Kurd , m zik   stran   hwd. t n qedexekirin.   gelek kes j  ji aliy  dewlet  ve t n ku tin. Heke li welatek  ewqas ti t n ne xwe  p k b n ew der cihek  girt    teng e:

Serp hatiy n wan hem  mele, p  merge   ronakb r n dilsoz y n Kurdistana  ran  ku Ayetullah Xelxal  di destp ka  ore a  ran  de ew tarumar kirin   dan ku tin bi mebesta bi tevah  tunekirina xebata netewey  ya gel  kurd li  ran ; qedexekirina

ziman û çanda kurdî li seranserê Îranê; hîcabkirina bi kotekî ya jinan; qedexekirina stran û mûzikê... (r.57)

Pênabera di navbera xwe de li ser tengbûn û girtîbûna welatên xwe diaxivin:

Bala min kişandiye, di nav me Îranî û Iraqîyan de, bi ser de jî di nav hemû penaberên ku ji rojhilat hatine, hertim axaftin li ser wê yeke ye ku di hundirê welatên me de kê qurbaniyên zêdetir dane?... (r.62)

Leheng tengbûn û girtîbûna welatê xwe girê dide tevgerên Ewropîyan. Li gorî lehengê Ewropa petrol, qezenc û serwatên wan ji destên wan digire û ji dewsa wan tank, top, napalm û her wekî din ji wan re difiroşe ku hevdû bikujin:

Axayê Ferhad... evên han ‘ destê xwe ber bi derve dirêj kir; mebesta wî ewropî bûn’ her çi petrol, qezenc û serwatên me yên xwezayî hene didizin û dixin depoyên xwe de ji demen xwe yên teng re. Ji aliyê din ve jî her çi tank, top, napalm, firokeyên şer û çekên wan yên giran hene difiroşin me da ku em li Rojhilat hev bi wan bikujin... (r.64)

Îran ewqas welatekî tund e ku kesekî biçê Îsrailê nikare here Îranê:

Cih û be û dehên caran serdana Îsrailê jî kiribe’’ riskê bike û here xwe bispêre nava zindanên Komara Îslamî ya Îranê! (r.94)

Heta wê demê Parîsê wek cihekî vekirî û fireh derdiket pêşiya me lê nivîskar li vir ji me re dibêje ku pênaber ji ber tunebûna pereyan birçî dimînin û di nava metroyan de dimirin. Em ji vir fehm dikin ku Parîs jî ji bo pênaberên bê pere re cihekî girtî û teng e:

Birçîtî û nebûna pereyan li vê Parîsa bêwijdan, ku bi sedan mihacir û bêkar di nava metroyên xwe de ji serma û birçîtîyê kuştibûn, her sebr û hêzeke liberxwedanê ji Mihemedê Hacîzade sitandibû. (r.108)

Leheng ji ber bêperebûnê li Parîsê gelek tengasî dikşîne û welatê xwe ji ber vê rewşê ji Parîsê baştir dibîne:

Weke segan di nav wan xwaringehên pîs yên ku li wan kar dikim, mirim hingî bermayên midbexan dialîsim. Li welatê xwe hîç nînbûna maleke min hebû, halekî min hebû, nav û dengêkî min hebû... li vir jixwe nasnameyeke min jî nîne. Li vir ez kî me? Çi me?! (r.118)

Leheng bi salan bi eynî tişt re mijûl dibe û ew tişt wî aciz dike. Cihê ku li dijî jê re teng û girtî tê:

Çend salan, her roj heman hotêl, heman kar, dubare heman metro; heman bêhn, heman kes... min dixwest ji destê vê rûtînê rizgar bibim. (r.149)

Rewşa aboriya lehengê li Saint Malo xweş e. Lê leheng xwe li wir tenê û xerîb hîs dike. Em ji vê mijarê fehm dikin ku heke mirov xwe li cihekî xerîb û tenê hîs bike, çiqas dewlemend be jî ew der jê re teng û girtî tê:

Bi wî awayî, jiyana min li Saint Malo bi resimandin, qezenc û karkirinê tije bû. Lê dîsa jî, nizanim ji ber çi min hest bi tenahiyeke kujer dikir û hesteke xerîbiyê, seranserî rihê min parçe parçe kiribû. (r.169)

Mirov heke bê nasname be û buha û wateya wî/wê tunebe, li Ewropa jî bijî ew der jê re girtî û teng tê:

Li derveyî welat, bi taybetî li Ewropayê, tu nasnameyeke mirov tune û qet jî nabe. Tenê li welatê xwe û di nav qewmê xwe de, buha û wateyeke mirov heye. (r.189)

Leheng xwe di hundirê qefesê de hîs dike. Qefes zêrîn be jî teng û girtî ye:

Tenê çend meh in, em derbasî nav qefesa zêrîn bûne. (r.196)

Mehabad ji lehengê re dibe xelesa werîsekî ku roj bi roj teng dibe. Ti nasê lehengê li wê derê namîne. Her der jê re biyanî tê. Mehabad jê re dibe bajarekî girtî û teng:

Mehabad êdî ji wî re bûbû xelesa werîsekî ku roj bi roj teng dibû, kesek ji hevalên wî yê kevî nema xuyabû, berê xwe dida kû jê re biyanî xuya dikir weke ku nû diçû wan deveran, dem jî diherîkî weke dawa bûkeke li ber bayekî êvareke dîn, êdî nedihat bîra wî kengî hatiye bajer û çima?(r.237)

Di romanê de gelek cihên girtî û teng tên dîtin. Di jiyana de 2 cîhan tên dîtin li gorî romanê di cîhana yekem de ku ew der rojhilata navîn e û tim şer û zext û zilm hene. Lê di cîhana din de ku ew der jî wek Ewropa dertê pêşiya me li wir jî aramî û azadî hene. Lewra lehengên me ji ber vê jî cihên girtî û teng direvin û xwe dispêrin Ewropayê. Li Ewropayê xwe ewletir hîs dikin.

6.2.1.3. Cihên Çandî

Di romanê de cihên Çandî dernakevin pêşiya me tenê di minakên jêr de hin agahiyên piçûk em dikarin bibinin:

Li Parîsê stîleke nerm heye ku li Amerîkayê nîne, kiryarên emerîkî zehf ji vê stîlê hez dikin (r.15)

Dizanim kurd çiqasî mêvanperwer in, kurdan pir xizmeta min li Kurdistanê kirin. (r.48)

Ev çend meh in di nav vê çirava Ewropayê de dizivirim... ev fransiyên han kengî beşer in!? Kengî dizanin exlaq, edet û mirovatî çi ye! Bawer bike... ev çend meh in liv ê Parîsê dizivirim, tu yekemin kes î pê re rûnim û qehweyekê pê re vexwim... (r.66)

Lê di nameyeke din de nivîsandibû: “ dibe ku herim Yaru Şelîmê... li wir, tev li ax, xwîn û nijada xwe bibim.” (r.170)

Wek ji minakên jor jî tê dîtîn di romanê de cihên çandî rasterast nayên dîtîn tenê bi hin agahiyên biçûk di derheqê hin çandan de hin tiştên fehm kirin.

6.2.1.4. Cihên Olî

Di romanê de cihên olî tenê bi navên xwe derbas dibin ew jî tenê bi çend mînakên derdikevin pêşiya me lê di derheqê wan de ne agahî nayê dayîn û ti carî şibandin nayê kirin:

Baş e... tu çima naçî ji xwe re li mizgeftan dersen Qur’anê ji zarokên misilman re nabêjî?

Got: li seranserê Parîsê tenê mizgeftek heye, ew jî morokî û tûnusiyan ji xwe re zeft kirine.

Daxuyaniyekê li ser dîwarê mizgeftekê yan li ser deriye xwaringehên Saint Denisê hilawise, kesên ku dixwazin zarokên xwe bişînin ber xwendina Qur’anê, bila telefonî te bikin. jixwe qiyametê misilman li Parîsê hene. (r.12)

Got: Erê, ez pêşnimêjê mizgefta Zeynebê li Tehranê bûm, li teniştê pira Kerîmxan. (r.66)

Lê di nameyeke din de nivîsandibû: ‘‘ ji ber ku liv ir, li Fransayê Xwedê nemaye; dibe ku di siberojê de herim Hindistanê... belkî li wir di nav wan hemû xwedayên ku li Hundistanê de hene xwedayekî bibinim û min bextewar bike. ‘‘ (r.170)

Di romanê de lehengek heye ku mela ye lê şayesandineke mizgefteke qet nayê dîtin. Tenê çend cih bi nav derbas dibin. Û di romanê de 2 olên pîroz dertê pêşiya me lehengên me ji welatên Misilmanan direvin diçin welatekî xaçperest. Romannivîs ji aliyê atmosferê ve her du olên ku li welatên cuda de tên bawer kirin berawird dike lê ji aliyê mîmarî û cihên olî ve berawird kirin nayê dîtin. Wek li jor jî hat gotin tenê çend cih bi nav derbas dibin.

6.2.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Di şayesandinan de armanc afirandina rih û atmosfereke diyar in. Bi vê metodê sazkirina bûyerê û afirandina lehengan bi temamî di bin vê atmosferê de tên çêkirin. (Karaca, 2016, s. 74) Di minaka jêr de bikaranîna cih tenê ji bo saz kirina atmosferê ye. Ji bilî atmosferê ti erka wan tune ye:

Li Parîsê, Mihemedê Hacîzade, demeke dirêj li cem jin û mêrekî hevbjarên xwe, Murtezyayê Gulçîn û Ferehnaz xanimê; dijiya. Demekê jî li ba hevvalêkî xwe yê ereb yê cezayirî li Pigalle dima, ku digot dikanekê wî ya piçûk li hember zanîngeha jussieu heye û Qur’an, gername û kitêbên kalsîkî jê re berg dike... (r.13)

Bi agahiyên jêr em di derheqê atmosfera Îranê de agahiyan hîn dibin. Li Îranê rejimeke tund heye. Ev rejim Îranê dike welatekî girtî û teng:

Li Îranê, her dema ku gumana rêjimê dikeve ser meleyekî ku li dijî deshîlata Komara Îslamî ya Îranê ye, yan eger hest bikin ew mele bi tevahî fermanên rêjimê bicih nake, êdî deshîlata wî jê distînin û wî ‘xel’îlîbas’ dikin. (r.17)

Li Îranê dadgeheke taybet bi dadgehkirina meleyan heye, jê re dibên hakimî şer’î. (r18)

Di paragrafa jêr de atmosfera odeya lehengê ji me re tê vegotin. Bi alikariya şayesandinê ode li ber çavên me zindî dibe:

Heft mehên gilower, ez û Humeyla, di nav wê odeya takekesî de rihê me dikir biteqe. Odeya me textekî nivînan yê pîs û dukesî lê hatibû danîn, me nedikarî bêjin du

textên cuda yên yekkesî ji me re bînin qena em kifş nebin, taximekî çayê û selikeke riziwayî ya fêkiyan jî li odeya me hebûn... (r.23)

Di paragrafên jêr de şayesandineke biçûk tê kirin ji bo vegotina bûyerê. Bi saya wan paragrafan atmosfera hotelê dibinin:

Digel ku televizyon li hember kursiyê min di salona pêşwaziyê de hatibû danîn lê belê min pir kêr li televizyonê temaşe dikir. Çimkî her heftî sê-çar rojan diçûm serdana pirtûkxaneyê taxê ku tenê çend metroyan ji hotelê min dûr bû. Her carekê diçûm, min heft pirtûk, bi taybetî jî albûmên wênekêşên ewropî bi xwe re tanîn hotelê;... (r.38)

Bi şev, ji saet deh û nîv ve, gava hotêl xilmaş dibû, hemû mêvan vedigeriyên odeyên xwe, êdî jiyana min ya hunerî dest pê dikir: min deriye hotêlê digirt û diçûm kafeteryayê. Di midbexê de, min rûpelên rojnameyên kevin yên Le Monde, Le Figaro yan Libération li ser erde radixistin û tevî vexwarina qehweyê min dest bi kişandina tabloyan dikir. (r.38)

Bawer dikim roja dewamkirina min ya pêncan yan şeşan bû li hotêlê, saet derdora sê û nivê şeve, di nav salona pêşwaziyê de, li cihê xwe; li ser kursiyê xwe, min wehwe vedixwar û min li albûmeke mezin ya hunermendên serdema Baroque dinêrî... (r.39)

Dîsa bi bûyerê ve di derheqê cihê de hin agahiyên piçûk tên dayîn:

Havîna pêrar bû, min çenteyê xwe danî ser mile xwe û ji Parîsê bi trêne çûm Venise. Li stasyona Venise, sibeheke zû û tarî bû gava gihîştim. Hema gava ji trêne daketim, çûm tuwaletê. Min çenteyê xwe li pişt xwe, li teniştê xwe, tenê metroyekê ji min dûr, li pêşber tuwaletê bicî hişt. (r.44)

Çentê lehengê tê dizîn. Bi saya vê bûyerê em fêr dibin ku li wî bajarî roja şemî û yekşem bêhvedana fermî ye. Bi bûyerê ve di derheqê cihê de agahiyan hîn dibin û atmosferê dibinin:

Ew roj berbanga roja şemiyê bû. Şemî û yekşem bêhvedana fermî bûn. divabû du rojan, heya roja duşemê, li cadeyan razim; bê mal û hal, bi birçitî, bê cixare, bê av û nan, li kolanan bizîvirim: gelo kîjan rojê piştî duşemê balyozxaneyê fransî li Venise tê vekirin? (r.45)

Di hin paragrafan de navê hin bajar û welatan derbas dibin lê di derheqê wan de şayesandin nayê kirin:

Di destpêka salên 1970an de, mühendis 'endezyar' bûm, hatim Kurdistanê, li navçeyên derdora Dihokê projeyeke me ya endezyarî, hebû. Min neh mehan li Kurdistanê, li navçeyên li dora Dihokê kar kir. (r.48)

Wê dema kum in Mihemedê Hacîzade nas kir, nû ji Yewnanistanê bi riya gemiyan ber bi Îtalyayê bi qaçaxî xwe gihandibû xaka Fransayê (r.55)

Li qehwexaneyê Montmartre leheng li ser rewş û atmosfera Iraq û Îranê diaxifin:

Pişt re li heman cihî, li qehwexaneyê Montmartre; me dest bi behsa gelek tiştan kir. Nûçe û saloxên hezaren leşkerên bêguneh ku di welatê min û welatê wî de, bêyî sedem û bêyî tu huneh bûne êzinga agirê wî şerê kelevajî yê ku Xumeynî û Sedam li ser herdu welatên me ferz kirin... (r.57)

Di paragrafên jêr de hin şayesandin tînin kirin lê ne ewqas hûrgûlî tenê atmosferek piçûk tê afirandin ji bo domandina bûyerê:

Hacîzade weke ku ji pêşbirkiyekê derketibe bêhna xwe vede, piştî xwe dabû balîfê îranî yê li ber dîwêr, diyar bû dixwest ji gengeşeyê vekişe, berê xwe da meriva xwe Ferehnazê (r.71)

Diçû seriyek li kafeteryayê dida û bi vexwarina qehweyê re di hundirê 15 deqîqeyan de, hinek hesab û nivîs li wir dikirin. Vêce di dawî de, min awaza pîr ya gavên wê û teqteqa giran ya şimika wê dibihîst; hêdî hêdî, seik li depoya fireh û mezin ya hotelê jî dida; depoyeke dirêj, hinekî tarî û şêşû, li hember wê pêşwazîgeha lê rûdiniştim. (r.73)

Hêmanên cihê di sazkirina lehengan de jî girîng in. Di hin romanên de leheng ne bi qerekerên xwe bi cihê ku li dijî tînin nas kirin. Ev kesan bi cihê re wekhevî bûne. (Balîk, 2016, s. 124) Mîrov wek ku bi welatên xwe an bi cihê ku li dijî tînin nas kirin bi eynî şikl jî bi cilên xwe jî tînin nasîn û bi cilên xwe re wekhevî datînin. Di kolanên Parîsê de cihû bi cil û bergên xwe cihûbûna xwe nîşan didin:

Cil û bergên wî jî, berovajî wan cihûyan bû ku min ew di kolanên Parîsê de didîtin. Şebqeyeke reş li serê wan, rihên xwe berdabûn, yan jî kumekî reş yê piçûk bi debûseke piçûk li qoqa serê xwe didan da ku bînin nas kirin ku cihû ne... (r.80)

Di perçeya jêr de di derheqê Denmarkê û Portekîzê agahî tê dayîn. 5 milyon rûniştiyên Denmarkê hene ji wan milyonek penaber in. Hejmareke mezin ji cihûyên Portekîzê jî bi esl morokî ne. Ew agahî atmosfereke piçûk li ber çavên me dide xuya kirin:

Ev di demekê de ye ku tenê li welatekî weke Denmarkê, ku hejmara rûniştiyên wî pênc milyon kes in, milyonek ji wan bi esl penaber in! (r.82)

Tiştêkî din jî ji te re bêjim: hejmareke mezin ji cihûyên Portekîzê jî, ew welatê ku tê de jidayik bûm, bi esl morokî ne, ji wan cihûyên k udi wextê xwe de ji ber sitema rêjîma îslamî ya Morokê li Portekîzê bûne penaber pêk tîn; hinekên din jî ew cihû ne ku ji sitema Naziyan Almanyanê reviyane Portekîzê. (r.83)

Monsieur Luciana di derheqê cihûyên Portekîzê de agahiyan dide û wan dişibîne Kurdan. Pişt re jî li ser atmosfera Portekîzê ya berê agahiyan dide:

Monsieur Luciana digot ku cihûyên Portekîzê, bi dirêjiya sedsalên derbasbûyî, weke milletê kurd îro li Tirkiyeyê, Îran û Sûriyê... mafê hevvelatîbûn û nasnameyê wernedigirtin û nikaribûn ol û kultura xwe ya neteweyî pratîze bikin; lewma bi dirêjiya sedsalên çûyî cihûyên Portekîzê ji ber sitem û zilma paşayên Portekîzê hertim reviyane welatên derdorê... (r.84)

Romannivîs bi devê lehengê xwe li ser atmosfera sedsala 16an agahiyan dide. Bapîrê lehengê ji bo bazirganiya koleyan çûye Afrîqayê û koleyan anîye li Ewropayê firotine:

Di sedsala 16an de, piraniya welatên Afrîqayê û hinek welatên Asyayê jî di bin destê Portekîzê de bûn. bapîrên min yê mezin bo bazirganiya koleyan diçûn Afrîqayê; evd û kolayên reş li welatên Afrîqayê dikrîn û dibirin welatên Asya û Ewropayê û li wir bi nirxekî girantir difirotin. (r.87)

Bi saya destnivîseke bapîrê Monsieur Luciana li ser Esfehanê em hin tiştan hîn dibin:

Di destnivîseke wî bapîrê min de hatiye nivîsandinku cihûyên taxên derdora minareya Çehl Duxteran ku dikeve kêleka meydana Heşt Beheşt li Esfehanê, bi sûdwegirtin ji bingeheên hunera pîşesaziya Çînê, heya weke sedsala pazdehan jî çuqliyên darên tûyên spî dianîn, distirandin, didewisandin û kaxez ji wan çêdikirin... (r.90)

Gava gihiştin Esfehanê, min pîşesaziya çêkirina kaxezan ji çuqliyên darên tûyan yên spî vejand û geş kir. Min cihûyên taxên derdora minareya Çehl Duxteran civandin û ew anîn ser meraqa çêkirina kaxezan. Çiku min dizanî tenê li bajarê Qendehar û li Çînê girîngî bi vê pîşeya girîng hatiye dayîn... (r.90-91)

Monsieur Luciana çend mehan careke diçe Tel Avîvê ji bo wergirtine kirêyên malên xwe û safîkirina hesabên wan:

Rast jî digot; Monsieur Luciana her çend mehan carekê diçû Tel Avîvê, çimkî hotêleke sêsterk, dermanxaneyek û çend xanî û zeviyên wan li wir hebûn; diçû bo wergirtina kire û safîkirina hesabên wan li wir. (r.94)

Di derheqê sala 1991ê de atmosfera Kurdîstanê tê vegotin:

Wê çaxê, hê jî serhildana sala 1991ê li Kurdistanê vêneketibû, Sadam Husên hê jî li ser desthilatê bû. (r.99)

Navên hin tiştan tê dayîn û ti wesifandin nayê kirin di minaka jêr de.

Di wê demê de, di cih de, hogirekî min yê wênekêş hate bîra mink u erebê Bexdayê bû û em bi hev re li ordîgeha penaberên iraqî li Kere cli meydana Zob Ahen, di heman qawişê de dijiyan (r.109)

Dîsa li ser atmosfera Îran û Iraqê hin agahî tê dayîn:

Ne bi tenê Elî Rubey'î, em hemûçk, nişê parçe parçebûyî di bin destarên şer de, em nişê wî zemanî li jêr sitema Sedam û Komara Îslamî ya Îranê, baweriya me bi marksîzmê û dijberiya wan herdu rêjimên, şerxwaz ku bi navê îslamê çen milyonan hevvelatîyên Iraq û Îranê dabûn kuştin hebûn. (r.110)

Li Parîsê ciwanên Lubnanî û Filistinî diçin qapût û pantolan didizin û bi nirxekî erzantir difroşin. Ew agahî di derheqê atmosfera Parîsê de hin tiştan nişane me dike:

Ew ciwanên Lubnanî û Filistinî yên ku di destpêka gihiştina min bo Parîsê de, di kampê de bi min re bûn; derbarê wan kesan jî ku weke min hê jî mafê akincibûnê ji wan derneketibû; diçûn parçeyên piçûk yên zêr û qapût û pantolon ji dikan û sûpermarketên Parîsê didizîn û li bazarên reş yan li pêşber bazara Tatili Marcadet-Poissonniers bi nirxekî erzantir difirotin... (r.117-118)

Leheng atmosfera ode xwe bi şayesandineke piçûk nişane me dide:

*Di odeyeke yazdeh metroyên çargoşe de, destşok û text û dûş û botoxazek...
kepîneya min jî hevbeş bi penaberekî srîlankî yê li odeyeke din ya li derveyî
apartmana min. (r.118)*

Tevgerên Mihemedê Hacîzade bi alikariya hin cihan ji me re tê vegotin:

*Mihemedê Hacîzade, bi dirêjîya wê dema bêkariya xwe heya wê dema ku
restoranteke din bibîne da ku firaxan tê de bişo; fêr bûbû diçû nav koridora bi xirecir
ya mezin ya lu pêşber dêra Notre Dame yan li nav baxê Luxembourg, pir caran jî
diçû nav qehwexaneyên Jussieu û Sorbonne ku xwendevanên ciwan yê zanîngehê li
wan bûn... (r.121)*

Di paraprifa jêr de nivîskar navnîşana restoraneke kurdên Tirkîyê yê bi navê
Dîlan vedibêje. Cihên ku derbas dibin nayên şayesandin tenê ji bo rê nîşandanê tîn
bikaranîn:

*Te rûbarê Seine li pey xwe dihişt ber bi cadeya Charone heya digihiştî taxa
Saint-Antoin, li kêleka dêra Madeleine de Tronel li kolana Saint-Antoin, restoraneke
xweşik û piçûk ya kurdên Tirkîyeyê bi navê Dîlan hebû... (r.121-122)*

Monseur Lucîana ji bo gotina tiştêkî Ferhadê dibe meyxaneyê Îspanî li
meyxaneyê muzîka Îspanî û Flamenko lêdikeve û dest bi axaftina li ser atmosfera
cihanê dikin. Ji atmosfera Îran û Iraqê bigirin heta li ser evîna Rimbaud û Verlaine jî
diaxifin:

*Vê rûniştina me li wê restoranê derî li ber çend derketinên me yê din vekir, her
carekê jî bo restoran, qehwexane û meyxaneyê cuda.*

*Monsieur Luciana, şevêkê, gava mine w bir meyxaneyêke îspanî ya xweş ‘
jêrzemînek tê de mûzîka îspanî û Flamenko dijenîn bi navê La Vida’; ji min re got
(r.134)*

*Bi hev re me qala siyaseta Amerîka û şerê Îran û Iraq û Efxanistanê dikir, me
qala filmên Jean-Paul Belmondo, pêwendiyên Alain Delon bi Romy Schneider re,
nexweşiya AIDSê, mûzîka jazzê û diplomatîkiya Yasir Erefat dikir... me qala
ciwaniya jina rojhilatî û berhevkirina wê bi jina ewropî re, firotna çekan ji aliyê
Almanya û Fransayê bo Iraqê, wehpên Saint-Denis, eşqa navdar di navbera
Mewlana Celaledînê Romî û Şemsê Tebrîzî de û berhevkirina vê eşqê bi eşqa di
navbera Rimbaud û Verlaine re dikir... (r.134-135)*

Bi bûyerê re dîsa şayesandineke piçûk tê kirin. Leheng diçin restoraneke Tirkan bi navê Karwanseray:

Şevêkê ji wan şevên ku em bi hev re bûn, li Parîsa heştan li restoraneke tirkan, bi navê Karwanseray ku sema û muzîka osmanî lê bû; ez çûbûme tuwaletê (r.135)

Kulîlk tim di hundirê dendikê xwe de xwe veşartiyê. Ev gotin ji me re mal û odayên wî nîşan dide. (Bachelard, 2008, s. 52) Ferhad diçe mala Monseiur Luciana û dekora mala wî gelek bala Ferhad dikşîne û Ferhad hundirê malê ji me re teswîr dike. Atmosfera malê li ber çavan dide zindî kirin:

Bi dirêjiya korîdorê, ku diçû nava dîwanxaneyê mala wan, merşên hevrîşim yênan îranî û beren rengîn yênan fîguratîvî yênan rojhîlatî bi dîwaran hatibûn hilawistin. Her yekê ji wan xwe ne wek kilîmekê, lê weke tabloyeke buhadar nîşan dida. (r.136)

Di korîdorê de, di beşê pêşî yê dîwanxaneyê şahane ya mala Monsieur Luciana min ev tişt dîtî, ku her yekê ji wan ji welatekî û ji bakarekî bi xwe re anîbûn.

Şûr, diranê fîl, mûmdana zîvîn, ala ji etles çêkirî, qutiyên ji gewher çêkirî, sindoqên hesinî, guldanên destçêkirî yênan çînî, kemerbend, saz, zina hesp, mertal, balîfên hevrîşmî, topa pîşandera dinyayê, cizme (potin), şaxê (stirihê gergedan) hêkên neqîşandî... (r.136-137-138)

Di romanê de bi navê “*Bajarê San Francisco li ser yazdeh giran hatiye damezrandin, bi rastî bajarê wênekêşan e*”. beşeke heye û di vê beşê de li ser San Francisco hin agahî tê dayîn û ji San Francisco şayesandina hin cihan tê kirin:

San Francisco li ser yazdeh giran hatiye avakirin, çend metro li her cihekî amade ne te biguhezin wan avahiyên bilind ku ji wan dikarî deryayê bibînin. San Francisco bi rastî bajarê wênekêşan e! (r.154)

San Francisco di nav Market Streeta wê de, deh cûr nijad û milletên cûr bi cûr, li pêşber sînemayekê, di dema xilasbûna sînemayê de, careke din tev li hev dibin. San Francisco ew bajar e kut ê de xelk guhdariyê li baştirîn muzîka jazzê ya Amerîkayê jî, dikin. (r.154-155)

Li tenîştê Telegraph Hill, li taxa North Beach, restoraneke çînî bi navê The Cellar heye, berê nivîskarên nişê ‘Beat’ tê de kom dibûn; lê belê vêga bûye cihê wan penaberên bê nişîngeh û bê mal û hal yênan ku tînan li wir heşîşê dikişînin; bûye

menzilgeha wan bê nişîngehên bextreş yên ku li dû homoseksuelan digerin da ku bi wan re bibin heval... (r.155)

Di beşa jêr de navên hin cihan derbas dibin lê li ser wan tişteki nayê gotin:

Roja sêşemê, li rawestgeha trêne ya ‘ Gard de Nord’, saet heft û nivê êvarê, me hemû aliyan xatirê xwe ji hev xwest û her yek ji me ber bi aliyekî çû, murteza –ku nû çend meh bûn ji jina xwe Ferehnazê cuda bûbû- bi bi xwişka xwe Saqî Gulçînê re ber bi firokexaneya Charles de Gaulle çûn... (r.158)

Ferhad atmosfera otomobîla Monseeiur vedibêje:

Hundirê otomobîla wî, germ û xweş bû. Min denge Charles Aznaou ji tomara otomonîlê, dibihîst. Bêhneke balkêş dihat, lê bala min her û her li cem Mihemed Hacîzade bû. (r.176)

Bi agahiyên jêr di derheqê atmosfera hotelekê ya Parîsê de em hin tiştan hîn dibin:

Bere, wê dema ku li hotêlê bûm, nivê şevan, piraniya caran jî piştî saet deh û nivê şeve bi şûn de, mêrekî ereb yê dewlemend yan mêrekî afriqî- bi awayekî giştî jî piraniya caran asyayî- tevî qehpeke nîvtazî li zengilê deriye hotêlê didan û min derî li wan vedikir... (r.177)

Di beşa jêr de jî em dewlemendiya Monseeiur Luciana dibînin. Li sê paytextên cihê ya li dinyayê xwedî mal û mülk e:

Monsieur Luciana xwediyê sê hotelên lüks bû- heryek ji wan li paytexteke cihê ya dinyayê. Hotêleke sê stêrkî ya lüks li Parîsê, yek li Oxforde û yek li Tel Avîvê ev ji xeynî ku, weke bi xwe digot: çend apartmanek li Parîsê, sê apartman li Oxfordê, çar apartmanên din li Tel Avîvê, diwazdeh dermanxane jî li diwazdeh bajarên cûr bi cûr yên Fransayê. (r.180)

Di beşa jêr de ji bo tenahiya Ferhad afirandina atmosferên cuda cuda tê vegotin:

Hemû wênekêşênberî heyama ‘Behzad’ eger bixwesta weke mînak wêneyê tenahiya ‘ Ferhadê peykarsaz’ biresimînim, diçûn Ferhad li çolistanekê diresimandin; lê Behzad hat tenahiya Ferhad di nav girseya jiyana hemdem de, di nav wezîr û hesinkar û nêçirvan û bexçevanên mijûl de, ango di orta bajar û

werebalixiya xelkê dewêneyê tenahiya Ferhad kişand û... tenahiya wî jî pir ciwan diyar bû. (r.191)

Di beşên jêr de navê meyxaneyê Îrlendiyan tenê bi navê û şayesandineke biçûk bo domandina bûyerê tê vegotin. Tenê atmosfera bûyerê saz dike:

Vêce gava em gihîştin pêşber keviya kolana li ber tavê ya meyxaneyê îrlendiyan ku me li wir daxwaza bîrayeke Tuborg û Pilsen kir. (r.194)

Li Saint Malo, min du carên din jî Saqî Gulçînê dît û em bi hev re rûniştin. Cara yeke li heman meyxaneyê îrlendiyan, cara duyemîn jî li qehwexaneyekê li qeraxa deryayê bi navê la Java- li kêleka cihê kum in lê pertre ji tûristan re çêdikir. (r.197)

Di romanê de cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin gelek tînin sedema wî jî ew e ku ji her aliyê ve gelek cihên ji hev du cuda di romanê de derbas dibin. Carinan welatek tê şayesandin carinan jî wek mînaka dawî atmosfera meyxaneyekê tê vegotin.

6.2.1.6. Cihên Ûtopîk

Di mînaka jêr de em cihekî Ûtopîk nabînin lê tiştekî din derdikeve pêşya me. Nivîskar bi me dide fehmkirin ku hunermend bi berhemên xwe dikarin cihên ûtopîk biafirînin:

Hunermend dikare cîhanê bi awayekî nû, weke çawa dilê wî dixwaze; çêbike. Tamê jî ji vê çêkirina xeyalî werdigire; lewma hunermend ji vê rastiya gemarî û kujer bêminet e; rastî eger req û hişk yan xweş be. (r.179)

Ji bilî minaka jor di romanê de cihên ûtopîk tune ye. Romannivîs belkî dikaribû li gelên rojhilatîyan bi xeyalên lehengan ûtopoyayekê ava bike lê di romanê de tişteke wiha nayê dîtin.

6.2.1.7. Cihên Derî Siruştî

Di romanê de cihên Derî Siruştî tenê di çend minakên biçûk de derdikevin pêşya me. Lê tenê ji bo şibandîna tînin bikaranîn:

Di wê demê de li bîra min e, min keriyekî bizinan dinêrî, keriyekî bizinan yê karkerên kurd yê li ser tixûbê Îran-Tirkiyeyê... ew bizin çiqasî azad di nav wê şînahiya bihuştî de ji xwe re digeriyan... (r.31)

Me desthilatdarên Îslamê welatê xwe li xwe kiriye dogeh. (r.35)

Welatên misilmanan piranî wek dogehê di romanê cih digirin û tên şayesandin welatên ewropa jî ji bo ew kesên ku ki rojhîlatê direvin wek bihuştê tên nişandan lê li gorî rewşê carinan ew bihuşt di romanê de ji lehengan re dibe dogeh jî:

6.2.1.8. Cihên Sehekî

Leheng li Montmartre xwe baştir hîs dike û dilê wî bi wê qerebalixya rengîn ya Montmartre tê vekirin:

Min dizanî dilê wî bi wê qerebalixiya rengîn ya Montmartre dihat vekirin, bi taybetî jî ji wê rojê ve gava bi wan jin û mêrên tehranî yê hevbjarên wî re ku li mala wan radiket; bi hev re tevî Saqî Gulçînê ya xwişka Murteza ku ji San Francisco cara yekê bû dihate Parîsê... (r.13)

Ji sînora Tirkiye û Îranê pênaber xwe baş hîs nakin. Ew der ji ber zordariya leşkeran li ser mirovan tirs çêdike. Ê cihekî sehekî diafirîne:

Ji Îranê bi qaçaxî em ber bi Tirkîyeyê diçûn, di orta konên kurdan de, di navbeyna gundên navbera Şîno û wî aliyê sînorê Tirkîyeyê de, pasdarên Îranê û leşkerên tirk di her dem û wextekî de xwedî maf bûn ku me bidin ber gulleyan. Bi awayekî berdewam li ser wî sînorê, bi tirs destê me li ser dilê me bû. Di wê demê de li bîra min e, min keriyekî bizinan dinêrî, keriyekî bizinan yê karkerên kurd yê li ser tixûbê Îran-Tirkîyeyê... ew bizin çiqasî azad di nav wê şînahiya bihuştî de ji xwe re digeriyan... (r.31)

Medbexa hotelê ji bo lehengê cihekî sehekî ye. Leheng berhemên xwe li wê derê diafirîne:

Şemî û yekşem ne di nav de, min taştê û şîv jî her li hotelê dixwarin. Herwiha vexwarin û xwendin û gelek caran nîveşevan min tabloyên xwe jî di medbexa hotelê dîresimandin.(r.37)

Derengiya demê û telefona di vê saetê li ser lehengê tirs çêdike û ew der û dem dibe cihekî sehekî:

Di wê dema derengiya şevê de, di nav bêdengiya bi xof û tirs de, bi rastî, dilgiran bûm û hinekî jî tirsiyam, ev telefon çi bû? (r.39)

Leheng derdikeve derve û dixwaze hinekî ji xwe bigere. Li derve baran dibare kolanê şil dike. Bêhneke xweş ji pel û darên şilbûyî tê û ji bo lehengê cihekî sehekî saz dibe:

Rabûm, min paltoyê xwe danî ser mile xwe û bi hêdîka çûm derve. Baranê, diyar bû nû xweş kiribû. Kolan şil bûbû. Bêhneke xweş ji pel û darên bi baranê şilbûyî yên vî alî û wî aliyê kolanê dihat. Ronahiya heyvê li hinek pelan û şevnema wan dida û diteyisîn. (r.39)

Tarîbûna dinyayê li ser lehengê bandorê çêdike û dilê lehengê giran dibe:

Dinya tarî dibû. Dilê min giran dibû û diponijîm. (r.46)

Esfehan bo lehengê cihekî sehekî ye û ji ber vê jî di xewa xwe de dibîne:

Carna di xew de dibinim ‘‘ Çûme Esfehanê... paltoyekî sor yê zivistanî li min e û tik û tenê, bi berbanga sibehê re, ji hotêla Alî Qapû derdikevim û di pêşber rawestgeha Baba Qasim re derbas dibim; pir kêfxweş, bi minareya navdar ya Sareban û Darûlziyafe, ku ya yekemin di serdema Selçûqiyên de û a duyemîn jî di serdema Êlxaniyan de hatiye çêkirin... (r.93)

Eşqa rastîn ya welatên Rojhilatê li ser lehengê bandorê çêdike ji ber vê jî ji Rojhilatê hez dike. Rojhilat ji ber ku li ser lehengê hîs saz çêdikin bo lehengê cihekî sehekî ye:

Ez bi eşqa rastîn ku li welatên Rojhilatê heye metelmayî me, ew kelegermiya ku di evîn û hezkirina Rojhilatê de heye, bi ser de jî di pêwendiyên di navbera mirovên ji hev nêzik de bi hev re. (r.99)

Li San Francisco pûtek heye bi navê Son Yat-Sin. Pênaber, serxweş, mihacir û bêkar di bin de kom dibin û bawer dikin ku ew der odeya razanê ya mala wan e. Ji ber ku xwe li wê derê ewle hîs dikin, ew der bo wan cihekî sehekî ye:

Li navenda taxa çînîyên San Francisco, pûtek heye jê re dibên Son Yat-Sin; ku penaberên serxweş, mihacir û bêkar di bin de kom dibin û nivê şevan wiha bawer dikin ew der odeya razanê ya mala wan e. (r.155)

Li Saint Malo leheng cara yekê hest bi tenahiya xwe dike. Nemaze jî dema ku peykerekî ku dişibe bavê xwe dibîne. Ew peyker û bajar li ser lehengê hîs ava dikin:

Li Saint Malo cara yekê bû di jiyana xwe de min hest bi tenahiya xwe kir, nemaze jî rojekê gava li jêr peykerê Robert Surcauf ku Alfred Caravaniez saz kiribû; rawestiyabûm. Ew peykerê Robert Surcauf, qilafet û demê wî, deq bi deq li bavê min diçû. Min dest bi fikirîna li dê, bav, xwişk û birayên xwe kir. (r.167)

Leheng bo vegera xwe ya li Parîsê pir kêfxweş dibe lewra Parîs bo lehengê cihekî sehekî ye:

Baran hûr hûr li ser kolana li pêşber rawestgeha trêne dibariya. Dilê min pir xweş bû ku piştî sê mehan dîsa Parîsê dibinim; min li barana çirisandî ya ezmanê reş yê Parîsê dinêrî. (r.175)

Baran li ser lehengê hîsên cuda saz dike. Lewra di bin baranê de bi Zîbayê re di kolanên Parîsê de geriyane û Zîba jî pir ji meşa bin baranê hez dike. Baran ji bo lehengê cihekî sehekî saz dike:

Zîbayê zehf ji meşa bin baranê hez dikir! (r.176)

Heya em ghiştin otomobîla wî, bi dirêjîya wê riyê; di bin baranê de, qala baran û wan rojan dikir ku çawa di bin baranê de bi Zîbayê re, bi cot kolanên Parîsê tey kirine, çawa vêga jî her carê gava baran dibare Zîbayê tê bîra wî. (r.176)

Dengê mûzîkê bêhna pirteqalan û bêhna genimê şamî li ser lehengê bandor çêdikin. Heta rûhê lehengê jî dihejînin:

Em li qorziyekê rûniştibûn ku denge muzîkeke xweş bi hêminî rûhê min dihejand. Min bêhna pirteqalan dikir, bêhna genimê şamî jî li ser maseya me. Tama şeraba Martini pir bi dilê min bû. (r.179)

Cîhan mala her kesê ye li gorî lehengê, divê her kes li gorî vê tevbigere li xweyî derbikeve. Li cihekî tiştê were serê welatekî divê welatên din jî pê biêşin û alikariya wî bikin. Li gorî lehengê cîhan bo her kesê divê cihekî sehekî be. Di rûpela 181an de ev tişt tê vegotin:

Lehiyek eger li Haitî rabe û bi hezaran mirov, xanî û zeviyên bibin qurbanê, yan erdhejek eger li Srî Lanka biqewime û sedên mirov û xanî û avahiyan bi sedema wê ji nav herin, ev bextreşiyên bi vî rengî weke ku di heman demê de hatibin serê bajarekî Colombia jî, yan li Australyayê jî dilê xelkê giran kiribin. Cîhan eynî ew goka mezin e, mala me hemûyan e... em li ku derê bin ferq nake. (r.181)

Ger qulek bikeve her cihekî vê erda girover, cihekî din jî li wî serê dinyayê yan bi ser de çend cihên din jî ji ber qulê birîndar û zerermend dibin. (r.181)

Em mirov bi tenê ne berpirsên wî cihî ne ku tê de dijîn, lê pêwist e em xwe weke berpirsê hemû quncik û qorziyên vê cihana ku Xwedayê mezin weke nîmeteke bexîşandiye me, bibînin.

Vêce got:

Erk e li ser me cihanê biparêzin. Li her şûneke vê dinyayê birînek hebe, derman bikin. (r.181)

Bi saya gelek tiştan Esfehan di dilê lehengê de ji xwe cihekî xwe dibîne û ji bo lehengê dibe cihekî sehekî:

Destnivîsên buhadar yên bapirê wî yê mezin li Esfehanê, mezara Hafîzê Şîrazî, nemaze jî – ji hemûyan girîngtir jê re: Zîba... Zîbaya herdem zindî ya di nav xewnên wî de ! (r.186)

Dengê piyên Saqî Gulçîn li ser textê apartmanê de zehf xweşa lehengê diçe û hundirê apartmanê jê re dibe cihekî sehekî:

Dengê piyên Saqî Gulçînê li ser textê di apartmana min de zehf xweş di nava dilê min de ziringî dida. Min çavêrê dikir mile xwe bixe mile min, nekir. (r.194)

Di romanê de di navbera leheng û cihan de gelek caran têkilî tê çêkirin. Cih li ser hestên lehengan de bandorê çêdike. Mezinbûna bandora cihan li ser hestan diguhere ew bandor carinan bandoreke pir mezin carinan jî bandoreke pir biçûk dibe. Esfehan ji bo lehengekî pir bi bandor e û di navbera evina lehengê û Esfehanê têkiliyeke mezin tê dîtin. Carinan jî apartmanek di demeke biçûk de li ser lehengekî bandorê çêdike denge piyên Saqî Gulçîn di apartmanê de bandor di hestên lehengê de ava dike.

6.2.2. Encama Tehlîla Romanê

Di romanê de em rastê cihên Fantastîk nayên. Sedema vê jî ew e ku romannivîs dixwaze bûyereke realist vebibêje. Ji cihên Ûtopîk tenê minakek derdikeve pêşiya me. Lê romannivîs dikaribû zêdetir cihên ûtopîk bi kar bîne lewra di romanê de gelek gel di bin rewşeke nebaş de jiyana xwe didomînin. Romannivîs xeyalên wan bi xwestekên wan ya jiyanekê baş dikaribû bi hevdû re di cihên ûtopîk de nişandana lê

romannivîs tişteke wiha nake. Cihên Derî Siruştî di romanê de tenê bo şibandinê tèn bikaranîn. Bi erka xwe ya yekem dernakevin pêşiya me. Cihên olî jî gelek cihan de tèn bikaranîn lê li ser wan jî ti şaysandin nayên kirin, nivîskar tenê wan bi kar tîne. Lê di romanê hem cihên ku olên cuda hene tê vehotim hem lehengekî Mela ye hem jî lehengê sereke wênesaz e romannivîs dikaribû di navbera wan agahiyan de têkilî çêkira û mimariya cihên olî berawird bikira lê romannivîs wê jî nake.

Li gorî demê wate û nerînên ku hunermend dane cihê hatine guhertin. Disa divê neyê ji bîr kirin cih hemû jiyane dorpêç dike. Cih li gorî jiyane ku li ser wan tèn jiyîn wate digirin. Yanê cih bi wateya xwe ya hûrgilî, ji aliyê fikr, rewş, çand, aborî, derûnnasî û olî ve dibin cihên jiyînê. Curbicuriyên çandî piranî bi têkiliyên cihê ve çêdibin. (Yılmaz, 2007, s. 24) Di romanê de ev tişt gelek caran derdikevin pêşiya me carinan cihên ku dibê fireh bin bi sedema rewşa xwe dibin cihên teng û girtî. Romannivîs li gorî nêrîn fikr û ramanên xwe di romanê de cihan saz kiriye.

Ji bilî hersê cih ku me li jor behsa wan kir, roman ji aliyê cihê ve serkeftî ye. Gelek caran bi vegotina atmosferê nivîskar dixwaze agahiyan ji xwîneran re bide. Welatên Rojhilatê wek cihên teng û girtî, welatên Ewropa jî wek cihên vekirî û fireh tê dîtin. Di navbera cih û lehengê de têkilî tê çêkirin. Carinan cihên teng li gorî hestên lehengê jê re dibe vekirî û fireh, carinan jî cihên fireh û vekirî mîna Îtalyayê ku welatekî Ewropî ye ku me li jor jî qal kir welatên Ewropî cihên fireh tèn dîtin bi gelemperî, li gorî hestên lehengê û rewşên ku tèn serê wî jê re cihekî teng û girtî tê.

7. CIH DI ROMANÊN ROJAVA DE

7.1. Mijabad ¹¹

Badîn bi têkçûyina xwe ya evînê di romanê de cih digire. Bûyerên romanê bi çavên Badînê tê dîtin û wiha dimeşe. Di navbera Badîn û Mehabadê de têkilî heye. Jiyana Badîn û jiyana Mehabadê û rewşa Kurdan dişibin hevdu.

Badîn di nav belengaziyê de dayîk dibe. Li odê ku tê dinyayê tiştê tune ye. Tenê li dîwarê Qur'anek û tiwîngê daliqandiye. Li welat jî rewş nebaş e. Li her derê mirî hene. Li kenarê her rê û li devê her şikeftî mirî hene. Di rewşeke wiha de Badîn tê dinyayê û di cîhanê wiha de mezin dibe. Salên nexweş derbas dikin. Şaban Axa serî radike li hemberê hin eşîrên wek Tiyarî, Baz û Cêlo û hwd. Ji nav eşîran herî zêde eşîra Tiyarî bi alikariya Ingilîzan erîş dikin li ser bajarên Kurdan. Mizgeftan dişewîtinin kitêban davêjên bîra mizgeftê. Ji dijmintiya Ingilîzan piraniya Kurdan dibin aligirê Hîtlêrê. Sixurên Ingilîz û Elmana li bajêr digerin. Sixurên ku tînen qefaltin di zindanan de tînen kuştin. Rewşa Mehabadê çiqas diçe xirabtir dibe.

Bûyera Dersîmê jî çend sal berê bûyera Mehabadê diqewime. Dewleta Tirk gelek bi tundî bersîva Kurdan dide û gelek Kurd di vê bûyerê de tînen kuştin. Di wan salan de li Ewropayê jî rewş xirabtir dibe. Ewropa piranî dikeve bin destê Hîtlêrê. Şereke mezin li Ewropayê pêk tê. Hîtlêr dixwaze xwe bigihîne rojhilatê jî lê di şer de tînek diçe. Piştî tûkçûyina Hîtlêrê Rusya û Ingîltre di navbera xwe Îranê perçe dikin. Ingilîzan Bi hêzên Îraqîyan ve êrîşî herêma Barzan dikin. Li Mehabadê di wan salan de Komara Mehabadê tê saz kirin lê wek evîna badîn jî ew jî tînek diçe û serokên Komara Mehabadê tînen daliqandin. Badîn jî pişte vê bûyerê ji Mehabadê koç dike.

¹¹ Jan Dost

Jan Dost romannivîs, helbestvan, wergêr û nivîskarekî kurd e. Ew di 12 Adara sala 1965an de li bajarê Kobanî hatiye dinyayê. Xwendina xwe heta lîseyê li Kobanî qedandiye. Ji sala 1985an heta 1988an li zanîngeha Helebê fakulta zanîstê beşê Biyolojiyê xwend, lê temam nekir. (Pariltî ve Galip, 2010: 112)

Jan Dost di dehsaliya xwe de dest bi nivîsîna helbestên erebî kir paşê jî panzdesalî de qulipî zimanê kurdî. Çîroka wî ya yekem Xewna Şewitî sala 1993an di pêşbirka kurteçîroka Kurdî de li Suriyê xelata yekem stand. her weha li Tirkîyê jî li ser sehneyê hate listin. ji bilî wê çîrokê, jan Dost çend çîrokên din jî nivîsandine, wek Mistek Ax ku sala 2007an li Almaniyayê bû kurtefilmek, û rûyekî şîrîn û hinin din. Her weha gelek helbest û lêkolîn bi erebî û kurdî di rojname û kovarên cihê de weşandine. Jan Dost di malpera Dîyarnamê de di quncika xwe ya bi navê Şevnem de ji 2007an heta 2012 nivîsar dinivîsandin. Jan Dost ji sala 2000î de li Elmanyayê diji û ji Adara 2009an de hemwelatîyê Almaniyayê ye. (Dost, 2004: 6)

7.1.1. Cih di Romana Mijabad de¹²

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Mehabad, Rexê Dîcleyê, Navçeya Barzan, Behçeya Qazî
Cihên Girtî û Teng	+	Odeya Lehengî, Bajar, Sariqamiş, Zindana Akreyê, Gundên Kurdan, Çayxaneî Girtîgeh, Çapxanê, Amêdî, Çarçira Cîhan
Cihên Çandî	+	Dêrsîm, Amêdî, Di cejna Remezanê de Mehabad
Cihên Olî	+	Mizgefta Ebbas, Ziyaretên Çakên Mehabadê, Mizgeftên Mehabadê, Mizgefta Zekeriyayê,
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nîşan Didin	+	Bazar, Sala 1919an, Atmosfer biharê, Meyxaneya Agop, Silêmanî, Mehabad, Dêrsîm, Odeya Lehengî, Ewropa, Stûdyoua Nûbarê, Deşta Helebçe, Odeya Lehengî, Kelê Şînê, Mala Emîral Axayî, Kolanên Mehabadê, Mala Hejarî, Baxî Şêxî, Tewrêz, Şikakî
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	+	Xeyalên Lehengî
Cihên Fantastîk	+	Ewr, Stêrk, Xweza, Ba, Sablax
Cihên Derî Sirûştî	+	Dojeh, Bihuşt, Erşa Xwedê
Cihên Sehekî	+	Amêdî, Mehabad, Dara tiriyê, Êvar, Berf, Silêmanî, Odeya Sultanê,

7.1.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Bayê hênik ya çiyayên Mehabadê xewa lehengê tîne. Leheng li wê derê xwe ewle hîs dike:

Ez ê niha razêm, ev bayê hênik ku çiyayên Mehabadê weke sûlaveke neditî û nermik tê xwarê, xewa Xwedê jî tîne. (r.138)

Leheng azad dibe û bi azadbûna xwe diçe rexê Dîcleyê. Bayekî azad ji çem jê re tê. Bîna wî fireh dibe. Ji wan gotinan tê fam kirin ku rexê Dîcleyê ji lehengê re cihekî vekirî û fireh e. Lewra leheng xwe li wir azadtir û xweştir hîs dike:

¹² Cihan KAYNAR di teza xwe ya bi navê ‘‘Hêmana Mekanê Di Romana Kurdî (Kurmançî) De: Mînakên Mijabad, Labîrenta Cinan û Gerîneka Guernîcayê’’ de li ser cihên romana Mijabadê disekîne lê di navbera herdu tezan de cudahiyeke wiha heye ku Cihan KAYNAR bi gelemperî mijara xwe vedibêje. Di vê teze de senifandina cih tê kirin û li gorî binbeşên cih mînak ji hevdu tên veqetandin.

Bê bask ez firiyam, ez azad im, careke dî ez azad im û min berê xwe da rexê Dicle. Bayekî hênîk û azad li ber çem dihat, bîna min fireh bû, ji min dihat ku ez bi sobayê avê qut bikim, lê Dicle ye û henek pê re nabin, naçar emin pêncî Fild dane yekî kelekçî ku xelk bi kire derbasî wî alî dikirin... (r.147)

Navçeya Barzan cihekî xweş ji lehengê re tê. Heta dibêje ku keriyên pezkoviyên bi aramî li wir diçêrin. Ew der cihekî vekirî û fireh e li gorî lehengê:

Li jêr lingê me navçeya Barzan weke xewneke xweş xuya dikir, dilê Barzanî bi ser malbat û gundiyan ve bû, keriyên pezkoviyên bi aramî di berbanga wî çiyayê bilind de diçêriyan. (r.171)

Leheng baxçeya Qazî dişibîne bihuştê. Di van rojên dojhîn de her kes berê xwe dide wî baxçeyê û di bin darên baxçeyê de rûdinin. Tê dîtin ku baxçeya Qazî ji cihên vekirî û firehtir e. Ji ber vê gelek kes diçin wê derê û li kêfa xwe dinêrin:

Baxçeya Qazî bihuşteke e her cûre darên bilind û mezin tê de hene, ti dibêjî ew konekî koçeran ye herî mezin e û li rex Sablaxê vegirtine. Di van rojan dojhîn de keç û xort û pîr û ciwan berê xwe didin vî baxçeyî û di siya darên wî de civatan digerin, pîr kes tîn li wê derê navroja xwe jî dixwin... (r.175)

Ji ber ku qala dema şer tê kirin di romanê de cihên vekirî û fireh zêde nayên dîtin. Atmosfereke nebaş di welatê de heye û li ser her kesê tirs heye. Di nav vê xofê de Baxçeya Qazî wek cihekî vekirî û fireh dertê pêşiya me û gel ji bo cihekî xweş diçin behçeya Qazî.

7.1.1.2. Cihên Girtî û Teng

Leheng di nav belengazî de tê dinyayê. Li odeyê ku tê dinyayê tişteke tune, odeyekê rût e. *Di odê de tivîngê û Qur'anek daliqandiye. Bi teswîreke wiha em dikarin di derheqê malbat û civaka ku vebêjer lê hatiye dinê jî şîroveyan bikin. Belasebeb nîne ku behsa tiving û Qur'anê dike hêj di destpêkê de; lewra em di berdewamiya romanê de rastê şer, tevlêhevî û aloziyan tîn.* (Kaynar, 2020, s. 45) Li derva jî li gorî lehengê stêrkan bi tariyê re şer dikin û tenê ronahiyek xemgîn ji stêrkan tê. Ji van agahiyan heke em derbikêvin rê em ê bibînin ku cihê tê qal kirin cihekî ewqas ne xweş e. Ne xweşbûn û rewşa ku tê vegotin girtîbûn û tengbûna wê derê nişane me dide:

Ez di odeyeke rût de ji dayik bûm. Bi dîwarê li ber serê min ve, tenê tivingek û Qur'anek daliqandî bûn. Nivê şevê derbas bûbû, stêrkan bi tariyê re şerekî bêdeng dikirin. Ronahiyek xemgîn ji stêrkan diniqufî. (r.14)

Romannivîs tengbûn û girtîbûna bajarê hem bi hewayê hem jî bi derdorê nîşanî me dide. Di şayesandina nivîskarê de roniyêke ji xemgîniya stranên çiyê û miriyên ku li derdora riyekê û hwd. derdikevin pêşiya me:

Dawîya meha Gulanê bû. Hîva ku weke kulorek nan dixewînî, roniyêke ji xemgîniya stranên çiyê hûnayî bi ser wan her sê firariyan de diniquwand. Bîna berateyan difûriya, mirî li kenarê her riyekê û di devê her şikeftê de ramedayî bûn. (r.16)

Wê rojê ji Ênis û Remo re mîna dojhê tê û li Sariqamişê hewayekî sar heye. Nalînên hevalên xwe li pey xwe dikişkişînin. Bi her awayî ve dinya û ew der ji wan re girtî û teng tê.

Ênis û Remo hêviyên xwe yên pêknehatî, Îranînên şikestina di şer de, dojeha wê roja sar li Sariqamişê û nalînên hevalê xwe yê Helebî li pey xwe dikişkişandin. Newal, şikeft, zixurên nava çiyên û tariya şeve sitara wan bû... (r.17)

Hem saleke nebaş ku wek dojhê tê ditîn hem jî mirov tîn xistin zindanan û êrîş tîn kirin li ser gundên Kurdan û mizgeft tîn şewitandin û hwd. Dîsa tê ditîn ku hem ji aliyê demê ve hem jî ji aliyê cihê ve girtîbûn û tengbûn derdikevin pêşiya me:

Saleke dojhê bû, zindana Akreyê ji zindaniyan tîn nedibû. Şaban Axa li Amêdiyê ser kişandibû, xelkên Berwara Bala, Doskî, Sindî, Kolî, li hember ingilîz û dûvikên wan ku piraniya wan ji êlên Tiyarî, Baz, Cêlo, Tixûma bûn, rabûbûn. Ji hemûyan bêhtir Tiyariyan êrîş dibirin ser gundên kurdan, mizgeft dişewitandin û kitêb diavêtin bîrên mizgeftan... (r.23)

Navê romanê rasterast navê mekanî ye. *Mijabad ji peyvên "Mij" û "Mahabad" pêk hatiye. Ji ser vê navê ku mijê wek sembol bikar tîne meriv dikare derheqê atmosfera nav romanê de şîroveyan bike. Mij rewşeke hewayê ye ku dişibe dûyê û derdor radipêçe. (Kaynar, 2020, s. 43) Wek ji navê romanê jî diyar dibe roman li ser bûyereke nexweş hatiye ava kirin. Ji navê romanê em dikarin li ser bûyeran hin tiştan pêderxînin. Ji ber atmosfereke nexweş Mehabad wek şarê mijê tê ditîn û navekî din li tê dayîn jê re Mijabad tê gotin:*

Mij e, mij xewna çiyê ye. Henasên zivistanê ye. Razên ku şev di guhên sibehan de dibêje, cewiyê baranê ye mij. Pêçiyên ewran in li ser têtên sîlara zivistanê. Mehabad jî weke ku keçeke tazî xwe bide ber sûlavekê, di nava mijê de ye. Dibêjin ‘ mehabad şarê mijê ye ‘, Mijabad e, ne tenê mija xwezayê, lê komara ku saz bûye bi xwe di nava mijê de digevize. (r.24)

Mijarên ku tê vegotin, taybetmendiyên demê, hêmanên sergûzeştê, şerên ku tên kirin û hwd. dibin sedema firehbûna erdnigariya romanên dirokî. Ev jî dibe sedema dijwariya erdnigarî û kêmasiyên têkiliyên cih û lehengê. (Karaca, 2016, s. 77) Ji qehra Ingilîzan xelk aligirê Hitlerê dibin. Alman û Ingilîz jî casus û sixurên xwe li deverê cih dikin. Ji tirsê wan xelk ditirse û baweriyên xwe nikarin bi yekê re bînin. Cihêkî teng û girtî xwe nişane me dide:

Wan salan kesî nediwêrînu baweriyê xwe bi her kesî bîne, casus û sixurên almanan li her deverê hebûn, yê ingilîzan jî bêhtir bûn, casûsek bihata girtin, di zindanan de dirizîya, tune jî dibû, piraniya kurdan alîgirê Hîtler bûn, ji qehra ingilîzan ji almanan hez dikirin. (r.39)

Atmosfera çayxaneyekî tê vegotin. Çayxane tijî ye û ji dûyê cixara kes kesî nabîne û deng li nav hev dikevin. Û wî rewşê leheng dişibîne şerekî:

Çayxane tijî bû, ji dûyê cixareyan kes kesî nedidît, te digot şerê eniya Sehraya Misrê ye, weke pêtageke hingiv deng li nav hev diketin. (r.43)

Her ku şev diçe tarîtir dibe û weke çayeke tîr li ser Mehabadê dirije. Li vir şibandin tê kirin. Ji vê hevokê tê fam kirin ku rewşa Mehabadê çiqas diçe xirabtir dibe:

Her ku şev diçe tarîtir dibe, weke çayeke tîr bi ser Mehabadê de dirije. Qutiya min a titûnê roniyêke xemgîn dide, bêriya tiliyên min kiriye (r.132)

Leheng di odeyekê piçûk de dimîne. Û her tiştê xwe li wê derê dike. Nikare xwe dirêj jî bike bi rûniştî dikeve xew. Leheng gelek dijwarî li wê odeyê dibîne. Ew ode hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê derûnnasî ve cihêkî teng û girtî ye:

Min termikên wan yê perçiqî di qelşên odeya piçûk de vedişartin (odeya razanê bû û min tê de dixwar û destava xwe jî lê dikir, min nikaribû xwe tê de dirêj bikira, hema rûniştî diketin xew, lê ew jî ne xew, weke xewa guran bi çavekî şiyar bûm û bi yekê radizam.(137)

Leheng li girtîxaneyê dimîne. Girtîxane ji ber ku azadiya mirovan ji destê wan digirin cihên girtî û teng in:

Girtîxaneya ku ez lê bûm, nêzîka çil kesî tê de dihewirîn, diz û talançî, mêrkuj û girtiyên namûsê, sextekar û komunîst û dindar û her cûre xelk hebûn. (r.142)

Leheng bi hevalên xwe re di çapxaneyê de dimînin û çapxane jê re wek çîlexaneyê tê. Û nêzî deh rojan ji wir dernakevin, ew der ji wan re dibe cihekî girtî û teng:

Ev deh roj in ez û Menaf û hejar û Hêmin ji çapxaneya Kurdistan dernakevin, weke ku em di çîlexaneyê de, kovar û rojname gelek dertên, lê yek berhema min ji tê de nayê weşandin. (r.171)

Leheng ji pencereyê dinêre. Şayesandina derveyê dike û dibêje tarî, bédeng û xemgîn e. bayê ku tev li nalînên kalkê wî dibe xwe ji çavên wî direvîne:

Di pencerêyê re li baxçeyê Gulistan dinêrim, tarî û bédeng e, xemgîn e, bayekî hênîk çuqlî û şaxên dar û deviyar dihejîne. Denge wî bayê hênîk tev li nalînên kalkê min dibe û xewê ji çavên min direvîne. (r.197-198)

Li gorî lehengê bayê Amêdiyê weke nalînan û hênasên evîndaran e, bayekî serxweş e bi şewat û xemgîn e:

Niha bayekî hênîk ji hela Şinoyê tê, na ev bayê nerm û hênîk ji Amêdiyê tê, ez bayê Amêdiyê nas dikim, weke nalînan û hênasên evîndaran e, bayekî serxweş e bi şewat û xemgîn e, (r.207)

Bi dîtîna werîsan tirs dikeve dilê lehengê û fam dike ku tiştên ne xweş li wê cihê pêk were. Cih jê re teng û girtî dibe:

Dema ez derbas bûm, min sê kodikênt jî zeyt dîtî, her qutiyek werîsektê de bû, ez behitîm û dîsa tirsê ez zefî kirim. (r.207)

Atmosfera ku leheng tê da dijî atmosfereke xemgîn e. Leheng cihê ku li dijî wek cihekî girtî û teng ji me re vedibêje:

Dîsa şev e, dîsa baran e, dîsa tenêti û ev rûpelên weke qadeke spî û dilê zarokê çend salî ne. Dîsa meye serê min girtiye û weke çemçikekê dîza xeyal û bîranînan tev dide. (r.222)

Bûyera Çarçira li ser derûnnasiya lehengê bandorê çêdike. Çarçira ji bo lehengê cihekî sehekî ye. Leheng ji Mehabadê dûr dikeve lê her der jê re Eynî tê, êdî dinya jê re dibe cihekî girtî û teng:

Dem weke avekê di ber wî re diherikî, roj û şev û sibe û êvar li ba wî bûbûn yek kat, Mehabad jî nema xuya dikir, winda bûbû, bi kû de diçû li sêdaran dilikumî û werîsên daleqiyayîbi wan ve didîtin, her der bûbû Çarçira û hemû dar bûbûn sêdar... (r.237)

Ji navê romanê wek tê fehm kirin di romanê de gelemperî cihên girtî û teng tên bi kar anîn. Ji Mehabadê re Mijabad tê gotin ji ber ku di atmosfera wê demê de rewşeke nebaş li ser welatan wek mijek dagirtiye. Loma di romanê de piranî cihên girtî û teng tên şayesandin. Di minaka dawî de jî em hesteke dibînin ku bajarek li ser mirovekî çiqas dikare bandorê bihêle. Piştî bûyera Çarçira lehengê me ji Mehabadê dûr dikeve. Ji ber bûyera ku li Çarçirayê diqewime êdî dinya tev ji lehengê re girî û teng tê.

7.1.1.3. Cihên Çandî

Li ser Dersîmê hin agahî tê dayîn di paragrafa jêr de li tiştê ku bala me dikşîne ew e ku li Dersîmê xelk li ser bi ava destnimêja Seyîd son dixwin. Ew agahî ji me re bûyereke çandî nîşan dide:

Ez ji Dersîmê me bira, te ev nav bihîstiye? Deriye zîv e lê teresan navê wê guherîne, kirine Tuncelî, binêre çawa zîv bi kîna xwe dikin tunç û sifr! Lê xwîna wê nehatiye guhertin, hîn xelk bi ava destnimêja Seyîd son dixwin, hîn hineya ku bûkan ji serê xwe strabû di kodikan de ye ziwa nebûye (r.40)

Li Amêdiyê keç û xort diçin ziyaretgahan û li wir diayan dikin ji weliyan û ji wan dixwazin ku miradên dilên wan pêk bînin. Ziyaretgah cihên olî ne lê tevgerên ku gel dike tevgereke çandî ne. Diçin ava şor vedixwin û tî radizin da ku di xewnê de dîlber û evîndarên xwe bibinin:

Berî çend rojan min dilê Mûjdeyê hiştibû, ew diçû ziyareta çakên Mehabadê (li vir ji ziyaretgehan re dibêjin Çak). Wê yek nehişt ku neçûyê, çakî Qolqula, çakî Babexelîfe, çakî Çikole, çakî Xezayî, tê bîra min, li Amêdiyê keç û xort diçûne ziyaretgehan û dua dikirin ji weliyan dixwestin miradên dilan pêk bînin, yek caran jî keç û xortan ava şor vedixwarin û tî radizan ku da ku di xewnê de dîlber û evîndarên xwe nas bikin... (r.127)

Di paragrafa jêr de nivîskar adetên Behdiniyan û Kurdên mayî vedibêje. Bi çêbûna zarokên wan çandêke wan derdikeve pêş, navika zarokan bi çi şiklê bibirin wiha bawer dikin ku di pêşerojê de zarok jiyanêke li gorî wê bijî:

Îroj kurekî Mele Mistefa hate dinyayê, ji ber ku di roja îne ya pîroz û di meha Remezanê de çêbû, navê wî kirin Mes'ûd, ango xwedan bext û behremend, navika wî jî –weha tê gotin- dayeye bi xencera bavê wî birrî, ji adetên behdiniyan û kurdên mayî ye ku zarokêkî wan dibe, navika wî bi amerîkî dibirrin, eger bi şûr yanxencer an kêrêbe, ew lawik şervan û egîd derdikeve, eger bi serê qelemekê be, xwendewan û edebdost derdikeve û her weha, navika wî bi çi were birrîn wê di dahatuyê de di wî babetî de şareza be. (r.188)

Ji hevoka jêr fehm dikin ku roja yekşemê Ermen naçin kar ji ber ku ew roj ji bo wan rojêke olî ye û nişaneyê çandêke ye:

Kenekî din da ser û werisê di nav destê xwe de avête pişt xwe û got: ‘mamosteyê nezan! Kengî Ermen yekşemê diçin kar!’ (r.192)

Cejna Remezanê cejneke olî ye. Lê pîrozkirina cejnê li gorî herêman diguhere. Em bi şiklê pîrozkirina cejnê di derheqê çanda gel de jî agahdar dibin:

Min nizanibû ez dê rojên cejna Remezanê de li nexweşxaneyekê bim! Xelk bi kêf li kolanan diçin û tîn, îro kolana Pehlewî ya ku nexweşxane lê ye ji zarokan dagirtî bû, bi kincên xwe yên rengareng digeriyan û dilîstin, gelo li Mehabadê cejn çawa derbas dibe? (r.197)

Di romanê de gelek cihên çandî tîn dîtin. Di romanê qala jiyana bajarekî tê kirin loma jî di derheqê jiyana wan de jî agahî tîn dayîn. Ji vê sedemê hin çandên wê demê jî tîn vegotin û bi vegotina çandan ve têtîliya wan ya bi cihanê ve cihên çandî derdikevin holê.

7.1.1.4. Cihên Olî

Mizgefta Ebbas Axa bê teswîr tenê bi navê xwe di vê beşe de derbas dibe:

Denge azanê ji Mizgefta Ebbas Axa bilind dibû. (r.27)

Li Amêdiyê keç û xort diçin ziyaretgahan û li wir diayan dikin ji weliyan û ji wan dixwazin ku miradên dilên wan pêk bên:

Berî çend rojan min dilê Mûjdeyê hiştibû, ew diçû ziyareta çakên Mehabadê (li vir ji ziyaretgehan re dibêjin Çak). Wê yek nehişt ku neçûyê, çakî Qolqula, çakî Babexelîfe, çakî Çikole, çakî Xezayî, tê bîra min, li Amêdiyê keç û xort diçûne ziyaretgehan û dua dikirin ji welîyan dixwestin miradên dilan pêk bînin, yek caran jî keç û xortan ava şor vedixwarin û tî radizan ku da ku di xewnê de dîlber û evîndarên xwe nas bikin... (r.127)

Meha Remezanê meheke olî ye û li Mehabadê jî dema ku meha Remazanê tê meyxane tên girtin û cihekî olî ji bo vê mehê tê saz kirin:

Mehabadî xwe ji meha Remezanê re amade dikin, bêguman wê meyxaneyê Agop jî mehekê sax were girtin, îcar divê çend şûşeyan bi dest bixim an jî her şev herim mala Xanim û Sultanê li kûçey Cûlekan. (r.179)

Tevgerê olî di hevoka jêr de derdikeve pêşîya me. Gel ji bo nimêja terawîhan diçin mizgeftê:

Şeva îne bû û dengê mizgeftan li hev vedigeriyan, xelk bi zikên têr û devên bi cixare, bi qeflan ji malan derdiketin û berê xwe didan nimêja terawîhan (r.182)

Adeteke bi girêdayî olî li jêr derdikeve pêşîya me dema zarokek çêdibe di guhên wî de azan tê xwendin. Û ji mizgeftên Mehabadê dengê azanê bilind dibe di eynî demê de:

Ji adetan e ku zarokek nû çêdibe jî, yek di guhê wî de azan dide, lê kêlîka ku Mes'ûd welidî, ji mizgeftên Mehabadê hemûyan dengê azanê bilind bû. (r.188)

Dîsa Mizgefta Ebbas Axa bi navê xwe derbas dibe ji bilî dengê Meleyê mizgeftê ti teswîr nayê kirin:

Wa ye meleyê mizgefta Ebbas Axa azana mexribê bi denge xwe yê nexweş hildide, êdî mehabadî li malen xwe, li dora xwarinê civiyane. (r.192)

Ji hevoka jêr fehm dikin ku roja yekşemê Ermen naçin kar ji ber ku ew roj ji bo wan rojeke olî ye:

Kenekî din da ser û werisê di nav destê xwe de avête pişt xwe û got: ‘mamosteyê nezan! Kengî Ermen yekşemê diçin kar!’ (r.192)

Cejna Remezanê, cejneke olî ye û ji aliyê gel we tê pîroz kirin:

Min nizanibû ez dê rojên cejna Remezanê de li nexweşxaneyê bim! Xelk bi kêf li kolanan diçin û tîn, îro kolana Pehlewî ya ku nexweşxane lê ye ji zarokan dagirtî bû, bi kincên xwe yên rengareng digeriyan û dilîstin, gelo li Mehabadê cejn çawa derbas dibe? (r.197)

Cihên olî bi cihên çandî re gelemperî eleqedar in di romanê de jî ew tişt gelek caran tê dîtin. Carinan di şayesandineke mizgefteke de cihên olî tîn nişandan carinan çandeke Ermeniyan ve bi awayekî ne rasterast cihekî olî tê vegotin

7.1.1.5. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Di navbera romanên dirokî û romanên modern de hin cudahî hene. Ji ber ku romannivîsên ku romanên dirokî dinivîsinin bûyerê di vê demê de nabînin, hin tiştan jî xeyalên xwe saz dikin. Loma divê romannivîsên dirokî zêdetir li ser cihê, bi dîqet bin. (Karaca, 2016, s. 76) Di rûpela 17 an de Romannivîs atmosfereke piçûk saz dike:

Sûreke reş, minareyên bejinzirav xuya dibûn û çemekî weke zendeki spî bajar hemêz kiribû. (r.17)

Dengê firoşkarekî li bazarê bilind dibe. Firoşkar ji gelek cihan tişt anîne û difroşin. Xelk jî bi hesret li wan tiştan dinêre li nikarin bikin:

Kulavên Xorasanê, hibriyên Mûsilê, kile Hicazê, kildanên Hindê, neynikên bûkan, titûna Koyê (Koyseceq), hevrişim, xaliçeyên Helebçeyê, şalen Dihokê, malen baş û erzan.

Dengê Mûsilî ku malê xwe di koşeyê qeyseriya Amêdiyê de raxistibû, bilind dibû. Xelkê bi hesret û axîn li wan tiştan temaşê dikir, jin li ber radiwestiyan, texnekî diman û diçûn. (r.19)

Di paragrafa jêr de nivîskar hezîrana sala 1919an teswîr dike. Atmosfereke nexweş derdikeve pêşiya me di vê salê de:

Berbangê hijdehê hezîranê ta sala 1919 an bû, ingilîz weke kunemoza ku agir pêkeve, har bûbûn. Leşkerên Bormayê mîna pezkoviyan bi zinarên Derbendî Bazîyan ve hildiperikin, Mişîr Heme Silêmanê Hemawend dabû pêşiya hêzeke ingilîzan û berî dabû kozika ku Şêx Mehmûd tê de bi cih bûbû. (r.22)

Li bajarê bihar zû tê. Bi hatina biharê ve berf dihele kulîlk ji bin berfê serê xwe derdixin û mizgîniya biharê didin û gelek tiştên wilo di atmosfera paragrafa jêr de derdikevin pêşiya me:

Rojeke xweş bû, ji nêva biharê xwe vedizî bû û hatibû serdana vê sibatoka sar. Berf qeto qeto li serê çiyayên Xezayê, Qûlqulax, Daşa Mecîd, weke bîranînên min xuya dikirin, çend kulîlkên helekokê di bin berfa bişaftî de serê xwe hildabûn, mizgîniya biharê didan, nameyên bihareke zû bûn ew kulîlk... (r.29)

Li jêr atmosfera pêşiya meyxaneyê Agop tê vegotin. Hin kes diçin bereberê, hin kes diçin terzîyê û hin kes di bin çavan li meyxaneyê dinêrin û rûyê xwe tîrş dikin. Atmosfer bi vê şiklî didome:

Bavekî bi destê kurê xwe girtiye û wî dibe berber, yek bi kurê xwe re derbasî ba terziyekî dibe, pîrr kes di ber meyxaneyê Aqop re derbas dibin, di bin çavan re li şûşeyên mişt şoreş û dînbûn dinêrin, rûyê xwe tîrş dikin û dilezînin, siwarekî ji xwe razî di meydana Çarçira re dibûre, qirpeqirbe simên hespa wî, şal û şapikên wî, rêşiyên ku ji kolosê wî dawerivîne... (r.30)

Li Silêmanî atmosfereke netewî çêdibe. Fikra netewî êdî geş dibe. Bûyerên berê hin ne hatiye jibîr kirin lê tevgerek li ber destpêkirinê ye:

Silêmanî weke dîzeke li ser agirê fikreke netewî dikeliya, hîn bîna barûdê ji zinarên Taşlûce û Derbendî Bazîyan dihat, hîn xwîn şil bû li ser wan zinaran (r.38)

Ji qehra Ingilîzan xelk aligirê Hitler dibin. Alman û Ingilîz jî sixurên xwe li deverê cih dikin. Ji tîrsa wan xelk ditirse û baweriyên xwe nikarin bi yekî re bînin. Cihêkî teng û girtî û atmosfereke nexweş di paragrafa jêr de derdikeve pêşiya me:

Wan salan kesî nediwêrinû bawerîya xwe bi her kesî bîne, casus û sixurên almanan li her deverê hebûn, yê ingilîzan jî bêhtir bûn, casûsek bihata girtin, di zindanan de diriziya, tune jî dibû, piraniya kurdan aligirê Hîtler bûn, ji qehra ingilîzan ji almanan hez dikirin. (r.39)

Ji agahiyên jêr en dibînin ku li Silêmanî atmosfereke ne xweş heye xelkê Silêmanî ji Badîniyan hez nakin:

Ez li Silêmaniyê xerîb bûm, ji min nefret dikirin xelkê, zimanê min fêm nedikirin, digotîne min: ‘Badîniyo kurmanco!’ Herkes li serê min bûbû Mîr Miheme Korê

Rewandizî, lê Heme Reşîd ne weke wan bû, me ji hevdû fêm jî dikir, gelo ev xemgînê han kî ye? (r.40)

Leheng atmosfera bajarê Dêrsîmê vedibêje. Li Dêrsîmê xort tèn kuştin û gelek cih tèn şewitandin. Leheng bi vê tiştê pir xemgîn dibe û dixwaze bûyerên ku çêbûne bîne ziman. Bi şayesandineke dirêj atmosferê dixwaze li ber çavan bide xuya kirin:

Berî du salan bû bira Dêrsîm serxweş bûbû, xwinê di rehên xortên wan de dîlan dikir, çiyayê hev ji xewa ezê radikirin, dîrokê xefkên xwe veda bûn, lingên kor bi hezaran tê wer bûn, çî xefkên xweşik bûn bira, rêl û daristan, newal, dil û hinav, bi hev re sotin, agir bi çiyayê Dêrsîmê ket, Elî Şêr nas dikî bira? Rayber serê wî hilqetand weke ku zêbeşekî ki lemê hilkê, seriye bê gewde di bin çenge Rayber de bû... (r.41)

Keçik û bûkên Dêrsîmê porê xwe hine kiribûn: " em serê xwe naşon heta Seyid Riza destûrê bide." Lê wî destûr neda, sedan keç avêtin çemê Munzirê, heta mehekê hineya bişaftî çem reş kiribû, desmalên bûkan li newalan weke qulingan bi bayê kurr re mêl dibûn, wan desmalên bi hine, xwe li daran digerandin... (r.41)

Li Silêmanî berf dibare û bêdengiyek heye. Leheng bi wan agahiyan dest pê dika piştî atmosfera Silêmanî derbasî atmosfera odeya xwe dibe:

Wê şeve berfeke fediyok dibariya, şeqamên Silêmaniyê bêdeng bûn, di odeya xwe ya piçûk de rûniştibûm, guhê min li derî bû, çavên min jî li kolana weke rûpelên nivîskarekî tembel bû, saeta Serkisof a bavê min Ji Qersê bi xwe anîbû neh tamam digot... (r.44)

Dîsa bi atmosfera bajarê tê dest pê kirin ji bajarê jî derbasî atmosfera Ewropa dibe. Ewropa di bin lepên Hitlerê de perçiqiyaye:

Dojeh dibawêşkiya wê mehê, ji german tilûr jî ezmanana dêweşiyay. Ne tenê hejîr û tû, dil jî stewiya bûn, Ewropa jî wekek hirmiyekê di lepên Hitler de perçiqîbû, nakokiyên di navbera herdu baskên Hîwa de Kûrtir bûbûn. (r.49)

Leheng dema ku digihije cihên ku diçe, dest bi şayesandina atmosfera wê derê dika:

Piştî meşa saetekê em gihane wir, qewan û beybûn û endekoyan di wê germe de govend gerandibûn, gelek kulîlk ji qelşên zinaran derketibûn û li hawîrdor dinihêrîn,

hîn bîna barûdê ji zinaran dihat, bîna titûna ku di wê cengê de hatibû sotin ji axê difûriya... (r.49)

Di paraprafa jêr de derdor tê şayesandin. Di ezmaneke zelal de çivîk distrin û bayeke heye şev pê dizûre, bi wan şayesandinan atmosfereke tê saz kirin:

Ezman zelal bûye, komek çivîk li ser kevîkên rût yên dîwarê hewşê bi awazên nizm distirên, bayê kurr yê ku bi şev pê de dizûriya, ewrek li ezman nehişt, tenê rûpelên berfê li ser dîwaran xilmaş bûne, termen deh cixareyan di xwelîdankê de rêz bûne, min çîroka jaleyê neqedand, ma diqede hilatîna rojê? (r.52)

Di paragrafa jêr de jî cihê Stûdyoya Nûbar tê gotin û hin teswîrên biçûk tînin kirin:

Stûdyoya Nûbar, di Qeyseriyê de, li pişt Meydanî Asingeran e, qarmeyeke reş, zingarî li ser e, bi tîpên farisî û ermenî Ekkasî Wan hatiye kolan. Di camekê de fotoyekî Pêşewa, bi riya xwe ta sivik xuya dikir, ez gelek caran di ber re derbas bûbûm, lê min bala xwe nedabûye, tu carî nehatibû bîra min jî ez fotoyê xwe bikişînim li tenîşt studio... (r.52-53)

Di derheqê dema Sariqamêşê û şerê duyem ya cihanê de gelek agahî tînin dayîn di çend rûpelan de em bi wan agahiyan atmosferê wê demê li ber çavên xwe zindî dikin. Ji bajarên Tirkiyeyê bigirin heta atmosfera Ewropayê di wan rûpelan de derdikevin pêşiya me:

Dema Enwer Paşa di şerê Sariqamîşê de şikest, leşkerên wî bûne weke stêrkên ku roj li wan hîle, her yek bi deverekê de çû, berî wê jî serbazên ermen hemû reviyabûn û xwe teslîmî artêşa Rûsyayê kiribûn, osmaniyan bi xwe di dawîya şer de ew diavêtin deren asê û zor... (r.55)

Artêşa Rûsyayê weke gêrikên ji mûristaneke baran bi ser de hatibe, ji bakur dikişiyar, berê wan li Erzoromê bû, leşkerên osmanî jî li nêzik Sariqamîşê, bendewariya qedera xwe ya reş dikirin, ji serma diranên wan nedihatî ser hev, berfê gîr ji erde girtibû, bela xwe di xwezayê dida ... (r.55)

Piştî ku ez tev li rûsan bûm, min bawer nedikir em derbasî Wanê bibin, qirçe-qirça parsûyên bajar û gundan bû di bin cizmeyên rûsan de, (egerosmaniyan parsû ji wan re hêlabin) Qers, Trabzon, Erzîncan, Mûş, Bedlîs û gundikên wan, weke meyweyên helîsî diketin... (r.58)

Lê kesî nedikarî bi dagirkirina Berlînê bawer nekira. Artêşa Sor weke hirçên Sîbîryayê Êrîşî Şêrnişîna naziyan kirin, das û çakûç kete dewsa xaça çiviyayî û simurxê bask vegirtî û pençetûj, stalîn dû ji qelûna xwe berda, destê xwe di nava du bişkoka re li ser dilê xwe yê hesinî danî û li rojava nihêrî... (r.62)

Atmosfera çayxaneyek li jêr tê vegotin:

Weke her carê çayxane mişt bû, rojê ne kêmi çewalek titûna gundê Şawerê dihate sotin, pê re gelek keser jî ji devên bêdeng weke refên qulingan difiriyan, düyê xelek xelekî ber bi banê tenîgirtî ve bilind dibû, her xwelîdankek termen neh deh cixareyan tê de ramedandî bûn. (r.63)

Leheng ji nivîsandinê diweste û bi westandina xwe dest bi şayesandina atmosferê dike:

Ez westiyame, pêçiyên min ji nivîsandinê diarîn, ez dibêjim hindik maye movikên wan ji hev bikevin, esman karasê xwe yê tarî û bi stêrkan xamilandî ji xwe dişeqitîne, kirasekî lacewerdî li xwe dike, reng di vê berbangê de têne guhertin, weke siyasetan kê gotiye esman bi xwe jî ne siyasetmedarek e! (r.70)

Dîsa atmosfera şer di beşa jêr de tê vegotin:

Du sal buhurîn û cen ranewestiya, li ezmanan balafitên Stuka yên almanî, B17, B25 yên amerîkî, Lancasterên ingilîzî, Zeroyên japonî, bi milyonan jinbî û sêwî li erde diçandin. Rûsya û Ingiltere ji xwe re Îran weke zebeşekî parçe kirin, almanan jî bi devgirêzî li petrola Rojhilat dinêrîn, guhên xelkê weke paçikan di radyoyan ve hatibûn dirûtin, dilê min jî le ber bayê Bexdayê dihejiya. (r.70)

Di beşa jêr de ji lehengê re nameyek tê. Nameyeke sar e lê dîsa leheng bi vê nameye kêfxweş dibe û nameye dişibîne gelek tiştan:

Çi nameyeke sar! Lê dîsa dilê min vexist, şepol û pêlên ku aram bûn, bi yek carî di dilê min de kirin xumexum, ez dişewîtîm, agir bi giyanê min ketibû, Jale behsa Reşîdê Geylanî dike! Ka evîn? Ka ez ji te hez dikim? Nameyeke weke qeşayê sar, weke kevîrekî ziwa û hişk, bêhest û bêdil! Nameyeke kerr weke goreke wêran, lal mîna şevên serê çiyên. (r.71)

Şayesandina jêr tenê ji bo nişandana atmosferê tê bikaranîn:

Roj mîna daneyeke sor, ji milwanka aso kete pişt çiyayê Lendî Şêxan, kenarên ewran weke balindeyên efsaneyi baskên xwe weke terîşên agir li rojava vegirtûbûn, li herdu rexên şeqamên ku Çarçira dilê wan e, xelk weke rêzikên mûriyan diherijîn Merkezî Ferhengê... (r.72)

Bi agahî jêr em dibînin ku li Mehabadê atmosfereke tund heye keç û xort bi rehetî nikarin bi hevdû re bigerin:

Bibûre lê rûnştina te li rex Mujde ne durust bû! Tu dizanî ev Mehabad e û keç û xort ne ewqasî serbest in, hûn jî ne tiştêkî hev in. (r.73)

Atmofereke piçûk li jêr derdikeve pêşiya me:

Şapên berfê ji lûtkeyê efsaneyi diqetiyên û dihatin xwarê, bi gurmîneke weke ya tava nîsanê digindirîn. (r.75)

Bi meha Pûşperê re em tevgerên paleyên Helebçeyê dibînin. Paşê atmosfera cihanî tê vegotin. Ingîlîz destên xwe dîsa dixê qirika bajaran û Şêx Mehmûd vedigere Silêmanî:

Hezîran nû ji dara salê weşiya bû, paleyên deşta Helebçeyê, êdî komkirina sapên genim jî qedandibûn, pirêze dihatin şewitandin û di hinan de keriyên pez diçêriyan. Reşîdê Geylanî ji Bexdayê reviya Almaniyayê, ingilîzan dîsa destên xwe xistin qirika wan bajar û gundan, dîsa Şêx Mehmûd berê xwe da Silêmaniyê, şerek bû li şêrgeha xwe vejeriya. (r.77)

Êvar e û leheng li odê xwe rûniştîye û atmosfera derdora xwe ji me re vedibêje:

Êvar e... stêrk dilizîn, ez li ber pencereya xwe ya bi ser hewşê de vekirî rûniştîme, bayê ku weke dizan xwe li pencereye dide, perdeya etlesê şîn direqisîne, herdu enîşkên min, şopa xwe li ser maseya ji darê berrûyan kolane, di qunceki odeya min de, textê razana min e, palgehek ji perîkên deh dikên qurre... (r.81)

Ji mehan Avrêl e. Bayekî hênîk heye ew jî xewa lehengê tîne:

Xewa min li ber vî bayê hênîk tê, dengê hat, ez guman dikim tabloya min a nîvco ket, hîv weke guhanê çêlekekê xuya dike. tiliyên şeve yên reş ronîya wê didoşin, bayê Nîsanê xew mintîne, bibore(r.85)

Rojekê îne ye û leheng dibêje ku mar çermê xwe di vê rojê de diguherin. Xwezayê dişibîne wê rojê:

*Rojekê îne bû, gelo tu dizanî di wê rojê de, mar çermê xwe yê kevn diguherin?
Wê rojê xweza bi xwe bûbû marek û çermê xwe diguhert! (r.87)*

Li Mehabadê ewrên reş kom dibin. Leheng dibêje heta wê rojê ewrên wiha reş neditîne. Û baran dest pê dike û bi baranê re vegotina atmosferê tê domandin:

Ji nişkê ve ewrên reş ji aliyê rojhilat ve xuya bûn, reş bûn weke minalek teniyê di rûyê xwe bide, min ewrên wisa reş neditîbûn, tavan kire reqereqû birûsk har bûn, te digot ezmanê Mehabadê dîn bûye, dihat ku were xwarê, zarok bi kêf derketin pehnavên malen xwe yên kelpîçî, çelçelpa lingên wan yên xwas bûn... (r.87)

Bi paragrafeke dirêj leheng atmosfera odeya xwe vedibêje. Kitêbên wî rêzkirî ne. Leheng yek bi yek kitêbên xwe dide nasandin:

Niha ez li odeya xwe me, kitêbên min weke serbazên yekîneyeke leşkeri li dû hev rêz bûne û bêdeng in, lê her yek hawareke nihênî di wan de ye, dîwana Wefayî ya ku xetên Qadirê Muderrisî, dîwana Herîq, ya Edeb ku Beşîr Mişîrê terzî di sala 1939 an de li Bexdayê çap kiribû, hejmareke kovara Niştîman (tiştê ecêb we e ku sembola Komeley Jiyanewey Kurd bi tîpên Latînî ne JK ew di nîva rojekê de hatine resimkirin û bi ayeteke Qur'anê xemîlandiye)... (r.106)

Dîsa atmosfereke piçûk derdikeve pêşiya me û ev atmosfer bi hevokerê hatiye çêkirin:

Asoya rojava sor bûbû, ewrên sêwî roj hembêz dikirin, rojê jî weke ku nedixest li wan serbazên dîl binêre bilez berda pişt çiyê. (r.119)

Leheng ji pencereya rojhilatê ya odeyê dinêre. Êvar e. Darên Mehabadê tev şîn bûne lê tenê dara lehengî hişk maye:

Di pencereya rojhilat re dêliya tirî xuya dike, roniya hîva çardehşevî bi ser de weke mûmeke heliyayî herikiye, dareke bi saw e, şaxên wê razên efsaneyî di xwe de vedişêrin, darên Mehabadê hemî şîn hatine û kulîlkên wan teqiyane, dara min tenê bi biharê nehesiyaye!... (r.132)

Atmosfera cîhanê hatiye guhertin. Hîtler xwe kuştîye. Generalekî ingilîzî hêzên Iraqî û Ingilîzî kom dike bi ser herêma Barzan de dimeşe:

Êdî payîzê li dergehê xwezayê dixist, dilê me de jî teqîna biharê bû, xeber giha me ku general Rentonê ingilîzî yê lepqut bi xwe serekiya hêzên iraqî û ingilîzî dike û

leşkerekî giran diajo herêma Barzan, bîna cengeke nebûyî dihat. Êdî cenga cihanî rawestiyabû, Hîtler xwe kuştibû... (r.150)

Atmosfereke trajik derdikeve pêşiya me di paragrafa jêr de. Baran dibare gel kom dibe û xatir ji xaka xwe dixwaze. Gundên wan wêran bûne ew jî koç dikin:

Baran bû, em li Kêlê Şînê kom bûbûn û êdî me bi dil xatir ji xaka xwe dixwest, pîr û kal û jin û zarok rêzeke weke ya mûriyan di xaçerêkên wan çiyayên de çêkiribûn, hemiyên li rojavayê dinêrîn, li wan gundên xwe yê wêran û nedihatî dinêrîn. (r.170)

Hêdî hêdî êvar dibe li Mehabadê. Leheng jî bi Emîral Axa re diçe mala wî û şayesandina mala wî dike:

Êdî tarî dibawîşkî û Mehabad di reşahiya şeveke bêdeng de digevizî. Min nedixwest kes min bi Emîral Axa re bibîne, xelk baqil û dînekî bi hev re qebûl nakin. Mala wî di dawîya kolana Pehlewî de bû, dîwarên hewşa wî hemî şil bûn û te digot qey gemiyek di nivê behrê de te ew hewş... (r.176)

Meha tebaxê ye. Şer êdî qediyaye. Dinya di navbera Rusya û Amerîka de hatiye parve kirin. Li Japonyayê 2 bombeyên atomî teqiyaye û sedhezaran kes miriye:

Yekê tebaxê ye, ev meha rûreş û germ meha ku tê de par şerê cîhanê rawestiya û Rusya û Amerîka bi ser ketin û dinya ji hev parve kirin! di vê mehê de du bombeyên atomî bi ser du bajarên japonî de hatin barandin. Dibêjin sedhezaran kes di cih de mirin. (r.181)

Êvar dibe û ji bilî çend peşmergeyan li kolanan kes namîne. Ew pêşmerge jî cixareyan dikşînin. Bi vî şiklî atmosfera êvara bajarê tê vegotin:

Roj çû ava û pêjna kesekî nema ji kolanan hat, tenê çend pêşmerge bi payebûn û serbilindî li koşeyekê rawestiyabûn û duyê cixareyên wan digiha meydana Çarçirayê, te digot qey gîr ji wan cixareyên ziravik girtine û wan bi kerb û kîn dişewîtînin. Xuya ye ku wan bawer nedikir roj wê têkeve pişt çiyê da ku cixareyên xwe vêxin... (r.181)

Meha Remazanê ye xelk radibe paşîvê, çirayên malan yek bi yek vedikevin, leheng jî diçe odeya xwe û dibîne ku rûpelên spî li ser masê ne û dest bi nivîsandinê dike:

Êdî çirayên malan yek bi yek vediketin, Mehabadî radibûn paşîvê, çend sirsirkan bi dijwarî bêdengiya şevê weke goleke rawestiyayî diçelqandin, ez ji kêmxewiyê dihatim ku ji qama xwe bikevim, lê kêlîka ku ketim odeya xwe û min rûpelên spî raxistî li ser maseya xwe dîtin, çivîkên xewê firriyan û min nivîsî (r.184)

Leheng atmosfera mala Hejar ya dema fitarê vedibêje:

Li mala Hejar, li taxa Rizgeyî, her cûre xwarin hate danîn, ava bire ya sar, dewê meşke, meyweyên li ber bayê hênîk û di pencereyan de û xwarinên rengareng rêzkiyê bûn, hîn roj neçûbû ava, hemûyan ni dilbijandin li xwarinê dinihêrîn û li setên di destên xwe de jî yên ku tîketika wan pirr giran bûbû... (r.188-189)

Leheng diçe Baxî Şêxî yê li Başûrê Mehabadê. Atmosfera wê derê teswîr dike:

Ez îro çûme Baxî Şêxî yê li başûrê Mehabadê. Xelk li wir civiya bûn, ji Gereki Hermeniyân û Serpilûsk û Pişqela û Gereki Hacihesen û Wênetan û Kûçey Cûlekan û kolan û taxên dî bi qeflan dihatin, him ji ber germê him jî ji ber rojiyê û tîbûna bêsinor bazdidan... (r.191)

Li gorî lehengê bajarek li cihanê pesnê xweşî û pîrbûna bax û seyrangehan xwe bike, divê ew Mehabad be. Bi wan gotinan leheng dest bi vegotina atmosfera Mehabadê dike:

Eger bajarek li cihanê pesnê xweşî û pîrbûna bax û seyrangehan xwe bike, bêguman ew Mehabad e, hemû dar û gul û geya û av û hênkayî ne, tu dibêjî qetek ji bihiştê ye Xwedê ew li erdê ji bîr kiriye, lê wan bax û seyrangehan mûyekî dilê min rihet nekirine, ez nizanim bela min çi ye van rojan!

Li qeyseriyê xelk diçûn û dihatin, ji ber ku gelekî germ e û qeyserî jî sergirtî ye, xelk rûniştibûn û hin ji wan di xew de, tî û birçî li hêviya denge azanê bûn. (r.192)

Leheng ji nexweşxaneyê derdikeve û dixwaze li Tewrêzê bigere. Leheng Tewrêzê dişibîne bajarên Rûsyayê. Lewra pîraniya xelkê bi rûsî diaxifin û wêneyên Stalîne li her derê ye. Nivîsên Rûsî li ser dîwaran û alên sor û neqşên das û çakuçan li her deverê ye. Atmosfera Tewrêzê bi vî şiklî ji lehengê re tê vegotin:

Êvarê ez ji nexweşxaneyê derketim û hinekî li navenda Tewrêzê geriyam, tu dibêjî qey li bajarekî Rûsyayê yî! Pîraniya xelkê, bi rûsî diaxivîn, nizanim rûs in yan na?

Wêneyên Stalîn li her koşe û mehelle û zikakê daliqandî ne, nivîsên rûsî li ser dîwaran û alên sorû neqşên das û çakuçan li her deverê ne... (r.200-201)

Dîsa bi hevokek atmosferek tê saz kirin:

Bayekî nermik li derve pêlên çinar û şengebiyên baxçeyê Gulîstanê diwerandin. (r.202)

Di hevoka jêr de atmosfera cejna Remezanê tê şayesandin:

Berî çend rojan cejna Remezanê bû, xelk bi cilên xwe yên rengîn û devên li ken çûbûne seyrangehên Baxî Sise û Kanî Mam Wenberan û Lalebas û yên dî (r.207)

Li Mehabadê havîn diqede û payîz xwe ji germa havînê xilas dike. Hêdî hêdî hênik dibe dinya. Zarok ji dibistanê derdikevin vedigerin malen xwe hin ji wan jî li serê kolanan dilîzîn. Bi van şayesandina atmosferê dest bi bûyerê tê kirin:

Êdî payîzê şerê xwe yê bi havîna germ û dogehî re bi dawî anîbû û bi ser ketibû, dinya hênik bûbû û roj kin bûbûn, ewrên spî û tenik û dûr ezmanê Mehabadê yê şîn dixemalandin, berî nîvro, qutabî bi kêf ji dibistanan vedigeriyan mal, gelek ji wan bi bazdan berê xwe didane malen xwe, hin ji wan jî li serê kolanan rawestiyabûn û dilîstin, ez û Hejar û Hêmin hinekî li qeyseriyê geriyan... (r.209)

Li bajarê Şikakî zêde nemane, atmosfera bajarê diguhere. Hinek ji wan dixwazin li wir bimînin lê piraniyan çûne warên xwe:

Ji kerîmê Şikakî nameyek kete destê min, siwarên şikakan êdî kêma li vir tîn xuyakirin, çendek dixwazin bi Barzanî re bimînin û hinek ji wan jî ji keçen mehabadiyan zewicîne û bêgav mane ku li vir bimînin, wekî din hemî Şikakî çûne warê xwe... (r.225)

Roman ji ber ku romaneke bûyerî ye û bi armanca vegotina demeke dîrokî tê kirin loma jî cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin gelek hatine vegotin. Ji bo nişaneyê û têkiliya di navbera xwîner û romanê de were çêkirin atmosfera wê demê bi cihên fizîkî re gelek caran tê nişandan.

7.1.1.6. Cihên Ûtopîk

Leheng bi ken ji çayxaneyê derdikeve û bi kêfxweşiya xwe cihekî ûtopîk diafirîne. Li gorî leheng ji keran bigirin heta dar û ber jî dikenin:

Ez û Kerîm bi ken ji çayxaneyê derketin, çi binêrin! Tu li kê rast têtî dikene, kenekî ne asayî bû, heta kerên gundiyan ku hatibûn sûkê jî dikenyan û diranên wan qîç dikirin. Dikandar, minalên cil qerpolî yên li serê zikakan dilîstin, pêşmerge, siwarên hespan, jinên di bin çadirên reş de, dar û ber jî dikenyan... (r.103-104)

Hevoka jor wek cihekî fantastik jî dibe ku were dîtin lê me di bin beşa Ûtopîk de bi kar anî. Lewra ew hevok bi hesreta hin tiştan ji aliyê leheng ve tê afirandin.

7.1.1.7. Cihên Fantastik

Bi qêrîna mizgînê re stêrka sibê dilerize. Tiştên wiha di jiyana rasteqîn de dernakevin peşiya me di film û pirtûkên fantastîk de ew tişt çê dibin:

Bi qêrîna mizgînê re stêrka sibê lerizî û di nav şewqa rojê de winda bû. (r.14)

Di helbest û perçaya binî de teşhîs tê kirin. Hin tiştên taybet yên mirovan bi ewran re tên bikaranîn:

Ewr strana baranê dibêjin

Weke bîranînên salên mijokî

Yên her ku dûrî me diçin, şêrîntir dibin.

Bi evîndarî dibare, bi xurtî dibare, bêşerm dibare. Ewr in û helbestên xwe yên hovane dirêjin ser rûpelên zeviyên tî, gelo çit ê bîra van ewran heta ku razên xwe tev de di guhên vî şarê xilmaş de dibêjin? (r.23)

Bi mirina Simko Axa ji darên Şîno, Ormiye, Selmas û Xoyê nalîn tên. Her kes dengê spîndaran dibihîse û hwd. di paragrafa jêr de derbas dibin. Nalînên daran tune ye heke hebe jî mirov dengê wan nabîhisin ji bo mezinbûna bûyerê û giraniya mirina Simko Axa nîşan bide nivîskar cihekî fantastîk diafirîne:

Dema ku Simko Axa kuştin, nalîneke weke barebara karikên şîr ji darên Şîno, Ormiye, Selmas û Xoyê hat, her kesî giriyê spîndaran bihîst, hinar û sêvan wê salê ber negirtin. Berû di darên xwe de teqiyên, tê hêsrên daran dîtine Badîn? Berbangê here li ber darekêraweste, stranekê bibilîne, wê dar şaxên xwe daweriwîne û bergên wê weke çavên minalan şil bibin... (r.33-34)

Tiliyên ba tunene ku karibe dirêjî dêliya tirî bike û kirasê berfê ji ser şaxên wê yên rût bişeqitîne û zinayê bike. Romannivîs bi daxwaza nivîseke wêjeyî taybetmendiyên mirovan dide ba û cihekî fantastîk ava dike:

Bayê kurr tiliyên xwe dirêjî dêliya tirî dike, wî kirasê berfê ji ser şaxên wê yên rût dişeqitîne, bi hovîtî wê tazî dike, zinayê pê dike û dibe qêrîna wî bayê zinêkar (yek caran şoreş dibin ba). (r.35)

Emîral Axa cihekî fantastîk ava dike û dibêje Sablax berê mirovekî evindar bûye û ji kerbê yareke xayîn heliya ye û diherike:

Emîral Axa, carekê got: ‘‘ Hûn dizanin Sablax çi ye? Ew ne cobar û çem e, berê ew mirovekî evîndar bû, ji kerbê yareke xayîn heliya û her û her diherike.’’(r.79)

Tenê di cihên fantastîk de stêrk dikarin mirovan guhdar bikin. Di jiyânê de tiştên wiha nabin:

Şev êdî dereng dibû, ji ezmanê ku di hewşa mala Hejar de xuya bû ku stêrikan jî li hêviyên me guhdarî dikir. (r.173)

Ji bo ku li ser xwîneran bandor çêbike romannivîs dixwaze sirûştê jî li gorî rewşê bi kar bîne ji ber vê jî gelek cihên fantastîk dertên holê. Zêdebûna cihên di romanê de dibe dûrketina jiyana rasteqîn û tê fehmkirin ku romannivîs di nivîsandina romanê de gelek di bin bandora hestên xwe de maye.

7.1.1.8. Cihên Derî Siruştî

Leheng ji bo germiya havînê nîşan bide peyva dojhê bi kar tîne. Li vir dojh tenê ji bo xurtkirina rewşa germa havînê tê bikaranîn:

Dilê min di havîneke dojhê de bû komir.

Dîsa li vir jî Romannivîs bo xweşikbûna keçeke şibandinê bi kar tîne û wê dişibîne horiyên bihuştê:

Horiyên bihuştê jî ne di ciwaniya wê de bûn. (r.35)

Du cihên metafîzîk di hevoka jêr de tên bikaranîn.

Dojeheke ji bihuştê xweştir bû ew şev (r.45)

Cara yekem di vê beşê de nivîskar bihuşt û horiyên wê bi vî şiklî teswîr dike û cihekî metafîzîk li peşiya çavan dide xuya kirin:

Ne ez bûma bawer bike, wî ji şer baz nedida, cennet û heftê horiyên çavbelek û goştzelal û çardesalî li hêviya wî bûn, wey xwelî li serê we be, xelkê dikuta xwehên we û hûn kutana horiyan timadar dikirin. Wey xwelî li serê we be.” (r.99)

Pîrka Badî cihekî metafîzîk teswîr dike di beşa jêr de. Jê badî re dibêje bi navê Dengaiî keleşêrek di bin erşa Xwedê de heye:

Êdî ez li berkeviyên xewê me, dengê keleşêran tê, pîrka min digot:” Badi di bin erşa Xwedê de keleşêrek heye dibêjinê Dengaiî, ku ew baskên xwe li hev dixê û bang dike, keleşêrên erdê hemû bang dikin (r.108)

Wek ji minakên jor jî tê dîtîn cihên derî sirûştî tenê bo şibandîna tînan bikaranîn.

7.1.1.9. Cihên Sehekî

Di navbera bêhn, bîranîn û mekanê de têkiliyekê heye. *Bi saya bêhnê mekan şênber dibe di hişê mirov de, herwiha bi saya bêhnê bîranîn jî zindî dibin.*(Kaynar, 2020, s. 47) Bi bînkirina gulekê re gelek cihên tînan bîra lehengê. Ew cih ji ber ku bo lehengê cihên sehekî ne, leheng bi bêhneke xweş wan bîrtîne.

Bi bînkirina wê gulê re Amêdiyê tev de hate bîra min: çiyayê Gare li Berwara Jêr, Metîn, Rûbara Amêdiyê tev de Kela Aşeb, Medresa Qubehan, darên berrûyan, keça meta min û hevdîtîna me yên di bin kulînan de, li bêriyê, di şikeftên nêzik de, ramûsanên me yên germ û tirsok, pîrka min û keserên wê, rûniştina wê ya her sibe û êvaran li bin dara tuyê, nifirên wê yên li osmanî û ingilîz û Tiyariyan, bi hev re weke kunemozekê di xeyalê min de der bûn. (r.15)

Cih li ser lehengê bandorê çêdike û leheng di bin bandora wan de dimîne:

Taxên teng, sûka sergirtî, saeta babulferec, azana Migefta Zekeriya û stranên Helebê di çavên wî de hêlan dikirin. Bîna mirinê ji nalîna wî dihat. (r.16)

Cihên Sehekî li gorî derûnnasiyên mirovan ve tînan çêkîrin. Gelemperî di xeyalan de cih digirin.(Kanoğlu, 2017, s. 10) Leheng di navbera xwe û darekê de têkilî dibîne û gelek tiştên wê dişibîne tevgerên xwe:

Dara tiriye ya ku berxew bûye, weke tagirtiyekî dilerize, dareke rût weke vê şev amin, dareke hişk weke vî giyanê min, dareke sêwî weke vî dilê min, dareke kin weke wan evînen min...(r.23)

Leheng şaxên darê guhdar dike û nalinên wê dibihîse. Di navbera dar û lehengê de tiştêkî taybet derdikeve pêşiya me:

Gelek caran ez guhê xwe didim şaxên vê darê, denge buhurîna avê di rehên wê de weke awazê sîtarekê tê. Nalîna rezan ji hewşa min tê. (r.33)

Leheng di beşa jêr de hin pirsan dike. Em ji pirsên wî fam dikin ku leheng ji xwe cihekî sehekî digere û dixwaze ew cih birînên wî hembêz bike:

Wê şeva payîzî xewê riya çavên min winda kir. generalên artêşên fransîz û alman û ingilîzan jî wê şevê çav nedane ser hev, ez difikirîm çi bikim û berê xwe bidim kîjan bajarî? Kîjan bajar e min û birînên min hembêz bike! Ew difikirîn kîjan bajarî têxin bin lingên xwe! ez jî difikirîm kîjan bajar dikare ji min re bibe pênah. Ez generalê evîneke sêwî bûm wê şevê!... (r.37-38)

Êvar li ser helbestvanan bandorê çêdikin. Lewra wê jî êvar bo helbestvanan cihekî sehekî ne:

Êvar e. di êvaran de jî hestên şairan weke şaberrûyên li ser agirekî diteqin, har dibin û dilê jar didin ber gezan. (r.100)

Leheng di navbera xwe û berfê de têkilî datîne û berfê dişibîne evîna xwe:

Ez sibata wê sala çûme Kerkûkê beşdarî konferansa Hîwayê bûm, berf dibariya, berfeke weke van rûpelên li ber min raxistî, berfeke bêdeng weke minalên di pêçekên xwe de razayî. Hawîrdorê min berf bû. Agirê Babagurgur nedişî wê berfê bihelîne, berfê nedikarî agirê dilê min vemirîne. Weke evîna min bû ew berf, lê segên berdayî ew dilewitandin. Berfeke tijî raz, saw, xewn û serhişkî û înad. (r.122)

Heke di navbera leheng û cihekî de têkilî tunebe leheng ji wî xatir naxwaze. Ji paragrafa jêr de lehengê xatirê ji gelek cihan dixwaze. Cihên ku xatir tînin xwestin bo lehengê cihên sehekî ne:

Min xatir ji Silêmaniyê xwest, ji çayxaneyan, ji kolan û şeqaman, ji dibistanan, ji Pîremegrûn û Qeredax, ji hevalên Hîwa, dostên min yê di kovara Jîn de, ji odeya xwe ya ku bîna hineyê jê nediçû, bîna henasên Jaleyê jî xwe li diwarên wê mîna lavlavan gerandibûn, min ji dilê xwe jî xatir xwest. (r.123)

Odeya Sultanê ji lehengê re cihekî sehekî ye ji ber ku leheng jê bîneke naskirî digire. Ew bîn tiştên nexweş tînin bîra wî:

Çawa em derbasî hundirê odeya Sultanê bûn, bîneke naskirî dihat, volkanekê, hetûnekê, dojehekê dihat (r.138-139)

Leheng Amêdiyê wek evîna xwe ya yekem dibîne û dixwaze careke din jî wê bibine:

Amêdiyê, evîna yekem, dara tuyê, minareya Mizgefta Mezin, xirecira qeyseryê, Qubehan, keleha Aşeb, çiyayên Gare û Metîn, kolanên teng û biharên lertzok! Careke dî ez ê çavên xwe bi dîtina warê zarotî û ciwaniya xwe kil bikim... (r.148)

Di paragrafa jêr de di cihên sehekî derdikevin pêşiya me. Yek ji wan Amêdî ye ku ji bo ji bîr neçe leheng ji xwe re şaxek tîne, ya duyem jî ew şax e ku mirinê tîne bîra lehengê:

Dema ez bi Barzanî re çûme Behdînan, min şaxek ji rez bi xwe re anî û li hewşa xwe ya li Mehabadê çand li ser daxwaza pîrka xwe. Min berê jî ev nivîstî, mebesta wê ew bû ku Amêdiyê ji bîra min nece, lê her ku ez vî şaxî di bédengî û tenêtiya wî de dibinim ji bilî mirina min tiştêk nayê bîra min (r.161)

Bédengiya bajêr dilê lehengê xemgîn dike. Bajar bi bédengiya xwe bo lehengê dibe cihekî sehekî:

Nîvê şevê derbas bûye, bédengiya ku bajarê tê de ye dilê min xemgîn dike, ez bi giraniya şevê nedihesiyam berê, lê niha! Her kelîkek ji çiyayên Mehabadê girantir e li ser dilê min, ez nizanim çi bi min hatiye! ... (r.188)

Di navbera payîz û xelkê Mehabadê de têkilî hatiye çêkirin. Rojên xweş diqedin. Çiz, şahî tîn jibîrkin:

Payîz e, li dil payîz e, li xwezayê jî û di rûyên xelkên Mehabadê de jî payîz e, êdî wê geşbûn û devlikenîna mehên Sibat û Adarê xwe ji ser rûyên wan dane alî. Çiz û şahî tîn jibîrkin! Bi qasî xweşî û lezzetên jiyane zû ji bîr dibin, jan û derdê ew qasî di kûraniya dil û mejî de têne kolan ku nema êdî kes dikare wan birenîne... (r.211)

Badîn nîvdînî dibe û li kolanên bajêr li dilê xwe digere. Der û dorên bajêr bi mijêke tîr hatiye ristîn. Badîn ji peşmergeyan xwe vedişêre lê qet naxwaze Mehabadê berde. Mehabad bo Badîn cihekî sehekî ye:

Badîn êdî neditebitî, nîvdînî bûbû, li kolanên bajêr li dilê xwe digeriya, diçû ber deriye dibistanan, Mizgeftî Şaderwêş, Gerekî Şiwanan, Meydana Çarçira, Kûçey

Cûlekan, Gerekey Hermenyan û der û dorên wî bajarê ku li mijêke tîr hatibû ristîn, xwe ji ber pêşmergeyan vedişart, nedixwest dev ji Mehabadê berde, di gel ku zanibû êdî qeder dev ji wî bajarî berdide. (r.235)

Wek li jor jî hat gotin roman li ser bajarek û bûyereke hatiye nivîsandin. Lewra di romanê de di navbera cih û dem û bûyerê de têkilî tên çêkirin. Bi vî şiklî cihên sehekî dertên meydanê.

7.1.2. Encama Tehlîla Romanê

Di romanê de hema hema temamî cihên girîng yê ji bo Kurdan derbas dibin. Amêdiye, Mehabad, Silêmaniye, Dêrsim, Agirî, Hewlêr, Dihok. Digel vê yekê bûyer li Amêdiyê, Mehabad û li Silêmaniyeyê diqewimin. Cihên din jî cihên konbûna lehengan in. Bi gelemperî çayxane û navendên partiyên. Ligel wê meyxane jî wek cihekî girîng derdikeve pêşiya me. Badîn û kalê wî alkolîk in. Meyxaneyê Agop ji bo wan cihê bêhndayînê ye. Dibistan jî wek cihekî girîng tê dîtin. Zarokên Kurdan li vir bi xwendinê xwe pêş dixin. Divê qala zindanan jî were kirin. Badîn demekê li Musulê dikeve zindanê, li wir gelek Kurd hene. Hevdu nas dikin. Zindan bi Kurdan hatine tije kirin. Ji bo Kurdan çiya jî wek cihê xwe parastinê tê dîtin. (Filiz, 2020, s. 156) Gelek cih bi vî şiklî derdikevin pêşiya me û hemû cih bi bûyerê re têkildar in.

Em dibînin ku cihên romana Mijabadê bi gelemperî li ser lehengan bandor çêdikin. Her çend mekanên dîrokî jî bin leheng ji aliyê derûniyê ve di bin tesîra wan de ne. *Di vê romanê de mekanên dîrokî û polîtîk dertên pêş. Em dikarin bibêjin di navenda honakê de mekan û serpêhatiyên wan hene. Ligel vê leheng xwedî serpêhatiyên ji rêzê nînin. Serpêhatî û bîranînên wan li ser têgehên wek welat, sirgûn, koçberî û tekoşînên mekanî ne* (Kaynar, 2020, s. 61) Di roman de ji hemû beşên cih derdikevin pêşiya me. Ji bilî cihên Ûtopîk ji beşên din gelek mînak derdikevin pêşiya me. Cihên ûtopîk di navbera cihên ûtopîk û fantastîk de hatiye nivîsandin. Di romanê de cihên girtî û teng gelek caran tên bikaranîn. Ji navê romanê jî tê fehm kirin ku cihê bûyerê kut ê vegotin bi navê Mijabad tê binavkirin. Û bi xwesteka vegotina bûyereke dîrokî ku li ser gelege wek trajediyek tê dîtin hatiye nivîsandin û loma jî romannivîs xwestiye cihên sehekî û girtî û teng gelek bikarbîne ku li ser hestên xwineran bandor çêbike. Roman ji aliyê cihê ve romaneke serkeftî ye.

7.2. Heftiyêke dirêj li Amedê¹³

Di destpêka romanê de Ferzend ji Fransayê siwarê balafirê dibe ji bo biçê Tirkîyê û dixwaze ji wir jî derbasê Amûdê be. Di balafirê da rastî Newzat û jina wî tê, bi Newzad re demekê diaxife lê paşê jina Nevzat tê cem wan û dibêje Newzad nikare biaxife hereket bike, lewra Newzad nexweş e. Balafir digihije Stenbolê. Li Stenbolê jî siwarê balafirê dibe digihije Amedê. Li Amedê di nav kuçe û kolanan da digere û rastê Stêrê tê û bi Stêrê re hinek diaxife. Ferzend dixwaze biçê mala Newzad lê ji ber ku navnîşana wî baş negirtibû rê dernaxe. Di careke de derbasî zarokatiya xwe dibe û qala evîna xwe dike û mecbur dimîne ku welêt terk bike û biçê Ewropayê

Ferzend lawekî bi navê Mîrza dibîne û wî dişibîne kurê xwe yê rehmetî. Paşê Ferzend dîsa diçe berê. Bi Berfin re dizewice pêşî zarokên wan çênabin, paşê bi navê Dara kurekî wan çêdibe û paşê rehmet dike. Li ser wê bûyêrê Berfin întîhar dike.

Ferzand diçe cihê ku Mîrza dendikan difiroşe. Demeke şunda Mîrza û dîya wî tên lê dîya Mîrza dibêje qey ew bavê Mîrza ye û xwe hêrs dike û dibêje tu nikarî kurê min bigirî wek keça min bibî û biçî. Dîsa diçe jiyana xwe ya berê. Paşê hin kesên ku bi cilên resmî tên cem wî û wî dibin li cem KaraYildiz û diaxifin û KaraYildiz qala ‘‘Ortak Vatan’’ dike. Fawaz Husen gelek rexneyan li ser Karayildiz û kesên wek wî dike.

Ferzend diçe mala Mîrza. Navê dîya Mîrza Besna ye. Paşê Mîrza radikeve û dîsa qala berê tê kirin. Çîroka Besna tê gotin çîroka wê ya hatina cîhanê û zewaca wî û hwd. Besna bi berdilî bî Ferman re dizewice hina her du jî zarok bûne. Bi navê Perwana keçeke wan çêdibe. Paşê Ferman radibe dibe gerilla piştê çûyîna wî Mîrza tê dinyayê gelek sal li ser derbas dibin Perwane jî li pey şopa bavê xwe ve diçe ew jî diçe li ser çiya. Besna Mîrza koç dikin ji welatê xwe ji Cizîrê tên Amedê. Mîrza nexweş e û qet mezin nabe her tim di 9 saliya xwe de dimîne.

Ferzend dikeve rê pêşî diçe Mêrdîne paşê ji wir jî diçe Nisêbînê. Ji Nisêbînê dixwaze sinorê derbas bike û biçê Amûdê û li ber nigê wî mayin diteqe paşê Stêrê

¹³ Fawaz HUSÊN

Fawaz Husên Amûdî û Parîsî ye. Ew li Amûdê mezin dibe û xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û navîn dixwîne. Di sala 1978an de, ew digihije Parîsê û xwendina xwe ya bilin dli Sorbonnê, di sala 1988 an de diqedîne. Ji sala 1992 ta 2000î, ew li Stockholmê dijî û dibe endamê nivîskarên Swêdê û yê PEN Klubê. Fawaz Husên nivîskarekî xwedî gelek berhem e. Gelek pirtûkên wî çap bûne. Di nav wan da roman, kurteçîrok û werger jî hene. (Husên, 2015: 4)

dibîne û pê re diaxife. Jê re dibêje Perwane. Ferzend ji Mîrza û Besna re çenteyek danibû. Mîrza çente vedike û nameyek dibîne û ji dîya xwe re dixwîne. Gelek pere di çentê da hene Ferzend ji wan re gelek pere hiştine. Dîya Mîrza ji Mîrza re dibêje mezin bibe û Mîrza jî mezin dibe.

7.2.1. Cih di romana Heftiyeke dirêj li Amedê de

Cihên Şênber		
Cihên Vekirî û Fireh	+	Etîyopya, Afrîka, Tirkiye
Cihên Girtî û Teng	+	Dikana Sofî Elî, Kolanên Amedê, Amed, Mala Besnayê, Kurdistan
Cihên Çandî	-	
Cihên Olî	+	Mizgefta Mezin, Minareya Çarling, Mzgefta Şêx Matar
Cihên ku Atmosfera Fizîkî Nişan Didin	+	Firokxaneya Parîsê, Amed, Tixûba Tirkiyeyê, Kerwanseray, Bexçeyên Hewselê, Bedenên Amedê, Keleha Navîn, Xana Hesên Paşa, Kemera Artuqiyân, Mala Besnayê, Cihê Karayildiz
Cihên Razber		
Cihên Ûtopîk	-	
Cihên Fantastîk	+	Çiyayê Kafê, Axaftina bi Çûk re, Axaftina bi Kulî re, Mezinbûna Mîrza,
Cihên Derî Sirûştî	+	Dojeh
Cihên Sehekî	+	Amed, Kerwanseray, Tixûb

7.2.1.1. Cihên Vekirî û Fireh

Romannivîs di romanê de navê hin welatan bi kar tîne. Ji bo cihên fireh û teng em dikarin hevokên jêr bi kar bînin. Di hevokên jêr de Etîyopya wek cihên teng û Afrîka jî li gorî Etîyopiyayê ji aliyê fizîkî ve cihekî fireh e. Kurdîstan ji herduyan jî tengtir tê nişandan:

Xwezka ez mîrovekî ji Etîyopiyayê bûma, mîrovekî ku li qumistana Afrîka xwe ji birçibûna û ne ji vê axa bêyom a Kurdîstanê. (r. 26)

Li minaka jêr ji aliyê fizîkî ve di cihên fireh tîr bilêv kirin. Em welatan li gorî bajaran mestir firehtir qebûl dikin. Tirkiye û Kurdistan jî li gorî Amedê firehtir û mestir in. Ji ber ku mijar li Amedê derbas dibe berawirdkirinê em pê ra dikin:

Di demên berê de li jêzemînê li axuran şûna pênc sed bergîlan hebû, lê dem û dewran li Tirkîya serdest û Kurdîstana bindest hatibûn guhertin û bazirganî bi şêweyekî nûjentir dibû. (r.68)

Cihên vekirî û fireh di romanê de gelemperî ji aliyê fizîkî ve hatine bikaranîn. Jixwe ji bilî çend minakan nayê dîtin.

7.2.1.2. Cihên Girtî û Teng

Di şano de dekor çî be di romanê de jî şayesandina cih jî ew e. (Karaca, 2016, s. 76) Em dema ku şayesandinên nivîskar dibînin em fehm dikin ku nivîskar bi tenê çend gotinan dixwaze li ser mekanê bisekîne. Mînak:

Min lawê Sofî Elî, mêwefiroşê li kêleka dibistana xwe ya seretayî El-Xezalî û li kêleka Aşê bûzê dît. Dikana wî ji ax û kerpîçan weke qutiyekê tenê ji aliyekî vekirîbû (r.34)

Leheng ji nav bajêr derdikeve û hin cihên ku ji aliyê fizîkî ve teng in bilêv dike:

Berî Melîk Ehmed û Yenî Kapî ku rojava diçû rojhilatê bajêr, kolanek teng bala min bi xurtî kişand. Eger di nîvê kolanê de min dest xwe mîna du baskên firindeyekî vekirana, ew ê bigihîştana herdu dîwaran. Li jêr herdu kêlek weke du lêvên devekî bi ramûsanekê dihatin ser hev. Gelo ew kolana herî teng û herî piçûk a Amedê bû? Min nikaribû bersiva vê yeke bida lê ew der bi rastî pir piçûk bû û ber bi jêr, ber çemê nêzik yê Dicleyê dadiket. (r.42)

Li kêlekê damarên sûkê bi topên caw û malê firotinê yê erzan teng bûbûn û bi zorê yek di wan de dilivîya. Li aliyê din ê kolanê gazî, ez ber bi cihê Masîfiroşan û derîyê Nû çûm. (r.99)

Leheng di Kerwanseraya Delîlan de dimîne lê em nizanin ku cihekî çawa ye. Lê divê Romannivîs herî zêde wê derê ji me re teswîr bikira ji ber ku lehengê me li wê derê radize û herî zêde dema xwe li wê derê dibuhurîne. Romannivîs ji aliyê derûnnasî ve cihekî teng û girtî dide nişandan.

Bajarê Amedê di nav geremolek ecêb de, te digot ji kûrahîya hinavên bedenê derdiket, ber bi êvarê ve diçû. Piştî xana Ziroyan, ez yekser vegeerîyam Karwanseraya Delîlan. Di nav darên hewşê de, li kêleka şadirwanê, ez li ser

sendelîyekî li dora maseyeke bi cawekî qalind bi sorê girtî û bi nexşên endazeyî hatim xwarê. (105)

Besna dizewice nivîskar dîsa bi çend hevokan mala wê ya nû ji me re qal dike lê em fehm nakin ji bo çî dibêje. Lewra em fehm nakin ku têkîlîya wan çî ye. Ev odeya biçûk û teng li ser lehengî bandoreke çawa çêdike.

Besna xwe li maleke li jora Gundikê Mêlî li ba xes û û xezûrê xwe dît. Malê odeyek ji wê û Ferman re veqetandibû, odeyek bi komedek bi ayine û textekî raxistî. Li goşeyekê bi çimentoyê seynandî paporek û bi du- sê beroşên ji bo germkirina avê hebûn û ew jî êdî serşoka wan bû. (r.128)

Cihên girtî û teng li gorî cihên vekirî û fireh zêdetir hatiye bikaranîn. Sedema wê jî ew e ku romannivîs dixwaze rastiya fikren xwe bi cihên teng û girtî piştrast bike.

7.2.1.3. Cihên Olî

Çawa şanoyeke bê dekor nayê fikirandin, romaneke bê şayesandin jî nayê fikirandin. (Karaca, 2016, s. 76) Mizgefta Mezin tenê bi nav ders dibe. Li ser ti agahî nayê dayîn:

Bi destmalên şîrkî û bi şelwarên koçeran, ew li hêviya hemal û barkêşan bûn da ku ew mal li bazarên derdora Mizgefta Mezin li firoşgehan belav bikirana. (r.42)

Gelek caran tê rastî me ku Romannivîs ji bo zanebûna xwe nîşan bide hin navan bi kar tîne. Leheng diçe cîhekî li em bi çavên leheng wê derê nabînin, em bi agahiyên Romannivîs di derheqê cih de agahdar dibin:

Minaraya Çarling le ber devê Mizgefta Şêx Matar li hêviya min li ser her çar stûnên xwe bû. Li bajêr dihar gotin ku kesê di bin re dibuherî Xwedayê her çar mezhebên Îslamî daxwaza wî bi cih dikir. (r.99)

Cihên olî bi nav di romanê de gelek çaran tê dîtin lê nivîskar qet şayesandinê nake û li ser wan agahiyan nade. Tenê di rûpela 99an de şayesandineke biçûk tê dîtin.

7.2.1.4. Cihên ku Atmosfera Fîzîkî Nîşan didin

Di sazkirina bûyera romanê de divê romannivîs li ser têkiliyên hêmanên romanê zêdetir bisekîne. Di navbera hêmanên romanê de têkilî ne xurt be, roman bandora xwe ya li ser xwîneran winda bike û xwîner ji romanê dûr bikeve. Li ser girîngiya

sazkirina bûyerê de Ilyas SUVAĞCI wiha dibêje: *Romannivîs wexta ku di romanekê de behsa bûyera ku ji romanê re dibe bingeh dibijêre, divê ew hakîmî bûyerê be. Her wisa sê hemanên sereke yên romanê jî cih, zeman, leheng girêdayî hev in û li gor naveroka romanê tên bikaranîn.* (Suvağci, 2014, s. 196) Yek ji wan hemanên sereke yên romanê jî wek li jor jî hat gotin cih e. Cih di romanê de sehneya bûyerê ye, loma divê di navbera cih û hemanên din de têkiliyên xurt hebin. Cih divê hem bi hestên lehengan re hem bi demê re hem jî bi bûyerê re girêdayî be. Cih li gorî hestên lehengan divê şikl bigire û carinan jî derbikeve pêş û li ser hemanên din yên romanê bandor çêbike. Ilyas SUVAĞCI li ser vê mijarê wiha dibêje: *Ji bo ku roman weşfeke civakî bi dest bixe, cih xwedî roleke giring e; lewma cih camekana şarîstanîyê ye. Di tabloya mekanî de kevneşopî cil û berg û ruhê civakê heye. Cih ji bo me ne tenê bo tasfîrkirina cihê fizîkî giring e her wiha li ber wê di nîşaneyê ruhî ya lehengan de jî alîkariya me dike.* (Suvağci, 2014, s. 197) Bi şayesandina cih xwîner di derheqê leheng û bûyer de agahdar dibe. Şayesandina cih pêvajoya bûyerê jî diyar dike.

Heke em li roman binêrin, pêşî bûyereke ku divê were vegotin heye. Pêşî cihê ku bûyer derbas dibin tên nasandin. Di destpêka romanê de jî serleheng li firokexaneya Charles Gaullê ye. Romannivîs pêşî dixwaze cihê bi me bide nasîn û wiha dinivîse;

Ez wê rojê pir zû digihîştim û min xwe weke her her carê di eywanek fireh de dît. Eywaneke bi nemreyekê, bi enîya bel a televîzyonek bi bîşana her sê firokexaneyên Parîsê û bi sendelîyên ji çermê sexte. (r.13)

Romannivîs di destpêka bûyerê da cihê tasvîr dike lê ne zêde û dixwaze raste rast derbasî bûyerê bibe. Li vir dîsa tasfîrek biçûk be jî tê kirin lê dema ku Ferzend diçe Stenbolê an digihije Amedê em tê şayesandin nabînin. Romannivîs naxwaze ji bûyerê dûr bikeve ji ber vê tenê hin agahîyên di derheqê cihê da dibêje û derbas dibe. wek mînak;

Min dizanibû ku li dereke taybetî bûm û piştî Dîwarê Çînê, keleha Amedê bi mezinbûna xwe di cîhanê de ya duyem bû. Ew bêhtirî pênc hezar metran dirêj bû. 82 çeper li ser keleha li derve hebûn û 16 li ser a navîn(r.15)

Carinan Romannivîs bi şayesandina dirêj jî cihê li ber çavên me dixwaze bide xuya kirin. Lê ew şayesandinên wiha gelek kêr bi kar tîne:

Ez rêwîyê pêşîn bûm û min xwe li kêleka cama fireh li ser sendelîyekî ji çermê sexte perixand. Hema min serê xwe rakira min ê eniya pehn a televizyona ku agahîyên rêwîtiyê û derîyê derçûnê bidîta. Li ser destê çepê beşekî mezin asimanekî nizm xuya bû. Li ser sînga firokexaneya bi xêzên rast û kec, mekîneyên piçûk bi şûfêrên xwe bi lez diçûn û dihatin û bi karên xwe radibin. Çend balefir ji doh de li wê derê weke teyrê Sîmir mexel hatibûn, li bende bûn ku karkerên paqijkirinê ew amade bikirana û wan ê dîsa xêzên spî li asimanên hemû welatên cîhanê bihiştana (r:16)

Leheng di beşa duyem de dixwaze bîranînê xwe bibêje û bûyerekî ku di zarokatiya wî de hatîye serê wî tîne ziman:

Carekê ez hina zarok bûm, xalê Farê ji nişka ve ji min xwest ku em biçûna me roja xwe li Tirkiyeyê derbas bikira. Li Hemdûnê bi çend kîlometran ji Amûdê û li ser rêya ku diçû Dirbêsiyê, ew cara yekem bû kum in di temenê xwe de ewçend jin û mêr li herdu aliyên şiva hesinî ya trenê didîtin. Ji aliyê Sûriyê, kemberbendên pehn ên cendirmeyan di destê wan de bûn. Ji aliyê din leşkerên Tirk, bi çek û posatên giran bûn. Her kesî digot "Gorîşme ye" û ew gotin ji bo kesên ku bi Tirkî nizanibûn tevlihevî û geremola bê ser û ber bû. (r.31)

Di beşa sêyem de nivîskar bi şayesandina atmosferê dest bi beşê dike, lê li vir jî teswîra cihê zêde nayê kirin. Romannivîs dixwaze qala rewşeke bike û vê rewşê dixwaze bişopîne berê. Şayesandina atmosferê xweş tîne ziman, şibandina wî jî baş e, lê Romannivîs dîsa kin dibire:

Roja din ez berbang û çîveçîva çûçikên hewşê re şiyar bûm. Bayekî hênik hat bi tiliyên xwe yên hevrîşimî sîng û cênîkên min mist dan. Ew hestên xweş di salên xortaniyê de li ba min peyde dibûn dema ez li ser banê xaniyê me yê li taca başûrê rojavayê bajêr radizam û tirêjên roja teze henek bi hezarê spî yê dora textê min dikirin. Ez mat mam ku li Amedê ne mêş, ne kelmêş û ne pêşî hebûn tevî ku karwanseraya Réberan nêzîkî çemê Dîcleyê û bexçeyên Hewselê bû (41)

Di beşa sêyem de Romannivîs şayesandina Amedê dike cara yekem e ku nivîskar bi vî şiklî dirêj dixwaze cihê ji xwîner re ragihîne. Cara yekem e ku Romannivîs bi awayekî xweş cihê li ber çavên xwînerê zindî dike:

Bi derketina xwe ez bi aliyê rastê zivrîm û li ser caddeya mezin a Gazî ber bi dilê bajêr ve hilkişiyam. Ez çî bejim ji çosa nava xwe ku ez li paytaxta Kurdîstanê bûm

weke serxweş û mestan li min hat û min bawer kir ku ez ketibûm lê cîhaneke efsanewî. Çend dikanên hûrik nû derîyên xwe vekiribûn û ber xwe avreşandî kiribûn. Roja ku ne ji mêj ve derketibû bi kulora xwe ber bi zikê asîmanana ve hildikişiya û ji wê gavê de hinek ji hêz û hinera xwe diyar dikir. Li otogara liceyê niştecihên gundên nêzîk li ber barên xwe yên penêr û hiriya mihan û sebze û mêweyên demsalê rawestiyabûn. (r.42)

Romannivîs dixwaze qala bedenên Amedê bike lê mirov dibêje qey nivîskar bi çavên xwe nediye tenê agahîyan ji ber kiriye û xwendevanan re vedibêje lê li vir bo şayesandinê fîrseteke pir baş ketibû destê Romannivîs. Lê mixabin nivîskar naxwaze serê xwe bi teswîrê re bêşîne:

Min nizanibû dereke taybetî bûm û pişte Dîwarê Çînê keleha Amedê bi mezînbûna xwe di cihanê de ya duyem bû. Ew bêhtirî pênc hezar metran dirêj bû. 82 çeper li ser keleha li derve hebûn û 16 li ser a navîn. Her çar deriyên wê yên qayim hîna mabûn û ew di demen berê de bi ketina êvarê dihatin girtin. (r.48)

Teswîra cihê herî zêde di beşa sêyem de tê kirin ji ber vê beşa sêyem dikarin wek beşa cihê qebûl bikin. Lê şayesandinên Romannivîs ji ber ku ne ewqas serkeftî ne û perçe perçe ye em ê hemûyan nenivîsin. Em ji teswîrên nivîskar fehm dikin armanc cihkirina bûyerê ye. Romannivîs dixwaze atmosfereke ava bike ji bo bûyerê, ji ber vê jî cihê bi şayesandinên hindik bilêv dike:

Lê, min ji xwe re got ku gelek caran li paş deriyên girtî û rûxaniyên sade, gencîneyên mîmariya rojhilatî, bi eywanên fireh û şadirwanên ji mermere û bi odayên fireh hebûn. Min ji aliyê derve da pey diwar u bircên Keleha Navîn û min wisa jî xwe li ber devê dergeha wê, Deriyê Serayê dît. Lepek pîrejin li wê derê ketibû û wisa xwe di nava mitalan de winda kiribû min ceger nekir ne çend pirs li ser Newzad jê bikarana... (r.50)

Di beşa caran de Romannivîs bi xwesteka nîşandana rewşê destpê dike û dixwaze atmosferê nîşanê xwînera bide ku rewşa Amedê xwîner fehm bike:

Du tiştan, du hêmanên bêyî asîman û bayê Amedê zeft kiribûn û di nav xwe de parve dikirin. Yekem, helîkopterên ertêşê bûn ku her gav û her kêlî bi zanebûn pir nizm i bi giranî di ser serê me re difîriyan. Kuliyên hesinî û bi teknolojiya amerîkî dagirtî zikên xwe yên tije malwêranî nîşanî çavên me kurdan didan û her ku baskên

xwe li hev didan piştîyên gotinên dijûn di canê me re dikirin. Duyem, sêla rojê bû ku heştê dane sibehê sêlavên ji bizot û perengan bi se niştecih û rêwîyan dirijandin...
(r.63)

Romannivîs di beşa çarem de diçe xana Hesên Paşa em dikarin cara duyem e ku nivîskar bi vî şiklî cihê bi awayekî ne hindik teswîr dike:

Kevirên reş û spî rûyên dîwaran dixemilandin û rêzên stûn û kevanan bi şeweyekî lihevhatî belav dibûn. Çayxaneyan palên xwe dabûn dikanên pîşekaran ku tepsîyên girover ji paxîra zer an sor û xalîçeyên hûrik bi wêneyên navdarên dîroka kurdan difrotin. Çayxaneyên bêhejmar bi sendelî û maseyên textînî an bi kenepeyên bi cawê rengareng bûn. Di demên berê de li jêrzemînê li axuran şûna pênc sed bergîlan hebû, lê dem û dewran li Tirkiya serdest û Kurdîstana bindest hatibûn guhertin û bazirganî bi şeweyekî nûjentir dibû. (r.68)

Di beşa pêncemîn de Kemera Artûqîyan bala leheng dikşîne lê çî hest di dilê leheng de çêdibin em fehm nakin an jî ji bo çî bala wî kişandin em nizanin em tenê dizanin ku bala lehengê dikşîne ewqas:

Li destê çepê, Kemera Artûqîyan bi kevirên xwe yê şehkirî, bi têkoşîna şêr û boxe û nîşanên kabalistîk bal û hişê min xurtî kişandin ser xwe. Di zikê kêvanê de, derîyekî ji hesinê kutayî kutayî destura derbasbûnê nedida herkesî. Li paş kemerê dîwarsazan bê rawestan di bin germa dijwar de kar dikir û bi lez rûyekî nûjenî rûyekî mirovdost, didan bajarê nava sûran. (r. 86)

Leheng ji aliyê hin kesan ve tê girtin. Wî dibin ciheke veşartî Romannivîs bi awayekî xweş û bi zanistî derdorê ji xwîner re bi devê lehengê teswîr dike. Bi rastî cih li ber çavên me wek vîdeoyê derbas dibe lê kêmasî ew e ku rewş û cih li ser lehengê qet bandor çênake. Leheng pir bi rehet xuya dike û ji tirs an ji meraqê gelek dûr e. Ew jî kêmasîyek dide vê bûyerê:

Derdora min tarî bû, min di dest pêkê de tişt ji hev nedifesilandin, lê hin bi hin, çavên min fêrî tariyê bûn. ew der hênik bû û min di dilê xwe de got ku ez bi kêmanî ji agirê li ser singa bajêr dûr ketim. Di dereke ji wî rovîyî, ji wê dehlîza dirêj, ez di nav tevlihevîyek dîrî aqilan a çek û zirxên siwarên Sedsalên Navîn re buhurîm. Rûm û şûr û mertalên hemû navçeyên dinyayê li ber dîwaran bûn. ew bêguman li bende bûn

ku ji hev bihatana veqetandin. biketana camekanan û tarîx û jêdera wan li ber nigên wan bihatana nivîsandin...(87)

Romannivîs dixwaze qala jiyana lehengekê bike. Cihê dayîkbûna wê dixwaze ji xwîneran re bêje li dîsa em dibînin ku Romannivîs ecele dike û bi çend hevokan Besnayê ji dayîk dike û wê derbasî heşt salîya wê dike. Bi çend hevokan mala Besna ji me re teswîr dike û xilas:

Besna di sala 1971ê de li Gûndikê Mêlî li beramber Cûdî dayîk bûbû. Ew bi baw û dayîk û birayê xwe Receb li xaniyekî li nav xanîyên jêra gund dijiyan. Hewşa mala wan ji qirşik û êzingên ku li newal û li palên Cûdî hatibûn berhevkirin bu û di hewşê de çend bizin û karik dibarîn. (r.125)

Ji wek mînakên jor gelek mînakên bi vî awayî nîşanê me dide ku Romannivîs nav jiber kirine û li ser van hinek lêkolîn kiriye. Lê ji ber ku teswîran ji me ra nake, em fehm dikin ku Romannivîs dema ku romanê dinivîse cih ne li ber vê ye. Berê ev cihan ditine lê şiklê wan zêde di hişê wî de nemane, tenê navê wan û cihê wan di hişê wî de mane. Ji ber vê jî cihê nikare li ber çavên me bide xuya kirin. Ew jî romanê ji aliyê cihê ve li ber çavê me qelstir dike. Mînak nivîskar navê gelek cihan birêz dike, cihên wek dîrokî, xwezayî û derûnnasî û xeyalî, lê Romannivîs di derheqê wan de tenê hin agahîyên biçûk dide û bandora wan yêr li ser lehengê qet nîşanê me nade. Heke bandor tunebe çima ewqas navan dinivîse nayê fehmkirin. Bi ihtîmaleke mezin Romannivîs zanebûna xwe dixwaze nîşanê xwîneran bide.

7.2.1.5. Cihên Fantastîk

Cihên xeyalî jî wek em dizanin di bin beşên taybetmendîyên cihê de cih digirin. Romannivîs di romana xwe de cih dide cihekî xeyalî:

Ji dêm û lèvên wê diyar bû ku ji mêj ve kêfxweşîyê ji sînga wê bar kiribû û çûbû Çiyayê Qafê.(r. 19)

Leheng di beşa 6 an de bi çûçikekî re diaxife û çûçik jê re çîrokeke vedibêje:

Tu yî, çûko tu silavê dikî?

Ma ê kî yê din be, heyra? Ê bi kurdî. Ma ne ji gava ku tu hatiyî vî bajarî tu gazinan ji lildim bildimê dikî, ezbenî!.. (r.106-107)

Leheng di beşa 8 an de jî bi kuliyekê re diaxife. Kuliyek pêşî silavê dide lehengê paşê dest bi axaftinê dikin û bi devê kuliye nivîskar rexneyên xwe dibêje:

Ma piştî heftiyekê di nav diyarbekriyan de tu ewqas bê edebbûyî? Tu nema silavê jî vedigerînî, qerdaş?

Silav silava Xwedê ye. Evara te bi xêr! Kuliyo, tu yî? Hek û pek, tu diaxifî... (144-145)

Di beşa 9an de leheng li ber mirinê ye û keça dibîne. Keça wî ji ber mirinê di hişê wî de çêdibe an wek demeke fantastîk rol dilîze baş nayê fehm kirin lê dîsa jî em ê di bin cihên fantastîk de nişan bidin:

Dengê çend pêyên sivik li ser gihayê zer û hişkbûyî gihîşt guhên min û ez di ber xwe de keniyam. Weke ku sed kes ji min re bejin, min dizanibû gavê min kê bûn. Bi rastî jî, dem û lêvên Stêrê li ber çavên min, li ser asimanê tije ster xuya bûn û biskên wê bi ser rûyê min de bariyan. Wê keliyê tenê wê keliyê, heyvê dev ji dilsariya xwe ya hezarsalane berda û wê jî di ber dilê min de da... (r.165)

Di beşa 10an de Mîrza bi awayekî derasayî di careke de mezin dibe. Em dizanin ku di jiyana rasteqîn de kesekî di nav deqîqeyek de nikare bi vî şiklî mezin bibe lê di romanê de ew tişt tê dîtin:

Di vê navê de, devê Besnayê biqasî gazeke ji hev mabû. Kurê wê li ber çavên wê mezin dibû, ji kirasê xwe yê zaroktiyê derdiket, dibû xortekî bi zend û bend. Ruyê wî yê hilûs hin bi hin din av rîhek bit ov de dihat veşartin û dem û lêvên wî dibûn ên xortekî bixwebawer, xortekî di navbera bîst û bîst û pênc salan de.

Di romaneke nêzî dema niha de gelek beşên fantastîk tên dîtin. Dema ku roman tê xwendin gelemperî bi rêyeke rasteqîn dimeşe lê di hin beşan de minakên bi vî şiklî tên dîtin.

7.2.1.6. Cihên Derî Siruştî

Romannivîs bi devên hin kesên din dixwaze germahîya havîna Amedê bîne ziman lê bi hevokeke vê meselê jî derbas dike:

Li ser vî bajarî herkesi digot ku di meha heştan de, meha kum in dida ser rê, ew der dibû agirê tenûra dadayî û dojeha Xwedê. (15)

Dojeha rojê li ser dîwarên kelehê li ber dilê min şêrîn bû.

Ji bilî van şibandinên bi vî şiklî di romanê de cihên derî siruştî nayê dîtin.

7.2.1.7. Cihên Sehekî

Di romanê de Amed û karwanseray bi vê hevokê ve wek cihekî sehekî tê dîtin lê zêde li ser nayê sekinandin:

Li Amedê ez matmayî dimam çawan çîveçîva beytikan û bêhnên şînkahiyên hewşa karwanserayê ewçend pêlên bîranînan bi xwe re ji min re dianîn... (r.117)

Leheng diçe ber Tixûbê dixwaze derbasî alî din bibe. Belkî cara yekem e ku em dibînin ku mekanek li ser lehengê hin hestîyarî çêdike:

Tixûb nedihîşt ku ez dûrtir biçûma. Ew bi asebûna xwe bû bedena keleha Amedê û bi ser de jî her çar derî hatibûn girtin û parçeyê dîwarê ku bi dînamîtê hatibû hilweşandin dîsa hatibû lêkirin. Erê vîyanek ewçend xurt ez zeft kiribûm, lê min nikaribû li kolanên bajarê xwe weke berê bigeriyama û li aliyê herdu goristanan refên têtî û silêmanî dunikil li ver xwe bi asimanan bixistana. Piştî rêya hesinî, tîrek erd bi tîlên rêsayî hebû û li paş wan axa Kurdîstana Sûriyê ber bi başûr ve dadiket. Kûçikên bêxwedî, cewrik û dêlikan ew tîra erde û ew der ji xwe re kiribûn memleket, şahînsahî û haya wan ji bayê felekê nebû. Roj hîna neçûbû ava lê wê xwe amade dikir û aso jî di nav deryayeke xwîne de gevizîbû. (r.160)

Di navbera leheng û cih de qet têkilî nayê dîtin ji bilî minakên jor di romanê de cihên sehekî bi vî şiklî nayê dîtin.

7.2.2. Encama Tehlîla Romanê

Roman metneke çêkiriye. Di metnên çêkirî de bûyer, dem, leheng û cih ji aliyê nivîskarê ve tîr saz kirin. Nivîskar tîr nivîsandina romanê de dikare cihê bi awayekî cuda bi kar bîne. Di hin beşên romanê de cih ji bo avakirina atmosferê tîr bi kar anîn, di hin cihan de jî ji bo nasandina derûnnasiyên lehengan. Di romanê de fikirandina leheng û bûyerê bêcih ne mimkûn in. Ev hêmanên romanê bi cihê re wate digirin. Hin nivîskar ji bo nasandina lehengan cihê bi kar tînin, hin nivîskar jî ji bo nîşandana taybetmendiyên derûnnasî û fîzîkî yê lehengan bi kar tînin. (Zeren, 2018, s. 72) Di romanê de nivîskar qet girîngî nade cihê. Cih bi gelemperî bi nav derbas

dibin û ti eleqayê wan bi bûyerê re tune ye. Armanca nivîskar bi temamî vegotina bûyerê û xwesteka qanîkirina fikrên xwe ne.

Di romanê de cihên çandî û ûtopîk nayên dîtin. Cihên çandî divê di romanê de cih bigirta ji ber ku leheng diçe bajareke ku wek payitaht tê dîtin û di kuçeyên bajarê digere divê hin tiştên çandî bidîta lê wek li jor jî hat gotin nivîskar dixwaze rastûrast bûyerê vebêje. Cihên Sehekî tenê bi çend mînan derdikevin pêşya me. Cihên Olî jî bi gelemperî tenê bi nav derbas dibin. Lê hin cihan de li ser cihên olî hin agahî tên dayîn lê şayesandin qet nayên kirin. nivîskar tenê dixwaze agahiyên xwe û xebatên xwe nîşanê xwîneran bide. Cihên fantastîk di romanê gelek caran tên dîtin. Roman bi şiklê jiyaneke rasteqîn tê nîşandan lê dem dem beşên fantastîk atmosfereke cuda dide romanê. Di romanê de gelemperî cihên ku atmosfera fizikî nîşan didin hatine bikaranîn. Lê di navbera wan cihan û lehengan de ji bilî çend minakên biçûk têkilî nayên çêkirin.

Leheng di romanê de gelek cihên dirokî digere li ser wan agahiyan dide lê agahî bi temamî li ser dîrokê ne. Ti cih li ser lehengê bandor çênake. Leheng cihên pir cuda dibîne lê di navbera cih û lehengê de qet têkiliyek çênabe. Romannivîs cih baş bi kar neaniye û qet giringî nedayê jî. Ji bo afirandina atmosferê jî qet xwe neêşandiye. Cih bi gelemperî bi nav derbas dibin. Roman jî aliyê cihê ve romaneke gelek qels e.

ENCAM

Di vê xebatê de hat dîtîn ku romanên Qafqasyayê ji ber ku romanên bûyerî ne, ji cih re zêde giringî ne hatiye dayîn. Romana Şivanê Kurmanca romaneke otobiyoğrafîk e, û bûyer di gelek cihan de çêdibin loma jî zêdetir bûyer derdikevin pêş. Cihên derî siruştî û fantastîk nayên dîtîn sedema wê jî ew e ku roman mijara xwe ji bûyereke rasteqîn digire. Cihên olî jî di romanê nayê şayesandin. Hin kesên ku baweriyên wan li ser olên cuda ne tên dîtîn lê romannivîs naxwaze navberê bide bûyerê. Di romanê de gelemperî cihên ku atmosfera fizîkî nişan didin tên bikaranîn. Di navbera leheng û cihan de têkilî nayên dîtîn. Rastûrast roman li ser bûyerê hatiye nivîsandin.

Di romana Gundên Mêrxasan de jî bi gelemperî mijar şer e. Lewma roman zêdetir giringî dide bûyeran. Di romanê di navbera çiya û Kurdan de têkilî tê çêkirin. Bi vê têkilî cihên sehekî dertên meydanê. Heke li navê romanê were meze kirin ew ê bê dîtîn di navê romanê de di navbera leheng û cihan de têkilî hatiye çêkirin. Lê dema ku roman were xwendin piranî ew ê were dîtîn ku cih ji bo avakirina atmosferê tên bikaranîn. Cihên fantastîk di romanê de cih digirin sedema wê jî ew e ku romannivîs dixwaze li ser xwîneran bandorê çêbike. Di romanê de hemû binbeşên cihê tê dîtîn. Lê cih piranî ji bo afirandina atmosfera bûyerê tê bikaranîn.

Di romanên Bakur ku hatine hîlbijartin de Bîra Qederê ji aliyê şayesandinên xwe yê dirêj derdikeve pêş. Şayesandinên ku tên kirin bi gelemperî nişandana atmosferê ne. Uzun li ser cihê gelek xebitiye lê di navbera cih û leheng de zêde têkilî çênekirine. Roman ji ber ku dîroki ye û di gelek welatan de derbas dibe û di demeke dirêj de bûyer pêk tên têkilî çêkirina navbera leheng û cih de ne ewqas hêsan e. Loma roman ji aliyê têkilî ve qels dimîne. Di romanê de şayesandinên dirêj acizî dide xwîneran. Romannivîs bi têkilî carinan bi rûpelan qala hin cihan dike. Armanca romannivîs tê fehmkirin ku zanebûna xwe nişan bide lewra di romanê gelek caran xaniyên Bedirxaniyan bi agajiyên gelek kûr tên şayesandin. Di romanê ji nav cihên razber de cihên sehekî dertê pêş. Cihên ûtopîk û fantastîk nayên dîtîn.

Di romana Rojnivîska Spinoza de jî gelemperî cihên girtî û teng derdikevin pêşiya me. Roman romaneke derûnî ye û ji ber vê jî divê di navbera leheng û cih de têkilî bihatana çêkirin. Cih nişaneya derûniyên lehengan bin. Lê ji ber ku di romanê

de gelek çîrokên cuda derdikevin pêşiya me û gelek cihên cuda de bûyer derbas dibin ev têkilî û şayesandin re nivîskar zêde dem nabîne. Di romanê de cihên ûtopîk, fantastîk û derî siruştî nayên dîtîn. Ji cihên vekirî, çandî û olî tenê ji her yekî minakek derdikeve pêşiya me. Roman romaneke derûnnasîyê ye. Çîrokên cuda cuda tên vegotin. Di wan çîrokan de jiyanên trajedîk û dramatik tên dîtîn. Di navbera cih û lehengan de têkilî zêdetir bihatana çêkirin roman ew ê xurttir bibûya.

Di romana Pêşmerge de cih gelemperî ji bo sazkirina atmosferê hatine bikaranîn. Di romanê de cihên ûtopîk, derî siruştî, olî nayên dîtîn. Sedema wê jî ew e ku roman hem romaneke dîrokî û bûyera xwe ji jiyana rasteqîn digire hem jî romaneke bûyerî ye ku armanc zêdetir vegotina bûyerê ye. Di romanê de jiyaneke ne baş tê dîtîn. Leheng gelek tengasî dikşînin. Di romanê de gelek bûyerên trajîk derbas dibin. Zêdebûna cihên girtî û teng û cihên sehekî ji bo romanê çavkaniyeke baş e, lê romannivîs vê tiştê baş bi kar neaniye.

Di romana Balindeyên Li Ber Bê De de cih bi her awayî ve baş hatine bikaranîn. Di navbera cih û leheng de têkilî hatine çêkirin û cih û leheng li ser hevdû bandor çêkirine. Roman ji aliyê bikaranîna cih de romaneke serkeftî ye. Di romanê de tenê cihên fantastîk nayên dîtîn. Sedema wê jî ew e ku roman mijara xwe ji bûyerekî dîrokî digire û armanc zêdetir vegotina bûyera vê demê ye. Ji bilî cihên fantastîk, cihên din tên dîtîn. Cihên olî nayê şayesandin tenê navê wan di romanê de derbas dibe. Cihên derî siruştî ji bo şibandîne tên bikaranîn. Roman ji aliyê bikaranîna û avakirina cih de serkeftî ye. Di navbera cih û leheng de têkilî bi awayekî xweş hatiye saz kirin.

Di romanên Başûr de ku hatine hilibjartin, romana Apê min Cemşîd Xan Ku Her Tim Bê Ew Li Ber Xwe Dibir de hemû binbeşên cih tên dîtîn. Bikaranîna cih bi awayekî serkeftî tê dîtîn. Nivîskar ne şayesandinê dirêj dike ne jî kurt dihêle. Têkiliya cih; leheng û bûyer baş hatiye saz kirin. Roman li ser bûyereke fantastîk hatiye bikaranîn. Loma em dikarin bibêjin ku ji serî heta binî ew tişt dibe romaneke fantastîk. Cihên ku di romanê derbas dibin di jiyana rasteqîn de hene lê bûyer fantastîk e. Bûyer di gelek cihan de derbas dibe û di nav romanên ku hatine tehlîlkirin de herî zêde di romana Apê min Cemşîd Xan de cihên derî siruştî tên şayesandin û ne ji bo şibandîne bi wateya xwe ya yekem der tê pêşiya xwîneran. Di

romanê de kêmasiya herî mezin beşek bi temamî di cihên olî de derbas dibe lê şayesandinên wan nayên kirin.

Di romana Hotêl Ewropa de jî têkiliya cih, dem, leheng û bûyer baş hatiye saz kirin. Li gorî rewşan erka cih hatiye guhertin û ew jî xurtbûnek daye cihê. Di romanê de cihên fantastîk nayê dîtin ew jî rasteqîniyek dide romanê. Cihên vekirî û fireh û cihên girtî bi gelemperî berawirdkirina welatên rojhilat û rojava der tê pêşiya xwîneran. Welatên rojhilatê ji aliyê rewşa xwe di romanê de cihên girtî û teng in. Welatên rojava jî ji aliyê lehengan ve cihê xwe spartinê cihê ewlehîbûnê ye, bo vê jî wek cihên vekirî û fireh tên dîtin. Lê ew tişt bi temamî wiha nadome. Di romanê de tiştê herî xweş e ew e ku cih ne stabil in. Cih guherîner in carinan welatên Ewropayê bo lehengan re dibin cihên girtî û teng. Carinan jî ji ber hestên lehengan ve welatên Rojhilatê dibin cihên vekirî û fireh.

Di navbera romanên Rojava de, romana Mijabad derdikeve pêş. Roman ji aliyê bikaranîna cih de gelek serkeftî ye. Hemû binbeşên cih di romanê de bi awayekî xurt hatiye bi kar anîn. Navê romanê Mijabad e. Mijabad ji aliyê nivîskar ve ji bo bajarê Mehabadê hatiye bikaranîn. Armanc nişandana rewşeke kambax e. Atmosfereke xirab li ser bajarê wek mijekê dagirtiye. Romannivîs bûyereke trajîk vedibêje û bo vê jî di romanê de cihên girtî û teng û cihên sehekî gelek caran derdikeve pêşiya xwîneran. Di navbera cih, bûyer û lehengan de têkilî hatine çêkirin. Bûyereke dirokî bi cihê re baş hatiye honandin. Bo vê jî ji aliyê cihê ve romaneke xurt tê dîtin.

Lê di romana Heftiyêke Dirêj Li Amedê de cih bi awayekî baş ne hatine bikaranîn. Bi gelemperî navbera cih û lehengan de têkilî nehatine çêkirin. Şayesandinên ku hatine kirin bi gelemperî ji bo romanê qels in. Di romanê de leheng gelek salan ji welatê de dûr maye û dixwaze vegere welatê xwe li pêşî tê bajarekî ku wek payitaht bi nav dixe. Di romanê de gelek cih derbas dibin lê ti cih li ser lehengê bandor çênake. Cih piranî ji bo ji bo atmosfera bûyerê tê bi kar anîn. Wek sehneyeke lê ti erka wî nayê dîtin. Romannivîs carinan li ser hin cihan agahiyan dide lê agahiyên ku dide xwîneran ji romanê dûr dixwe lewra bi romanê re zêde têkildar nîne. Agahiyên dirokî tê dayîn lê şayesandina cihê nayê kirin. Di romanê de cihên fantastîk gelek caran tê dîtin. Roman wek bûyereke rasteqîn xuya dixe lê bi bûyerên fantastîk ew tişt diguhere. Di romanê de cihên çandî û ûtopîk nayên dîtin. Cihên sehekî jî bi

awayekî qels hatine çêkirin. Bi kurtasî were gotin, cih di romanê de gelek qels hatine saz kirin.

Bi gelemperî heke were gotin, romanên Kurdî bi demê re serkeftitir dibe ji aliyê bikaranîna cihê ve. Di romanên pêşî de cih zêdetir ji bo avakirina atmosferê hatine bikaranîn. Lê di romanên nêzî dema me de ev tişt guheriye û ji bilî hin awarteyan cih bi awayekî zanistî û bi awayekî serkeftî hatine bikaranîn. Di romanên pêşî de wek Şivanê Kurmanca, Gundên Mêrxasan û Pêşmerge de cih zêdetir ji bo sehnebûna bûyerê hatine saz kirin. Cihên ku atmosferê fizîkî nişan didin zêdetir tên dîtin. Armanç wek li jor jî hat gotin gelemperî vegotina bûyerê ye. Di romana Bîra Qederê de cih li gorî romanên beriya xwe xurttir hatine saz kirin. Lê ji ber romanêke biyografîk e û bûyer di navbera gelek salan de derbas dibe têkilîya cih û leheng ne ewqas xurt bûye. Di Rojnivîska Spînoza de di çêkirina têkilîya cih û lehengan de kêmasî tên dîtin. Di hefteyekê Dirêj Li Amedê de cih gelek qels hatiye saz kirin. di nav romana ku hatine tehlîl kirin de qelsbûna herî zêde di vê romanê de tê dîtin. Lê her çar romanên din: Balindeyên Li Ber Bê, Apê min Cemşîd Xan Ku Her Tim Bê Ew Li Ber Xwe Dibir, Hotêl Ewropa, Mijabad de cih gelek serkeftî hatine bikaranîn. Ji aliyê bikaranîna cih de gelek xurt in. Ji bilî hin kêmasiyan di romanê de avakirina cih xwe baş nişan dide. Tê dîtin ku romannivîs di derheqê avakirina cihan de xwedî agahî ne. Cih tenê bo sehnebûyîna nehatine saz kirin. bi temamî bi bûyerê re girêdayîne. Têkilîya navbera cih; dem, bûyer û leheng bi awayekî zanebûn hatine çêkirin.

Di vê xebatê de hat dîtin ku giringiya cih li gorî nivîskar û demê ve hatiye guhertin. Hin nivîskar cihê gelemperî ji bo nişandana atmosferê fizîkî û bo sehnebûna bûyerê saz kirine û cih bi şiklekê stabîl tê dîtin. Lê hin nivîskar di avakirina cihan de li gorî nivîskarên din dîqettir bûne û di fehma giringiya avakirina cihê de buna. Loma jî di navbera romanên de cudahî derketine. Hin romanên Kurdî ku li jor hem navê wan hem jî sedema qelsbûna cihên ku saz kirine hat qal kirin li gorî romanên ku ji aliyê cihê ve baş hatine honandin, qels mane. Lê tê dîtin ku romanên Kurdî bi gelemperî bi demê re ji aliyê sazkirina cih de xurttir dibin.

ÇAVKANÎ

Adalı, Bilgin, (2014), *Odyseia Destanı İthake Kralı Odysseus'un Serüvenleri*, İstanbul, Yapı Kredi Yayınları.

Ahmedzade, Haşim, (2011) *Romana Kurdî û Nasname*, İstanbul, Avesta Yayınları.

Aktaş, Şerif, (2003), *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, Ankara, Akçağ Yayınları.

Atay, Dinçer, (2013), *Amat'ta Mekan'ın Poetiği*, 13. Uluslararası Dil, Yazın ve Deyişbilim Sempozyumu: Basit Üslup, Kafkas Üniversitesi, Kars.

Bachelard, Gaston, (2008), *Uzamanın Poetikası*, Çev: Alp Tümertekin, İstanbul, İthaki Yayınları.

Balık, Macit, (2016), *Edebiyat ve Mekan Bağlamında Safiye EROL'un Ülker Fırtınası Romanı Üzerine Bir İnceleme*, Bartın, *International Journal of Cultural and Social Studies*,

Başaraslan, Suzan Nur, (2010), *Roman Nedir? Nasıl Yazılır?*, İstanbul, Derin Düşünce Fikir Platformu.

Binboğa, Mehmet, (2019 Nisan 19), *Romanda Mekan Unsuru*, 29 Ekim 2020, <https://www.hiciste.com/romanda-mekan-unsuru>

Celil, Celîlê, (2018), *Çima Deve Xeyîdî?*, İstanbul, Wardoz Yayınları.

Cizîrî, Mela, (2004), *Diwan*, Arif Zêrevan, Stockholm, Nefel Yayınları.

Çeri, Bünyamin, (2014), *Osmanlı Devleti'nin Kuruluş Devrini Konu Edinen Romanlarda Mekân Unsuru*, Yüksek Lisans Tezi, Sakarya Üniversitesi Sosyal Bilimler Fakültesi, Sakarya,

Çetin, Nurullah, (2004), *Roman Çözümleme Yöntemi*, Ankara, Edebiyat Otağı.

Çetişli, İsmail, (2008), *Batı Edebiyatında Edebî Akımlar*, Ankara, Akça Yayınları.

Çoban, Erol, (2017), *Şirove Û Nırxandinek Lı Ser Pirtûka Ferhad Pîrbal Ya Bı Navê Hotêl Europe*. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Bingöl.

Çoşkun, Sezai, (2009), *Mekandaki Medeniyet-Medeniyeteki Mekan: Sezai Karakoç'un Şiirinde Mekan-Medeniyet İlişkisi Üzerine Bir İnceleme*, Konya, Selçuk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi,

Doğru, Sefa Mehmet, (2020), *Zaman Ve Mekân Bağlamında Bir Zamanlar Anadolu'da Filmini Bahtin'in "Kronotop" Kavramıyla Okumak*, Uluslararası Kültürel ve Sosyal Araştırmalar Dergisi (UKSAD).

Dost Jan, (2011), *Mijabad*, İstanbul, Avesta Yayınları.

Elî, Bextiyar, (2014), *Qesra Balindeyên Xemgîn*, İstanbul, Avesta Yayınları.

Elî, Bextiyar, (2019), *Apê Min Cemşîd Xan Ku Hertim Bê Ew Li Ber Xwe Dibir*, İstanbul, Avesta Yayınları.

Elçi, Handan İnci, (2003) *Roman ve Mekân Türk Romanında Ev*, İstanbul, Arma Yayınları.

Ergiydiren, Sevinç, (2001), *Edebiyat Araştırmaları*, İstanbul, Boğaziçi Üniversitesi Matbaası.

Farqînî, Zana, (2013), *Ferheng Sözlük*, İstanbul, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Filiz, Mehmet Şirin, (2020), *Üç Kürt (Kurmancca) Romanında Üç Özgürlük Anlatısı (Emekçi, Kürt, Kadın)* Doktora Tezi, Dicle Üniversitesi, Diyarbakır.

Husên, Fawaz, (2015), *Heftiyeke Dirêj Li Amedê*, İstanbul, Avesta Yayınları.

İncil

Kanoğlu, Büşra, (2017), *Hasan Ali Toptaş'ın Hikâye Ve Romanlarında Mekân Algısı*, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul Üniversitesi, İstanbul.

Karaca, İsmet, (2016), *Tarihi Romanlarda Mekan- Coğrafya*, İstanbul, Dergipark, Sayı:34

Kaynak, İbrahim Hakkı, (2016), *Dinlerde Kutsal Zaman ve Mekânın Tarihsel Yapısının Fenomenolojik Algısı*, Konya, Türkiyat Araştırmaları Dergisi.

Kaynar, Cihan, (2020), *Hêmana Mekanê Dî Romana Kurdî (Kurmancî) De: Mînakên Mijabad, Labîrenta Cınan Ê Gerîneka Guernîcayê*, Yüksek Lisans Tezi, Muş.

Korkmaz, Ramazan, (2005), *Yurtsuzluk İtkisi ve Anayurt Oteli*, İlmî Araştırmalar Dil ve Edebiyat İncelemeleri.

- Korkmaz, Ramazan, (2007), “*Romanda Mekânın Poetiği*”, Ankara, Edebiyat ve Dil Yazıları.
- Leeming, David A. (2017), *Dünya Mitolojisi*, İstanbul, Say Yayınları.
- Lescot, Roger, (2013), *Memê Alan*, İstanbul, Avesta Yayınları.
- Narlı, Mehmet, (2002), “*Romanda Zaman ve Mekân Kavramları*”, Balıkesir Üniv. *Sosyal Bilimler Dergisi*.
- Nehayî, Eta, (2013), *Balindeyên Li Ber Bê*, İstanbul, Avesta Yayınları.
- Oğuz, Öcal, (2007), *Folklor ve Kültürel Mekan*, İstanbul, Milli Folklor Dergisi, Sayı 76.
- Özdemir Emin, (1994), *Yazınsal Türler*, Ankara Ümit Yayıncılık.
- Özer, İlhami, (2009), *Axbanû*, İstanbul, Do Yayınları.
- Özmen Şener, (2008), *Rojnivîska Spinoza*, Diyarbakır, Lîs Yayınları.
- Parlıtı, Abidin ve Galip, Özlem, (2010), *Kürt Romanı Okuma Klavuzu*, İstanbul, Sel Yayınları.
- Pirpal, Ferhat, (2019), *Hotêl Europe*, İstanbul, Avesta Yayınları.
- Purçak, Mehmet Emin, (2019), *Kuyu Metaforu Bağlamında Kader Kuyusu Romanında Mekân ve Bellek İlişkisi Üzerine Bir İnceleme*, Mardin, The Journal of Mesopotamian Studies.
- Ramazanoğlu, Muzaffer, (1998), *Gilgamış Destanı*, İstanbul, Cumhuriyet Yayınları.
- Qazî, Rehîmê, (1997), *Pêşmerge*, Stockholm, Nûdem Yayınları.
- İnan, Hacı, (2014), *Kur'an-i Kerim Meali*, 1. Baskı, Ankara, Dua Yayıncılık.
- Suvağci, İyas, (2014), *Di Romana Fawaz Husên ya Bi Navê Evdo û Çend Bêhnikên Şadiyê de Hêmana Mekanî, Wêje û Rexne*, j. 1.
- Şemo, Erebe, (2009), *Şivanê Kurmanca*, Diyarbakır, Lîs Yayınları.
- Şengül, Mehmet Bakır, (2010), *Romanda Mekan Kavramı, Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*.
- Tekin, Mehmet, (2018), *Roman Sanatı 1 (Romanın Unsurları)*, İstanbul, Ötüken Neşriyat.

- Temo, Selim, (2013), *Kürt Şiir Antolojisi* 1.Cilt, İstanbul, Agora Kitaplığı.
- Tevrat
- Todorov, Tzvetan, (2001), *Poetikaya Giriş*, İstanbul, Metis Yayınları.
- Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi, (1998), Cilt 8, İstanbul, Dergâh Yayınları.
- Türker Ferah, (2012), “*Altay Türklerinin Anlatmalarında Mitik Bir Varlık: Celbegen*”,*Milli Folklor Dergisi*.
- Uzun Mehmed, (2007), *Destpêka Edebiyata Kurdî*, İstanbul, İthaki Yayınları.
- Uzun Mehmet, (2007), *Bîra Qederê*, İstanbul, İthaki Yayınları.
- Yeşilyurt, Nurdani, (2018), *Ösküs Uul Destanında Mitik Mekân Ve Gerçek Mekân*, Bartın, *Çeşm-i Cihan Tarih Kültür Ve Sanat Araştırmaları E- Dergisi*.
- Yetkin, Suut Kemal, (2016), *Edebiyatta Akımları*, İstanbul, Remzi Kitabevi.
- Yıldırım, Münir, (2014), *Kutsal Mekan Algısı Bağlamında Şehir Kimliği ve Din*, Adana, Ç.Ü. Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Cilt 23, Sayı: 1,
- Yılmaz, Basri, (2007), *Elif Şafak'ın Romanlarında Mekân Ögesinin Zaman-Kişi Ve Olay Bağlamında İncelenmesi*, Yüksek Lisan Tezi, Osmangazi Üniversitesi, Eskişehir.
- Yılmaz, Ferhat, (2015), *Berawirdkirinek Li Ser Şivanê Kurmanca û Sêbareya Maksîm Gorkî*, Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin.
- Yûsiv, Helim, (2013), *Jinên Qatên Bilind*, İstanbul, Peywend Yayınları.
- Zambak, Ferda, (2007), *Türk Romanında Mekân*, Yüksek Lisans Tezi, Muğla Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Muğla.
- Zeren, Hüsamettin, (2018), *Necati Tosuner'in Romanlarında Yapı Ve Tema*, Yüksek Lisans Tezi, Pamukkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Denizli.
- Zozanî, Birûsk, (2007), *Şêr û Xencer*, İstanbul, Nûbihar Yayınları.